



JI WÊJEYA GEL

P e n d û P e n g

Bîlal Hesen

٢٠٠٨

Komîta temaşedar:
Dr. HUSÊN HEBEŞ
Dr. MECÎT ŞÊXO
Dr. MAMED CUMO

Mafê çapê parastiye.

Nîşan

K	: kurdî .
E	: Erebî .
T	: Tirkî .
E T	: Erebî . Tirkî.
K E	: Kurdî . Erebî .
E K	: Erebî . Kurdî :
E T	: Erebî . Tirkî :
K T	: Kurdî . Tirkî



Bavê Nivîskar

Diyarî :

Ez bi dilzamî vê pêrtûka xwe ji giyanê herdu dayikên xwe : Gulê û Meyrê, ku ji Kurmancî pê ve bi ti dîl din nizanî bûn, û ji giyanê bavê xwe Mehmodê Hesên ku Tirkî û Erebî û hinek Farisî zanîbû re diyarî dikim.

Ez wamgirê wa me.

Ew ji min de bi hêvî bûn ku ez ji wan re tiştêkî bikim, lê mixabin di xwaşiya wan de min ji des kar û barê xwe yê siyasî nikari bû tiştêk ji wan re bikira; ji ber wilo jî, ez ji hinavên xwe de ta niha jî dêşim. Haya ev diyariya biçûk piştî evqas sal wê kani be hinekî ji wamgirî û êşa min kêm bike an na .



Nivîskar li parîzê

Ez rênçberim, tu wêneya minî
 Ez berî te me, tu berê minî
 Ez li ber te me, tu li hember minî
 Ez ku de derim, Berê te li minî
 Ez bimirim, tu li ber xêzê minî
 Ez berdar im, tu cîgirê minî

P ê ş g o t i n

Pend û peng, metelok yan gotinên pêşiyên cûrek ji cûrên zimanê devkî ye. Ev di zimanê her miletekî de tîn dîtî. Di metelokekê de, gelek aliyên ziman derdikevin holê. Metelok ne herdem girêdayî demê, cografîya û sirûştê ne, tevî ku bandora demê, cografîya û sirûştê li ser pêkhatina metelokan berbiçav e jî.

Mînakek ji metelokên girêdayî cografîyayê :

Agir bi Hemqê keve, gurzek pûşê min tê de nîn e.

Li vir pêwîst e mirov bizanibe, ka peyva Hemqê çi ye. Bêyî zanebûna vê peyvê têgihîştîneke tewaw pêknayê. Hemq deştek e, di navbera Çiyayê Kurmênc û Deryaya Sipî de ye. Mînakek ji metelokên ne girêdayî cografîyayê :

Agir bi dunyayê keve, derziyeke min tê de nîne.

Ji aliyekî din ve, metelok bi piranî funksiyona xwe ji bo her demê û her cografîyayê diparêzin û bi asanî tîn fêm kirin. Mînak:

Ziman ji şûr tûjtir e.

Di metelokan de, sûret, awaz, kurtî, zelalî, qafiye û perelêlizim tên dîtin û ew bi hebûna wan xweşik û ciwan dibin. Mînak:

Vexwe dew, têkev xew.

Metelok bi rola parêzvanên zimên radibin. Herweha funksiyona wan ew e, ku, qaîdeyên jiyane, agadariyan û hişyariyan ji bo xweparastina ji şaşîti û tehlûkeyan ji nifşekî bidine nifşekî din. Diyar e, ji ber vê ew hewqas kurt û zelal in.

Di her metelokekê de gelek mesaj hene. Mînak:

Rûnişt li germa, rabû li serma.

Mesaj li vir ev e, ku her tişt divê di dema xwe de bê kirin. Û mirov divê çalak be.

Metelok li ser bingeha tecrûbe û ezmûnên kesayetî û kolêktîvî pêkhatine û pêktên. Mînak:

Zarok negirî, dayîk wî namijîne.

Komkirin û civandina metelokan di dîroka miletan de ji zû ve destpêkiriye. Li gor çavkaniyên ku gihîştine me, Feylesûfê Yonanistana kevin Arîstotêlis gelek pend û pengên Yûnaniyan û gelên cîran komkirine û li ser

wateya wan a felsefî rawestiyaye. Li vir mirov dikare behsa aliyê felsefî yê metelokan jî bike.

Gelek zana û pisporên me Kurdan jî pend û pengên miletê xwe komkirine û di pirtûkan û di gotaran de dane weşandin. Ev yek li Yekîtiya Sovyêta berê, li her çar beşên welatê me, li Ewropa û Amerîka pêkhatiye.

Bi pirtûka ku niha di destê we de ye, karekî din dikeve rêza karên bi qîmet yên zana û pisporên Kurdan li ser metelokan. Yek ji taybetmendiyên vî karî ew e, ku piraniya wan li ser bingeha edebiyata devkî ya herêma Çiyayê Kurmênc hatiye avakirin.

Ev kar ji aliyê mirovekî ve hatiye kirin, ku ew herêma xwe baş nasdike. Ew li gelek gundên Efrînê geriyaye, ji Xulalkan heta bi Gewrikan, ji Heştîyan, ji Kaxura Xastiyan heta bi Şêrewiyan.

Kak Bîlal Hesen herêma Çiyayê Kurmênc di demên zor û zehmet de nasdike. Ew ji ber zor û zilma dewleta Sûriyê bi sal û mehan li çol û çîyan şevder maye. Ewî xwe tevî têkoşerên azadiyê, endamên PDKya-Sûriyê û komonîstên Kurdperwer wek Cemîl Ebdoyê Gewrikan û xwe li gelek deverên herêmê veşartîye û bi salan di nav xelkê xwe de maye.

Bîlal Hesen herweha herêmên din jî yên Kurdistanê nasdike : Ji Qamûşlo heta bi Wêranşehrê û ji deşta Bişêriyê heta bi Behdînan û Şengalê.

Li dawiya vê gotina xwe ya kurt tenê vê yekê dibêjim :
 Hêviya min ew e, ku xwendevanên me yên hêja sûdeke
 mezin ji vê berhemê bibînin û gelek pend û pengên
 xweşik jê hîn bibin.

Dr. Kamal Sîdo

Marburg, ٢٢/ ٠٤/ ٢٠٠٦

Gotina min

Pend û peng beşik ji kelepûr e, û ev beşik balkêştirin û
 girîngtrîn beşik e, tevî ku hemo cûreyên kelepûr di jiyana
 gelan de balkêş û girîng in, ji ber ku her beşik ji kelepûr
 aliyekî ji rengjiyan û dîroka gelan dide xuya kirin.

Lê pend û peng bi teybetî abîneyeke û neynikeke hemo
 aliyên miletan bi şêwekî test û rebeq dide xiyirin.

Li gor nirîna min, eger kesek bixwaze miletekî
 analîzebike û binirxîne, divê ji hemû beşên kelepûrê,
 bêtir xwe bi ser pend û pengan de birêse û xwe
 rafêkêyê.

Ji ber ku pêwendiya vî beşî ji kelepûr bi şêwakî
 gelemperî bi jiyana û jiyankariya gelan ve heye, û li gor
 her bûyerekê, di her koçekê de û di hemû waran de,
 pendekê yan pengekê xwe avêtiye holê.

Loma miletek çendî bi pend û pengên xwe dewlemend be, ewqas jî ew millet xwedî bûyer û danûstandina bi hev re, bi cîran û neyaran re, bi aşîxwaziyê, şervaniyê, û xwedîkirina pez û dewaran, û çandiniya dexl û dana, dar û beran, ta naskirina heyamê asîman û stêrkan. Û wek ku ez dibînim gelê Kurd yek jî wan milletên ku bi folklorê xwe dewlemend e.

Vî beşî kelepûr bala min kişand û ez pê mijûl bûm û her her min jî devoka gel û hin weşanan pend û peng wergirtin û nivîsanmdin.

Ev kar û xebata min a dilzam di vî warî de karekî serbixwe ye, jî ber xwe ez pê rabûme û min xwest ku tiştên li ba min komkirî di pirtûkekê de çap bikim, ku bibe bingeheke biçûk, xwendevan li wan veşerîn û bidin dû.

Hêvîdar im, ku gelê me li van pend û pengan vegere, di axiftin û peyvînê xwe de pêk bîne. Ev pirtûka min ya pend û peng berdewamiya pirtûka min a yekemîn e, ya ku di bin navê pend û şîret de di sala 1990-an de li Libnanê hatiye çapkirin. Lê min pir pend û pengên din xistine nav û di vî pirtûkê de şîrove kirine, lê pêwîst e ez li vir destnîşan bikim, ku min hemû pend û pengên li vir jî nivîsîne, min tê de guhartin di warê dangan û tîpan de nekirine, min li ber xwe daye, ku ez di vir de zimanê devkî li gor yasayên zanistî û akadêmî biparêzim, jî ber ku zimanê devkî, an berhemên devkî jî mercên bingeşîn ên folklorê ne. Belkî hîn baştir be jî ku ez li vir hin mînakên bidim diyarkirin. Pendek weha

dibêje : "*Î ku dest û pêyê mera bikin, dê û bavê mera nakin*". Lê eger em vê pendê weke hevokeke ne zargotinî binivîsînin, divê weha be "*Yê ku dest û pêyê mirovan bikin, dê û bavên mirovan nakin*"; "*Barî kerê ne girn bê, ker nabezê*", lê bi zimanê fermî û nivîsandina niha gerek e hana be : "*Barê kerê ne giran bê, ker nabezê*" û herweha bi sedan nimûneyên weha di vê berhemê de hene, ez naxwazim pir li ser vê mijarê rawestim; çimkî ev mijareke zanistî û serbixwe ye.

Li dawiyê, ez hêvîdar im ku ev berhema cihê xwe di dil û mêjyê gel de rind bigire û ez lava dikim, ku xwendevanên pirtûka min li kêmasiyên min jî biborin. Her weko Kurd dibên: **GOŞT BÊ HESTÎ NABE**

Bîlal Hesen

A

١. A dinê* li dinê ye, a mêt li jinê ye, a gur li bizinê ye.
 ٢. A hewiya herikî a cawiya xeriqî.
 ٣. A xoce azan e.
 ٤. Adar e dew li dar e.
 ٥. Adar e, sibehê sar e, êvarê bihar e.
 ٦. Adar ne bihar e. xox ne ti dar e. qîz ne war e.
 ٧. Adarê berf radibe pozî darê, namîne êvarê.
 ٨. Adarê, şev û roj xedarê.
 ٩. Adarê. agir çêtir e ji xwarina savarê.
-

١٠. Adarê. serê darê çêtir e ji binê darê.
١١. Adetên* bav û bapîran, kerik xweştirin ji hejîran.
١٢. Afir lê bilind bû: (*Afir ciyê xwarina dewara ye, carina li malina azoxe* û xurdemenî kêr dibe û ev rewş li gor dilê hin kesa tê, yan jî hinek bi henekî dibêjin: Afir lê bilind bû, ango dev nagîne xwarinê*).
١٣. Agir berda gomê*, xwe da aliyê zomê*.
١٤. Agir berda kayê xwe da ber bayê.
١٥. Agir bi agir nayê vemirandin.
١٦. Agir bi çiyakî kevê, ter û hişk bi hev de dişewitin.
١٧. Agir bi darên hûr tê geşkirin.
١٨. Agir bi dehlê keve ter û hişk tevde dişewitin
١٩. Agir bi loda min ket, xelkê xwe li ber germ kir.
٢٠. Agir bi mala derewîna ket kesî jê bawer ne kir.
٢١. Agir bi riyê yekî ketibû, ê din go: Hele mere ez cixarê xwe vêxim.
٢٢. Agir bi serê min ketî, tu jî rûnê xwe li ber diqijilîne.
٢٣. Agir bi serî min ketî, tu jî firîkî xwe li ber dibrêjê.
٢٤. Agir biçûk e, dû bilind e: (*Di tiştonekan de dibêjin :Hilindir bilindir law ji bavê bilindtir*).
٢٥. Agir di kulvîla de (qurmê darê) dimînît.
٢٦. Agir gula zivistanê ye.
٢٧. Agir ji dêv dibarê.
٢٨. Agir kete mala derewîn derewîn gazîkir. Kesî jê bawer nekir.

*E adetên adet :. nerît.

*K azoxe : qût . xurdemenî. Tifaq .

*K gom : zinc . xîfk . xaniyê nizim.

*K zom : kon . çadir .

٢٩. Agir xweş e, lê xulî jê çê dibe.
 ٣٠. Agir xweşe, lê bi dûmanê reş e.
 ٣١. Agir, di kevnebizotan de dimîne.
 ٣٢. Agirê dil da ser agirê cegerê.
 ٣٣. Agirê dilan, agirê sêlan.
 ٣٤. Agirê dostan, mirov dişewitîne.
 ٣٥. Agirê evînê dilan dişewitînê.
 ٣٦. Agirê kuçkan her germe, bi dereng sar dibe.
 ٣٧. Agirê pêşîn gurr e.
 ٣٨. Agirê xurt di kutikê kevin de ye.
 ٣٩. Ahê bizina kol, ji bizina bi qoç re namîne.
 ٤٠. Ahê kesî li erdê namîne.
 ٤١. Ahê vî destî ji vî destî re namîne.
 ٤٢. Ahîna bizna kol ji ya bi qoç re namêne .
 ٤٣. Ahîna vî destî ji vî destî re namîne .
 ٤٤. Ahînid meriyan ji meriya re namînin.
 ٤٥. Alîk firn* û alîk curn.
 ٤٦. Alîkî darê rim jê dibê, alîkî xwe bêr jê dibê.
 ٤٧. Alim* bibe rê, di ser re derbas nebe.
 ٤٨. Alim* ji bîr dike, qelem ji bîr nake.
 ٤٩. An hêrg* bike an terk* bike.
 ٥٠. Anca çavêd meriya ji pençek ax têr bibin : (*Piştî mirî binax dikin, li verêbûnê camêrek ji ser tîrbê ji alî linga radihêje pençek ax û davêje alî sêri û di dilî xwe da dibê : Here têr bibe, birako*).
 ٥١. Anca caw di ber meqesê* re bigîne.

*E firn : eton . tandir .

*E alim : hozan . zana . rewşenbîr.

*E alim : hozan . xwendevan . rewşenbîr .

*K hêrg bike : bihêre.

*E K terk bike : berde .

٥٢. Anca def zurnê zepkê.
 ٥٣. Anca ker di bin bara de xewkin.
 ٥٤. Anca ker di bin baran da bimînin.
 ٥٥. Anca meqes di ber cêw re bigînê.
 ٥٦. Anca nan li ber serî miriya bimînê.
 ٥٧. Anca nêûkid mera mera bixurînin.
 ٥٨. Anca şor di dûyî miriya re bibin.
 ٥٩. Anê bi qurbanê jinê binefş û rêhanê.
 ٦٠. Anê bi'ukê, jinikê rihikê .
 ٦١. Anê bobokê* jinê hebokê*.
 ٦٢. Ap biraziya radikin, xal xwarziya radikin
 ٦٣. Apê xidiro hero li viro.
 ٦٤. Aqil bata firotin minê hinekê ji kerê xwe re bikiriya.
 ٦٥. Aqil bi xwe ji zîrarê ye. .
 ٦٦. Aqil derxistine firotinê, herkesî dîsa aqilê xwe kiriye.
 ٦٧. Aqil di sêrî de bûye pelûl.
 ٦٨. Aqil di seriyan de ye, ne di dirêjahiya çekan de ye.
 ٦٩. Aqil li sêrî ye qapaq li dêrî ye.
 ٧٠. Aqil nayê firotin.
 ٧١. Aqil ne benîşt e ku mera bi serî hevda bizemirînê.
 ٧٢. Aqil ne ji biçûk û meziniyê ye.
 ٧٣. Aqil ne li bejnê ye, li seri ye .
 ٧٤. Aqil rêberê mirov e.
 ٧٥. Aqil sermiyan e, ne di serî hemiyan e.

*E meqes : cawbir. Duwêrde . hac .

*K bobok : çîçekê çava.

*E hebokê : serdilkê.

٧٦. Aqil taca zêrîn e lê li serî her kesî nîne.
 ٧٧. Aqil tune kêf dike, pembo tune eşêf* dike.
 ٧٨. Aqilê dîna bidin ber pîna*
 ٧٩. Aqilê qûnê heba tirr ne dikirin.
 ٨٠. Aqilê sivik barê girane.
 ٨١. Aqile zirar : (*gavê kesek tişteki di ser aqilî xwe re dibînê, çi bi piraniyê ya bi meziniyê yan cara tiştid wena nedîbin, dibê: Aqile zirar, ango mera aqilî xwe winda dikê*).
 ٨٢. Aqilî heft jina di serî mirîşkikê de ye û hew mirîşka jî li ser sêrgo diçêre.
 ٨٣. Aqilî kêmbi mera ga û golka bi çêrandin didê.
 ٨٤. Aqilî kurmênc pişt nivro tê sêri.
 ٨٥. Aqilkêmbi kavila* dipên.
 ٨٦. Aqilkêmbi xiraba dipên.
 ٨٧. Aqilsivik çapikin* .
 ٨٨. Aqilsivika bar giran in.
 ٨٩. Ar bi dunyê* kevê derziyeke min tê tine ye.
 ٩٠. Ar bi Hemqê* kevê, gurzek pûşî min tê tine ye: *(Hemq deştek e, di navbera çiyayê Kurmênc û Derya Sipî de ye û berê deryaçak biçûk jî li wir hebû, jî du çeman tije dibû, yek: Ava Reş, ko bûye sînorê çiyayê Kurmênc û Tirkîyê jî alî rojava ye çiyayê Kurmênc û herdu alî çemê Ava Reş jî*

*K eşêf : axşûvkinirin .

*K pîna : pihêna .

*K kavil : xirabe . xopan . xapûr .

*T çapik : lezok . sivik .

*E dunya : cîhan . gerdon .

*hemq : ez gelek li vê gotinê gerîm ko wateya wê zanibim. Li dawiya dawî min di ferhenga hejar de dît . wa dibêje (hemke) bi wateya pirre. Ji vê pê ve mixabin min nikarîbû . li gor bîr û baweri ya min .ger (hemq û hemke) yekbin. Tê wê wateyê ko hemq bi mixêlê (warid) xwe zengîne.

kurmanc in û yek ji çemê Efrînê (avriwîn), ava ko bi baran û axê bersorî dibe, yan jî ava (lezoke) van herdu çeman piraniya çiyayê Kurmênc hambêz kirî ji ber wê nirxa vê herêmê ya dirokî gelek bilind e, lê niha ew deryaçe hatiye çikandin û ziwakirin û deşta Hemqê hîn ferehtir bûye).

٩١. Ar bi mala yekî keti bû, yekî jî serpiyê xwe li ber dikizirandin.
٩٢. Ar î bi min ketî dûman î ji te derê.
٩٣. Ar î bi serî min ketî, ew î cixarê xwe pê vêdixe.
٩٤. Ar î di kutkî kevn da ye.
٩٥. Ar ji sifiliyê hez nakê.
٩٦. Ar ket quncê* solê: (*gavê tengasiyek-aloziyek bi ser kesekî de werê û virde wêde bibeze ji bo xwe ji wê aloziyê xels ke, dibe wek ê ko agir di solê de û şaş bûye nizane wê çilo wî agirî ji sola xwe derxe. Îca, ji ber wê bezê û wê şaşqiniyê, dibêjin : ar ket quncê solê*).
٩٧. Ar û pûşe* li ba hev nabin: (*Berê, heste qulpekî polatî sêkoşeyî bû, kirîfa (mirtiba) ew pûşe ji kuvarka, heger ez ne şaş bim, çêdikirin. Îca, piçek ji wî pûşî dadanîn ser kevirekî çeqmaq î biçûk û bi wî hestî li wî kevrî dixistin, hema çîkek biçûya ser wî pûşî, tavilê agir bi pûşe diket û cuxarê xwe pê vêdixistin. Ji ber ko agir zû bi wî pûşeyî dikevê dibên: Agir û pûşe li ba hev nabin*).
٩٨. Aram stûnê jînê ye.
٩٩. Araqi dan mişk, xwe li hember pisiyê vena.*
١٠٠. Araqiya belaş mela jî vedixwin.
١٠١. Ardê xwe yî bêtî*, kepeka xwe yî rêtî*: (*gavê mirovek hemo kar û barê xwe bi ser hev anî bê û*

*K quncê solê : hundirê solê, ango tengasiyekê ew di

*K xwe vena : xwe qij kir.

**rêkûpek kiribê û xwe ji her tiştî re amede kiri bê,
dibêjin : Mêrik ardê xwe yî bêtî û kepeka xwe yî rêtî).**

١٠٦. Ardî* li ber bindî*.
 ١٠٧. Arê sergoya ye geh vêdikefê geh vedimirê.
 ١٠٨. Arê zengîna tim î germ e .
 ١٠٩. Arvanê salê, di salê de diçe.
 ١١٠. Aş bi çeççeçokê tenê nagere.
 ١١١. Aş çû ye bi dû çeççeço keti ye.
 ١١٢. Aş çûye çeççeço ma ye.
 ١١٣. Aş digerê bi avê law tê li bavê.
 ١١٤. Aş digerê bi avê, law dike karê bavê.
 ١١٥. Aş digerê bi bê qîz tê li dê.
 ١١٦. Aş digere qeraş* xwe dipesine.
 ١١٧. Aş dike qeraş* dixwe.
 ١١٨. Aş î bi ber lê ketî, ewî kewsana* di ser avê ra digrê.
 ١١٩. Aş ji du kevran, hevaltî ji du biran.
 ١٢٠. Aş li boşiyê nagerê.
 ١٢١. Aşê dînan bê av digere.
 ١٢٢. Aşekî bihêle ko tu arvanî xwe lêkî.
 ١٢٣. Aşî nezana bi xwe digerê.
 ١٢٤. Aştiyek ne baş, ji şer xerabtir e.
 ١٢٥. Aşvan li ser ard qise neke, wê li ser çiwalan qise bike.

*K bêtî : êlek kirî .

*K rêtî : rijandî .

*K ardî : ardo . sotemenî . êzng.

*K bendî : pixare . tifik . agirndan .

*K qeraş : sûsanî . aşvan .

*K qeraş : sûsanî . aşvan .

*K kewsan : kezwan . qizwan . şînok .

۱۳۲. Aşvanê mîran bi xulam in.
۱۳۳. Av berê ya biçûka ye, nan ê mezina ye.
۱۳۴. Av bi bêjingê nayê civandin.
۱۳۵. Av bi xwe rê yê xwe dibînê.
۱۳۶. Av çiqas di gola da ma, ewqas digemirê.
۱۳۷. Av di ciyê teng de deng dide: (*herkes zanê ko av di ciyê teng de deng dide, lê mebest ne ew e, belê mebest ew e ko tu çi têxê bin zorê, wê deng jê derkevê û deng bide*).
۱۳۸. Av di gola de dimînê, jin di mala de dimînê.
۱۳۹. Av di golan de genî dibe.
۱۴۰. Av diçe xîç* dimîne.
۱۴۱. Av hat bin: (*berê, xanî ax bûn, ya kon bûn, ya zinc bûn; carina, berf ya baran pir dibarî, av derbazî hundir dibû, digotin : av hat bin me. Îca, her kesî li gor rewşa xwe çarak xwe (çaraka xwe) didî, û belkî hinek jî ji mal derdikevin, diçûn ba kesin din, li vir gavê malin, yan kesin zorek mezin tê ser û carina neçar dibin ji wî gundî bar kin jî, lewma dibêjin: Av hat bin*).
۱۴۲. Av heta girik nebe zelal nabe.
۱۴۳. Av hîn nediye, xwe xwasdikê.
۱۴۴. Av ku bi ser xwe tê, ji rê dertê: (*her kes zanê ko av bi ser xwe werê, wê ji rê derê; ne tenê av, çi tiştê xweristê di ser sînorê xwe re werê, wê ji rê derê, lê mebest ne ew e, belê mebest ew e ko qûl-mirov çiqazengîn ya bilind bibê, ya bibê serdarekî mezin, gerek e ji wê rêya rast ko ew tê re gihayî wê pilê, dernekevê*).
۱۴۵. Av neherimê, masî nayên girtin.

*K xîç : qûm . sêlik .

١٣٦. Av rabû, deng bela bû: *(her kesek her tişteki ji rewşa xwe ya xweristî (normal) derkevê û têkevê rewşeke dî çî çêtir, çî xiraptir deng bela dibê) .*
١٣٧. Av rêya xwe nasdike.
١٣٨. Av û ar amanê nizanin.
١٣٩. Av û ar ti car nabin yar.
١٤٠. Av û zibil bi zorê ji xwedê distînin.
١٤١. Av xew dikê dujmin xew nakê.
١٤٢. Av xwe li ciyê nizim digrê: *(herkes dizanê ko av bi nizmiyê de derê, lê mebest ne ew e; nizmî li vir bi wateya kêmtiriyê hatiye, di vê xweristê de çî, kî, kîjan ji hevalê xwe kêmtir be, yan nizimtir be, yan qelstir be, wê zor lê bê; ji ber wilo, gerek e mirov mêr be û ne qels be).*
١٤٣. Av zanê di bin wê de çî heye.
١٤٤. Av zanê ko binav li kû ye.
١٤٥. Av, avahî ye.
١٤٦. Ava bi mista, ramûsnên ji dosta têrnakin kesa.
١٤٧. Ava bin kayê ye kes nizane rê di kuray e.
١٤٨. Ava bin kayê, deng jê nayê.
١٤٩. Ava binê ka yê, kî têkevê jê dernayê.
١٥٠. Ava bîra bi tedbîra*.
١٥١. Ava birê bi birê tehl e: *(li vir tê zanîn ko mirov çîqa ji hev nêzîk be, weqa kêmasiyên hevdu dibînin; îcar hîn bira û bira kêmasiyên hevdu bêtir dibînin, ji ber vê, mirov dixwaze bi kesin dûr re bidê û bistîne, ne ji ber kêmasiyên wî tinene, lê ji ber ko nizane, wî bê kêmasî dibîne, lewma dibêjin: Ava birê bi birê tehl e, yan dibêjin: dûr bi nûr e, yan dibêjin, giyayê enkûrê mera tehl e) .*

*E tedbîr : çare . çarekirin . çaresazî .

١٥٢. Ava ciyê teng, jê tê xuşxuş û deng.
 ١٥٣. Ava diherike, coka xwe çêdike.
 ١٥٤. Ava golan bê tevger e.
 ١٥٥. Ava hêdî* min ecêb* jê dî.
 ١٥٦. Ava miriya, merijînin ber deriya.
 ١٥٧. Ava miriyan nerêje nava deriyan.
 ١٥٨. Ava rûya peşkek e; ger birijê, meşkek e: (*ava rûya fedîkirin e, şermkirin e, û ew av jî ne bi pir û hindikiyê ye, loma dibên peşkek e, lê ew av bi xwe li rûyê mirov perda fedîkirinê ye, li vir dibên: ger birijê meşkek e, ango ger kesek wî mirovê fedyok neçar bikê ko wê perda fedîkirinê ji ser rûyê xwe bavê, hîngê ew mirov dikeve nav meşkek ava fedînekirinê*).
 ١٥٩. Ava xorta berve jor dihilkişe.
 ١٦٠. Ava xorta ser evraz diçe.
 ١٦١. Ava xwestî naçe hestî.
 ١٦٢. Ava zorê hevraz diçe.
 ١٦٣. Avahiya mala bi jina ye.
 ١٦٤. Avahiya malan di destê jinan de ye.
 ١٦٥. Avdanê dara di devî gîsinî ajotinê da ye: (*Her weko em zanin dar hinek avî ne û hinek jî bejî ne; ger tu bixwazî darên te bejî wek ên avî, baş bibin, Kurda naskirî ko ajotin jî wek avdanê ye, tu çendî bajo, ewqas dar gurr û geş dibin*).
 ١٦٦. Avdarê, şev û roj hatin qerarê*.
 ١٦٧. Avdaz lê teng bû: (*Avdaz ango avdest e, gavê destav zan mîzî yekî bi avdaz tê û wextê nimêjê nêzik bûye, û naxwazê avdazê xwe bişkîne. Tê wê wateyê ko avdaz lê teng*

*E hêdî : nerm . giran .

*E ecêb : sûsret .

*E qerarê : qas hev bûn.

bûye, îcar gavê kesek dikevê aloziyekê û nikane rê jê re bibîne, dibên: avdaz lê tengbû) .

١٦٨. Avê aş biriye tu bi dû çeçeqo ketiye.
 ١٦٩. Avê gi da ser te, çi bostek çi tiliyek.
 ١٧٠. Avê xorta bi dîwara da hildikşe.
 ١٧١. Avên biçûk ên diherikin, ji yên sekinî û mezin çêtir in.
 ١٧٢. Awcî* kes vê ra tine bê, forta pir dikin.
 ١٧٣. Awir_zawir derê.
 ١٧٤. Ax çiqas pirre, mar bi qinyat* duxin.
 ١٧٥. Axa kendalan dibe delaliya malan.
 ١٧٦. Axa mêr û jinê ji hev e.
 ١٧٧. Axatî bi şorbê sar nabe.
 ١٧٨. Axe bi xulam e, xulam bi olam e.
 ١٧٩. Axe bi xulam e, xulam* bi olam e, olam* bi tentene ye.
 ١٨٠. Axe bibin ker têrrê* xwe çemeke ser.
 ١٨١. Axe bû ker, cilka xwe çe meke ser.
 ١٨٢. Axe ji êlê xeyidi ye, êlê hajê tine ye.
 ١٨٣. Axê jinê û mêr ne wek hev bin di hev nagerin.
 ١٨٤. Axe kirîf azarkir ji bo rûnê, xulam berî kirîf rûnişt.
 ١٨٥. Axe li kêfê ye, xulam li zikrê* ye.
 ١٨٦. Axe li xizana didin, xizan her tiştî xwe di ber wan da didin.

*K awcî : nêçîrvan .

*K qinyat : li xweragirtin.

*K xulam : peya . kole .

*K olam : karkirê bê pere .

*K têrr : xurçik .

•E zikir : cezbe

١٨٧. Axê me om e, xulî li serê me kom e.
 ١٨٨. Axê mêt û jinê ne ji hevbê hevdi nabin.
 ١٨٩. Axê miriya sar e: (*Gavê kesek dimirê, hinek jê nêzîk
 pir digrîn. Piştî ko mirî binax dikin, li verêbûnê pîrejînek
 axinê ji ser tirbê radikê û berdidê yaqê wanêd pir digrîn ji bo
 aşt bibê*).
١٩٠. Axe nêd dide xulam xêli dibe.
 ١٩١. Axe û peya yê xwe li bajêr çûn ba qesêb axê goşt
 xwast peya nizanê wê ew jî buxwê ya na , dît yekî li wir
 destid xwe dişo got: Axe ewî destid xwe dişo ewkê jî bi
 mera buxê axê gotê: Ti xema mekşîn ne tu duxwê û ne jî
 ew.
 ١٩٢. Azep hene bi nanzikê ne.
 ١٩٣. Azepê mala xwe be, ne axê xelkê be.

B

١٩٤. Ba bê zebeşan bidêre* , neyê guh bidêre* .
 ١٩٥. Ba berî baranê tê, ta berî mirinê tê, ken berî girî
 tê.
 ١٩٦. Ba jî jê ye, baran jî jê ye.
 ١٩٧. Ba ji tehtê çî dibê.
 ١٩٨. Ba li bêderê te hat, li bake.
 ١٩٩. Ba li dîwarê derve dide.
 ٢٠٠. Ba neyê pelçik naheje.
 ٢٠١. Ba sîtila dagirtî nêxîne.

*E bidêre : li bake .

*K bidêr : gulxune.

٢٠٦. Ba yê hina tê kayê li ber badikin, ba yê hinka tê zebeşa li ber badikin.
٢٠٧. Ba yê xortan timî gurr e.
٢٠٨. Ban* qul be, binban şil dibe.
٢٠٩. Baqilbûna pir belaye .
٢١٠. Baqir nabe zîv, her geyak jî na be şîv.
٢١١. Bar bar e serbar neyar e.
٢١٢. Bar bikevê ji xwediya pêve kes tine ye.
٢١٣. Bar nare ber kêr, û ker nare ber bêr.
٢١٤. Bar, min naêşîne, serbar dêşîne.
٢١٥. Baran dibare, ji xwediyê zeviyan re kare.
٢١٦. Baran ji ewrê reş tê, kar ji dilê xweş tê.
٢١٧. Baran ji rengê ewra de xuyaye .
٢١٨. Baran li ku tê, konê xwe li wir vedigire.
٢١٩. Baran tê erd xwe dipesinê.
٢٢٠. Barana nîsanê zerê xirêsanê.
٢٢١. Barê bi aqila, li pişta bê aqila.
٢٢٢. Barê êzingê min: (*Yekî barek êzing li kerê bar kiri bû, dibir Mêrdînê, bifroşê; peyakî hukmetê ji para gihîştê, rojbixêrek dayê. Piştî çend gav bi hev re avêtin, mêrik got: Birako tê van êzinga bibê ku, go: Ezê bibim bifroşim, mêrik gotê: Ka ez perê êzinga bidime te û tu li kera xwe siwar be û çentê min dîne pêşiya xwe û emê hêdî hêdî herin bajêr, go: Lê êzingid min. Mêrik gotê: êzingid xwe li vir veşêre, tê veşêre û wan jî bibê, bifroşê, û her te perê xwe birine, go; Erê rast e ma ne ez gelekî bi êzingan re westî me, ezê çilo êzingê xwe li vê çolê bavêjim, mêrik kir û nekir nikanî têxista sêri; li dawîyê, gotê: Ez peyê hikometê me, rabû bi zorê êzing pê avêtin û li kerê siwar bû; piştî gihan bajêr, perê wî danê û gotê: De here êzingê xwe bîne).*

*K ban : pişta xanî.

٢١٩. Barê giran para kerê ye.
 ٢٢٠. Barê hicetan* kes nikare rast bike.
 ٢٢١. Barê kerê tiving bin jî, dîsa gurê wê buxwin.
 ٢٢٢. Barê kêre, li ser pişta hêştire
 ٢٢٣. Barê ketî li erdê namîne.
 ٢٢٤. Barê ketiya kes bilind nake.
 ٢٢٥. Barê te ket, zorê bi morê* de.
 ٢٢٦. Barê tu nikaribê rahêjê nekeve bin.
 ٢٢٧. Barê xwar, naghê war.
 ٢٢٨. Barê zana, li pişta nezana.
 ٢٢٩. Barî kerê ne giran bê, ker nabezê.
 ٢٣٠. Barût ji kîsî zêve ye.
 ٢٣١. Baş be, ne belaş be: (*ango sûd û qedra başîtiya xwe bigre û zani be.*)
 ٢٣٢. Başaq* li pey paleyên baş nayên berhevkin.
 ٢٣٣. Başî ji te nayê xirapiyê jî meke.
 ٢٣٤. Başî, başiyê nasdike.
 ٢٣٥. Başiyê ji cîranê xwe re buwaze, ji bo tu jî başiyê bibînî.
 ٢٣٦. Başkiro bi xwe kiro, xerab kiro bi xwe kiro.
 ٢٣٧. Bav bibe zirbav, dê jî dibe dêmarî.
 ٢٣٨. Bav çawa ye, kur wisa ye.
 ٢٣٩. Bav dixwaze law jê çêtir be, xoce dixwazê şagirt jê jîrtir be.
 ٢٤٠. Bav ji êş tê, law pirsar bajêr jê dikê.
 ٢٤١. Bav qoriq dixwin, lawa diran ditevizin.
 ٢٤٢. Bav tê dîtîna bira nayê dîtîna.
 ٢٤٣. Bavê baş kur sed salî bi navê wî nan dixwe.

*E hicet : mihane . abob . qîl

*K mor : qûn . kûn .

*K başaq : hew tayê ko li pey paleyan dmîne.

٢٤٤. Bavê bê qîz, çiyayê bê av e.
٢٤٥. Bavê keçan siltan e*.
٢٤٦. Bavê ling hilanî, kur li şûnê danî.
٢٤٧. Bavê rezek da lêw, lêw goşîk tirî neda bavê.
٢٤٨. Bavê te hat kuştin, çi siwara kuşt, çi peya kuşt.
٢٤٩. Bavê xwe kuştî ye, nimêja xwe jî li ser kiri ye.
٢٥٠. Bavê xwe kuştî, bi tirbê sûnd xwarî.
٢٥١. Bavê xwe ne dîba wê bigota ez kî me.
٢٥٢. Bavê xwe nedîba wê bigota ez lawê kê me.
٢٥٣. Bavek heft zarokan xwedî dike, heft zarok bavekî xwedî nakin.
٢٥٤. Bawer ne kir mêr bikê, mêr kir, doza malheştê dikê.
٢٥٥. Bawerî hêza jîyanê ye.
٢٥٦. Baweriya xwe bi tiştê neyne, li hember her tiştî bi tevdîr be.
٢٥٧. Bawîşk, bawîşkê tîne, Gulzêrîn di kadîne de linga dikutîne.
٢٥٨. Bayê germ bayê baranê ye: (*Kurd ji wê germê re dibên: Germêd kûnşîla, ji ber ko, ew ba pirê wextan, ya di dawî ya biharê de, ya di destpêka payîzê de tê, û di wê demê bi xwe de jî li gor rewşa welatê me pirani ya xelkê li dervayî mala ye, ji berko herdo dem jî wexta kar û kispê Kurda ye, îca, wextê baran dibarê, helbet cil-milid wan şil dibin û cilid wê demê jî havînîn e helbet gavê ew cilid tenik şil dibin kûnid wan jî şil dibin. ji ber wê şilbûnê dibên: Germêd kûnşîla*).
٢٥٩. Bayê sibê li mirovan nexe, yê êvarê hêç e.
٢٦٠. Bazar bê deng, mirî bê bang, serdar bê zor nabin
٢٦١. Bazar xweşe li benderê, ne li zeviyê
٢٦٢. Bazarkirinê helawê dêv şêrîn nake.

*E siltan : paşe . padişe . qeral.

٣٦٢. Bê da û baranê bir.
 ٣٦٤. Bê haveyn* şîr nameyê.
 ٣٦٥. Bê hêvan şîr nabê mast.
 ٣٦٦. Bê male, bê xaltîk û xale.
 ٣٦٧. Bê şêx û pîr neçe dîwana mîr.
 ٣٦٨. Bê xêret, bê îmane.
 ٣٦٩. Bê xwedê dibe, bê xwedî nabe.
 ٣٧٠. Bêçiyê xwe di dengizê kê dengizê biherimê.
 ٣٧١. Beden bedena şirtê ye, law lawê çirtê ye.
 ٣٧٢. Beden gep û zep e, aqil rast û çep e.
 ٣٧٣. Bêdera me ar vêket.
 ٣٧٤. Bêderê vê tene li ba meke.
 ٣٧٥. Bedewa çav kil kir, dilê xorta kul kir.
 ٣٧٦. Bedewî deh in, neh jê çek in.
 ٣٧٧. Bedewî nayê veşartin.
 ٣٧٨. Bedewiya mirov, ilm* û marîfeta* mirov e.
 ٣٧٩. Bedewiya* mirov, zanebûn û fereseta* mirove.
 ٣٨٠. Befir fi'la xwe nahêlît (tim sar e) .
 ٣٨١. Beg qedrê beg, şivan qedrê* şivan zane.
 ٣٨٢. Bêhn ferehî ji meznahiyê ye.
 ٣٨٣. Bêhna bêxêretan fireh e.
 ٣٨٤. Bêhna fere ji qelsiyê ye.
 ٣٨٥. Bêhna fereh ji bênamûsiyê ye.
 ٣٨٦. Behr* bi devê se nalewite* .

*K hevyan : hêvan . heyvan . ê ko şîr pê dimeye.

*E ilm : xwandin .

*E marîfet : zanebûn.

*K bedewî : qncî . başî . spehîtî .

*K firaset : jîrbûn . mêranî .

*E qedr : nerx . ûd .

*E behir : derya . zerya . avşîn .

*E nalewite : naherime . alodenabe .

٢٨٧. Behr* bi devî kûçka naherime.
 ٢٨٨. Bêje rast, raze rast.
 ٢٨٩. Bejin biriqî dil xeriqî*.
 ٢٩٠. Bejin çît û kitan e, nan qizî qitrane.
 ٢٩١. Bejin çît, mal mecît.*
 ٢٩٢. Bêjin lal e, nebêjin teral e.
 ٢٩٣. Bejin tîte, lê mal rûte.
 ٢٩٤. Bela dîna ji bela Xwedê mezintir e.
 ٢٩٥. Bela ji dera bêgûman tên.
 ٢٩٦. Bela nezana ji bela zalima xiraptire.
 ٢٩٧. Bela* serî mera ziman e.
 ٢٩٨. Bela* tên serî mêra.
 ٢٩٩. Bela* xelkê ji çol û çiya tê, ya min ji ber lingê min
 tê.
 ٣٠٠. Bela* zalima* li momina* dikefe.
 ٣٠١. Belê heye, bela ye
 ٣٠٢. Belên xelkê ji dûr de tên, ên me ji ber ûr de tên.
 ٣٠٣. Bêmalo bê ap û xalo.
 ٣٠٤. Ben di ciyê zirav re diqete.
 ٣٠٥. Ben ne bi sêri ketî, ne bi linga ketî .
 ٣٠٦. Bênamûsî avêtin ber kûçkan, kûçkan qebûl*
 nekirin.

*E behr : derya . zerya . avşîn.

*K xeriqî : lihevketî . berzerî.

*E mecît : ji mescêd hatî . mizgevt . hurmizgeh .

*E bela : telam .

*E bela : telam .

*E bela : telam .

*E bela : telam .

*E zalim : stemkar. Bêwijdan. Zordar .

*E momin : olperest . dilpak . evdal .

*E qebûl : pejirandin . litêkirin .

٣٠٧. Benî virra kin e.
٣٠٨. Benî xwe benî kevwê ye: *(kevw, tiştêkî wek hiriyê ye, di ser avê meyî ra çê dibê, lê sist e, û her weko em zanin, bena ji hiriyê çê dikin, û kevw jî wek hiriyê ye, yek ji kevwê jî benekî bihûnê û çê kê, lê mera pê ewle nabê ko barekî yan karekî pê bikê, mebest ew e ko mirovekî ko tu lê ewle nebê, tu dibê : benê te benê kevwê ye, pê bar ranabin)*.
٣٠٩. Benîştî dêhna ji ritlê ye* .
٣١٠. Benîştî dîna ji litirê ye* .
٣١١. Benîştî te bila bi serî pozî te va bê, kengê te xwast bicû.
٣١٢. Beq çiqas kok dibe, qûn ewqas lê qalind dibe.
٣١٣. Beq nequre wê bidire.
٣١٤. Beqa deng li mara kir, kêvcala lingê xwe li bakir.
٣١٥. Ber ji bestan xelas* nabin.
٣١٦. Ber şerî sibê here, ber xêrê êvarê mere
٣١٧. Ber siya rovî romene, bera şêr te bixwin.
٣١٨. Ber* li serî an ser li berî, wê her bişkê serî: *(ber, kevir e, ango çî ber li serî kevwê, yan serî li ber kevwê, ê ko bişkê her serî ye)*.
٣١٩. Bera berê heyvê li me bî, me çî ji stêrkayî .
٣٢٠. Bera bizê, nêr û mê ferq nîne.
٣٢١. Beranê bisko ba, tu wê li ber derî yê babo ba..
٣٢٢. Beraz ko xwe dişûn, dîsa vedigerin nav çamurê* .
٣٢٣. Berberî* û nanî genimî nayên ba hev.

*E ritil : litir , sed litir qentareke.

*K litir : sê kîlo û sêsed û sî û sê girami .

*E xelas : riha .

*K ber : kevir .

*T çamur : herî . rutam . gîl .

٣٢٤. Berdanê jinê, adeta dinê.
٣٢٥. Berê biedilîne* paşê bixemilîne.
٣٢٦. Berê bifikire* çêtir e.
٣٢٧. Berê darê bi darê ve kurmî dibe.
٣٢٨. Berê darekê ne, pîvazê mişarekê ne.
٣٢٩. Berê em di donê xwe de diqewiri: (*ango xizan in û tiştek ji wan re ji ciyekê din nayê*).
٣٣٠. Berê giran di ciyê xwe de girane, gava leqya ne bi du peran e.
٣٣١. Berê guhbidê paşê bêje.
٣٣٢. Bere lawkê min lawîn be, bere kirasê wî cawîn be.
٣٣٣. Bere qûna mera derkeve, bere dengê mera dernekeve.
٣٣٤. Bere rû yê mero biêşê, çêtire zikê mero biêşê.
٣٣٥. Bere rû yê te bêşe û dilê te neêşe : (*carina mirov tiştina ji bo xatira dikê, lê ne bi dilê wî ye; di bin fediyê de û rûwê wî nagrin û naxwazê xatirê wî bêşinê, li neçari wî îşî dikê, di dû re dilê wî rûnanê û li xwe poşman dibê, lê çû, derbaz bû, û her tê bîra wî dilê wî dêşe; îcar, li vir mebest ew e, rûwê xwe carekê bêşîne tevî ew jî giran e û bila dilê te tim neêşe*).
٣٣٦. Bere rûyê mero biêşê, çêtire zikê mero biêşê.
٣٣٧. Berê têr buxwe paşê bişekirîn*.
٣٣٨. Berê xwe bidin merdan, nabînin derdan.
٣٣٩. Berê, em î bi kevra bi kûçka ketine, hîn tu jî bi ser da: (*Carina kûçik tiştekî, xwarinekê ji ber kesekî xizan*

*K berberî : dogiş . şerr .

*E biedilîne : duristbike. Bigûrîne .

*E bifikire : birame.

*E bişekirîne : spaske

direvîne, ji wê xwarîne pê ve jî li ba wî tine ye, mêrik neçar dibe ko wê xwarîne jî kûçik bistîne, îca radibe li kûçik dike qîr qîr û bi kevra pê dikeve ko belkî kûçik wê xwarîne çeke, da ew bixwê, lewma yekî pir xizan be dibêjinê : î bi kevra bi kûçka ketî).

٣٤٠. Bereket* bi hereketê* ra ye.

٣٤١. Berf çiyê dibîne, xwe lê datîne.

٣٤٢. Berf dibare, bixêret dasê tûjdikin, bêxêret kêre tûjdikin: *(herweko em dizanin berê xelkê pez û dewar xwedî dikirin, û hev peza (ev peza) li çê (çiya) diçêrî; yêm kêmbû, gavê berf dibarî, rêyê çeriyê nedîma, xelk neçar dibû di wê berfê de herin, ji çê çilo ji pêz re binin, û em dizanin çilo jî bi dasê qut dibe, îcar xortê malê yê bixêret dibezî dasê û tûj dikir, jibo herê çilo ji pêz re wîne, û yê bêxêret dibezî kêre û tûj dikir, di dilê xwe de digot: Başê di vê berfê de belkî biznek xwedê bikim ji nêza bimirê emê şerjê kin û bixun).*

٣٤٣. Berf dihele erd dimîne.

٣٤٤. Berf jî ber xwe ve nahele.

٣٤٥. Berf jî sipiye, kûçik bi ser de mîzdikê.

٣٤٦. Berf ketiye, mêrik kêre tûjdikê.

٣٤٧. Berf tê digrîn, derê li pê digrîn.

٣٤٨. Berfa êvarê, qirê tine li debarê.

٣٤٩. Berfa hûr, xwe davê rana sitûr.

٣٥٠. Berfa hûre, dawî dûre.

٣٥١. Berfê bixwe ji tîna bimir, daniya bixwe ji nêza bimir : *(ango, tu tî bê, tu çiqas berfê bixwê, tîbûnê te naşkê. Tu birçî bê, tu çiqas daniya bixwê, birçîbûnê te naşkê)*

٣٥٢. Bergîr digrin hev, ker li ortê pehna duxin.

*E bereket : pêz. Birişt . weç .

*E hereket : tevger . liv . kar.

٢٥٢. Bergîr dîkin, hesp duxin.
 ٢٥٤. Bergîra têt xwarin, ê zîta bavên.
 ٢٥٥. Berî bigihî avê, daw û derlingid xwe hilmede navê.
 ٢٥٦. Berî darê darê dixemilîne.
 ٢٥٧. Berî dê ya tim berve lawane, berî lawan jî tim berve çiyane.
 ٢٥٨. Berî giya zelaxît in, paşê qermeqît in.
 ٢٥٩. Berî gotina xwe bêjî, gul xwe ne.
 ٢٦٠. Berî gotina xwe dibêje, bibêje*.
 ٢٦١. Berî ko îş bên serî te xwe biparêze.
 ٢٦٢. Berî ku tu bighê Êfrîn (çemê Êfrîn) xwe tazî meke .
 ٢٦٣. Berîka feqîran vala ye, qelbê wan tijî ye.
 ٢٦٤. Berîka rûta qul e.
 ٢٦٥. Berîka te, hevalê te.
 ٢٦٦. Berîkid kefena* tine ni: (*mebest ew e, gavê mirov dimire, nikane tiştekî bi xwe re bibê; ma çima berî bimirê camêriyê nake û ji xwe re kêf nake*).
 ٢٦٧. Berjêr tifke rih in, berjor tifke simêl in.
 ٢٦٨. Bersiva kerîtiyê bi kerîtiyê nayê dayîn.
 ٢٦٩. Bertîl kevra nerm dike.
 ٢٧٠. Berû dan bizinê dest avêt boçikê.
 ٢٧١. Berû yê darekê ne, pîvazê mişarekê ne.
 ٢٧٢. Berûk ji çiftê ket Got: Wey ez di devê te yî qîç nim .
 ٢٧٣. Berx li berên tê.
 ٢٧٤. Berxa mirî ji gur natirse.
 ٢٧٥. Berxa nespêrin gura.

*K bibêje : bêjingke. biparzine .

*E kefen : qerqer .

٣٧٦. Berxa Xwedê xwedî bike gur nikare buxwe.
 ٣٧٧. Berxê sêwî beran jê dernayê.
 ٣٧٨. Berxê xelkê ji meriv re nabin beran.
 ٣٧٩. Berxên pir ji mihên pir in.
 ٣٨٠. Berxî çê di kozê da xuya dikê.
 ٣٨١. Berxî çê di ser kozê de bêlî ye .
 ٣٨٢. Berxî nêr ji kêrê ra ye.
 ٣٨٣. Bêşerm, kirin hebana, lingê xwe di hingila re derxistin: (*heban wek meşkê ye, lê gewr e, û hingil ciyê çar linga ne bi hebanê van e, îcar li vir dibê: bêşerm (bêfedi) di hebana de veşartin ji bo kes wan nebînê û kes ji ber wan ve fedî neke, wan jî lingên xwe di hingila re derxistin, wek tu bêjê: Em va ne*).
 ٣٨٤. Bêxêretî ji bê îmaniyê ye.
 ٣٨٥. Bext hebê, text* ê bi xwe bê.
 ٣٨٦. Bext kela mêra ye.
 ٣٨٧. Bext kete xortekî bi dil bê, çiqasî pez bigerînî, pez şîr didê.
 ٣٨٨. Bêxt nadim bi têxt.
 ٣٨٩. Bextê bedbexta tinebû, min mêrek kir ew jî exte bû.*
 ٣٩٠. Bextê dê cihêzê qîzê.
 ٣٩١. Bextê pêşîn, warê hêşîn.
 ٣٩٢. Bextê sêwiya heba roja îdê zik nedêşan.
 ٣٩٣. Bextê sêwiya heba, dê û bavê wan nedimirin.
 ٣٩٤. Bextê te hebê, pisîka te jî wê nêçîrvan bê.
 ٣٩٥. Bextî dê ê dotê ye.
 ٣٩٦. Bextî dotê ji dê ye.

*K text : şahatî . padişahî .

*K exte : ginokirî . xesandî . xesek .

٣٩٧. Bextî min di her tiştî de reş e, tenê di zebeş de sipî ye.
٣٩٨. Bez ne spêre pisîka,
٣٩٩. Beza hêsp, namûsa siwêre.
٤٠٠. Beza pisiyê ta bin qulînê ye.*
٤٠١. Bêzirav* umur* dirêjin.
٤٠٢. Bi alistinê- zik têr nabe.
٤٠٣. Bi aqilê vala tu naghêjî hevala.
٤٠٤. Bi aqilî mezina bizewice, bi dilî biçûka hezke
٤٠٥. Bi avê gemirî re tê vexwarin.
٤٠٦. Bi avê û bi êgir mesqeri (lîzk) nabê.
٤٠٧. Bi baqila kinca bişûn, bi dîna dawşînin.
٤٠٨. Bi bêhna fere, bêşîr dibe doşav*.
٤٠٩. Bi çavê xwe te nedît û bi guhê xwe nebihîst înan meke .
٤١٠. Bi çavgirtinê, çav teng nabe.
٤١١. Bi cirt-fisiya caw boye nabê.
٤١٢. Bi çûçikî qulaq* qutkirine: *(Li gundan, guhên cêwrikan bi çûçikî jê dikirin, ji bo bi mezinê eger şer bi kûçkan re kir ji bo ew kûçkî din bi guhan negire; îca ew cêwrika mezin jî dibû û dîsa jî ji wî mêrkê ko guhên wî qut kirine ditirsî, ango çav ji xwe tirsandine).*
٤١٣. Bi çûkî bi goçê re dimeşî, mezin bû li kerê kirin .
٤١٤. Bi dandinê biçûya ser, jin ê bi mêrî xwe re biçûya ser.
٤١٥. Bi darka bi qulê sêmsora mekeve.

*K qulîn : kulîn . stêr . ciyê nivîna.

*K bêzirav : tirsonek .

*E umur : temen . mezîl . jî .

*K doşav : dimis . mitê .

*T qulaq : guh .

٤١٦. Bi dêna dên* sax nabin.
 ٤١٧. Bi derziyê neçe ser şûjinê.
 ٤١٨. Bi dest bike, bi dev bixwe.
 ٤١٩. Bi desta berda bi linga li dû gerya.
 ٤٢٠. Bi desta bide, bi linga bi dû kev.
 ٤٢١. Bi destê nemerda megir, bila av te bibe.
 ٤٢٢. Bi destekî çepik lênaKevin.
 ٤٢٣. Bi destekî çepik nabin.
 ٤٢٤. Bi destekî du zebeş ranabin.
 ٤٢٥. Bi destî xwe bike, bi devî buxwe.
 ٤٢٦. Bi devî te kes şorbê venaxê.
 ٤٢٧. Bi dijmina re zimanê xweş û piştî hişk
 ٤٢٨. Bi dilê mezinan bizewice, bi dilê biçûkan jî
 hezbike.
 ٤٢٩. Bi dilî xwaşi mera dikane mêr ji qolê bikşîne.
 ٤٣٠. Bi dîna hêvîr bistirê, bi baqîla nêr bike.
 ٤٣١. Bi dîna kinca bişo, bi baqîla raxe.
 ٤٣٢. Bi dîna re dîn, bi baqîla re baqil be.
 ٤٣٣. Bi dînan delava yoqle dike*.
 ٤٣٤. Bi dînan stiriyan biçine.
 ٤٣٥. Bi dinê bişêwirin*, dîsa bi ya xwe bikin.
 ٤٣٦. Bi dînî kir, bi baqîlî xwarî.
 ٤٣٧. Bi dizî hat gon, ê aşkere bizê
 ٤٣٨. Bi dizî hat nêrî, aşkere za.
 ٤٣٩. Bi dostan re germ be, bi dijmin re nerm be.
 ٤٤٠. Bi du pera me tu şand, em nikanin te bi çel perî
 vegeînin.
 ٤٤١. Bi dûvmqesokekê bihar nayê.

*E dên : wam . qer .

*T yoqle dike : sedike.

*E bişêwirin : bidanişin . rawêjkin .

٤٤٢. Bi fenê dibe bin benê.
 ٤٤٣. Bi gemarê ber dirana mera têr naxwe.
 ٤٤٤. Bi girî, venagerin mirî.
 ٤٤٥. Bi goliki tirsandine: (*mebest, bi çûkayî ji xwe tirsandiye.*)
 ٤٤٦. Bi gotina jinê, ket doşeka mirinê.
 ٤٤٧. Bi goto got mirov naçe cot.
 ٤٤٨. Bi gur be, pêşî kerê min buxwe.
 ٤٤٩. Bi gur ra dikujê, bi qijakê* re şînê* dikşînê.
 ٤٥٠. Bi gur ra dixwe bi şivên ra lê digere.
 ٤٥١. Bi gur re dixwe, bi xudên re şînê digerîne.
 ٤٥٢. Bi gurmistê mebeze dirêşê.
 ٤٥٣. Bi heft ava bişû pak nabê.
 ٤٥٤. Bi heft qatê erdê da çûye xwar û hîn jî li ber xwe nakevê.
 ٤٥٥. Bi heft top kêndir girêde zepnabê.
 ٤٥٦. Bi hêştir ra gotin çima paşkûnkî mîzdikî hêştir got: Li min binêre derek min rast heye ko mîzkirinê min jî rastbê.
 ٤٥٧. Bi kabê min ne bi kabê te: (*Her kes zanê ko sîsalk û dûvmeqesk zivistanê derin çiyên germ û havînê derin çiyên hênîk; berdevî biharê, sîsalk dûvmeqeskê dişînê welaê jorin dibê: Hele here binêre ka bihar hatî an na. Meqesok tê çend rojan dimîne û vedigerê ba sîsalkê xwe û dibêjê: Haho çawîr çîmen li kabê mera ye; sîsalk û meqesok tev sokin dikin û tèn welatê jor, dighên wir sîsalk dinêre ko ne çawîr û ne çîmen e, dibêje: Hevalê te got: çawîr çîmen li kabê mera ye, ka çawîr-çîmen, meqesokê gotê: Li kabê min e, ne li kabê te ye*).
 ٤٥٨. Bi kê re bigrî, tê bi wî re herî heşerê.*

*K qijak : tilûreke . firindeye . qijoka palûta.

*K şînê dikşîne : reşê girêdide.

٤٥٩. Bi kêfçi kom kir, bi heskê* bela kir.
 ٤٦٠. Bi kerê nikanê, dibeze kurtên.
 ٤٦١. Bi kerê nikarî, bezî kurtên.
 ٤٦٢. Bi ketinrabûnê kabêd me qul bûne.
 ٤٦٣. Bi kêvcêl ra gotin, çima berxar berxar dimeşî,
 got: Ewêliya bi reşî ye.
 ٤٦٤. Bi kûçik re gotin, bibeze û birew, got: Ez nikanim
 du kara bi hev ra bikim.
 ٤٦٥. Bi kulîlkekê bihar nayê, lê kulîlk nîşana biharê
 ye.
 ٤٦٦. Bi kulmê neçe ser dirêşê.
 ٤٦٧. Bi kûnê ket cacirûnê*: (*cacirûn navê xwarinekê ye
 anga ket nav xêr û bêrê*).
 ٤٦٨. Bi lê (lehî) de çû û ji ê xwe namîne .
 ٤٦٩. Bi lêda derê û ji xwe nagerê.
 ٤٧٠. Bi lêda derê, dibê ezî avjeniyê dikim.
 ٤٧١. Bi lezî, nagihîjî ti mirazî.
 ٤٧٢. Bi ling bişimite, bi zimên meşimite : (*mebest ew e
 bila lingî te bişkê, piştî demekê wê çê bibe, lê tu bi
 zimanî bişemitê, anga şaş bibê, dikeve nav dev û
 diranên xelkê; îcar, çêbûn ne bi des te ye û ne bi des
 tuxtira ye û millet li kesî nayê rehmê, loma dibên : bila
 tu bi ling bişemitê, bi zimên neşemitê.*)
 ٤٧٣. Bi malê dunyê nefire.
 ٤٧٤. Bi male, bi ap û xale
 ٤٧٥. Bi mara emnet* dibe, bi axan emnet nabe.
 ٤٧٦. Bi merdan bipirse, ji pîsan bitirse.

*E biheşirê :kombibê . cemabibê . bicivê . tevêbê .

*K hesk : kevçiyê mezin.

*K cacirûn : xwarineke ji rûn û nanê hûrkişî ye.

*E emnet : ewle . bawerî .

٤٧. Bi minêminê dernakeve ji bin hukmê* jinê.
 ٤٨. Bi mirinê dilê xwe şa neke.
 ٤٩. Bi mirîşkê re gotin, li ser sêrgo meçêre, go, xûya min e.
 ٥٠. Bi mirovekî govend nabê, lê bi hev dikevê.
 ٥١. Bi nav keleka ket (*dest bi xirapiyê kir*).
 ٥٢. Bi nermî mar ji qulê tên derxistin.
 ٥٣. Bi nirînê têt bixwara, kûçika wê têt bixwara.
 ٥٤. Bi pariyê xelkê zik têt nabe.
 ٥٥. Bi pirsê mera digihê xursê.
 ٥٦. Bi pirsê mirov digîne mala xwedê
 ٥٧. Bi porê sipî di xwîna sor da gevizî.
 ٥٨. Bi qelengî kirîfa qîzê* eşîra* natên.
 ٥٩. Bi qereza kes nagihê miraza* .
 ٦٠. Bi qewitiya hec* qebûl* nabe.
 ٦١. Bi qûna tazî, tembûrê dixwazî: (*feqîrtî barê xwedê ye, ma ne millet jî feqîr wek mirovekî nedipijirandin (qebûlnedikirin) ji ber wilo kûntazî gerek e tembûrê nexwaze çima fiqare ye*).
 ٦٢. Bi qurîşekî kûçik dîxesînê, bi du qurîşa destê xwe dişû.
 ٦٣. Bi rih û rehman e* , di bin ra Bekoyê awan e: (*mebest ew e ko ne her kesekî riha xwe dirêj kirin û berdane, dilê wî jî paqij dibe*) .

*E hukum : dar . destelat . serdarî .

*T qîz : keç . Dot .

*E eşêr : êl .

*E miraz : daxwaz : xwastek .

*E hec : mebestgeh . serdana mala Xweda.

*E qebûl : pejirandin . litêkirin .

*E rehmane : hilovane.

٤٩٤. Bi rovî ra gotin, me tu kir serekê mirîşka rovî go:
Karekî çêtir tinebû.
٤٩٥. Bi rovî re gotin ka em te bi serokî mirîşka kin,
rovî dagirî. jê pirs kirin çima digrî? Go: Ez ji
dewletê xwe bawer nakim.
٤٩٦. Bi sebrê qoriq dibe tiri.
٤٩٧. Bi ser kodka tiji da digrî: *(kodik biroşeke textî ye;
carina, mirovin hene kodika wan tijî ye jî û belkî tijî
zêr be jî ji tirsaxizaniyê re digrîn û ew kodika tijî
çavên wan têr nake)*.
٤٩٨. Bi serî îço bi binî îço bi nebî* îço bi mishefa* mala
Goçer nêriyê me bi alî gîska we da neçû.
٤٩٩. Bi şev bû ewr, bi roj bû sayî, xulî li yê ko ka di
kadînê da mayî: *(berê, gundiya qûtê salê datanîn û
yê mê dewêr ê zivistanê jî datanîn, lê her kesî nikanî, û
hinek jî hebûn za û kaya wan bêtirî pêdiviya wan bû,
hina jî wan di bin hinek neçarî de li ser bêdera berî ko
bînî mal difrotin, û hina jî nedifrotin, radikirin ber
devî biharê, ji berko, hîngê, her tişt giranbiha dibû,
îcar, li vir xuya ye Kurd rewşa xwerista xwe nas
kiriye, ko zivistanê bi şev bibe ewr û bi roj bibe sayî
giya zû şîn tê, û ber devî biharê ka jê re gerek nabê, û
ew kesê kaya xwe rakirî ko giranbiha bifrêşê, ne erzan
û ne giran nayê firotin û di kadînê de dimîne, loma
dibên :xulî li yêko ka di kadînê de mayî).
٥٠٠. Bi şev bûk e, bi roj pepûk e.

*E nebî : pêşbîn . peyxamber. Peyamber .

*E meshef : pertûka evra.

001. Bi şev, rewiye (*rêwiyê*) li riyân, (*li rêya*) qeda* li ber piyan*
002. Bi şorekê re mera cinetî* dibê bi şorekê re mera cehnimî* dibê.
003. Bi tajiya xelkê nêçîr nabe.
004. Bi tir fisa caw boye nabe.
005. Bi tirrek li mîza mede dû qîza: (*tirr nîşana xortaniyê ye, te dî yek kal bû bê, dibêjin: Tirr tê de bûne fis, ya dibêjin: Tirr tê nemane, ango ti tê nemaye; îcar, li vir, carina kesek dimîze tirrek pîsik di ber mîzê re derdikevê, nebêje ew tirra xortaniyê ye pê nexope û mede dû qîza*).
006. Bi vê qoşê naghê moşê.
007. Bi werîsî xelkê danekef birê.
008. Bi xatirê xatiran gelek diçin ser dînê kafiran.
009. Bi xêra seriya dixwe keriya.
010. Bi xulaman re bixebite, bi mîran re buxwe.
011. Bi xureka* xelkê, qasik nakele.
012. Bi xurîna (*xurandîna*) xelkê, xur danamire.
013. Bi xwarina gura be, ne biçûkê bira be.
014. Bi xwaziya kes nagrê gurzê keziya.
015. Bi xwe distirê, bi xwe tew dikê.
016. Bi xwe listî, bi xwede mîstî.
017. Bi ya mezina bike, cejnek berî te kirine.
018. Bi zana re here dûjehê, bi nezana re mere buhuştê.

*E qeda : girdav . bobelat . nervîn . rip .

*K piyan : lingan. Nig .

*E cinet : bihuşt .

*E cehnim : dojehe.

*K xurak : xwarin .

٥١٩. Bi zêran zo-lê-ferê* dilîzê: (*zo-lê-ferê lîskik e, yek çend tiştan dixê mistê xwe û bi yê dî re dibê : zo, lê, fer^s ê dî, ya dibê : zo; ya dibê: fer; eger wek gotina wî derket, ew tiştê mista wî jê re ye, eger wek gotî derneket, ewê bi qas wî tiştî bi wî dê, îca li vir mebest mêrik pir zengîn e, xwedî zêr e, li mala xwe rûniştî û bi zêrên xwe bi xwe re zolêferê dilîzê û dîşliqa xwe pê tînê*).
٥٢٠. Bibe çûka newala, nebe mirîşka nav mala.
٥٢١. Bibe dostê rojên teng, bila ji te re jî dostê rojên teng çêbibin.
٥٢٢. Bibe mal avakirî, nebe mal xerab kirî
٥٢٣. Bibe xulamê zana, nebe mîrê nezana.
٥٢٤. Bibe, dibên aşiq e* nerm here dibên çatiq e.*
٥٢٥. Bibîne cefê, têkefe sefê.*
٥٢٦. Biçûkê gura be, ne biçûkê bira be.
٥٢٧. Biçûkê malê gula malê.
٥٢٨. Biçûkê malê gula salê.
٥٢٩. Biçûkê malê kûçkê malê ye.
٥٣٠. Biçûkê malê, dimînê delalê dê û bavê.
٥٣١. Biçûkê salê, gula malê.
٥٣٢. Bide netirse, bistîne şerm neke.
٥٣٣. Bigre qedrê kal û pîran, çi feqîran çi mîran, ne li xweşiyê, ne li mirinê naçe ji bîran.
٥٣٤. Bigurije, nebore ...
٥٣٥. Bihar hat, rûmeta kincên zivistanê hilat.

*K zolêferê : navê lîstikê ye, tenena dixin destê xwe û dibên: zo lê fer.

*E aşiq : evîndar . sewdalî . dildar . dilbaz .

*K çatiq : kulek . lingxwar .

*E sefê : xoşî .

٥٣٦. Bihar keçek ciwan, havîn dayîkek, payîz
jinebiyek, zivistan jî dêmariyek e.
٥٣٧. Bihar, bihara ajal û hova ye, payîz, bihara mirova
ye.
٥٣٨. Biharê berf radibê pozî darê û namînê êvarê.
٥٣٩. Biharê girt û lêkir, payîzê jêkir.
٥٤٠. Biharê pez, payîzê rez.
٥٤١. Bihostek bêxemî gazek xusaret e* .
٥٤٢. Bihostek pexîlî, qulincek* rezîlî.
٥٤٣. Bike kala buxe mala.
٥٤٤. Bike û neleze, neke û neleze.
٥٤٥. Bila avis bê, bila bi derengi bê.
٥٤٦. Bila avis be, kengê dizê bila bizê.
٥٤٧. Bila berî hêvê li min bê, bila xelk giş dijmin bê.
٥٤٨. Bila bextê mirov hebe, bila çavek xwe nebe.
٥٤٩. Bila bihur be bila kûr be, bila qîz be bila pîr be,
bila rast be bila dûr be.
٥٥٠. Bila bizê, nêr yan mê wek hev in.
٥٥١. Bila boxanê rojekê bim, ne çêleka salekê bim.
٥٥٢. Bila bûk gêj bê, ne ziman dirêj bê.
٥٥٣. Bila canigê rokê bim, ne çêleka sed royî bim.
٥٥٤. Bila çavid meriya derkevin, bila navî meriya
dernekevê.
٥٥٥. Bila çê be, bila keça sê be.
٥٥٦. Bila cî bilind bê, bila li ser sing bê.
٥٥٧. Bila dereng be, bila baş be.
٥٥٨. Bila dijminê te kî bê, ne zik û ziman bê.
٥٥٩. Bila dîkê rojekê bim, ne mirîşka sed rojî bim.
٥٦٠. Bila dil bi dil be, bila ser erdê hesîr be.

*E xesaret : ziyar .

*K qulincek : qulinc dirêjî pî ji destan ta omizê. Gazeke .

٥٦١. Bila dil bi dil be, bila tûrê parsê li mil be.
٥٦٢. Bila dil li dil be, doşek kevir be, balgî jî buşkul be
û or<an jî bi heft ciyan qul be.
٥٦٣. Bila dilê te geş bê, bila nan ji ceyê reş bê
٥٦٤. Bila dilê te neşiqite hemû çavbelean.
٥٦٥. Bila dîn-îman li cî be, zewaciya Evdalê min bi
derengî be .
٥٦٦. Bila dol law be, bila kirasê min caw be.
٥٦٧. Bila ez di kulavê xwe de bim, ne di birca xelkê de
bim.
٥٦٨. Bila ez fiqarê gundê mezin bim, ne axê gundê
çûçik bim .
٥٦٩. Bila girar pir be, bila kevçî qul be.
٥٧٠. Bila girtiyê hebsê be, ne miriyê gorê be.
٥٧١. Bila gûzek bê , bila ne fiç* bê.
٥٧٢. Bila hebin, bila herin.
٥٧٣. Bila hemû tiştên te teze bin, dostên te yê kevn
bin.
٥٧٤. Bila hespî çêbe bila bê nal be.
٥٧٥. Bila hindik bê, bila rindik bê.
٥٧٦. Bila keç herin ser sêwiya, bila nerin ser hewiya.
٥٧٧. Bila kûçik neçe ber çûçik.
٥٧٨. Bila kur be, bila navê qîza lê be.
٥٧٩. Bila mal qedê cên bibe.
٥٨٠. Bila mêr mêr be, bila jin kera çolê be .
٥٨١. Bila mera bi ser dara keve, û mera bi ser zara
nekeve.
٥٨٢. Bila mera dikê salekê be, ne mirîşka deh salan be.
٥٨٣. Bila mera gurê çiya bê, ne biçûkê bira bê.

*K fiç : pûç . bê navik . fiş .

٥٨٤. Bila mera li ser dara be, û ne li ser zara be .
 ٥٨٥. Bila merayî sêfil be, bila merayî ne erzan be.
 ٥٨٦. Bila mirinê ga ji cê bê.
 ٥٨٧. Bila mirov kuştîyê şêran be, ne girtiyê roviyan be.
 ٥٨٨. Bila mirov zirav û dirêj be, ne kin û stûr be.
 ٥٨٩. Bila nan bi te bi şekirbê paşê buxe.
 ٥٩٠. Bila nav hebê, bila nan tinebê.
 ٥٩١. Bila navka mirov derê, navê mirov derneyê.
 ٥٩٢. Bila pariyê te nîvci be, bila namûsa te li cih be.
 ٥٩٣. Bila qîz be, bila pîr be.
 ٥٩٤. Bila qîzê bibin ber xencerê, lê nebin ser xeberê.
 ٥٩٥. Bila rû bêşe bila zik ne êşe.
 ٥٩٦. Bila rû sipî bê, bila nan ji ceyê reş bê.
 ٥٩٧. Bila rû yê mirov bêşê, zikê mirov nêşê.
 ٥٩٨. Bila rû yê te xweş bê, bila nanê te reş bê.
 ٥٩٩. Bila rûmet li ci bê, bila pari nîv ci bê.
 ٦٠٠. Bila rûmet li cih bê, bila zik birçî bê.
 ٦٠١. Bila şarê (şehrê) pirrepirr be, bila zikî qurrequrr be.
 ٦٠٢. Bila sax be, bila dûr be.
 ٦٠٣. Bila sax bê, li bîra bê, bila li paş heft çiya bê.
 ٦٠٤. Bila seg bê, bila ne bê xudî bê.
 ٦٠٥. Bila şêrê rojekê bê, ne roviyê salekê bê.
 ٦٠٦. Bila serî hebin kum gelek in.
 ٦٠٧. Bila tu zanibî ku dew birê mêst e.
 ٦٠٨. Bila Xoristan be, bila ne goristan be.
 ٦٠٩. Bila Xwedê yar be bila şûr dar be.
 ٦١٠. Bila Xwedê yar be, bila dînya hemî neyar be.
 ٦١١. Bila xwîndarbim ne dêndarbim.
 ٦١٢. Bila zik têr be, bila ji dêr be.

٦١٣. Bila zikê melê bel be, bila giya û pel be.
 ٦١٤. Bilbil bi dengê xwe, mêrxas bi cengê xwe.
 ٦١٥. Bilbil hevalê gulê ye.
 ٦١٦. Bilbil xistine qefesa * zêrîn, gotiye: Ax welatê min.
 ٦١٧. Bilind firî, li rêxa buharê şimitî.
 ٦١٨. Bilind firya nizim ket, nizim firya bilind ket.
 ٦١٩. Bilind nenêre nizim nekeve.
 ٦٢٠. Bilûra li ber ga ye, çira li ber kora ye.
 ٦٢١. Bimîn bibîn li dunya* yê, bixwe vexe tim ew e.
 ٦٢٢. Bimîn bibîn li heyatê*, tim xeyal e* tim xew e.
 ٦٢٣. Bimîn li ser nan û mast, bêje gotina rast.
 ٦٢٤. Bimîn û bibîn.
 ٦٢٥. Bin kerkê* xû nedayî: (*carina, kesek di karekî de biwestê, yan xêli bibê û bixeyidê, tu dibînê rûyê wî xûdan dide, û carina jî kesek di karekî de diwestê û yan dixeyide, lê xûdan nadê, carina karekî mezin û pîr bê, tu çiqas jê bibê û bikê lê xuya nabê, yan jî tu *şîretina li kesekî bikê û hunkariyê tê nekê, ango pê bandor nebû, tu dibê bin kerkê xû neda*).
 ٦٢٦. Bîna diya, tê ji xaltiya.
 ٦٢٧. Bîna kiz tê ji mala diz.
 ٦٢٨. Binalê nenalê tê koxê bimalê.
 ٦٢٩. Bînê dermên* ji te neyê, kes ji te natirsê.
 ٦٣٠. Bîne ji mezina û bide mal mezina.

*E qefes : reke .

*E dunya : cîhan . gerdon .

*E heyat : jîn . jîyan . zendeganî .

*E xeyal : wazanîn .

*K kerk : guhê derve . .

*K dermên (derman) : tiving

٦٣١. **Binguh* (*bingoh*) li yekî werê, tenî mêrasê* tê bidin.**

٦٣٢. Bipirs ji kalê zemana û ji xortê geryayî.

٦٣٣. Bipirse, metirse.

٦٣٤. **Bîr bi derzîkî nahête kolan .**

٦٣٥. Bîr bi derziyê nayên kolan.

٦٣٦. Bîra avê jê vexwê kevra navêjê.

٦٣٧. Bira bêjin ker e, nebêjin kerr e.

٦٣٨. Bira bira ye bazar li dera ha ye

٦٣٩. Bira bira ye bazar xiya ye.

٦٤٠. Bira bira ye belê bazar cuda ye.

٦٤١. Bira biratî ye, bazar beyantî ye.

٦٤٢. Bira dilê meriv xweş be, bira balgiyê bin serê meriv jî kevir be.

٦٤٣. Bira girar bol* be, bila kevçî qol be.

٦٤٤. Biratî, bi rastî.

٦٤٥. Birawo berdero, derdê kezebê da sero.

٦٤٦. Birçî ji harbûyîyan xirabtir e.

٦٤٧. Birçîbûn sofitiyê* nahêle.

٦٤٨. **Birçiya nan xeyal e.**

٦٤٩. Birê ji birê hez kira, jinê birê ne dibir.

٦٥٠. Bîrê me avdar e, xortî me sazdar e, dengbêjî me navdar e.

٦٥١. **Birîn birîna teze dikê: (*carina, dijmantiyek kevin di nav kesina de hebê û hatibe ji bîr kirin, dijberik din heger di nav wan de çêbibê, wê dijmantiya kevin bi bîr tînê*)**

٦٥٢. Birîn bixure, ber çêbûnê dere

٦٥٣. Birîn saxdibe, şûnê xuyadibe.

*K binguh : bingo . werimê bin guh . nexaşiyek e.

*E mêras : şûnêmayî.

*K bol : pîr.

*E sofitî : derwêşî . evdalî .

٦٥٤. Birîna hevala qula kendala.*
 ٦٥٥. **Birîna li hevala mîna qola li kendala.**
 ٦٥٦. Birîna li hogira, bîna (mîna) derba li kevira .
 ٦٥٧. Birîna vekirî mirov xweyê naxê yê.
 ٦٥٨. Birîna xebera ji birîna şûr kûrtir e.
 ٦٥٩. Birîna ziman ji birîna xiştikê* kûrtir e.
 ٦٦٠. Birinca îro ji goştê siba çêtir e.
 ٦٦١. Birîndar bi birîna xwe zanê.
 ٦٦٢. Birîndar bi êşa birîna xwe dizanê.
 ٦٦٣. Birîndar radizê, birçî ranazê.
 ٦٦٤. Birînê şora kûrtire ji birînê şûra.
 ٦٦٥. Biroş digerê qapaxê dibînê.
 ٦٦٦. Biroşê got, binî min zêr e, heskê got: Ezî ji bin te têm.
 ٦٦٧. Biroşê ko parê min tê da nebê zêhêr têda bê.
 ٦٦٨. Biryara xirap ji dudiliyê çêtir e.
 ٦٦٩. Bişkovid qul bi etara re namînin: (*mebest ew e, qîz di malê bava de namînin, yan jin bê mêr namînin*).
 ٦٧٠. Bîstan* tine ye bi şeqlûr* û bilûre.
 ٦٧١. Bitirse ji germa germ û mirovê nerm.
 ٦٧٢. Bitirse ji segê har, û ji jina bi yar.
 ٦٧٣. Bitirse ji xwedênetirsan.
 ٦٧٤. Bitrî* ji gayê cot re namîne.
 ٦٧٥. Bizin bi bizintiya xwe berî bimixelê ciyî xwe vedidê.
 ٦٧٦. Bizin bimire jî dûvê xwe berjêr nake.

*K xiştik : debûs . lolak sertûje pê zê (tene) ji çiwala derdixin

*E bîstan : werz .

*K şeqlûr : xemil .

*K . E bitrî : harî . harbûn . şageşke yî .

٦٧٧. Bizin bimirê, girr vedimirê.
 ٦٧٨. Bizin çû, şujiyê da dû.
 ٦٧٩. Bizin dide ser şivêlê* û rêçê û karka xwe jî li pê diçê.
 ٦٨٠. Bizin difkirê bi halê xwe, şivan dikeve xema beza xwe.
 ٦٨١. Bizin jî ya me ye, kizin jî yê me ne.
 ٦٨٢. Bizin mir gurr (girr)vemirî .
 ٦٨٣. Bizin û mî bûn heval, rojekê rastî çemekî hatin, miyê xwe di ser çem re avêt bizin kenî, miyê gotê: Heval tu bi çi dikenî biznê got ê: Min qula te dît, rabû mî jî kenî.
 ٦٨٤. Bizina belek, şivanê kulek, êvarê bi hev re dibin yek.
 ٦٨٥. Bizina gurrî navê keriyekî pîs dikê
 ٦٨٦. Bizina ku tu çîçka nemêjînî , şîr bernadin .
 ٦٨٧. Bizinê ji pêz veqete para gur e.
 ٦٨٨. Bizinê ling hilanî, karê ling li şûnê danî .
 ٦٨٩. Bizna hemis, lê mepirs .
 ٦٩٠. Bizna kol hobû daniya.
 ٦٩١. Bizna şîrdayî û lingê xwe li biroşê dayî.
 ٦٩٢. Biznê gurrî li serî kaniyê avê vedixe.
 ٦٩٣. Biznê hişk didoşê, pez tine ye rûn difroşê.
 ٦٩٤. Biznê malxwer, dêv davê her tiştêkî.
 ٦٩٥. Biznek gurrî navî kerîkî xiradikê.
 ٦٩٦. Bo baqila gotinek jî bese.
 ٦٩٧. Bodela (bûdela)got, baqila înan kir.
 ٦٩٨. Bostek miqrisbûn, gazek rezîlbûn.
 ٦٩٩. Bostek nezani, gazek xizani.

*K şivêle : rêkên teng . rêçik.

- V••. Boxanî* ji gayî cot ra namînê.
- V•). Bû aşê xalê û xêzî: (*Mirovekî aşekî xwe çê kir, xwarziyê mêrik arvanê xwe barkir, go: Ezê herim aşê xalê xwe, wê ji min re arvanê min belaş bihêrê; nêzîkî li êş kir, xalê ew dî, go: Baş e, wa ye xwarziyê min tê êş, wê çend quruşa zêde bi min dê, ji ber ko zane min aş çê kiriye, ez dest teng im*).
- V•٦. Bû ava berfê, kes nizanê bi ku da çû.
- V•٧. Bû doşeka Meydana.
- V•٨. Bû erebê tirkirî, çû û li paş xwe nenêrî: (*Dibêjin li ba ereba tîrr ji her tiştî şermtir in. Rojekê yekî navê wî Hemed tîrrek kir, rûya negirt ko li nav êlê bimînê, mala xwe barkir û çû, piştî çend salan gote jina xwe: ka ez bi dû tîrra xwe kevim, ka hele ji bîr bûye an na! Hemed çû gihîşt ser bîra êlê, zarokek li wir bû, gotê: Tu kurê kê yî? Xwe jê re got. Hemed gotê: Tu kengê çê bûyî? Lêwik bi lez gotê: Sala Hemedê tîrr kirî, hema Hemed vegeerî û li paş xwe nenêrî û ji jina xwe re got: Tîrra min bûye tarîxek ji êla me re*).
- V•٩. Bû kûçkê hêkêd pîrê di pînkê da xwarine newêrê werê mal.
- V•٦. Bû kulavê devê hirçê: (*Berê, hineka hirç xwedî dikirin û hîn dikirin reqş û semayê ji bo di bûneyan de wek sêrkek biçûk pêşkêşî millet bikin; îcar, ta ew hirç meşq dikirin, helbet lê dixistin û hirç xêlî dibû û dev davêt meşqvanê xwe, ji ber wilo, meşqvan neçar dibû ko kulavêkî li destê xwe bigerînê, her hirç dev davêtê wî jî destê xwe yê kulav kirî dida ber devê hirçê*).
- V•V. Bû kurmê gûza hindê, çilo ketê, wilo jî derket: (*Dibêjin: kurmekî ziravçik qulek biçûk di gûza*

*K boxanî : exte nekirî . nexesandî .

hindê da dî û tê ra ketê, tê da xwar û vexwar ta hundirê gûzê kuta kir, tenê ew qaliqê hişk ma; vê carê, dixwazê derkevê, î ne qelew bûye, di wê qulê ra derbaz nabê, li neçarî di wir da ma ta wek berê jar bû û fûsk di qulê re derke) .

- V•A. Bû Seîdê Seîda, ma li orta herdu îda* (*Dibêjin: Seîdê Seîda di roja îdê de gotî: Ez ê herim wî gundî ha gêrmigoştê bixum û ez ê vegerim li gundî me jî bixum, îcar berê li gor reweşt û titalên Kurdan, û her weko em zanin gundiya teva nikanîn qurban bikirana û ya din di nav gunda de hertim qehr û dubendî hebû; lewre, heçî yên qurban kirine serê sibê kezeba gewr didan kûçikê xwe û kezeba sor di sêlê de çêdikirin û bandikirin cîranên xwe yên qurban nekirine û bi kêf û henek bi hev re dixwarin û nîvro herkes radihêst hinek girar û sîngê wê qurbanê di sîniyeke paqij de û peyayên wê malê û tev li malmezina wî gundî dicivin û ban dikirin xizanên gundên bê qurban û teva bi hev re gêrmigoşt dixwarin. Piştî xwarinê radibin, û çî kesê bi hev re na axivin jî, hemiyan bi dilekî paqij û zelal îd li hev pîroz dikirin, û ew xwarina mayî jî malên xizan re dişandin; îcar, Seîdê Seîda berî xwarina gundê xwe jî gund derket, ta gihîşt wî gundî, camêra xwarina xwe xwarî bûn, bi lez vegerî gundê xwe, ta gihîşt gundê xwe mixabin wan camêran jî xwarina xwe xwarî bûn. îca Seîdê Seîda ma li orta herdu îda) .*
- V•9. Bû sergînê devê rovî: (*Te dî carina yekî jar bê, dibêjinê : rovî kêçekî; xuya ye rûvî kêç dikevinê, weko dibêjin rovî, yek jî aqildarê ajala ye, rovî jî bo xwe jî*

*E îd : cejn.

*kêçan riha bikê, dere ber goleke avê û sergînekî dixê devê xwe û xwe hêdî hêdî dide nav avê, hergî kêç bi jor de derin, rovî bi kûranyê de derê; dê, dê, kêç tev di wî sergîni de kom dibin, hîngê rovî xwe dixê bin avê û sêrgîn berdide; bi vê dekê rovî xwe ji kêça riha * dikê).*

- V\٠. Bû sipiya di ber piziya de.
 V\١. Bû tirra di golê da.
 V\٢. Bû xezala* mar aniye, çû û li paş xwe nenêrî:(*Dibêjin: Xezal gavê dizê carina li şûn xefşikê (karikê) mar jê dikeve; îcar, gavê za li paş xwe dinêre ger xefşik be lê dibanê, na ger mar be, bi ser hev de derê û li paş xwe nanêre*).
 V\٣. Bû ye masiyê ku av li ser hişkbû ye.
 V\٤. Buhar tere li paş kerê mere.
 V\٥. Bûk bê tac dibê, bê benîşt nabê.
 V\٦. Bûk bi dilê zavê ye, çi karê gundî û cîranan pê ye.
 V\٧. Bûk bi dilê zêve ye, çi kula dilê xelkê ye.
 V\٨. Bûk çê bê, xesû yê dêbê.
 V\٩. Bûk di kincî sor de, qiçik di ber şîr de.
 V\١٠. Bûk di sorik de, zaro di lorik* de.
 V\١١. Bûk di sorik* da, zarok di zerik* da.
 V\١٢. Bûk hat dewat hilhat.
 V\١٣. Bûk jî ji me ye, tûtik* jî ji me ye.

*K riha : aza . azad .

*E xezal : asik . mambiz.

*K lorik: dergûş .

*K sorik : kincên bûkanî . mebest : bi bûkanî perwerdeke .

*K zerik : gû yê zarotiyê . mebest : biçûkanî perwerdeke .

*K tûtik : zurne .

٧٢٤. Bûk li ser hêspe, hefsar di deste, kes nizane ji bo
kê qismete.
٧٢٥. Bûk stewre, qîz avise.
٧٢٦. Bûk tasa* zêrînî bîne, wê bi xwe tê de nan bixwe.
٧٢٧. Bûka bê şerm û heya*, siwara dike peya.
٧٢٨. Bûka bi def mîna rûnê bi kef û bûka revandî
mîna rûnê helandî .
٧٢٩. Bûka li ser hespê kes nizane nesîbê* kê.
٧٣٠. Bûka malê rewşa malê ye.
٧٣١. Bûka nuh hat hêka hesinî kir.
٧٣٢. Bûka rind di sorkê de bêliy e .
٧٣٣. Bûka salê delala malê.
٧٣٤. Bûka salê qeşmera malê .
٧٣٥. Bûka ser hespê ye, kes nizanê qismeta* kê ye.
٧٣٦. Bûka xalê delaliya malê.
٧٣٧. Bûka yekê bi apê re dibê: Ez bûka zer im, tu hefta
wînê ez a ser im.
٧٣٨. Bûkê di reşiyê ke pîrê di xweşiyê ke.
٧٣٩. Bûkê rind desmalê ser desta ye.
٧٤٠. Bûkê tir kir, bûk xeyidî.
٧٤١. Bûkê tune zar ziman, xesuyê tune dîn* îman*.
٧٤٢. Bûkê ziman tine, xasiyê îman* tine.
٧٤٣. Bulxur kişî bi legana, tişteke neket nav dirana.
٧٤٤. Bûn wek nohoka li tehtê ketî.

*K tas : zerka avê. Li vir ji bo xwarinê hatiye .

*E heya : fedî .

*E nesîb : şans . par . pişk . êqbal .

*E qismet : şans . par . beş . bext . pişk .

*E dîn : ol olperestî.

*E îman : bawerî . xwedênasî.

*E îman : bawerî . xwedênasî .

- VΣ٥. Bûne gurê mûsa, xwe bi xwe bi canî hev ketine.
 VΣ٦. Buxwe weke mêran, rabe weke şêran.
 VΣ٧. Buxwe, pê bidebir*, ne buxwe pê bimir.
 VΣ٨. Bûye benkê dû hebanê*.
 VΣ٩. Bûye berûya ko bi şikeniya* xwe qayîl nabê:
(Berû û palût yek in, her weko em zanin palût dikeve du cûre dar, yek dara sidîganê û yek dara mazyê, darê mazyê palût û mazi û gulêr dikevinê, gavê palût sor dibe têkoz dibe ji malkê yan şikeniyê xwe derdikeve û dikeve erdê, şikenî bi darê ve dimîne û devî xwe berjêr e û vala ye, berû ji jêr ve li dêv dinêre û dibêje; hele, binêrê, ço dev qîç kirî) .
 V٥٠. Bûye çawîra kevir li ser hilhatî
 V٥١. Bûye dînê dindoq diye.
 V٥٢. Bûye gawirê pîsî bi xasiya xwe kirî.
 V٥٣. Bûye gayê gênco: (*Dibêjin: Gakî gênco hebûye, qey xwastî bifroşê. Gavê kesek bixwazê dewarekê bikire, gerek e, zani be çend salî ye û temenê dewêr di dirana re tê zanîn, ji ber wê yekê, divê ticar devî gê veke, û li diranan binêrê, qey ticar pir hati bûnê ku bikin, zar nebûye qismet, îcar qasî ticara dev sekiri bû, kî bervê diçû ji ber xwe ve devî xwe ji hev vedikir.*)
 V٥٤. Bûye îmana*cufûta*: (*xuya ye kesina bi xelkê da bû zanîn ko îmanê cifûta kevn bûye û ji hevçû ye, ji ber wilo tiştekî kevn bû be, dirrî bê, pizirî bê, ji hev çû bê, digotin: Bûye wek îmanê cifûta) .*

*E debir : çareser . çaresaz .

*K heban : tûrekî çêrmiye şêx têde êrd dicivînin .

*K şikenî : qalîqî palûtê . qalikê berû yê. Malkê palûtê ko bi darê ve dimîne .

*E îman : bawerî . xwedênasî .

*K cifût : cihû . yahodî .

٧٥٥. Bûye kerê di aşê qabê de carekê ceh xwariye,
heroj derê û tê.

٧٥٦. Bûye kerê Qurnê, ne dizirî û kuri* lê dihatin:
(Dibêjin: Kerekî Qurnê qir(sipî) hebû; Qurnê gundekî Efrînê ye; wek tev dizanin biharê dewar tev tê gan, û hîn ker bêtir tîrre dibin, kerên gund dizirîn û dida dû hev li wan çol-molan; kerê qir çêriya xwe sedikir, dibû şev, her kerek diçû mala xwe û dihatin girêdan, her weko kerê qir bêdeng bû, girênedidan; şev kal dibû, nobe dihat dora kerê qir, hema diçû di ber bên de kerrkî karê xwe bi çend ciyan didî û vedigerî mala xwe, bihara din dihat ker dizan gi kurri giş qir in).

٧٥٧. Bûye kerî bi lingî paşin girêdayî: *(Her weko em dizanin, qurbet (qereçî) malêd wan kon in, û ji gundekî bar dikin gundekî din, lewma gerek e her qurbetekî li gor mala wî kerêd wî hebin, zivistana neçar in ku kerêd xwe jî di bin kon de li ba xwe girêdin ji bo hevdu germ bikin, ker jî di kudabê ker e, dibê ku bi şev fişqula vekê yan bimîzê, ji bo wilo singek dikutan alîkî kon û lingî kerê î paşî pê ve kin qasî ko nikani bê bilivê, girê didan, paşî kerê bi alî der ve da dibû, û serî kerê bi alî razanê de dibû bi vî awî fişqulê kerê bi wî alî de diçûn û bêhna kerê û germ bi ser wan de diçû)*.

٧٥٨. Bûye kerî li singî xwe geriyî: **(gavê kera yan dewara or dikin, benekî dirêj bi ser hefsêr de girêdidin û serî bên î din dibin bi singikî ve girê didin ji bo hew dewara wê orkê, (ango dirêjî bên.) di dor wî singî biçêre, îcar ev kera hêdî hêdî di dor sing re dizîvire û diçêre, carekê dibînê ko devê xwe gihîşt ber sing û nema kanê bilivê, loma gavê mirovek xwe virde wêde çedike û kara di ber hev re derbaz**

*E kurri : dehşik . kurrê kera .-

dike, carekê, sedikê ketî helwestekê, nema kanê xwe jê xelas kê, hîngê dibên :bû kerê li singê xwe geriye) .

٧٥٩. Bûye kirîfê pêl koz naye.
 ٧٦٠. Bûye korê kêç bi des ketî.
 ٧٦١. Bûye kûçkî bi ewra da direwê.
 ٧٦٢. Bûye kuriyê bûtê, şeş mehîbû çiwalek genim radikir, yeksalî bû nikarî nîv çival rakira.
 ٧٦٣. Bûye kurriya mala Hisê Abo, tim li aşê qabê mistek ceh xwarî.
 ٧٦٤. Bûye marê bin teştê.
 ٧٦٥. Bûye marî axû* li serî ketî.
 ٧٦٦. Bûye mirîşk, û xwe vedîpişkîne.
 ٧٦٧. Bûye miya gur xwe di sera çekirî.
 ٧٦٨. Bûye pisiya bi mişk dilîzê.
 ٧٦٩. Bûye qirdê* Sêwiya: (**Sêwiya gundekî Efrînê ye, dibêjin :yekî ji wî gundî qirdek xudî kir, û bi xwe ra dibir dûkanê, û ew hokir çilo pandiya dûkanê bikê; mêrik nîvro diçû mizgeftê û qird li dûkanê* dima; rojekê, yek çû ba qird, bi îşmara silav dayê, qird jî wekir, destê xwe da ser dilê xwe, qird jî wekir, çavên xwe damirindin, qird jî çavên xwe damirandin, mêrik rahişt çend top çox birin û çû; qird dereng çavên xwe vekirin dît ku mêrik çox biriye, xwediyê dûkanê ji nimêjê vegerî, wî jî dît ku çox çûye, ji qird pîrskir, qird bi îşmara jê re got; xwedî çend dar lêdan û ew şîret kir; qird serê xwe hezand; piştî demekê, mêrik dîsa hat ku çox bidizê, mêrik çilo kir, qird jî we kir, mêrik çavên xwe damirindin, qird çavên xwe beq kirin) .**

*K axû : zêhêr . jehir .

*E qird : meymûn . kûnsork .

*E dûkan : firoşgeh .

- W٠. Bûye qirdî* li paş xudanî xwe nîştî: (***Berê, Ereban qird di paş xwe de li hespan didan û danîn nav gunda direqisandin; xelkê tişt dida wan, wek ard, bilxur, pere; gavê vedigerîn dîsa qird li paş xwe sîwar dikirin, qird bi rê ve destî xwe davêt têrrê êrd û bilxur û bi dizîka çê dikir, ta Ereb digîşt mal nivê êrd û bilxur hatî çekirin***).
- W١. Bûye roviyê min ji mirîşkên xwe re tîmar kirî.
- W٢. Bûye yê ku ker li bavê xwe pix kirî.
- W٣. Bûyi pisiya ku li ber mişk dahatî.

* E qird : meymûn . kûnsork

C

٧٧٤. Camêr bi destê bêbexta dimirin.
 ٧٧٥. Camêra gak û nanek li ba yeke.
 ٧٧٦. Camêra nanek û hespek li ba yek e.
 ٧٧٧. Camêra tu di ber re wîne, î xerab tu jê bixwaze.
 ٧٧٨. Can dere, teb'et nare .
 ٧٧٩. Can îmdatê* dixwaze.
 ٧٨٠. Can şêrîn e.
 ٧٨١. Cara car bê dewê te li dar bê.
 ٧٨٢. Carê werin ber cara kerê werin ber bara : (ev li vir wek gefekê ye, xuya ye mêrik tiştêk yan karek ji kesekî *xwastiye û wî jî pêknaniye, û mirov jî motacî hev dibin, qey mêrik xêli bûye, û bi vê wateyê gotiye :ker ku de herê, wê were ber bêr, helbet tu jî carekê motacî min bibê, û carê te jî wê werê ber vê carê*)
 .
 ٧٨٣. Carê werne ber caran, kerî reş ê bi xwe bizire û were ber baran.
 ٧٨٤. Carekê li nalê dixê carekê li sim* dixê.
 ٧٨٥. Carekê li nêl dixê, û carekê li mêx dixê.
 ٧٨٦. Carekê tiştêk li gurdî* ket, zû dûzan nabê.
 ٧٨٧. Carekê xatir, carê din xatir, carê sisi yê çatir-patir.
 ٧٨٨. Carikê pêtkî dik di testê da dît.
 ٧٨٩. Carina jehr jî dibe derman.

*E îmdat : alikarî . hawarî . yarmetî . yardimî .

*K sim : hestî lingid dewara .

*K gurdî : dûzani . sazi .

٧٩٠. Carina kevrî mera pê qayil nabe serî mera dişkîne.
٧٩١. Carina mera ji yarê diya xwe re dibê: Apo.
٧٩٢. Carina mirov ji yarê diya xwe re dibê: yabo.
٧٩٣. Carina rev ji desthîlanînê çêtir e.
٧٩٤. Carina rev jî mêrani ye.
٧٩٥. Carina şîretên herî baş ji mirovên herî xirap derdikevin.
٧٩٦. Carna mirin dibe zêrê zer, lê bi dest mera nakeve.
٧٩٧. Caw cawê te ye, meqes* meqesa te ye.
٧٩٨. Cawê bi kutan bê dewê bi derman bê.
٧٩٩. Cawê bi kutan bê, şaşiyê li serî mêra bê destê bi destî jîna bê.
- ٨٠٠.
٨٠١. Cefayê te bû cefayê şoşpên: (*Şoşpan an kirîv herdu yek in, Kurd bi çûkayî zarokên xwe sinet dikan, îcar li gor ola Kurda, ew zarokê ku wê sinet kin, dixistin dawa dostekî û sinet dikirin: Li vir, ez dibêm zar wî zarokê ji tirs, yan ji êşê re xwe pîs dikir û xwîn dibû û dirîji ser dawa mêrkê zarok di dawê de, ew mêrik dibû şoşpan yan kirîfê wê malê, û ji ber wê xwînê, Kurd dibêjin kirîvê xwînê.û ez guman dikim ji bo xwe pîskirina zarok jî dibêjin cefayê te bû cefayê şoşpên*).
٨٠٢. Cefayê te bû xû ya eniyê: (*ez guman dikim mebest ev e, carina kesek xwe di ber hina de yan di karekî de pir diwestîne, lê mixabin bêhode û vala derê, herweko tu carina diweste û rûyê te xûdan dide, hema tu tiliya xwe dide ser eniya xwe û xûyê ji eniya xwe rêş dike û xû vala derê, loma dibên cefayê te bû xûya eniyê*).

*E meqes : cawbîrr . duwêrde . hac .

٨٠٢. Cêh dide yekî gênim jê distîne.
 ٨٠٣. Ceh kera şamî dike, xizanî mêra ketî dike.
 ٨٠٤. Ceh rşandiye, genim naçine.
 ٨٠٦. Cehşik mezin be jî dîsa kere.
 ٨٠٧. Cejin tê xêr û bêr vêra.
 ٨٠٨. Cejna salê bi salê re dere.
 ٨٠٩. Cerê avê li riya avê dişkê.
 ٨١٠. Cerrî nuh, avê hênik dike.
 ٨١١. Cersandin ? lê fetsandin ?
 ٨١٢. Cewdikî xwe di nav kuna de dîdine.
 ٨١٣. Cewrên seyê dir timî dir in.
 ٨١٤. Cifût* deyndar• bûn, defterêd kevn vedikin.
 ٨١٥. Cih bi mirova teng nabe.
 ٨١٦. Cih heye ko xebernedan ji xeberdanê çêtir e.
 ٨١٧. Cih heye rev ji mêranîyê çêtir e.
 ٨١٨. Cih ji dilan teng e.
 ٨١٩. Cihê baze, kund lê digaze.
 ٨٢٠. Cihê bilind, ji mirovê nizim çêtir e.
 ٨٢١. Cihê pakî hebe, xerabî çiyê.
 ٨٢٢. Cihê şêra rovî lê dîkin gêra.
 ٨٢٣. Cila bi malê gerek be, li mizgeftê herame .
 ٨٢٤. Cila ko ji mala te re gereke, bi ber camiyê veneke.
 ٨٢٥. Cilhecî, li hember terzî bihecî.
 ٨٢٦. Cin* bûkên xwe li kûçkêd reş sîwar dîkin.
 ٨٢٧. Cîran bajarê cîrên e: *(li gunda, sûk tine ye û helbet kêmanîyên malan jî gelek in; te dî, carina, mêvan tên , carina nexwaşin dertên û her tim jî cîran ji bo cîranê*

*K cîfût : cihû . yehodî .

*K dëndar : wamdar . qerdar ê ko pere lê

*E cin : meçêtir . id gonê . id neçê .

amede ye; carina, mera neçar dibe ko xwe li cîrananê xwe bigrê, loma dibên cîran bajarê cîrên e).

٨٢٨. Cîran bi her tiştî motacî hev dibin.
 ٨٢٩. Cîran mêrasxwarê* cîranê* xwe ye.
 ٨٣٠. Cîran warisê* cîranê xwe ye.
 ٨٣١. Cîranê baş ji birayê nebaş çêtir e.
 ٨٣٢. Cîranê mera bi xêrekê be, mera bi heft xêra ye .
 ٨٣٣. Cîranê nêzîk ji birayê dûr çêtir e.
 ٨٣٤. Cîranê xerab bihêle, diranê êşyayî bikşîne.
 ٨٣٥. Cîranî muxenet mera bi hacet dike.
 ٨٣٦. Cîranî pîs mera xwedan tişt dike.
 ٨٣٧. Cîrantiya salekê, çêrêbûna bi salan.
 ٨٣٨. Civata çûka li ser garisî meye.
 ٨٣٩. Civiq civiq circiviq: *(civiq xirapî ye, carina şerin yan tiştin din li gunda dibûn û xirapî jî derdiket, îcar hina digot , civiq civiq circiviq, ango pîsbûye bûye mila rind pîs bibê)*.
 ٨٤٠. Ciyê destê te herê yê, lingê xwe jî têxê yê.
 ٨٤١. Ciyê gorna miriyê te lê nebin ne warê te ye.
 ٨٤٢. Ciyê jina xira nekiribê hîn ava ye.
 ٨٤٣. Ciyê ku agir lê tinebe, dû lê hilnakşe.
 ٨٤٤. Ciyê ku rovî te lê girêdin û mişk te berdin ji xwe re meke war.
 ٨٤٥. Ciyê lingê xwe bike, paşê gava xwe çeke.
 ٨٤٦. Ciyê şera ortê gund e.
 ٨٤٧. Ciyê tu nih deriyê ez jê tîm.
 ٨٤٨. Ciyê xiya werê qelawîza* naxwazê.

*E mêrasxwar : paşmanxwar . paşmakxwar . paşmendexwar.

*E cîran : cînar . hevsî . hemsî .

*E werîs : paşmangir . paşmakgir . Paşmandegir.

*K qelawîz : rêber .

٨٤٩. Coka bîstana, nabe ji bo aşvana.
 ٨٥٠. Coko lawo rabe bileqîtîne*havînê bibhorê kar namîne.
 ٨٥١. Cot ne karê mirtibane.
 ٨٥٢. Cota bira neçin gura.
 ٨٥٣. Cotê baş ji xeta pêşîn ve kifş e*.
 ٨٥٤. Cotkaro tu çî di çînî ger şîn bê tê bibînî.
 ٨٥٥. Culha caw lê hesret e.

Ç

٨٥٦. Ça têne pa lê jin nêne pan.
 ٨٥٧. Çaketî reş li xwe meke tê bi file bî, çaketî sipî li xwe meke tê bi mile bî, ebê sor li xweke tê bi ezayê* gundê me bî.
 ٨٥٨. Çalima li xelkê nemîne.
 ٨٥٩. Çar hesp bi singekî nayên girêdan.
 ٨٦٠. Çar tişt hene serhişk mirîşk û mişk mar û dûpişk.
 ٨٦١. Çare çele, sî-û-neh bi êqilin, yek bi çov e.
 ٨٦٢. Çare li her tiştî dibê, li dil û mirinê nabê.
 ٨٦٣. Çav bi çava dikevin belê çiya bi çiya na kevin.
 ٨٦٤. Çav bi xêret in,* lê dest û ling mixenet* in.
 ٨٦٥. Çav dibîne dil dihebîne*.
 ٨٦٦. Çav dibîne, dil dihebîne.

*K . E bileqîtîne : aşêvke .

*E kifşe : xiyaye .

*E eza : endam berdekê keye.

*E xîret : dilxwaz . hosbûn . dixweradîtin .

*K mixenet : dilnexwaz . hosnebûn . dixweranedîtin

*E dihebînê : hezdikê .

٨٦٧. Çav dujminî xwe nasdikê.
 ٨٦٨. Çav ji çava şerm dike, bertîl kevira nerm dike.
 ٨٦٩. Çav ji çavan fedîdikin.
 ٨٧٠. Çav li deriya, xulî li seriya.
 ٨٧١. Çav li gêrmîyê kir xwe ji bîr kir.
 ٨٧٢. Çav li savarê kir silav ji bîr kir.
 ٨٧٣. Çav nebînin, rû fedî nake.
 ٨٧٤. Çav neynika çavan e.
 ٨٧٥. Çav xenîmê xwe nasdike.
 ٨٧٦. Çav zer hebin, simêl reş pirin .
 ٨٧٧. Çava pit-pit dukutê û dengî xwe nakê.
 ٨٧٨. Çavê derîgirtiya li ê derîvekiriya ye.
 ٨٧٩. Çavê kêrî neyê, tilya xwe li bin bide û derîne.
 ٨٨٠. Çavê kor tune, lê bextê kor hey e.
 ٨٨١. Çavê ku li deriyê xelkê be, timî birçî ye.
 ٨٨٢. Çavê kul, ji yê kor çêtir e.
 ٨٨٣. Çavê nalbendan li simê hespan e.
 ٨٨٤. Çavê şeliqî ji yê kor çêtire .
 ٨٨٥. Çavê tirsonek sîngê sipî nabîne.
 ٨٨٦. Çavê xwe veke bextê xwe seke.
 ٨٨٧. Çavê zaretê zerin .
 ٨٨٨. Çavêd li hêviya bira kor bibin.
 ٨٨٩. Çavêd li hêviya xulî li seriya
 ٨٩٠. Çavêd li rêyê te mila kor bibin.
 ٨٩١. Çavêd reş kildanê naxwazin.
 ٨٩٢. Çavek korbû, çavê din ne xeme.
 ٨٩٣. Çavek li mirinê çavek li kirinê be.
 ٨٩٤. Çavên birçî ti carî têr nabin.
 ٨٩٥. Çavên xwe damirandin devê xwe vekir.
 ٨٩٦. Çavên zer di nav ka yê de dît in.
 ٨٩٧. Çavid mela çarin gi ne heyşt bin.

٨٩٨. Çavsorî ji kesî re namîne.
٨٩٩. Çavzerê te hebin, çavreşê xelkê pir in.
٩٠٠. Çawîr rabû bi bosta, şagirta da ser hosta .
٩٠١. Çawîrê hewşê a tehle.
٩٠٢. Çaxa cwanbûm, bi tîr û kevanbûm, lê çaxa pîr bûm bi kul û hesretbûm.
٩٠٣. Çaxê qufirê* derbaz bû, di kokê kîrî xwe bide .
(şîrovekirinê vê pendê di pendê . nimre: (٤٨٩٦) de.
wextê bîrecik derbazbû de hatî ravekiri).
٩٠٤. Çê kir ji xwe re, xerab kir ji xwe re.
٩٠٥. Çêdibin birînid şûr û xencera, çênabin birînid dijon û xebera
٩٠٦. Çek ne ji bo hemiya, lê nefsa a giya.
٩٠٧. Çekê baş rewşa dinê ye.
٩٠٨. Çel banacaq* ketin bin bêjingê Gotin: Hîn cîyê yekî din jî heye.
٩٠٩. Çêl salî xwe ragir, dijminî te ê bi xwe bimirê.
٩١٠. Çêleka mirî pir bi şîr dibe. (**çêlek jî wek her tiştîye, piştî dimirê dipesinin.**)
٩١١. Çêlekek bi şîr ji deh mihên bê şîr çêtir e.
٩١٢. Çêlekek rêxok garanekê dilewitîne.
٩١٣. Çêlekek vijoker garanekê dilewitîne.
٩١٤. Çêlema bê zihêr nabin, mêrêd çê bê yar nabin.
٩١٥. Çêlkê qirkê mezin bûn, risqê qirkê qut bû.
٩١٦. Çêlkêd qirkê ne: (**Qirkê piştî çêlikêd xwe mezin kirin û bi firê xistin, rojekê gote wan: çêlikino, hûn mezin bûn ji nah û pê ve em her kesê bi oxira xwe de herin, lê ez divêm şîretekê li we bikim, çêlika got: fermo, yadê, qirakê . Go: Eger we di mirovek bi alî we de tê, yan wê di ber hewe**

*T banacaq : hevling

**re biborê, hema we dî ku qûrve hat wer zani bin, wê rahêjê
kevrekî û pê li we xê, hûn jî tavilê bifirin, çêlika go: Lê
kevir berê di başilê de bê) .**

٩١٧. Çêlkêd şêran jî şêr in.
 ٩١٨. Çêlkên mara bê axû nabin.
 ٩١٩. Çêlmar jî bê jehr nabin.
 ٩٢٠. Çem bê bihur nabin.
 ٩٢١. Çem ji kaniyan çêdibe.
 ٩٢٢. Çênabe şoşpan xas pêl cilid şoşpanî xwe ne: **(Bi
rastî, ev gotin pîr kûr e, li gor bîr û bawerî ola Kurda,
şoşpan (kirîve) ev kirîvaniya ha jî di rêya sinetkirina
zarok di dawa mirovekî de tê, ev kirîvanî li ba Kurdan
gelekî evra ye û gelekî bi nerx e, ji ber vê nerxê çê nabe ku
kirîv yan şoşpan keç û lawên xwe bidin hev û ji hev şû
bikin, loma bi vê duqatîyê şîret hatiye kirin ku ti carî keç
û xortê şoşpanan bêtirî çavê biratîyê li hev nenêrin).**
 ٩٢٣. Çend çiya hene yê Kurdan e.
 ٩٢٤. Çeqel û rovî nakevin yataqê* şêra.
 ٩٢٥. Çêre çiqas nerm bibe di bin kevirde nasekine.
 ٩٢٦. Çêroka me çû destê, qulik li sirtê piştê, rehme li
civatê giştê: **(li vir, ez neçar im ko li ser çêroka Kurdî
şîroveyek kurt bêjim: Di nav Kurd de du cûre çêrok hene:
yek bûyerin rast bûne ji vî cûreyî re dibên: stiran ya
kulam; lê, mixabin piştî lehengê vê bûyerê naghêjê
daxwaza xwe û dîmirê, yan jî tê kuştin, îcar, ev cûre bi
deng û awaz û hinek bi deng û çêrokî tê gotin, lê çûreyê
din ne bûyer e, bê bîngêh e, xuya ye millet ji des derd û
kulên xwe û jiyana xwe ya dujwar ev çêrok nijinandine û
kîrîne ko lehengê çêrokê bighêje daxwaza xwe ji bo xwe pê
kêf xwaş bikin, îcar, berê, zivistana li gunda li ber ara**

*T yataqa şêra : lan . xewgeha şêra . ciyê razanê .

rûdiniştin û çêrokvan ji wan re ev çêrok digotin; piştî çêrok kuta dibû , çêrokvan digot, çêroka me çû deştê qulek li sirtê piştê rehme li civatê giştê, yan jî digot li miriyê civatê, û guhdara jî bi gotina rehme li te û miriyê te lê vedigerandin, yan jî çêrokvan digot: çêroka me çû liqatê, reme li civatê; guhdara jî digotin: rehme li te jî, yan jî çêrokvan digot: hew giştin mirazê xwe, hûn jî pêgînin, guhdara digotinê tu jî pêgînê mirazê xwe, pir bi hev û bi gotinê delal kêfxaş dibûn, pişt re dore dihat xwediyê malê, wî jî li gor hebûn û kêfxaşiya xwe bi çêrokê şêranî datanî, carina sehnêd mûj û hejîra û sehnêd kunci û kewšana di ber hevra rêz dikirin û bi kêf dixwarin û diman bi çêrokê ve her kesî ciyê pê xaş hatibû di ber hev re dibirin û di ser hevra digotin û dubare dikiri).

٩٢٧. Çêrê kûçka bibe, û ço dîne ba xwe.
 ٩٢٨. Çeşmî* morî payî* mara nanî mela kes nedit.
 ٩٢٩. Çêyî kir bi xwe kir, xirapî kir bi xwe kir.
 ٩٣٠. Çi bê serî mera ji zimên e.
 ٩٣١. Çi bêjî jî li bejna siwarê min tê.
 ٩٣٢. Çi bi etêr ra bê, bi wî ban dikê.
 ٩٣٣. Çi bi reng e, kanê heft şîva di biroşekê da bikê, û yek bi yekê de venedê.
 ٩٣٤. Çi bi serî mera werê ji dev û zimanî mera ye.
 ٩٣٥. Çi biçîn, tê wî biçinî.
 ٩٣٦. Çi bikê dev û zimanê dirêj dikê.
 ٩٣٧. Çi di ûr de, çî di tûr de.
 ٩٣٨. Çi dîlana mîr tê de, çî girara şîr tê de.
 ٩٣٩. Çi hat aqilê te neke.

*K çeşm : çav .

*K pa : ling . nig .

٩٤٠. Çi hat meydanê, emê çekin hebanê*. (*mebest emê bixwin*).
٩٤١. Çi hebe, ji tune bûnê çetire.
٩٤٢. Çi keçel hesen çî hesen keçel.
٩٤٣. Çi rijî ye çî bijî ye: (*carina şerin ya nakokiyin ji bo tiştin vala çêdibin, xêrxazek dibê hûn ji bo çî vê nakokiyê di nav hevde çêdikin, çî rijîye çî bijîye*) .
٩٤٤. Çi rojê baran bê, ew roj wê zivistabê.
٩٤٥. Çi serî ye, çî merî ye.
٩٤٦. Çi tê serî quling, ji qarîna quling e.
٩٤٧. Çi werê serî te, ji des zimanî te ye.
٩٤٨. Çih zindiya xwarî, mayî dora miriya.
٩٤٩. Çil (çel) tajî yên te nikarin xirnikêkî (çêlkê kêrguh) min rakin.
٩٥٠. Çilê reş debarê diqedîne li gayê beş.
٩٥١. Çima î te can e, î min behcan e.
٩٥٢. Çino, navê xwe li mino.
٩٥٣. Çiqa mirîşk tawli dibê, weqa kûn teng dibê.
٩٥٤. Çiqas tu kûçik kevirkê, ê weqas bi hewt hewtkê.
٩٥٥. Çiqas av kûrdibê, weqas avjenî xwaşdibê.
٩٥٦. Çiqas bibî mîr, xwe neke ji bîr.
٩٥٧. Çiqas çiya bilind bê mij wî winda dikê.
٩٥٨. Çiqas kaş hene weqas deberjêr jî hene.
٩٥٩. Çiqas pêde, nankor e.
٩٦٠. Çiqas pîsiyê tevde, hewqas bîn dide.
٩٦١. Çiqas sax bimînî, ewqas ecêba* dibînî.
٩٦٢. Çiqas sing bikut tu weqas cihêr pêvedikê.
٩٦٣. Çiqas sing bikut, ê weqas tûr pêvekê.
٩٦٤. Çiqas tu bilind bibê, ketinê pîsbibê.

*K heban : tûrê çêrmiye , li vir bi wate ya ûr hatî ye .

*E ecêb : sosret

٩٦٥. Çiqas tu kûçka kevirê wê weqas birewin.
٩٦٦. Çiqas tu zanabê ji zana pirske.
٩٦٧. Çiqas xwediyê te pîsbin pêl wan meke.
٩٦٨. Çiqasî hevalên te pir bin hindik e, dijminê te yek
be pir e.
٩٦٩. Çiqasî şareza* ye, weqasî şerpeza* ye.
٩٧٠. Çira bê zêt, ronî nade.
٩٧١. Çira ji kora re def ji krira re bê fêde* ye (*bê sode*).
٩٧٢. Çirîskê di taryê de rokeke di ronyê de.
٩٧٣. Çîroka bizê (biznê)li xweşiya pîrê nayê.
٩٧٤. Çirt bi qentarê xwe: (*Çirtê got : rojê, qentarek goşt ji
min dihelê. Gotin : ê, tu tevda çiqaska yî ku qentarek goşt
ji te bihelê. got, Bi qentarê min*) .
٩٧٥. Çiva mede xwe çiv ne rindin.
٩٧٦. Çivîkek girtî ji qazek çolê çêtir e.
٩٧٧. Çiya bi (di) ser hev re hene.
٩٧٨. Çiya bi çiya nakevin, lê çav li çava dikevin.
٩٧٩. Çiya çiqas bilind bin, illem rê vêdikevin.
٩٨٠. Çiya hewceyê çiyane
٩٨١. Çiya rastî çiya natên lê mirov rastî mirova tên.
٩٨٢. Çiyayê bê gul weke mirovê bê dil.
٩٨٣. Çiyayê bilind. bê dar nabe, keça gihîştî. bê yar
nabe.
٩٨٤. Çiyayê codî ji weynên jinan xwarbû ye.
٩٨٥. Çiyayên bilind bê berf nabin, mêrên çê bê dijmin
nabin.
٩٨٦. Çiyayên bilind bê mij nabin, newalên kûr bê av
nabin.

*K şareza : jîr . zana . jêhatî .

*K şerpeze : dijûn . ne li serhev . rewşkirêt .

*E fêde : sod.

- ٩٨٧.
٩٨٨. Çiyê gotî: Ez ji Xwedê natirsim, ez ji zengîna ditirsim.
٩٨٩. Çol fere ye, tir bi pere ye .
٩٩٠. Çolîn e. dunya nedîne, dibêjin şekoka hirmîne
٩٩١. Çor ket ga, rîk ket sa.
٩٩٢. Çoyê quto tu zanî.
٩٩٣. Çoyê şivên, qoçê berên: (*Çêrokêd Kurda li ser pêximber Mûsa gelek in ji ber ku dibêjin Mûsa demeke dirêj û hin dibên çel salî li Mîdya bi Kurdan re mayî, hev yek jê ye: dibêjin: pêximber Mûsa dî şivanek nimêj dike, gote şivên: Tu li ser nimêjê çî dibêjî, şivên gotê: Ez dibêjim çoyê şivên, qoçên berên, pêximber Mûsa xwest ko şivên hînî hinek kat û bendên (ayet) nimêjê bike, gava dî li ezberkirina kat û bendan ji şivên re giran e, Mûsa gote şivên, wek xwe bêje*) .
٩٩٤. Çû dermanê mîzê, gû lê esirî* .
٩٩٥. Çu evrazî bê jordanî nînin.
٩٩٦. Çû heckir, dîne xwe li ser kir.
٩٩٧. Çû heckir, vegerî gûza.
٩٩٨. Çû heckir, xwe ji berê xirabtir kir.
٩٩٩. Çû heyfa bavê qûn li ser kir.
١٠٠٠. Çû kerê xwe bi ker da û perê xwe bi ser da.
١٠٠١. Çû mala derwêşa, jêre danîn mastê gamêşa.
١٠٠٢. Çû ser darê, dara bin xwe birrî.
١٠٠٣. Çûçik çiqasî bifire, gava avê vedixwe li Xwedê dinêre.
١٠٠٤. Çûçik li ser garisên feqîran datînin.
١٠٠٥. Çûçik wê li çolê bi hevgirin, û dî nav garisê me de wê li hev werin.

*E esirî : dijwarbû . derneket . tersvegerî.

١٠٠٦. Çûk ê li nav garisî axa şer bikin, wê werin li nav garisî fuqara li hev werin.
١٠٠٧. Çûka wîçwîç danî, tu bi tiştêkî nizanî te mala xwe xera kir û mala me li ser danî.
١٠٠٨. Çûkê malê, çûckê malê.
١٠٠٩. Çûkek xwe çedikê paş hejekî xelas* dibê.
١٠١٠. Çûkmezîni mara tine ye.
١٠١١. Çûme şikeftêka tarî, tijî tê de gopal in, yekî wisa nebû destê xwe bigrim .
١٠١٢. Çûndin bi des mera ye veger bi des xweda ye.
١٠١٣. Çûndin bi des meraye hatin bi des xweda ye.
١٠١٤. Çûyî bajarê koran çavekî xwe bigre.

D

١٠١٥. Dahol jî ya wane, û gopal jî yê wan e.
١٠١٦. Damarê eniyê xwe peqîne. (*mebest şerm û fedî li rû ya tine ye.*)
١٠١٧. Damarêd meriyan di erdê de nînin ku bi axê bijîn.
١٠١٨. Dandinê ji dil di dayînî destan re xiya ye.
١٠١٩. Danê kûn, bi ser de lepek rûn.
١٠٢٠. Danî me bi hev ra nakelê. (*ango em nikan bi hev re bijîn.*)
١٠٢١. Danû xistin dawa wî kîrê wî rabû.
١٠٢٢. Dar ber digre serê xwe berjêr dibe: (*mebest herweko qûl (însan) jî gavê ber digre ango dibe xwedî qîz û law carina serberjêr dibe*).

*E xelas dibê : riha dibê .

١٠٢٢. Dar bi berê xwe, mirov bi nanê xwe.
 ١٠٢٣. Dar bi berî xwe şîrîne.
 ١٠٢٤. Dar bi hilmiştinê, mirov bi serşuştinê.
 ١٠٢٥. Dar bi pelên xwe ve diheje.
 ١٠٢٦. Dar bi pelkê xwe dike hijehij .
 ١٠٢٧. Dar bi terrî xwar dibê .
 ١٠٢٨. Dar bi tû ye, lê xwedî tûle ye.
 ١٠٢٩. Dar bi verotinê, mirov bi gotinê.
 ١٠٣٠. Dar ji kokê xwe de kurmi dibê.
 ١٠٣١. Dar ji ziravî dişkên, mirov ji stûrî dişkên.
 ١٠٣٢. Dar li ser koka xwe hişîn tê.
 ١٠٣٣. Dar li ser koka xwe şîn dibe.
 ١٠٣٤. Dar li ser rihên xwe şîn dibe.
 ١٠٣٥. Dar tineye ku bê lê ne xistî: (*mebest kesek tineye ko kêmani negêşti binê*).
 ١٠٣٦. Dar û devî bi guhun.
 ١٠٣٧. Dar û kulavê min, rehme* li dê û bavê min.
 ١٠٣٨. Dar* bi darê xwe, mirov bi nanê xwe. (*dar serdari ye. serdar bi serdariya xwe, bi zora xwe serdariya xwe bi rê ve dibe, lê mirov bi nan û camêriya xwe karê xwe bi rê ve dibe*).
 ١٠٣٩. Dara azadiyê bi xwînê tê avdan.
 ١٠٤٠. Dara bê pel û ber, kes kevirnakê.
 ١٠٤١. Dara ko tu bi xwînê avnedê, berê şêrîn nade.
 ١٠٤٢. Dara ku jê duxî, lê miqate be.
 ١٠٤٣. Dara mer dayî, çiqil dayî.
 ١٠٤٤. Dara sêv pêve, kevirê herinê ji virve wêve.
 ١٠٤٥. Dara te bi ber bê, wê silav li te bê.
 ١٠٤٦. Dara xwar bû, nabe kêran...

*E rehmet : dilovanî .

*K dar : destelat .

١٠٤٨. Dara xwezi ya şên nabe.
 ١٠٤٩. Dara xwezi yê ti car şîn nabe.
 ١٠٥٠. Dara zulmê zû qalind dibe zû jî dişkê.
 ١٠٥١. Darbirro dara bibirr, lê omîda xwe ji xwedê nebirr.
 ١٠٥٢. Darê di bin xwe da mebirre.
 ١٠٥٣. Darê gotî: Birayê min bikuj, ezê odekim*.(*mebest ewe ko carina çîqlên darê di nav hev re û di ser hev re derbaz dibin. û gavê dar dukeve wî rewşî kêm ber digre û berê xwe jî baş nabe. Lewma darê gotî wan çîqlid ko di nav hev re derbaz bûne bibire ezê ji ber xwe û ji ber wî çîqlî ve ber bigrim*).
 ١٠٥٤. Darê xoxê ne tu dar e, jinê bi mêr ne tu yar e.
 ١٠٥٥. Darê zorê zû dişkê.
 ١٠٥٦. Darêd hişk pelan nagrin.
 ١٠٥٧. Darekî tîxê qunê, gulekê dide ber bêhnê.
 ١٠٥٨. Darên sert zû dişkên.
 ١٠٥٩. Darên serxwe re nebirre.
 ١٠٦٠. Darkê nav her pelûlikê ye.
 ١٠٦١. Darkî çavêd xwe nabinê qilçiqî* çavêd xelkê dibînê.
 ١٠٦٢. Dasek bi dehlekê nikane.
 ١٠٦٣. Dawet a duduyan, cenge cola hemûyan.
 ١٠٦٤. Dawet ferikî*, berbû hetikî.
 ١٠٦٥. Dawet tune li kefçiyên digere.
 ١٠٦٦. Daweta mîra gir e li feqîra .
 ١٠٦٧. Dawicî* xirap rûyî şahid* reş dikê.

*K odekim : li şûnê bidim . di berda bidim.

*K qilçiq : bijiyê gênim yan cêhê . h d .

*E ferikî : kuta bû . belav bû .

*E T dawicî : dozdar . gilîvan .

١٠٦٧. Dawiya pevçûnê dijmaniye, dawiya dijmaniyê poşmaniye.
١٠٦٩. Dawiya sebrê* selameti* ye.
١٠٧٠. Daxbe li destê saxbe.
١٠٧١. Daxê qurfê, kerê mirtiba dimre.
١٠٧٢. Daxwaza koran, du çavên reş in.
١٠٧٣. Dayê belayê, xuşkê tehlayê, jinê were kolana minê, ez te bigerînim li welatê dinya yê.
١٠٧٤. Dayê buhbikê, jinê rihikê.
١٠٧٥. Dayîkê bibîn dotê werîn.
١٠٧٦. Dê bibin jin bav, bav jî dibin zirbav.
١٠٧٧. Dê bû dêmarî, bav jî dibe bavmarî.
١٠٧٨. Dê dimire, bav dibe bavmarî.
١٠٧٩. Dê gote: Keça xwe, neçe nav geda, keçê got: Dayê te ji zû de gotiba.
١٠٨٠. Dê qelqana* zaroka ye: (*ango zarok li şûn li hevxin xebra ji dayîkê hev re dibin*).
١٠٨١. Dê tev bavê cotek bask e.
١٠٨٢. Dê û bav berî li zaroya, zaro berî li çiya.
١٠٨٣. Dê û dotê şerkir, aqilkêma bawer kir.
١٠٨٤. Debar* li her tiştî dibê li kezê nabê.
١٠٨٥. Dedo didizê, Medo sûnd dixwê.
١٠٨٦. Dêhn ne dêhnin, ê ji wan bawer dike dêhnin.
١٠٨٧. Dêkê diza du tirra dikê yek ji kêfa re yek ji tirsare.
١٠٨٨. Dêkê mera tim lawa nîne.

*E şahid : dîdevan . gewah .gova .

*E sebir : aram .

*E selameti : aşîti .

*K qelqan : vêlkek hesiniye, didin ber şûr ji bo şûr li wan nekeve .

*E debar : çareser . çaresaz .

١٠٨٩. Dêl a bi se be, kopekê ji hemqê were sere, hema dêl ne a bi se be, kopek î li kêlekê veketî be nare sere.
١٠٩٠. Dêla sor tê teleb, kûçik tê ji Heleb.
١٠٩١. Dêlik bi ba ye, kûçik li ba ye.
١٠٩٢. Dêlik bi seh bê segê werê ji Helebê.
١٠٩٣. Delîlê baranê baye, delîlê mirinê ta ye.
١٠٩٤. Dêlka mantore, kûçikê har jê nakevin.
١٠٩٥. Dêlka tirrek, jî dikeve tûla dirrek.
١٠٩٦. Dêlkê çilek kûçkî gurêx jê dikeve.
١٠٩٧. Dem bi te re neçû tu bi demê ra here.
١٠٩٨. Dem ji zêr e, here pêre.
١٠٩٩. Dem qoriqî tirş şîrîn dike.
١١٠٠. Dem tê mera bi yarê dêya xwe re dixwe.
١١٠١. Dema bextewerî nebe dost, feyde nake gera bost bi bost.
١١٠٢. Dema dayîk dimire bav dibe mam.
١١٠٣. Dema hirç pîr bû kudik bi guncan dilîzin.
١١٠٤. Dema ji savarê re me digot: Savar, wî digot ufik.
١١٠٥. Dema ker bikeve heriyê, ji xwedî zeximtir kes tune.
١١٠٦. Dema ku ga dikeve, Kêr lê pir dibin .
١١٠٧. Dema nimêjê kîrê mile rabû.
١١٠٨. Dema siod hate serî, bila bizirrê weke kerî, xelk dê bêjin çi xoşmer î.
١١٠٩. Demê ecil tê li derî naxê.
١١١٠. Demek a gula ye û demek a sosina ye.
١١١١. Demek ji demê re, demek ji kêfê re.
١١١٢. Dên* bi danê, dijmin bi kuştinê.
١١١٣. Deng li dêng vedigere.

*E dên : wam . qer .

١١١٤. Deng li te kir, çav li xwe kir.
١١١٥. Dengbêj gula govendan e.
١١١٦. Dengbêj ku dest danî ber guhê xwe gereke zanibe bi kîjan kulamêde.
١١١٧. Dengê daholê dikê, mala dawetê nizanê.
١١١٨. Dengê def û zirnê gumegum e, serî xort û keça bi şaş û kum e.
١١١٩. Dengê defê kiriye, lê nizanê li kîjan aliye.
١١٢٠. Dengê dîka qebe ye, rabin sibe ye wexta karê me ye.
١١٢١. Dengê ezmana nîşana barana.
١١٢٢. Dengî defê ji dûr ve xweş e.
١١٢٣. Dengî dîk narê yê: (*rewşê kesekî pir xwaş be û pir bi kêf be dibêjin, dengî dîk narêyê*).
١١٢٤. Dengî kerê bi kerê xweş tê.
١١٢٥. Dengî xwe bilind meke, dîwar bi guh in.
١١٢٦. Dengke tu dicerisê, deng meke tu dikerisê.
١١٢٧. Dênî kesî li te bê û tu kê nedê yê û nexeyidînê, kengê xwast bêjê îro siba: (*Dêndarê yekî hat, mêrik ne li mal bû, kurê wî gotê: Apo, bavê min dibêje: kengê em vî çiyayê ha bi rez kin, emê mewîja bifroşin û dênê camêr bidin; êvarî bav hat mal, kurik bi ken çêrok gote: Bavê xwe, bavê xwe xeyidand û got: Kuro, te xêre-soz dayê, te bigota: îro-siba*).
١١٢٨. Deqî bi duqê ye: (*dî gomanê min de, duq ji deqê bi zerptir e, mebest ewe ko tu deqekê li kesekî xê, xelkê duqekî li texê*).
١١٢٩. Dera tu hêviya jê nekê, tu gazina ji jê nakê.
١١٣٠. Derba ko nan dibire, şûr nabire.
١١٣١. Derban ji derblêketiya bipirse.
١١٣٢. Derbê neyaran xedarin.

١١٣٣. Derd çiqas hene, weqas derman jî hene.
 ١١٣٤. Derd derda tîne .
 ١١٣٥. Derd di ser derdan ra hene.
 ١١٣٦. Derd heye derman jî heye.
 ١١٣٧. Derd meriya bi dengkirin didin.
 ١١٣٨. Derd pirin, lê giş ne li ba hevin.
 ١١٣٩. Derd û kul ji bin hev derketin.
 ١١٤٠. Derd û kulê me ne besbûn, derdê te jî bi ser de.
 ١١٤١. Derd, derdan winda dike.
 ١١٤٢. Derda ji derdvêketiya pirs ke.
 ١١٤٣. Derdê Beko pelûl e.
 ١١٤٤. Derdê dilan hûr e, kûr e, dûr e.
 ١١٤٥. Derdê dilketinê da ser derdê mirinê.
 ١١٤٦. Derdê feqîra nan e, derdê axa kêf û dîlan e.
 ١١٤٧. Derdê hewiyê da ser ê xwasiyê.
 ١١٤٨. Derdê hewiyê pir giran e, derdekî bê derman e,
 ya ku bi sêri nehatibê nizane.
 ١١٤٩. Derdê hewiyê, jana tiliyê.
 ١١٥٠. Derdê jina ku seriyê xwe li ser du balgiya diye
 nayê kişandin.
 ١١٥١. Derdevan pîrbêjin, evîndar dengbêjin.
 ١١٥٢. Derdî te ne ji bena dibê, ne jî ji werîsa.
 ١١٥٣. Derdî tunebûnê çetine.
 ١١٥٤. Derê ar lê nîştî, dişewitê.
 ١١٥٥. Derê derba xencera, narê derba xebera.
 ١١٥٦. Derê maşe lê, destî xwe meşewtîne.
 ١١٥٧. Derê mî lê tu nebin, bizin Ebdilkerîm Axa ye.
 ١١٥٨. Derew sêwî ye.
 ١١٥٩. Derewan meke, ger te kir jî bira cefî te bike.
 ١١٦٠. Derewîn dijminê xwedê ne.
 ١١٦١. Derî bişkêne ku dar pir bin.

١١٦٢. Derî kilîto, nav gund cirîto.
١١٦٣. Deri yê xerata (textbirr) bi bena girêdayî ye.
١١٦٤. Deriyê gomê vebe berx ber bi mêşinê, kar ber bi bizinê dere.
١١٦٥. Deriyê necaran timî ji hev xelîne.
١١٦٦. Deriyê te ji camê bê, deriyê xelkê kevir meke.
١١٦٧. Deriyê xêra nayê girtin.
١١٦٨. Deriyê xwe bigre û darekî di paşxe, cînarên xwe diz dermexe.
١١٦٩. Deriyê xwe bişkîne îmza* xwe meşkîne.
١١٧٠. Deriyê necara* her şikestî ye.
١١٧١. Deriyê xwe veneke, gazina li cînara neke.
١١٧٢. Dermanê her tiştî xwedê ye, dermanê xwedê tine ye.
١١٧٣. Dermanê her tiştî zêr e, belê ji zêr xurtr zor e.
١١٧٤. Dermanê xwastinê dayîn e.
١١٧٥. Dervayî min xelkê dişewtîne, hundirî min min dişewitîne.
١١٧٦. Derwêş dizane çi di hebana derwêş de heye.
١١٧٧. Derwêş zanê, çi xistî hebanê.
١١٧٨. Derya bi çelpandinê devî kûçkekî nalewite.
١١٧٩. Deryê xwe bigire, cîranê xwe diz dernexe.
١١٨٠. Derziya xwe di serê xwe re kir.
١١٨١. Derziyê xelkê dibînê, şûjinê xwe nabînê.
١١٨٢. Dest desta dişo, qencî rûya dişo.
١١٨٣. Dest di ser desta ra hene ta mala xudê.
١١٨٤. Dest dizanê kuderê dixurê.
١١٨٥. Dest hevdu dişûn û vedigerin rûya dişûn.
١١٨٦. Dest hilanîn fereca* xêrê ye.

*E îmze : wajo . dêxnûs .

*E necar : textbirr . dartiraş .

١١٨٧. Dest ji me sbef ji xwedê.
 ١١٨٨. Dest li desta heta ezmanê hefta.
 ١١٨٩. Dest naghînê yê dibê: Bila xêra min bê.
 ١١٩٠. Destê merdan dermanê derdan.
 ١١٩١. Destê min didize, dilê min dilerze.
 ١١٩٢. Destê ramûsandinê, nayê gezkirin.
 ١١٩٣. Destê reht li ser zikê peht.
 ١١٩٤. Destê rihet li ser zikê birçiyê.
 ١١٩٥. Destê rûs (rût) nedane ser zikê birsî (birçî) .
 ١١٩٦. Destê rûs* dane ser zikê birsî* .
 ١١٩٧. Destê te bi don bê, di serî xwe bide.
 ١١٩٨. Destê te ne destê mêrkuja ye.
 ١١٩٩. Destê tenê deng ji na yê.
 ١٢٠٠. Destê vala deng jê nayê.
 ١٢٠١. Destê vêsiyayî li ser zikê têr e
 ١٢٠٢. Destê wî rast naçe paxila wî.
 ١٢٠٣. Destek ji pê ra, destek ji pa ra
 ١٢٠٤. Destekî riya destekî simêla.
 ١٢٠٥. Destên camêran dirêjin .(*ango yê ko li mala xwe camêr be li mala xelkê jî bi serbestî dixwe*).
 ١٢٠٦. Destî bi xêr, li ser zikê têr:
 ١٢٠٧. Destî camêra natê girtin.
 ١٢٠٨. Destî ku tu nikaribê kezkê, maçke.
 ١٢٠٩. Destî mera ne mizîn e: (*ango gavê tu bi destî xwe li kesî dixê, tu nizanê wê bi kîjan zerpê lêkevê*).
 ١٢١٠. Destî westayî, li ser zikê têr e, destê vehesiyayî li ser zikê birçî ye.
 ١٢١١. Destî xwarinê dirêj e.

*E ferec : ferehî . bi rûyadenêrîn

*K rûs : rût.

*K birsî : birçî.

١٢١٢. Destî xwe mexe her qulekê, qul hene mişk tê da ne qul hene mar tê da ne.
١٢١٣. Destî xwe zû li kesî rameke, te rakir jî lêxe
١٢١٤. Destikî bivir ne ji darê be dar nakeve.
١٢١٥. Destikî pêlte ne ji darê ba dra nediket.
١٢١٦. Dev dibê, guh nabîsê.
١٢١٧. Dev dibêjê lê dil nabêjê.
١٢١٨. Dev dixwazê rû fedî dikê.
١٢١٩. Dev duxwe rû fedî dike.
١٢٢٠. Dev î beş e zik î reş e.
١٢٢١. Dev ji dêv namîne.
١٢٢٢. Devê girtî, kes nizanê çi tê de veşartî.
١٢٢٣. Devê girtî, serî rehetî.
١٢٢٤. Devê hobê (hûbê) virra, kûna hobê (hûbê) tirra nayên ser berra.
١٢٢٥. Deve ji hev dûr diçêrin, lê guhêd xwe li ser hev in.
١٢٢٦. Devê ku pîvazê nexwe, bên jê nayê.
١٢٢٧. Deve li xeyalekê û deveçî li xeyalekê .
١٢٢٨. Deve nalkirin, rovî çû go: Pepe
١٢٢٩. Devê pisîngê negîşt goşt, go: Min xêra dêw bavê hîşt.
١٢٣٠. Devê rovî negihêşt tirî got: Tirş e.
١٢٣١. Devê wan li gebola wan.
١٢٣٢. Devê xelkê ne doxîna mirov e ku mirov girêde.
١٢٣٣. Devê xwar, ken jêre nabe sitar*.
١٢٣٤. Devê xwe hûmeke virra, qûna xwe hûmeke tirra.
١٢٣٥. Devgirtin vehesiya sêrî ye.
١٢٣٦. Devî hebe wê bibe dar, xwelî li serê bêwar.

*E sitar : perde .

١٣٣٧. Devî te tije xwîn bê, li ba kesî tif neke.
١٣٣٨. Devî te tiji xwîn bê, li ber dijmin velû meke.
١٣٣٩. Devî xelkê ne kûna mera ye, ku mera li ser rûnê.
١٣٤٠. Devî zû dibe dar, xulî li serî merî bê war.
١٣٤١. Devî pala, didin hûr deviyan.
١٣٤٢. Dew bi namûs e: (*ango tu çiqas av têxê yê her wek xwe dimîne*).
١٣٤٣. Dew birayê mêste.
١٣٤٤. Dew ê bi derman bê, caw ê bi kutan bê, şaşiyê li serî mêra bê, dest ê bi destî jina bê.
١٣٤٥. Dew li aşîqa nayê.
١٣٤٦. Dew tine rûn difroşe.
١٣٤٧. Dew xwestin û kodik* veşartin bi hev ra nabin.
١٣٤٨. Dewar sol dikirin, jûjî got : pepilêd min jî.
١٣٤٩. Dewar tèn girêdan bi hefsara, mirov tèn girêdan bi qewl* û qirara*.
١٣٥٠. Dewaran nekirre li nîsnê*, jinan nebjêre li dîlanê.
١٣٥١. Dewarê baş alîka xwe zêde dike.
١٣٥٢. Dewarê malekê winda bû, peyayê malikê çûn lê bigerin gihiştin çiyê heryek bi qulpekî* de çû. Pir ne çû birayê mezin dewar dît rabû bang kir birayê xwe yê biçûk gotê: Were min dewar dît. birayê biçûk go: Ez carekê gîhame vir û gîhame ka ez li vê newalê jî binêrim ezê werim.
١٣٥٣. Dewarek kesî şevder bimînê bira xoce bi ser devî kêrekê da bixwînê û devî wê kêrê bi hevdin gur

*K kodik : zerka darî . pîvaneka darî .

*E qewl : soz . gotin .

*E qîrar : biryar .

* nîsan : cotan .

*K qulp : alî .

nikanê wê dewarê buxê, lê ji bîrmekin devî kêrê sibehê vekin ji bo gur ji nêza ra nemirê. Û li gor bîr û bawerî Kurd ger gur xwe di ser avekê re çekê jî devî xwe wê vebê.

١٢٥٤. Dewat bi xudana şên dibin.
١٢٥٥. Dewat dibê ji bo dudiyan, agir dikevê hemiyan.
١٢٥٦. Dewî ceribandî* çêtir e ji mastî ne ceribandî.
١٢٥٧. Dewî mera ji mastî xelkê çêtir e.
١٢٥٨. Dewî tirş li bavê xwe nahêvşînê: (*ango rastiye di rûyan de dibêje*).
١٢٥٩. Dewlet birêse* ga golkê dalêse: (*Li gor adetê (fêrwe*) mange golka dalêsin, lê gavê dewlet xwe bi alî te da badidê û dirisê, ga jî golkê dalêse, ango tiştin dervayî fêrwe jî çê dibin*).
١٢٦٠. Dewlet li derê tifaq e*.
١٢٦١. Dewlet* sê cara tê ber derî mera.
١٢٦٢. Dewleta bi lez, rez û pez.
١٢٦٣. Dewran* tim bi dor e,geh li jêr e, geh li jor e.
١٢٦٤. Dewsa şêran kund dike şêran.
١٢٦٥. Dewsa şûran rehet dibe, dewsa gotina rehet nabe.
١٢٦٦. Dewsa* şêran, rovî nikarin bikin gêran.
١٢٦٧. Dêya kabciya du tira dike. yekê ji kêfa çift re, yekê ji tirsê zirt re.

*E ceribandî : taqîkirî . teqemenî .

*K birêse : şans xwe bervê badê .

*K fêrwe : rêdarî . isûl . awar .

*E tifaq : yekdestî . yekdilî . lihevkirin . palan .

*E dewlet : bext . şans . êqbal .

*E dewran : ger . lêhatin . Çerx .

*E dewsa : cih . war . mal .

١٣٦٨. Deyn li te kir, çav li xwe kir.
 ١٣٦٩. Deynakê, ku deynkir dibê hêştir.
 ١٣٧٠. Deyndar xwe avêtiye pişt xwîndar.
 ١٣٧١. Dezîkî jê bikşîne hezar perspan wê jê bikevê.
 ١٣٧٢. Dezîkî jê bikşîne hezar perspan wê jê biwerê* û ji xwe nagerê.
 ١٣٧٣. Di ber dîwarî çirûk re mere.
 ١٣٧٤. Di civatekê da çêrê marekî bibe, di wê civatê de çêl çêrok mara wê werê hewaldan.
 ١٣٧٥. Di destekî de ar e, di destekî de pûşe ye.
 ١٣٧٦. Di govendê cahila* de sergovendî ne diyar e.
 ١٣٧٧. Di halan talana da kes nizanê kî kî ye.
 ١٣٧٨. Di havînê de rez û pez, di zivistanê de agir û ez.
 ١٣٧٩. Di kefçîk av de difetisê.
 ١٣٨٠. Di ku ra zirav e bila di wir ra biqetê.
 ١٣٨١. Di kulavî şil da nasekinê.
 ١٣٨٢. Di mistê ke di fistê ke.
 ١٣٨٣. Di nav çewalek ka de li derziyê digêrê.
 ١٣٨٤. Di navberê mêranyê û qelsemêriyê de mûk e.
 ١٣٨٥. Di navberê xêretê* û mixenetiyê* de mûk e.
 ١٣٨٦. Di pê bandevê (barana xurt) re tim ga di axira ke.
 ١٣٨٧. Di qulê mazi* da veşêre ê bibînê.
 ١٣٨٨. Di tengiya da jî deryê nemerdan nekute.
 ١٣٨٩. Dibê deve çima stûyê te xwar e, dibê çiyê min li kar e.

*K biwerê : biweşê . bikevê.

*K cahil : xort . ciwan êrgan .

*E xîret : dilxwastin . hosbûn . di xweradîtin .

*K mixenetî : dilnexwastin . hosnebûn . di xweranedîtin .

*K mazi : glovere dikevê darê maziye . carina qulek biçûk lê çêdibe .

١٢٩٠. Dibê dewlemendo pîroz be, dibê feqîro te ji ku anî.
١٢٩١. Dibê ez xadim im,* tu dibê çend zarokê te hene.
١٢٩٢. Dibê kundo mirî pirin an zindî, dibê zindîkî zêde ye ew jî di bin fermana jinê de ye: *(ev di pendê nimre (٤٨٨٢) wek perçemkê de hatî rave kirin)*.
١٢٩٣. Dibê kûsî tu çima pîsî, dibê li eniya min nîvîsî.
١٢٩٤. Dibê te dinya çawa dî, dibê li gorî dilê xwe.
١٢٩٥. Dibêjin: Tu dinê çu zanî? Go: Ez li gora nêta *dilê xwe zanim.
١٢٩٦. Dibêjin: Xwînî mêrê zor be, ne dêndarê mêrê xerab be.
١٢٩٧. Dibêjin: Yekî bênamûs dikane li pêş gundekî bisekine.
١٢٩٨. Difirrî per pê ve nîne, darît pê pê ve nîne.
١٢٩٩. Digerî li dewleta lez, xweyîke rez û pez.
١٣٠٠. Digurije, nabare.
١٣٠١. Dijmin bi halî* dujmin zanibê umrî* xwe rok e.
١٣٠٢. Dijmin bibe nan jî meke paşilê xwe.
١٣٠٣. Dijmin mezelê meriyan vedide, dost meriyan vedişêre.
١٣٠٤. Dijmin naxwaze dû di pixara dijmin re derkeve: *(Berê di malan de pixare hebûn, tê da nan û şîvşevîn çê dikirin û agir tê da dadidan, li ber rûdiniştin, û duyê wî agirî di jor ra derdiket; gavê dû derneketa angû ne şîv li wê malê heye û ne ard û ne jî ardû, ji xwe dijmin jî ev divê.)*

*K xadim : nemêr . kîrpuç .

*E nêt niyet : niyaz .

*E hal : rewş .

*E umir : temen . mezîl . jî .

١٣٠٥. Dijminahî bi nermî, bazar bi germî.
 ١٣٠٦. Dijminê bavê nabe dostê lêw.
 ١٣٠٧. Dijminê bi fam*, ji dostê bê fam çêtir e.
 ١٣٠٨. Dijminê dijwar* ji dostê xayîn* çêtir e.
 ١٣٠٩. Dijminê mêrxasa, di nav ûçikê jina dene.
 ١٣١٠. Dijminê te bû herî, pêlê meke.
 ١٣١١. Dijminê xwe bi hesîdê* kuşt.
 ١٣١٢. Dijminî dujmin doste, dostî dujmin dujmine.
 ١٣١٣. Dijminî merayî tewr mezin jinê mera ye.
 ١٣١٤. Dijminî te gêrekek bê jî, xwe jê biparêze.
 ١٣١٥. Dijminî zane ji dostî nezan çêtir e.
 ١٣١٦. Dijûnêd Botiya ji duid Aşîtiya çêtir in (*Aşîtî, îro, bi ol perestiyê nasdar in; ew ji serdema berî Misilmantiyê de ji wan re maye; ol parêzên dînê Kurdan ên berê bûn. Piştî ku misilmantî hat, tê de berdewam kirin*)
 ١٣١٧. Dikalê lê şîr nadê.
 ١٣١٨. Dîkê çê di hêkê de bêlî ye.
 ١٣١٩. Dîkê dewletiyân jî hêkê dike.
 ١٣٢٠. Dîkê rojekê be, ne mirîşka salekê be.
 ١٣٢١. Dîkî çê di hêlînê da qî dikê.
 ١٣٢٢. Dil bi dil zane.
 ١٣٢٣. Dil dixwazê lê rû fedî dikê.
 ١٣٢٤. Dil dixwazê, lê laşe ranabê.
 ١٣٢٥. Dil fereh bê, rê fere ye.
 ١٣٢٦. Dil heye, (dixwazê) taqet tune ye.
 ١٣٢٧. Dil ji dil teng dibe.

*E fam : têgihêştin .

*K dijwar : zor . çetin .

*E xayîn : xiniz .

*K hesîde : xwarineke ji rûn û dimis û ard çêdibe .

١٣٣٨. Dil ko neşewitê, hêstir ji çawa naşemitê.
 ١٣٣٩. Dil li ser dile, jêre nîne ti derd û kul e.
 ١٣٣٠. Dil ne kevire, ji kêvir nermtire.
 ١٣٣١. Dil neke jina bi mêr, diçe mal dike ji bîr.
 ١٣٣٢. Dil şûşe ye, ku bişkê nacebire.
 ١٣٣٣. Dil timî can e.
 ١٣٣٤. Dîlan çawa digere, tu ji wilo digerî.
 ١٣٣٥. Dilê bi xezeb naghêjê mirada (daxwaz).
 ١٣٣٦. Dilê fereh pîr nabe.
 ١٣٣٧. Dilê mêvên ji mêvên tenge, dilê xwediyê malê ji herdiya tenge.
 ١٣٣٨. Dilê navbêjciyan firehe.
 ١٣٣٩. Dilê xerîba tim bi xem e.
 ١٣٤٠. Dilê xezeb mirov naghijîne mexsed û mirada.
 ١٣٤١. Dilê yekî goşt xast, got : Guhid dehşikê wek êd kêrgiyê ne.
 ١٣٤٢. Dilekî sadiq* û yekî minafiq.*
 ١٣٤٣. Dilekî sax, dilekî çirûk.
 ١٣٤٤. Dilêr bi destî bêbextan têne kuştin.
 ١٣٤٥. Dilî kûçka jî gêrmîyê rizê dixwaze.
 ١٣٤٦. Dilî kûçka jî hevrişkê dixwazê.
 ١٣٤٧. Dilî şivên bixwazê, wê têlme ji nêrî bikê.
 ١٣٤٨. Dilî tirsonek sîngî gewr nabîne.
 ١٣٤٩. Dilketin. meryan kor dike.
 ١٣٥٠. Dilketin xwaş e bi xortaniyê, zozan xwaş e bi goçberiyê.
 ١٣٥١. Dilop bi xwe tîrbê xwe dikolê.
 ١٣٥٢. Dîn bi lê da çû, dêv benîşt cû.
 ١٣٥٣. Dîn dîna dibînîn, şivikên xwe vedişêrin.

*E sadiq : rastgo . dilsoz .

*E minafiq : bêbext .

١٣٥٤. Dîn dîndûq* dî, bûkê sindûq dî.
 ١٣٥٥. Dîn î dikene çê nabe Dînî digrî çêdibe.
 ١٣٥٦. Dîn ji dîlanê, zarok ji listikê têr nabin.
 ١٣٥٧. Dîn narin ser zîn.
 ١٣٥٨. Dîn şerma dîkin xwedî fedî dîkin.
 ١٣٥٩. Dîn, ya li şahiya ye ya li şîna ye.
 ١٣٦٠. Dînak a bi çav a, bûnek a bi dil a .
 ١٣٦١. Dînan tê meke û ehmaqan bi şopê mekeve.
 ١٣٦٢. Dîndar bin, maldar bin.
 ١٣٦٣. Dinê bi dor e ne bi zor e.
 ١٣٦٤. Dinê ji qencan vala nabê.
 ١٣٦٥. Dinê ku nanê xwe bi mûja bixwe ne dîne.
 ١٣٦٦. Dinê ne behs û bazar e, qewl* û qîrar e*.
 ١٣٦٧. Dinê nêrdewane, hink têre hildikşin, hinek têre dadikevin.
 ١٣٦٨. Dinê* li dinê, çavê gur li bizinê.
 ١٣٦٩. Dînî kenî çênabê.
 ١٣٧٠. Dînî tazî giş nas dîkin.
 ١٣٧١. Dînî tazî giş nasdîkin dînî bi kinc tu kanibê naskê.
 ١٣٧٢. Dînok di şîn û şahiyân de kifş dibe.
 ١٣٧٣. Dinya bît dost, dijmin nabît dost.
 ١٣٧٤. Dinya bûye kes, tu kes negotiye bes.
 ١٣٧٥. Dinya dem e, gav petêx e gav lem e.
 ١٣٧٦. Dinya li dinyê ye, çavê gur li mihê ye.
 ١٣٧٧. Dinya xan e, Bazirgan bar dike û xan dimîne li şûnê wane.

*K dîndoq : cam .

*E qewl : soz . gotin .

*E qîrar : biryar .

*E dinê : cîhan . gerdon

١٣٧٨. Diran bi êş, derman kêş.
١٣٧٩. Dirêj nezane kinik ê awane orte-qalib baş-bîlane* melhema dilan e dermanê derd û kulan e.
١٣٨٠. Direw (*derew*) li biyaniyê, pesin li pîriyê.
١٣٨١. Dîtina çavan qinyata* dila ne.
١٣٨٢. Divê fikir* rind bê fikirandin, peyv rind bê gotin, kar rind bê kirin, (*Zardeşt*).
١٣٨٣. Dîwana keremirov têde nebin, bê xêre.
١٣٨٤. Dîwar ê hilweşê, toz ê hilkişê.
١٣٨٥. Dîwarê li ser cemedê ye.
١٣٨٦. Dîwarê xilxilî xwe jê bide alî.
١٣٨٧. Dîwarê xwehr tê xwar.
١٣٨٨. Dîwaro min ji te re got, bûkê tu guhê xwe bidê yê.
١٣٨٩. Dixwazê du çûka bi kevrekî bikuje.
١٣٩٠. Dixwazê hêştir bi ûskê avdê.
١٣٩١. Dixwazê mirîşkê xwe bi qazid xelkê re bifirînê.
١٣٩٢. Diya zavê lotika hildidê, diya bûkê navika (*navkutka*) hildidê.
١٣٩٣. Diyarî qesp in, şûn diyarî hesp in.
١٣٩٤. Diz diz e, çi hêkek çi gamêşek.
١٣٩٥. Diz gunehê dikê, xudan hezar gunehî dikan.
١٣٩٦. Diz ji bazarê li hevketî hezdikan
١٣٩٧. Diz ji malê bê, ga û golik di derî re derdikevin.
١٣٩٨. Diz li bazarê li hevketî digerin.
١٣٩٩. Diz li şevên reş digere.
١٤٠٠. Diz malid padişa jî vedikan.
١٤٠١. Diz xumal e, dergeh-girtinî betal e.

*T bîlane : zanaye .

*K qinyat : vehesîn . têrbûn.

*E fikir : raman .

١٤٠٦. Diza ji diza dizî erdê û ezmên ji hev pirsî.
 ١٤٠٧. Diza ji diza dizî, erd û ezman tev lerzî
 ١٤٠٨. Dizê malê ji malê be ga di kulekê re derdikeve.
 ١٤٠٩. Dizê nehate girtin şêr e .
 ١٤١٠. Dizê neyê girtin, sultan e (qerale) .
 ١٤١١. Dizek bi şev ket malekê, jinka malê pê hesî, mêrê
 xwe şiyarnekir, diz virda çû wêda çû tiştêkî
 bidizê nedî, bi nermî derî vekir wê herê, jinkê
 got ê: Birako hilde xwe, diz gotê: Tîrrê min li vir
 hildana xwe ezê li ciyekî din hildim xwe, lê tê
 siba çi buxê, jinkê got ê: Rizqî* siba li siba ye.
 ١٤١٢. Dizî ji qûçekî, qehpîti ji ramûsanekî.
 ١٤١٣. Dizi li Xidiro, sond li Bekiro.
 ١٤١٤. Dizid havînê payîzê bêlî dibin.
 ١٤١٥. Dohn di serî qirkê da tineyi.
 ١٤١٦. Dolaba hebîbê necar, xewke wek hercar, şev yek
 e dergeh hezar.
 ١٤١٧. Don nekî çîrê çîre rohnî nade.
 ١٤١٨. Donê genê (hindyaxi, ew zêta ko didin nexwaşa
 ji bo nava wan herê) nabit rûn qeleçik nabit xatûn
 ١٤١٩. Donxiz e*, xwast çêlka dike xwast hêka dike: *(Du
 mirovan yekî got: Donxiz çêlka dikê, yekî jî got: Hêkan
 dike; rabûn çûn ba mirovekê mezin û jê pirs kirin, mêrik
 ne xwast dilê wan ji hevdu bihêlê, hema bi hêsanî got:
 Bavo, donxiz e, kanê hêkan jî bike û kanê çêlkan jî bike).*
 ١٤٢٠. Dor dor e ne zor e.
 ١٤٢١. Dorê bide dornasan.
 ١٤٢٢. Dost bi qentara, hesab bi misqala.*

*E rizq : rojîn . rozîn .

*T donxiz : beraz .

*E misqal : diram . niqar .

١٤١٩. Dost di roja teng de bêlî dibin.
١٤٢٠. Dost malê xwe nadin mera, lê riya dirist raberî mera dikin.
١٤٢١. Dost mera digrînin, dijmin mera dikenînin.
١٤٢٢. Dost ne dostêd dewata ne, dost dostêd ber derî hepsa ne.
١٤٢٣. Dost pîs bê, dijmin ne gerek e.
١٤٢٤. Dost wek tebin dujmin ne gerek in.
١٤٢٥. Dostê bi xêr ji birayê bê xêr çêtir e.
١٤٢٦. Dostê te hingiv bê jî gişî malêse.
١٤٢٧. Dostê te, dijmjnê te, zimanê te ye.
١٤٢٨. Dostî şahiya ne dost e. dostî tengasiya dost e.
١٤٢٩. Dostî wek te mila gur bixwin.
١٤٣٠. Dostika kevin hespê zînkirî ye.
١٤٣١. Dot û firot negîşte xeta cot .
١٤٣٢. Du aqil nakevin serîkî.
١٤٣٣. Dû bi ser rinda de derê.
١٤٣٤. Du cara bipîv crekê bibirr.
١٤٣٥. Du firêšta li jor piyase dikirin dîtî firêştakî girs defeke mezin di sto da ye û mertekekî gopala rakirî hafê û xweragirtî û lê nadê herdu frêşte çûn balê û pirskirin ma karê te çi ye? Firêşte got : Ji roja roj de ev def di stoyê min da ye û ev gopal bi des min da ye û her xocak yan şêxek bi qencî nanekê bi xizanekî dê, ezê gopalekî lêxim, gotin ê : Ta naha te çend gopal lêxistine got : Ez vî gopali lêxim û yekî din lêxim dibin dudu.
١٤٣٦. Du gayê yekî hebûn, yek bi zorê dikirin koxê yek bi zorê ji koxê derdixistin.

١٤٣٧. Du gayê yekî hebûn, yekî qurfê* qetlebê dixwar, yekî qurfê maziye dixwar : *(carina, ber devî biharê kayê dewêr li malina nedima, malik neçar dibû ko herin ji çê çilo ji dewêr re wînin, çiloyê ko ga dixwin du cûre ne, yek qurfi qetlebê û yek qurfi maziye, û hev herdu cûre dar ji belkî ne li nêzîkî hev in, û her gak cûrekî dixwe, malik neçar dibûn ko her yek bi alîkî çê de herê).*
١٤٣٨. Du hêka li hevxe wê yek bişkê.
١٤٣٩. Du jin bi çêl* rastî hev werin, divê derziyî xwe bi hev bigewrin ji bo çêlî wan bi hev nekevê.
١٤٤٠. Du kêf li warekî nabin.
١٤٤١. Du mar di qulekê de dibin, du mal di malekê de nabin.
١٤٤٢. Du miraza bighîne hev, bi hecekê ye.
١٤٤٣. Du mişk bi hev re ji qulekê derketin, yekî ji yê dî re got: Tu ji ku tê.
١٤٤٤. Du parên xizani yê, nezani ye.
١٤٤٥. Du peya ji malekê narin dewatekê.
١٤٤٦. Du seriyê mezin di biroşekê de nakelin.
١٤٤٧. Du seriyê ne wekhev, naçin ser balgîkî tev.
١٤٤٨. Du textik û bizmarek.
١٤٤٩. Dudiyan got kumî te ne li serî te ye, dêst bavêjê.
١٤٥٠. Dudu por dirêj ji yekî ser filûs şê dixwazin.
١٤٥١. Duh ji hêkê derketî, îro dikaniyê dike.
١٤٥٢. Dukana bekîro: du qalib sabûn û çar tûr xwê.
١٤٥٣. Dûma her tiştî heye, dûma zilmê tune ye.
١٤٥٤. Dunya bi sebrê* çê bûye.

*K qurf : çilo .pel .

*K çêl : piştî jin dizên çêl rojî di nexwaşiya çêl de dimînin -

*E sebir : aram .

١٤٥٥. Dunya bi serî mirî de xira dibê.
١٤٥٦. Dunya bi tirra bata kurrîn, kera wê bikiriya.
١٤٥٧. Dunya bi umidî ye.
١٤٥٨. Dunya çû bi ser nîvro ve, hîn golik bê av e.
١٤٥٩. Dunya dem e, hemî kul û xem e.
١٤٦٠. Dunya derewên e, ji kesî re namîne.
١٤٦١. Dunya dolab e, hin ê herin, hin ê werin: (*Dibêjin roviyekî tî rastî bîrek dolab li ser hat, lê nêzik bû û li binê bîrê nêrî, dît ko çipilek av di bin bîrê de heyê; rovi li dor xwe nêrî, kesek li wan dera nîne, di zikê xwe de go: Baş e, li gor hizr û wamgirtina xwe, go: Ezê di dûlikê re dakevim avê vexim û di dûlikê re jî derkevîm, û li ser vê tevdirê xwe avêt dûlê; rovi dadiket li nîvê bîrê ew û dûla ku digot: Ezê pê hilkişim rastî hev hatin, rovi zanî tevdira xwe şaş derket, lê tişt bi dest de nema, roviyê me gihêşt binê bîrê, av vexwar û gul xwe na, tu rê nedîtî, çend beq-meq hebûn li xwe ragirtin, rojekê dît morantiyek bi ser devê bîrê ket, lê nêrî ku gurek e, gur jî ew dît, rojbixêrek dan hev ketin pirs û bersivan, gur li ber rovi gerî û gotê: Ji bo Xwedê, min bibe ba xwe, ez ji tîna û birçîna nema wek gura me, rovi gotê: Birayê min, ez ditirsim tu bê ba min û dîsa wek berê to zorê li min bikê, gur gotê: Bi bextê min û te, hema tu çî bêjî, ez nabêjim na; rovi got: Bi wê sonda ku te pê sond xwarî, qet ne bi dilê min e; ez birayê te yê biçûk im, di vê xweşiyê de bim û tu jî di wê reşiyê de bî; lê rovi di ber dengkirinê re xwe bi dûlê ve kir şima û gote gur : birayê min, te ew dûl dîtîye, xwe bavêjê û bi herdu destan bi bîn bigir, gurê te hema bi lez xwe avêtê û bi bîn girt; tema gur jî rovi giratir e, gur daket rovi hilkişî li nîvê bîrê rast hev hatin, gur got: Kuda birê rovi, rovi gotê: Dunya dolab e hin ê herin, hin ê werin).*

1577. Dunya dor bi dor e, geh li jêr e, geh li jor e, ne li ser stoyê gayê bor e*: (*Berê li gor bîr û bawerî hin miletan yan hin kesan, digotin, erd li ser qiloçên ga ye, ga jî li ser pişta masî ye, û masî jî di behrê* da ye.îca, li vir xuya dibe, di roja ev pend hatî gotin, û vir de Kurda jî vê bîr û baweriyê û ji vê nêrînê bawer nekiriye, lewre gotine: erd ne li ser sto yê gayê bore).*)
1578. Dunya dûvê berên e kê pê zanî li ber wîn e.
1579. Dunya gulek e, bîhnke û bide hevalê xwe.
1580. Dunya ji şêx û feqiya de xiradibê.
1581. Dunya kê dot? Kê kirrî û firot.
1582. Dunya lêhatin e, ne jêhatin e.
1583. Dunya li serî merî gidî teng e.
1584. Dunya mestî-meyan e, mîna xewnên şevan e, her gav felek yarê hinan e, xweda mîrekî mezin e ji hina distîne didê hinane.
1585. Dunya nedî gava dît bi xwe de rît.
1586. Dunya qenc e ji şêra re, xweş milk e ji mêra re, ava bûye ji xêrê re.
1587. Dunya qenc e tu jî şêr be, tu ji xêrê re xweş mêr be, li axiretê* ne hevalê mêrê bêkêr be.
1588. Dunya qenc e tu jî şêr bê, tu ji xêrê re xweş mêr bê, tê di roja qiyametê* de ne hevalê mêrê bê kêr bê.
1589. Dunya sersiya dara ye, ge li vira ye ge li wira ye.
1590. Dunya wê bi rez bê, dimis wê bi derman bê.

*K gayê bor : gayê mor .

*E behir : derya . zerya . avşîn .

*E axret : roja bangê . roja bandê .

*E qiyamet : peslan . qars .

١٤٧٦. Dunya xan e û man e, hin çûne û hin mane, ê mayî jî mêvan e.
١٤٧٧. Dunya xane, mirov bazirgane.
١٤٧٨. Dunya xeyar e, rojekê bi des te da ye, rojekê di kûnê te da ye.
١٤٧٩. Dunya xeyar e, rojekê bi des te da ye, rojekê di te da ye.
١٤٨٠. Dunya xeyar e, tu nexwê wê xwe di texê
١٤٨١. Dunya xeyar e, ya bi te ra ye, ya di te ra ye.
١٤٨٢. Dunya zehmet* bê, mirinê rehmet* bê.
١٤٨٣. Dunya* qenc e ji şêra re, xweş milk e ji mêra re, ava bûye ji xêrê re.
١٤٨٤. Dûpişk bi yekî vedê, nalikê germ bikin û bi ser din.
١٤٨٥. Dûr be şêrîn be.
١٤٨٦. Dûr bigere bi saxbêrî vegere.
١٤٨٧. Dûr gerî nêzik dît.
١٤٨٨. Dûr here, durust were.
١٤٨٩. Dûrî bi nûr e.*
١٤٩٠. Dûrî çavan e, dûrî dilan e.
١٤٩١. Dûv î li hev dikevin: (*Dûv, ê ajal* û teba* ye, gavê kesek ji kombûn û civînê kesina xêli bê, nabêjê: Li hev kom bûne, yan li hev civîne, dibêje: Dûv î li hev dikevin*).

*K zehmet : zorî . giranî . dijwarî

*E rehmet : hilovanî . giravî.

*E dunya : cîhan . gerdon .

*E nûr : ronahî . rewşenî .

*K ajal : dehbe . dewar . teba.

*K teba : ajal . dehbe . dewar.

١٤٩٧. Dûv tê de dikutê: (*Gavê kesek dikevê nav xêr û bêrekê û ne bi dilê yekî dî bê, dibêje: Dûv tê de dikutê*).
١٤٩٨. Dûvê kerê ye, dilivê lê hlnabê.
١٤٩٩. Dûvê kûçik heft salan kirin qêlib ku rastbikin hîn movkek ket ser.
١٥٠٠. Dûvê qantirê ye, ne kin dibê, ne dirêj dibê.
١٥٠١. Dûvê rovî jêkî dîsa jî rovî ye.
١٥٠٢. Dûvî dinê dûvekî dirêj e.
١٥٠٣. Dûvî mişk di malê da bi ard nabê.
١٥٠٤. Dûvî xwe di tepka* de ruqiçandi ye.

E

١٥٠٥. Ebemil giş mêr bana, sersipî giş jin bana, dinê xera dibû.
١٥٠٦. Ecel* ku tê nade mecal*, .
١٥٠٧. Ecelê*biznê tê nanê şivên dixwe.
١٥٠٨. Edalet* ji ordiyan* xurtir e.
١٥٠٩. Ege riyê lawê te derketin, tê riyê xwe berdî.
١٥١٠. Eger hinek mirov ker nebin, wê qîmeta kera zêde bûna.
١٥١١. Eger mera guh bide xelkê, mera wê rêkê mala xwe şaş bike.
١٥١٢. Eger mera li ber avê çû, mera destê xwe davêje kevezê .
١٥١٣. Eger mirî melûn nebît, qebir* lê teng nabît.
١٥١٤. Eger ortaqi* rind bûya, wê du mêr bi jinekê bûna.

*K tepk : xefk . feq .

*E ecel : merg .

*E mecal : berge.

*E ecele : lez . mezma .

*E edalet : dademendî .

*K T ordî : yekîneke leşkeriye .

*E qeboir : gor . tirbe-

١٥١٠. Eger te xuliyek li serê xwe kir, qe nebe bila alîyekî porê te biqijile.
١٥١١. Eger tirî pir bû, li cem rûvî dibe qoriq .
١٥١٢. Eger tu çûyî ciyê biyanî xwe hebis bike wekî şêrê kavilan.
١٥١٣. Eger tu kê xwe bighînê dijminê xwe, ji destê wî re tu xwe nêzîk bike.
١٥١٤. Eger xêr bê welatekî. wê bighêje hemî cihê welat.
١٥١٥. Elo, birin li qazoqxin, jinê got ê: Ji min re kilê û neynikê ji bîrneke.
١٥١٦. Em bi Ebegewra qayil ne bûn, Ebesor jî bi me qayil ne bûn: *(Berê, li nav Kurmancan du cûre ebe hebûn, yek sor bû, digotinê: Ebê kizinî, ew eba zengîna li xwe dikir; eba din jî gewr bû, ew eba jî xizana li xwe dikir; îcar, xuya ye malik ne zengîne zengîn e, ku Ebesor pê qayîl bin û ne jî xizanê xizan e ku ew bi Ebegewra qayîl be, ev gotin di gelek waran da dihate gotin. Lê, bi taybetî di warê xwastina keçan da bi kar dihat).*
١٥١٧. Em bûn benîşt, ketin devê xelkê.
١٥١٨. Em çûn mala Fatê, Fat çû civatê.
١٥١٩. Em dixwin nanê sêlê, mêrik dixwe nanê êlê.
١٥٢٠. Em li mala fatêne, fat li mala xelkê ye.
١٥٢١. Em li pey bihna kebaba çûn, em rastî daxdana kera hatin.
١٥٢٢. Em ne ji malikêne, lê ji hewalikêne.
١٥٢٣. Em te dikin rum tu xwe dikî zixt*.
١٥٢٤. Em xursîne. ji malbatê em tivingcî ne. dwazdeh mal in sêzde risipî ne.

*T ortaq : hevbeş.

*K zixt : bismarê serê misasê ye.

١٥٧٥. Em zanin çaço biraziyê axê ye.
١٥٧٦. Embarê derda tune ne.
١٥٧٧. Emê li ebe dawşandinê*hesabî* xwe bikin. (*ango li dawiyê parvekirinê dextê li ser bêdera ji berko herkes li ser ebê xwe rûniştî ye, gavê radibin, carina razî, carina nerazî, û helbet hinek ka yan kêş bi ebê ve dimîne, lewma herkes ebê xwe dawdişîne û derin mal*).
١٥٧٨. Emelên* pîrê nayên bîrê.
١٥٧٩. Emrê ko çû nede dû.
١٥٨٠. Erd birinc be, av rûn be, ko xwedî tine be wê zû xelas be.
١٥٨١. Erdê têr bike, erd xwe dendar nahêle.
١٥٨٢. Erdê têr cot û bidar bike, erdê te têr nan bike.
١٥٨٣. Erdê têr tov bike erd wê te têr nan bike.
١٥٨٤. Erdê veqeliş û rûyo tê xuş: (*Carina, kesek ji ber karikî xwe ve yan karekî mirovekî xwe ve fedî dike û gelekî şermekar dimîne, naxwaze li rûyê kesî binêre yan kesek li rûyê wî binêre û wek mirinekê dixwazê û dibêje: Erdê, veqeliş, û rûyo, tê xuş*).
١٥٨٥. Erdekî hişk û asmanekî dûr.
١٥٨٦. Erdî rind nê didê.
١٥٨٧. Erdî xwe li ser desta ye, li ku baran barî li wira ye.
١٥٨٨. Erê pîr e lê fistanî xwe bi heft qirma* ye.
١٥٨٩. Erê, erê ye, na, na ye, erê na, bela ye.
١٥٩٠. Ereba dibên: Dên Kurdî, la yunkur û la yintî: (*ango kurmanc dênê xwe nadin lê înkâr* jî nakin*).

*K ebedawşandin : dawiyê .

*E hesab : jimartin . bîdav .

*E emel : kirin . kar .

*K qirme : çirtik . daşkandin .

١٥٤١. Ereb û tembûr.
 ١٥٤٢. Erzan kirî, heban dirî.
 ١٥٤٣. Eslê jinê jin e.
 ١٥٤٤. Eşq* meriyan har û dîn dike.
 ١٥٤٥. Eşqa dizan şeverêş in.
 ١٥٤٦. Eşqê* bor e bor e, ji wî were xelkî kor e.
 ١٥٤٧. Etar çi vê re be wê difroşe.
 ١٥٤٨. Etar e dil ji malê sar e.
 ١٥٤٩. Etar helawê* xwe naxwe.
 ١٥٥٠. Etar ji barê xwe naxwê.
 ١٥٥١. Ev lêlê ye hêj lolo li pê tê.
 ١٥٥٢. Ev şivana ji vî pezî ra pir e, ev gavana ji vê naxirêra pir e, ev giriya ji vî mirî re pir e.
 ١٥٥٣. Evîn derya ye, yê ku bidî nav, diçe av û av.
 ١٥٥٤. Ew çi ye diçînî, şînbibê tê bibînî.
 ١٥٥٥. Ew jî elimî tîrrê bin çenga.
 ١٥٥٦. Ew miriya, ne hêja ye wan giriya.
 ١٥٥٧. Ew newêre di eyarî xwe de bilve.
 ١٥٥٨. Ew riya te berê xwe da yê ez jê hatime.
 ١٥٥٩. Ewê destê xwe bêxe ber guhê xwe, ew dizane dê çi bêje.
 ١٥٦٠. Ewê ji te dûr dibe, reng bi te sor dibe.
 ١٥٦١. Ewrê te birûska wî dît jê netirse.
 ١٥٦٢. Ewrî xur-xur pir jê bê carina baran jê nayê.

*E înkâr : mendel. Înkarkir : da mendelê . li xwe nena . înkarnekir : li xwena . neda mendelê. Şemar .

* E eşq : evîn . sewda .

* E eşqê : evînê . sewdayê .

* E helaw : helaw. Gezebez .

1072. Ewrid reş vê baran nabin, sirtid bilind vê ba nabin, gelîd kûr vê av nabin, rindid gunda vê yar nabin.
1073. Extiyarî* dojecha jiyanê ye.
1074. Eyar di cîyî tenik re qukdibê.
1075. Eyarê bênamûsa fere ye.
1076. Eyarê berêz e ne derzî pêkanê ne şûjin.
1077. Eyb reş e şerm giran e.
1078. Ez axa tu axa, dewar ma bê gavan.
1079. Ez axa, tu axa, kî golika bibe nav baxa.
1080. Ez axe tu axe kî ê dewêr bajo.
1081. Ez bama, min ê li te we bikira: (*Merîkî xanedan û pîr zengîn hebû, Xwedê lê hat xezebê, di demê çend sala de tiştêk pê nehişt û tim jî mêrik bi nimêj û destnimêj bû, gihêşt qonaxekê nema kanî gotir kira; êvarekê, derket ber derî û li jor nêrî, û go: Ez bama, min ê li te we bikira!!!*).
1082. Ez bê ez tu bê ez wê kî here ber pez.
1083. Ez berê gul bûm baranê li min kir ez şil bûm.
1084. Ez bi şev lê digerîm, bi ro bi des min ket.
1085. Ez bi te, tu bi min, em tev de jî bi Xwedê.
1086. Ez biçûk bûm min nizanî, mezin bûm min nikanî.
1087. Ez çi dibêjim bilûra min çi dibêje.
1088. Ez çi dibêm tembûra min çi dibê.
1089. Ez çiya tu çiya, kî wê ji golik re here giya.
1090. Ez çiya, tu çiya, golik mane bê giya.
1091. Ez çûm bi lez, hatim bi bez.
1092. Ez dên dikutim, intinî ji te tê.
1093. Ez dengbêjim, diloka nabêjim.

*E extiyarî : kalbûn . pîrbûn.

١٥٨٥. Ez di kefçîk av de difetisim.
١٥٨٦. Ez dibêjim bira, tu dibêjî kirîv.
١٥٨٧. Ez dibêm hirç wa ye, tu dibê: Rêç va ye
١٥٨٨. Ez diz berdidim diz min bernadê: (*Dizek bi şev ket malekê, lawik pê hesî, got bavê xwe, bavê gotê: Herêyê, lawik çûyê û girt, û go: Bavo min girt, bavê gotê: Wîne vir, lêwik go: Nayê, bavê gotê: Berde û were, lêwik go: Bavo, ez wî berdidim, ew min bernadê*).
١٥٨٩. Ez gerîm û min dunya dot, li dawiyê vegerîm pêz û cot.
١٥٩٠. Ez hatime daweta te, tu hatiye diziya min.
١٥٩١. Ez hêdî diçim bela dighêje min, bi lez diçim ez dighêjim belayê.
١٥٩٢. Ez herim ser kaniyê, wê kanî hişk bibê.
١٥٩٣. Ez li ezmên li te digerîm, min tu li erdê dîtî.
١٥٩٤. Ez li ku dixim deng ji ku tê.
١٥٩٥. Ez mîr, tu mîr kî wê bibe wezîr.
١٥٩٦. Ez ne dikim nêçîrê, û ne dihêlim kew biçêrê.
١٥٩٧. Ez ne gihîştim te, ezê te bi xwe gînim.
١٥٩٨. Ez ne hêja me tenak genim, bi her kesî jî dikenim.
١٥٩٩. Ez ne hêştir im ku bi du ciyan şerjêbim (serjêbim).
١٦٠٠. Ez ne mar im, ku bi axê bidebirim*.
١٦٠١. Ez nebûm bûk û li kerê siwar ne hatim.
١٦٠٢. Ez pîr-pak jê xelas bûm.
١٦٠٣. Ez te dibînim te bi bîra xwe tînim.
١٦٠٤. Ez wezîr tu wezîr, kî dibe kizîr?.
١٦٠٥. Ez zanim û tu zane.
١٦٠٦. Ezê ji kîs* xwe nên bixum û aqila bi xelkê dim.

*E bidebirim : bijîm .

1607. Ezê pir buxum, zikî kê jî dêşê bila bêşê.
 1608. Ezê te tî bibim ser avê û tî vegeînim.
 1609. Ezmanê birrîbe seriyê vehesayî be.
 1610. Ezmanê dirêj darkokê serê xudanî ye.
 1611. Ezmanê dirêj darkûkê serê xwudanî xwe ye.

Ê

1612. Ê berê çû seferê*
 1613. Ê bi ar* ji xwe fedî dike, yê bê ar dibê ji min ditirse.
 1614. Ê bi birîn xewkir, ê birçî xwe nekir.
 1615. Ê bin sekinî, ê ser ne sekinî.
 1616. Ê birçî çû civatê, ê tazî neçû yê .
 1617. Ê birçî çû dawetê, ê tazi li mal ma.
 1618. Ê bû hevalê mirîşkan, ê biçêrê li ser herîşkan* .
 1619. Ê çê di me nagere, ê xerab ji me nagere.
 1620. Ê çê me nabîne, ê xerab jî ji me namîne.
 1621. Ê destê wî bilind e, serê wî bilind e .
 1622. Ê devê wî bi şîr şewitî bê, pif dêw dikê.
 1623. Ê dirnaqê* mera bikin, dê û bavê mera nakin.
 1624. Ê diz be, şev pirin.
 1625. Ê diziya hingiv bike wê mêş pêvedin.
 1626. Ê ewîlêd xwe hene bila loma li gidiya nekin û id qîzid xwe hene bila loma li reviya nekenin.
 1627. Ê fikra* pir kir, xwelî li serê xwe kir, mezîl* li xwe kin kir.

*E sefer : çûndin . çûna rêyek dûr.

*K E bi ar : fedok .

*K herîşk : sergo .

*T dirnaq : nêûk.

*E fikir : raman .

*K mezîl : temen . jî .

١٦٢٨. Ê giya li gazê, ê te li boxazê.
 ١٦٢٩. Ê havînê serê wî keliya, zivistanê qaska wî dikele.
 ١٦٣٠. Ê here masiya divê qûna wî şilbibe.
 ١٦٣١. Ê ji derve hatî yê hindur derkir.
 ١٦٣٢. Ê ji min bê wê li ber tifika min bê.
 ١٦٣٣. Ê ji şîr tirsî, pife dêw dike.
 ١٦٣٤. Ê jina xwe berde, li çogên sipî napirse.
 ١٦٣٥. Ê jinê berde li pani yê nanêre.
 ١٦٣٦. Ê ko deva xwedî bike deryê xwe bilind dike.
 ١٦٣٧. Ê ko deveyan bikire divê serdara xaniyê xwe bilind bike.
 ١٦٣٨. Ê ko dipirse ditirse.
 ١٦٣٩. Ê ko dîzekî çêbike, dizane çembilekî* jî pêve bike.
 ١٦٤٠. Ê ko gelaciya li ba te bikê, wê gelaciya te jî li ba xelkê bikê.
 ١٦٤١. Ê ko here nêçîra masiya wê qûna wî şil bibe.
 ١٦٤٢. Ê ko li dawiyê bikenê rast e.
 ١٦٤٣. Ê ko sifra bavê xwe nedîbê lome* lê nabin.
 ١٦٤٤. Ê ku bi şora jinê be, wê li sira mirinê be.
 ١٦٤٥. Ê ku guh bide şora jinê, wê bibihîze xebera mirinê.
 ١٦٤٦. Ê ku mir, çavreş dibe .
 ١٦٤٧. Ê kurmi bi ê kêl kenî.
 ١٦٤٨. Ê kuspê dikute bi du qurşa ye, ê ko jê re ha ho dike bi çar qurşa ye.
 ١٦٤٩. Ê lê gerî, tê gerî .
 ١٦٥٠. Ê li hespê xelkê peyaye.
 ١٦٥١. Ê ma li benda salê, wê li benda mehê jî bimînê.

*K çembil : qulp .

*E lome : gazine . tilf .

١٦٥٢. Ê mêr pê dadayî xew kir, ê birçî xew ne kir.
 ١٦٥٣. Ê mera riswa dike ziman e, ê mera distrîne
 ziman e.
 ١٦٥٤. Ê mera xera bû, xenzîr* tèn di hewşê mera de bi
 hev digrin.
 ١٦٥٥. Ê ne ji makê, nabe ji mêlakê.
 ١٦٥٦. Ê ne ji malekê nizani bi hewalkê*.
 ١٦٥٧. Ê ne li mala mera, nizanê rewşa mera.
 ١٦٥٨. Ê pê zanî kuftak xwe hilanî, ê pê nizanî kufta des
 xwe danî.
 ١٦٥٩. Ê pey ket digre, ê dinale dimire.
 ١٦٦٠. Ê qurre bê, kera wî li çolê dimînê.
 ١٦٦١. Ê rind dijminê xwe pîrr in.
 ١٦٦٢. Ê rind dijminê xwe pîrr in.
 ١٦٦٣. Ê rind vê yar-dost nabin, ê pîs jî vê derd-kul
 nabin.
 ١٦٦٤. Ê savar çand jî mir .
 ١٦٦٥. Ê sebirî* debirî.*
 ١٦٦٦. Ê ser sekinî î bin nasekinê.
 ١٦٦٧. Ê tirrek kom kir, ê fisek bela kir.
 ١٦٦٨. Ê vî ne bigre, ne berde (pê bawerî nabe).
 ١٦٦٩. Ê zimanê xwe kurt, ciyê xwe girt.
 ١٦٧٠. Êgir li ser piştê dade li xwe nanê.
 ١٦٧١. Êl yaman e* lê beg yaman e.
 ١٦٧٢. Êlek li me bi darxist: (*Heroj bi êlekê êrd (ard) dibêjin
 û dibin bi sing va dardixin, qey kesin xwîngiran*)

*E xenzîr : beraz.

*E hewal : rewş .

*E sebirî : arimî . xwe ragirt .

*E debirî : çareserbû .

*K yaman : xurt . hêzdar .

hatine malekê û neçûne ta ardê malikê xelas bûye; gavê ard nemînê herweha êlek jî bi sing va darxistî dimînê, lewre dibêjin: Êlek li me bi dar xistin, ango ardê me xelas kirin).

١٦٧٣. Êmo ya şikakî rojê bi awakî.
 ١٦٧٤. Ên ne ji hinava, nayên ber çava.
 ١٦٧٥. Ên nuh hatin, ên kevn xelat in.
 ١٦٧٦. Ên xêrê nayên dêrê*.
 ١٦٧٧. Ênişte bi gepirê girt û lênişte.
 ١٦٧٨. Êş xwediyê xwe têşîne.
 ١٦٧٩. Êşa tiliyê wek derdê hewiyê.
 ١٦٨٠. Êvara çekirinê qaliqî pîvazê ber derî neçê ye.
 ١٦٨١. Êvara rijandinê avê germ ko pê serî hatine şuştin berderî neçê ye.
 ١٦٨٢. Êvarêd îne meriyan têrnakin.
 ١٦٨٣. Êzdî baweriyê bi sûndê tênin.
 ١٦٨٤. Êzdî bê simbêl nabe.
 ١٦٨٥. Êzdî bi simêla tê naskirin .
 ١٦٨٦. Êzdî kirasê sipî ye gereke deq lê nekevin.

F

١٦٨٧. Falên qereçiya wek hev in.
 ١٦٨٨. Fata por bi rişk e, bi quroşekî paleyê diçinê bi du quroşa quncirka ji xwe jê dike.
 ١٦٨٩. Fata şikakî carê bi awakî.
 ١٦٩٠. Fêda gavana, siwarbûna kera ye.
 ١٦٩١. Fêda şîrê kêçê li dengizê dibe.
 ١٦٩٢. Fêda* gavana, niyandina kera ye.
 ١٦٩٣. Fêdê vî çavî li vî çavî nabe.
 ١٦٩٤. Fêdê vî destî li vî destî nabe.

*K dêr : kenişt .

*E fêde : sode. Hode .

١٦٩٥. Felek, hinek qawîna dixwin, hin jî keleka.
١٦٩٦. Feqîr (xizan) çûn xwe daleqînin, dîtîna ko dewlemend li badibin.
١٦٩٧. Feqîr çû diziyê, hêv neçû ava.
١٦٩٨. Feqîr çû diziyê, heyv ji êvar de derket.
١٦٩٩. Feqîr dêst davên şûr.
١٧٠٠. Feqîr e*, lê bi şûr e.
١٧٠١. Feqîr* çûn xwe daleqînin, dîtîna ko dewlemend li badibin.
١٧٠٢. Feqîro tim bê te rûyê xwe reş kir, rabe ser kab û nîvê.
١٧٠٣. Fermana deva hat rovî baz da.
١٧٠٤. Fêtokî (fedokî)li mêran nayê, kenokî li jinan nayê.
١٧٠٥. Fikir*çi be, zikir* jî ew e.
١٧٠٦. Filan kes rêka dipîve: (*virde wêde digere û kara nake*).
١٧٠٧. Filakî bi xêr, ji birakî bê xêr çêtir e.
١٧٠٨. Filan kes bê diçine: (*ango dîn e, tewtewe ye, tê difirîne*).
١٧٠٩. Filan kes ben-pîştê xwe tune ye (*ewlebûn pê nabe*).
١٧١٠. Filan kes çîçeka bervero ye.
١٧١١. Filan kes cila helisi ye.
١٧١٢. Filan kes cila şil e.
١٧١٣. Filan kes di kevçiyek av de difetisê .

*E feqîr : xizan .

*E feqîr : xizan.

*E fikir : raman .

*E zikir : cezbe .

١٧١٤. Filan kes dipijiqe wek encûrê kera. (*ango gelekî rû thel û tîrş e*).
١٧١٥. Filan kes dûvê qantirê ye ne kindibe ne dirêjdibe.
١٧١٦. Filan kes ger kumê serê wî kesk bibe jî, şor jê nayên bawerkirin .
١٧١٧. Filan kes gewriya xwe dûz e .
١٧١٨. Filan kes golkê henî-beşe (*naskiriye*).
١٧١٩. Filan kes gur e ewê diye.
١٧٢٠. Filan kes î bin teşte ye (*qird, mar, î ne çê*).
١٧٢١. Filan kes ji bizina re çû nêrî.
١٧٢٢. Filan kes kera dixesîne .
١٧٢٣. Filan kes kerê bar e.
١٧٢٤. Filan kes kerê ji bergîra re dikêye.
١٧٢٥. Filan kes kerrika dicû (*şorêd boş dikê*).
١٧٢٦. Filan kes kevrê binê bîrê ye.
١٧٢٧. Filan kes kevrî hewre ye çik nade: (*ango ne mêr e, ne no ye*).
١٧٢٨. Filan kes kîrê Adem e .
١٧٢٩. Filan kes kora difetsîne (*qoneke*).
١٧٣٠. Filan kes kûçika nal dike (*bêkarî*).
١٧٣١. Filan kes lingekî xwe li wê dinê ye, yekî li vê dinê ye (*bi awakî nêzikê mirinê bû ye*).
١٧٣٢. Filan kes manga bi ga ye.
١٧٣٣. Filan kes marê bin zik-zer e.
١٧٣٤. Filan kes mirîşka gêj e.
١٧٣٥. Filan kes miya fisine ye.
١٧٣٦. Filan kes neynûk tune xwe pê bixwerîne.
١٧٣٧. Filan kes pirrî bi kelema de berdide (*ango dîn e*).
١٧٣٨. Filan kes pisîka dûv bi agir e (*diçe ku wir agir dike*).

١٧٣٩. Filan kes pûş pan (pehn) dike: (*gavê kesek qûnê xwe dide xwe, li ser zik û li ser pûş dirêj dike, îca pûş di bin de pan dibe. Yan ji karkispekî xwe nake her li ser pûss rûnmisstî ye*).
١٧٤٠. Filan kes pûş bela dike: (*ango gotinên vala û ne baş dike*).
١٧٤١. Filan kes sepetê xwe sêreke (*bê hiş e, derewîne. fortêk e*).
١٧٤٢. Filan kes teniya bi done (*teniyê bi don zû ji mera nare*).
١٧٤٣. Filan kes tiştî nake hewşê (*naponije nafikire*).
١٧٤٤. Filan kes vingving a mêşê di kundir deyî: (*tiştekan jê nayê têgihêştin*).
١٧٤٥. Filan kes wekî kurka tim di ser hêlinê (hêkê) de ye.
١٧٤٦. Filan kesê qey kezeba gur xwariye.
١٧٤٧. Filan kesî çêlkên xwe xwarine.
١٧٤٨. Filan kesî derpiyê xwe di govendê de naskir .
١٧٤٩. Filan kesî wek tu mûyekî ji nav hêvîr bikşînê ez ji nav çopilmê derxistim.
١٧٥٠. Filan kesî: tu bi pera bikirî û bi kevra bikuji.
١٧٥١. Filan keso bû ye gurê dev bi xwîn.
١٧٥٢. Filan keso çav li dere.
١٧٥٣. Filan keso çav li roja reşe.
١٧٥٤. Filan keso koremar e.
١٧٥٥. Filan keso mêş jê naêşe.
١٧٥٦. Filan keso reşkê şevê ye.
١٧٥٧. Filan kes pirr tê difirîne.
١٧٥٨. Filan kes ne ji defê re ne ji zurn ê re dibe.
١٧٥٩. Filan kes bînî (wekî) mûyekî ji mêst derket .
١٧٦٠. Filan kes di kevçiyek av de difetisê .

١٧٦١. Filan kes dûvê qantirê ye ne kindibe ne dirêjdibe.
 ١٧٦٢. Filan kes ger kumê serê wî kesk bibe jî, şor jê nayên bawerkirin .
 ١٧٦٣. Filan kes gewriya xwe dûz e .
 ١٧٦٤. Filan kes kerê ji bergîra re dikêye.
 ١٧٦٥. Filan kes kerrika dicû (şorêd boş dikê).
 ١٧٦٦. Filan kes kîrê Adem e .
 ١٧٦٧. Filan kes marê bin zik-zer e.
 ١٧٦٨. Filan kes pisîka dûv bi agir e (diçe ku wir agir dike) .
 ١٧٦٩. Filan kes rêka dipîve (virde wêde digere û kara nake).
 ١٧٧٠. Filan kes teniya bi done (teniyê bi don zû ji mera nare).
 ١٧٧١. Filan kes tiştî nake hewşê (naponije nafikire).
 ١٧٧٢. Filan kes vingving a mêşê di kundir deyî (tiştekek jê nayê têgihêştin).
 ١٧٧٣. Filan kes wekî kurka tim di ser hêlînê(hêkê)de ye.
 ١٧٧٤. Filan kesî çêlkên xwe xwarine.
 ١٧٧٥. Filan kesî wek tu mûyekî ji nav hêvîr bikşînê ez ji nav çopilmê derxistim.
 ١٧٧٦. Fincek bi canî, yek bi pîrî.
 ١٧٧٧. Fiqare fiqara* bibin. parsekê jê bibin.
 ١٧٧٨. Fîrfirka li ber til e çep û rast diftile.
 ١٧٧٩. Firra mirîşka ta enîşka.
 ١٧٨٠. Firra mirîşkê ta kadînê ye.
 ١٧٨١. Fis di nav sisiya de wînda dibe.
 ١٧٨٢. Fis kir gû derket.

*E fiqare : xizan .

١٧٨٧. Fîstanê qîza sor e, çavê xorta kor e.

١٧٨٨. Fîšto qîçik li ku hîsto.

١٧٨٩. Fîšto qîçik li şûn xwe hîsto.

G

١٧٨٦. Ga bide gamiriya, jina bide jinmiriya.

١٧٨٧. Ga dikeve kêr pir dibin.

١٧٨٨. Ga dimirê çerm dimînê, merî dimirê nav dimînê.

١٧٨٩. Ga diziyê dibê: gurê feqîr xarî.

١٧٩٠. Ga jî bikêlê golik jî bi kêlê: (*Li gunda naxir (garan)*

heye yek ji xizanên gund derê ber naxirê, dibêjinê: Gavan, îca hev gavana serê her dewarekê çî ga bê çî golik bê çî ker bê kêlek za distînê, loma çî tiştê di zik hev da bê, dibêjin: Ga jî bi kêlê, golik jî bi kêlê, û şeş mehên di sermê de jî jîna gêvên herroj serê sibê derê ji her malekê nanek xwe tînê, mala gêvên ew nanina giş nedixwarin, têra xwe radikirin, ê din jî li ba cînara bi pêxur digewirîn wek nok-nîsk û h d).*

١٧٩١. Ga ku mir, gagera pir dibin.

١٧٩٢. Galgala ko ket nav dev û dirana, wê bigere li bajar û şaristana.

١٧٩٣. Gava dê bibe damarî, bav dibe filê gavarî.

١٧٩٤. Gava hebê mêvan î, ger tinebe golikvan î.

١٧٩٥. Gava kûçik bezya gur, gur mir.

١٧٩٦. Gava mêvan tîn pehra xwe jî bi xwe re tînin.

١٧٩٧. Gava xêr dibare gûyê sêwî ya tê.

١٧٩٨. Gava xwe li gor lingê xwe bavêje.

١٧٩٩. Gava xwedê bide ha rakeve, ha rakeve, gava nede ha li bakeve, ha li bakeve.

١٨٠٠. Gavan bê axe nabe, lê axe jî bê gavan nabe.

١٨٠١. Gavan ber bi mal e, jina gavan şixulkar e.

*E kêl : kodik .

١٨٠٦. Gavê pîrek hêvîr distirên, ger hevîrin ji nav destan bipekê, mêvanin wê malê li gor bîr û baweriya Kurda wê bên.
١٨٠٧. Gavê zarokê kesî çê bû, kêrekê bi qundaxê* zarok da girêdin ji bo meçêtir wî zarokî li gor bîr û bawerî Kurda negewirin.
١٨٠٨. Gavkirinê di ser landikê ku zarok tê da xewkirî ra ne çê ye.
١٨٠٩. Gawir li hember zulmê* misilman dibin.
١٨١٠. Gawirî qert misilman na be .
١٨١١. Gawir-misilman jina didin hev.
١٨١٢. Gayê bor re, fitek mane ye.
١٨١٣. Gayê çê bi boran, mêrê çê bi xeberan.
١٨١٤. Gayê dîn tim gulike, mêrê dîn tim zaroke.
١٨١٥. Gayê enî beş e, kuda herê nav li dû duxuşe.
١٨١٦. Gayê enî beş e.
١٨١٧. Gayê qut e, ne mêşa li ser xwe kiş dikê û ne jî li ser hevala.
١٨١٨. Gayê sor sorîtiya xwe bernade.
١٨١٩. Gayê zexel e, timî li mexel e.
١٨٢٠. Gayên qelp nîran dişkînin.
١٨٢١. Gayî kor li şûn afira* dimînê.
١٨٢٢. Gayî me di cot da guh medê, lê di mozê* da bavekî kal e.
١٨٢٣. Gayî moro mila min tu bifrota û eyb û uzrid te hewaldana: *(Ticar hatî gayê mor bikirê, lê ti tiştî gayî mor baş nîne, ticêr çi ji ser gayî ji xwedên*

*K qundax : pêçeka zarokan .

*E zulm : sitem .

*K afir : alif . ciyê dewar têde dixun .

*K moz : mêşik e ga jê ditirsin .

pirskir, got: Baş e û pesin da, hîn mêrik gê dipesinê, kutrepik di axirê de hat, rabû çû, axirê dît ku gayê mor dewar giş li ser afira derkirine û bi yanperiyê xwe dayî pêş afira û bi tenê êmê dewêr dixwe, mêrik çend misas pêrakşandin û got: Gayî moro, mila min tu bifrota û eyb uzrid te hewaldana).

١٨٢٠. Gayî pîr, di nav cwanega da, ji tirsê qûnê xwe ra boxaniyê dikê.
١٨٢١. Gaz gaza te ye, caw cawê te ye.
١٨٢٢. Gazid bilind bê ba nabin.
١٨٢٣. Gazinid bûkê ji xwasiyê ne.
١٨٢٤. Gaziya dû siwaran, naghîje xweyê xwe.
١٨٢٥. Ge saz, ge soz*.
١٨٢٦. Gelekî ne şêrîn be, tu wê li dilê hevalên xwe xînê.
١٨٢٧. Geliyid kûr bê av nabin.
١٨٢٨. Genim ket çala, çetin tê mala.
١٨٢٩. Genimê yekî dişewite, ê fuqare got: Welle, başaq ji dest me çûn.
١٨٣٠. Ger aqil bi pera ba min aqilikê ji kerê xwe ra bikiriya
١٨٣١. Ger bi kesî nikane, bila li te neqewime.*
١٨٣٢. Ger bi sertiya biba heso wê aş bigeranda.
١٨٣٣. Ger bi şev bû ewr û bi roj bû sayî, xwezî bi yê ku manga wî zayî; ger bi şev bû sayî û bi roj bû ewr, xwezî bi yê ko manga wî stewr.
١٨٣٤. Ger bi şuştinê sipî biba masiyê sipî biba.
١٨٣٥. Ger bi xewê biba Kêsefis ê maleka xwe çê kira.
١٨٣٦. Ger bi xewê tiştekan bi serketa kûsiyê bi serxista.
١٨٣٧. Ger bidarî te kete çêle, buxwe û meçîne.

*T soz : peyv . axiftin . denkirin .

* neqewime : hêrs ranebe .

١٨٣٨. Ger birha te ya rastê buxurê, kesek bi qencî çêra te dibê , ger ya çepê buxurê, kesek bi neqencî çêra te dibê.
١٨٣٩. Ger bulxurî te kêmbê hinekî jê bifroşe û pê rûn bikire.
١٨٤٠. Ger bûm xwarina cinawira, bila şêr min bixwin ne rovî.
١٨٤١. Ger çêlî* jinekê bi tivingekê ket, nanek sêlê qulkin û çêl carî wê tivingê tê ra derbaz kin, tivingê li gor bîr û bawerî Kurda wê nîşanê bigrê.
١٨٤٢. Ger cixarê tê bi alîkî şewitî, wer zanibe çûndinê rêyekê li ber te ye.
١٨٤٣. Ger def neyê ber gopêl* , îş bêlî nakin.
١٨٤٤. Ger dev ne devê te ye, çima tu deyn dikê.
١٨٤٥. Ger dewlet hate serî, bizirê wek kerî, wê bêjin ev çiqas xweş merî, û ger dewlet çû ji bal ê û şora bike bi mitqalê wê bêjn ev mirovekî nayê fesalê* .
١٨٤٦. Ger di çûkayî de li zarokên xwe nexî, tê bi mezinî li kabokên xwe xî.
١٨٤٧. Ger di riya avê de dişkê, pêlên mayî ji yên bihorî bêtir in.
١٨٤٨. Ger dî, ezim, ger ne dî, dizim.
١٨٤٩. Ger dîkî te çû, gi tu nedê dû, beran û gayid te ê bidin dû: ***(Rojekê, dîkê malekê winda bû, kalê malê gote lawên xwe : herin, dîk bibînin; lawa guh nedayê; piştî çend rojan beran winda bû, kalê got: Herin dîk bibînin, piştî çend rojan ga winda bû, kalê got: Herin***

*K çêl : piştî jin dizê çêl rojî di nexwaşî çêl de dimîne .

*K gopêl = gopal : darê ko pê li defê dixin.

*K E nayê fesalê : ne li gor xwastekê ye .

dik bibînin, lawa go: Rast e, ger me daba dû dik, beran û ga nediçûn).

۱۸۰۰. Ger dikî te dizîn tu nedê dû ga û beranêd te wê bidin dû.
۱۸۰۱. Ger dikî te dizîn tu nedê dû ga û golkêd te wê bidin dû.
۱۸۰۲. Ger dostî te dimis bê jî gişî melêse.
۱۸۰۳. Ger êrganbê mire, bi jinbê wezîre, bavbê kizîre.
۱۸۰۴. Ger gir bibên em çiyar e, wê golik jî bibên em gan e.
۱۸۰۵. Ger goşt girane, nexwarin erzane.
۱۸۰۶. Ger gumîn bi guhê te kevê, kesek çêrê te dibê
۱۸۰۷. Ger hat hê hê ke ger çû di pê ke: **(hê hêkirin dengeke pê ban bizna dikin).**
۱۸۰۸. Ger hate ber tu bide der, û ger hate der tu bide ber.
۱۸۰۹. Ger hate ber, dest bide ser.
۱۸۱۰. Ger ji malê pir, hate ser kavirê kur ew jî ne lazim e.
۱۸۱۱. Ger kanî sêlî bûn, cok jî wê sêlî bin .
۱۸۱۲. Ger keç çûn mala mêrê xwe, mila ji bîrbikin xesyeta mala bavê xwe.
۱۸۱۳. Ger ker heşimî, ji hespa bezotir dibin.
۱۸۱۴. Ger kesek bixwazê hespekî ji mehînek bergîr bigirê divê ta heft zikan tim caniyêd wê mehîne bergîr ji hespan bikşîne zikî heftê wê bibê hesp.
۱۸۱۵. Ger kundek bixwîne û deng here kundekî din û ew kund nexwîne, ew kunda li gor bîr û bawerî Kurda wê bimirê.
۱۸۱۶. Ger li deriya nexê derî venabê.

١٨٦٧. Ger mezin di mala de tine bin, kevrekî mezin wînin û di malê de dînin.
١٨٦٨. Ger mî ket deve di zikke ranabê deve bikevê miyê di zikke deveyê rabê.
١٨٦٩. Ger mirin hat li kal û cana napirsê.
١٨٧٠. Ger mirov li masiya bêt, qûna mirovî dê terr bît.
١٨٧١. Ger mirov xirapa nebîne, başa bi bîr nayîne.
١٨٧٢. Ger ne fen e, ev çi ben e.
١٨٧٣. Ger nebî kûçik, peran naxî hûçik.
١٨٧٤. Ger pîjik di ber nênkid yekî re derkevin, hingulîskek tûncî bila di pêçî xwekê, ew pîjik li gor bîr û bawerî Kurda wê jê herin.
١٨٧٥. Ger pîrek hêvîr bistirên helbet wê kûnê xwe jî bilivînin
١٨٧٦. Ger pisîkê mişkekî xwe girt bêjinê pisîka me şêrekî xwe girtî ji bo dranê pisîkê netevizin.
١٨٧٧. Ger qadî *nebin, kumî xwe bike qadî.
١٨٧٨. Ger rabûnek miriyan heba, wê bi şuştinê rabana.
١٨٧٩. Ger rûmetî di mûyan de bûya, wê bizin hilfiryana asmana.
١٨٨٠. Ger şêr kaldibe, dibe qeşmerê roviya.
١٨٨١. Ger sêwiya xêr bidîta roja îdê zik nedêşan.
١٨٨٢. Ger simêlê lawa biderketin gerek bav simêlê xwe kur kin.
١٨٨٣. Ger te derbek danî, zerbekê nebîne.
١٨٨٤. Ger te fîlerê xwe êxistin û li hev siwar bûn, wer zanibe çûndinê rêyekê li ber te ye.
١٨٨٥. Ger tê xweliyê li xwe bikî, bila xweliyek germ be.

*E qadî : dadwer .

۱۸۸۶. Ger tirs nebê, her kes ê xwedêyekî xwe ji heriyê çêkê.
۱۸۸۷. Ger tu bixwazê mêşêd te û hingiv pir bibin, yekê bikir, yekê bixwaz, yekê bidiz û dîne ba hev wê pir bibin.
۱۸۸۸. Ger tu çû mêvantiya gura, kûçkê xwe bi xwe re bibe.
۱۸۸۹. Ger tu çû sulhetikê* bila silhetiya mêra bê, ger tu çû xwestinekê bila xwestina jina bê.
۱۸۹۰. ger tu dizbî, şevên reş gelekin.
۱۸۹۱. Ger tu nizanibê ji yekî zanê pirske.
۱۸۹۲. Ger tu pera li erdê bibînê jî bijmêre.
۱۸۹۳. Ger tu rovî ye, ez serê dûv im.
۱۸۹۴. Ger tu yekî di xewnê da bibînê, balgiyî xwe wergerîn, wê ew jî te di xewnê da bibînê.
۱۸۹۵. Ger xecobext* bi kesî bigrê ta heft ker reş nezirin bernadê.
۱۸۹۶. Ger xwedê bi tedê nabê tu lawê kêye.
۱۸۹۷. Ger xwedê da, kes nikanê bistînê.
۱۸۹۸. Ger zarokek bi ser-binî maha* ket, piştê desta yan jî eniyê çatkî tenikin wê çê bibê.
۱۸۹۹. Gerandin (gerr)derman e, risq* li ser piyan e.
۱۹۰۰. Gere çar litir qûna mere hebe, mera karibe bi çar qurişa tê de cî bide.
۱۹۰۱. Gereke lîwanê devî meriyan hebê, ji bo her şorekê nekê.
۱۹۰۲. Gereke mirov dost û dijminî xwe li serhev derkê.

*E sulhetî : li hevanîn

*K xecobext : pîra perdasa .

*K serbinî maha : nexwaşiyek zaroka ye

*E rizq : rojîn . rozîn .

١٩٠٣. Gereke mirov şa nebê bi malê gir û hûr û ne bi gerdenê stûr.
١٩٠٤. Gêrik per didin mirinê wan tê.
١٩٠٥. Gêrik per didin, dimirin.
١٩٠٦. Geriyam li dinê*, xelas* nebûm ji mirinê.
١٩٠٧. Geriye diriye.
١٩٠٨. Germ e, cil şerm e; sar e, cil yar e.
١٩٠٩. Gêrmiya kundir e, ji qe çêtir e.
١٩١٠. Gêrmiya xwe kiriye, û kefçiyê xwe pê hilpesartiye.
١٩١١. Gêrre bi golkan nabe.
١٩١٢. Gerriye û dirriye.
١٩١٣. Gi bi nirînê têr bixara kûçka wê têr bixara.
١٩١٤. Gi di ber dimsî pêximber ra derbasbê wê bêçiyê xwe vêxê.
١٩١٥. Gi min bi te nikanî ma ez bi xwe jî nikam.
١٩١٦. Gi ne ji fesada* ba, roviyê li çarşiya bigeriya.
١٩١٧. Gi ne ji milawisa bê gur û mi wê bi hevra biçerin.
١٩١٨. Gi te pişt xar kir, êd kevra di ser te kin pir in.
١٩١٩. Gi werê qerezê, ti kes nikanê bi derbo re bibeze.
١٩٢٠. Gilalêd*kesî bikevin bira herê ba jinek ku li tiyî xwe vegeriye wê ew jinik dawê ungilkê* xwe di qirkê kê û heft caran veçengirînê û car bi car nexwaş wê ixkê û tifikê li gor bîr û bawerî Kurda wê çêbibê.

*E dinê : cîhan . gerdon .

*E K xelas nebû : riha nebû .

*E fesad : gelac . milawis .

*K gilale : behîvok .

*K ungilk : pêşdaw .

1921. Gilgil* ne ti ware lê jê bêtir nîne.
 1922. Girara mêran bi hemd dikele.
 1923. Gîsnî bi kar ne yê. zingar digre.
 1924. Giya di bin tehtan de namînê.
 1925. Giya di bin kevra de namîne.
 1926. Giya li ser kokê xwe şîn dibê.
 1927. Giyayê qeraca, malê muhtaca.
 1928. Giyayî hewşê tehl e.
 1929. Go: Erebê çima quzê te reş e, go malê min ev e.
 1930. Go :Koro tu çi dixwaze go çav.
 1931. Go: Çi li wê dinê heye ? Go: Tu qantirên
 karwancî netirsînê, tiştek li wê dinê nîne .
 1932. Go: Filan kes çiyê? Go: Dîrakê belanê ye, çira bi
 ro ye, piraka wî acî avê ye, û singê di kayê de ye.
 1933. Go: Guro, ji te re namîne, lê çibikim ez bê ker
 mam.
 1934. Go: Heye herame, û tune wêrane.
 1935. Go: Kerê: sîpakî te bû? Go: Heywax, êmê min
 kêmbû, û barek li ser min zêdebû.
 1936. Go: Pisikê, gûyê te dermane Go: Firî çû ezmana.
 1937. Go: Seriyê tu ji ber çi diêşî ? Go: Ji ber zimên .
 1938. Go: Ziyaretê min gelek caran bi derewa bi te
 sûndxwar, go: Min jî gelek caran mal li te
 xerakiriye, lê tu bi xwe nizanî.
 1939. Goçero, bide awê xwe yî berê.
 1940. Golikê beş, ma li devê deriyê reş.
 1941. Golkê bi du-sê makan carina birçî jî dimînê.

*K gilgil : çûrek garis e.

1957. Golkêd virnî* li şûn maka dimînin û diurrin dibên em jî gan e, sêwi-sêwlek li oda rûdinin dibên em jî peyan e.
1958. Golkek navî naxirekê pîs dikê.
1959. Golkî malê ji ga yî malê natirsê.
1960. Gora kerê, zikê gur e.
1961. Goreyî dêv silê lêxe.
1962. Goreyî rû şeqamê lêde.
1963. Goreyî welo tiving bes e.
1964. Goşt bê hestî nabê.
1965. Goşt bi kutanê pir nabê.
1966. Goştê xwe nespêre kidika.
1967. Goştî alî dûv mexwe. (*mêvanekî bi ûd û rêz bata malekê. Helbet kesin jî vê re dihatin û kesin jî gund jî li gor reweşt û tîtalên kurdî dihatin civatê û mazovan qurbanek jê re şerjêdikir û sing û seri yê wê qurbanê datanî ber mêvanê mezin û goştê din jî datanî ber mêvanên din û bi kêf û xwaşî bi hv re dixwarin*).
1968. Goştî belaş nabe şîv.
1969. Goştî destid xwe buxe, malî sêwiya mexe.
1970. Goştî diziyê naxwê, lê nanî xwe bi avşorkê goşt duxwê.
1971. Gotinê ji xwe meztir meke.
1972. Gotin em te têxin cinetê, got, roj ne xweş e.
1973. Gotin feqîro! çima xizanî, got, ji nezanî.
1974. Gotin filankeso baş e, çû di curnê gund de rî.
1975. Gotin guro: çira stûyê te qaling e, got, ez bi destî xwe dikim û bi devî xwe jî dixum.
1976. Gotin jojî, were ser xelîçê, go, bi girnîş e.

*K virnî : dewarî dereng dizê .

1962. Gotin kerengo ciyê te li ku ye, got, ba zanê baran zanê.
1963. Gotin kitkê gû yê te derman e, rabû rît û ax rada ser.
1964. Gotin koro te çi divê, got, çavek.
1965. Gotin koro tu li çi digerê, got: li du çav wek lep.
1966. Gotin kûçik: tu kanê bibezê û birewê got: Ez nikam du karan bi hev ra bikim.
1967. Gotin orispiyê çima avis nabî got, yek çê dike deh xira dikan.
1968. Gotin pisiyê: pîsiyî te derman e, çû pîsiya xwe veşart.
1969. Gotin qantirê: Kî bavê te ye, got: Hesp xalê min e.
1970. Gotin roviyo çima xwe dihezîni got: Li min tê û jimin tê.
1971. Gotin roviyo me tu kir serokê mirîşka rovî go: Ma karekî din li ba we tine bû.
1972. Gotin tu ji kuderê ye, got: Ez hîn nezewicîme.
1973. Gotin, heye zêr e gotin jî heye ava cêr e*.
1974. Gotin, heye zêr e, gotin jî heye zêhêr e.
1975. Gotin: Singo tu çu derê vê erdê hişk. Go: Ji çagût pirskin.
1976. Gotina bikeve nav du lêvan, dikeve nava du gundan.
1977. Gotina çolan bavêjin golan.
1978. Gotina jinê, dawiya dinê.
1979. Gotina paşî berî ya pêşî nebêje.
1980. Gotina rast bi mirov ne xwaş tê.

*K cêre . cere : kûp . kûz .

١٩٨١. Gotina rast sûnda naxwaze.
١٩٨٢. Gotina xweş bihara dila.
١٩٨٣. Gotina xweş mara ji qulê derdixe.
١٩٨٤. Gotine kerê, ka em te bibin cinetê, got: Gevzek li wir heye.
١٩٨٥. Gotinê pêşî bibêje paşê bêje.
١٩٨٦. Gotinê pîs zû bela dibê: *(Yek çû Hecê û vejerî mal; herweko mala wî jî li bajêr bû, û li bajara jî zûzû xeberê hevdo nabîsin, rojekê hecî rastî cîranê xwe hat, gotê: Cîranê hêja, ez çûm mala xwedê û ez hatim, te nehat heca min pîroz nekîr, xwedê bikim di pê min re di nav te û zarokê min de ti qehr çê nebûbê, cîrên gotê: Na bi xwedê tiştekî wena tine ye, lê bi wê heca ko tu çûyê min, nebîstî ko tu çûye hecê, hecî serê xwe hezand û got: Sûnd mexe, ez bawer dikim, ji ber hev halê me ye, gi min kûna daba, vî bajarî gişta wê di rojekê de bibîsta).*
١٩٨٧. Gotinê tu ji ku ye, go, dera ku min jin jê ani ye.
١٩٨٨. Gotine: Firewn, tu çö bûye Firewn? Firewn got: Kesî ez venegerandim.
١٩٨٩. Gotinên êvara dikevin qulê diwara.
١٩٩٠. Gotinên mezina nexşên li ser beran e.
١٩٩١. Gotinên mezina nexşê berî ne .
١٩٩٢. Gotinên mezinan, nexşê ser keviran.
١٩٩٣. Gotin in hene zêr in, û gotinin jî hene zihêr in.
١٩٩٤. Govenda mişkan di mala feqîran de ye.
١٩٩٥. Guh didim ê bilor e, deng tê ji kûr e, pez birçiyê li bûr e, ro bilind e av dûr e.
١٩٩٦. Guhê zaroka bêşin, dûyî cixarê hûfêkin yan jî bin guh bi derzikê dax din êşê jê here.
١٩٩٧. Guhekî xwe bi bêjing ke, yekî bi serrad ke.
١٩٩٨. Gul be gula biharê li bin darê çinarê.

1999. Gul bê istirî nabin, rind bê kêmasî nabin.
2000. Gul bê qisûr nabin.
2001. Gul ew gul bû, baran jî lê hat şil bû.
2002. Gul hene gula winda dikin, kulin jî hene kula winda dikin.
2003. Gul jî bi istirî ne.
2004. Gul jî di zibil de şîn dibin.
2005. Gul li gulê dinêre, sor dibe.
2006. Gula govenda, bûk e.
2007. Gula ku her kes bènke, bèn tê de namîne .
2008. **Gulan dikê istiriya: (*camêrin hene tu tevê rûdinê, tu jî gotinên wî têr nabe, qasî gotinid xaş û rind dibê û gula dikê istiriya*).**
2009. Gulan e, dew li ba hemiyan e.
2010. Gulek biharê nîn e, lê nîşana biharê ye.
2011. Guliyê jinê, rewşa dinê.
2012. Gund bê rez, kon bê pez nabe.
2013. Gundek e û gundorek e.
2014. Gundek û rindek.
2015. **Guneh giran in: (*mebest ew e ko tişteki te hinda bû, ya îşek bi serî te hat kirin, û tu nizanê kî ye, mexe stoyê kê bûye, xelkê guneh e û guneh giran in*).**
2016. Gunehkar ziman kinin.
2017. Gunîran* li dostêd xwe bamede.
2018. Gur kerê cîrana* xwar, kerê xwe durist girêde.
2019. Gur be bila gur te nexwin .
2020. Gur berî bighê nav pêz, devî xwe ji hev dikê.
2021. **Gur bi du pariya namire (*gavê kesek jinan bike didu vê gotoinê dibêje*).**

*K gunîr : her alîkî nîr du darik tédane dikevin stoyê ga ew gunîrin.

*E cîran : hevsî . cînar . hemsî .

٢٠٢٢. Gur dikujin, qijak dixun.
٢٠٢٣. Gur eyarî xwe çenakê.
٢٠٢٤. Gur girtin şîret kirin, got: Zûbin paşiya kerîya ji des min çû.
٢٠٢٥. Gur hat diyara, wey li sêfil û jara.
٢٠٢٦. Gur ji baranê bitirsiya, wê ji xwe re kurk çêkira.
٢٠٢٧. Gur ji gazîna bitirsiya, qe li çiyê ne dima .
٢٠٢٨. Gur ji nêza nikanî hilkişya çiyê, digotin, hincî zik dagirtiye.
٢٠٢٩. Gur kal dibin rovî bi wan dilîze.
٢٠٣٠. Gur ku dikeve nav kerîya, ji kêfa re dev tê girtin.
٢٠٣١. Gur li dû parî nerm digerê.
٢٠٣٢. Gur li ku be gurîtiya xwe dike.
٢٠٣٣. Gur newêrin li dû hev bimeşin.
٢٠٣٤. Gur oxir e, nebînî çêtir e.
٢٠٣٥. Gur pîr bibê dibê qeşmerê roviya.
٢٠٣٦. Gur pîr bibê dibê qeşmerî kûçka.
٢٠٣٧. Gur pîr bûn, dibin qeşmerên cewrika.
٢٠٣٨. Gur tê pêz, ekê (gû) kûçik tê.
٢٠٣٩. Gur tê pêz, kûçkî pîs xwe li xewî dinê.
٢٠٤٠. Gur û serçe kedî nabin.
٢٠٤١. Guran xwariye hirç mane.
٢٠٤٢. Gurê di bin kevilê mî yê de ye.
٢٠٤٣. Gurê kîjan çayî mirî: *(mebest ew e, karekî ne di bîra de ji bil yekî ve hat kirin, ya mêvanekî ne di bîra de hat, ya mirovekî ne qenc qencyekê bikê, dibê : gurê kîjan çayî mirî)*.
٢٠٤٤. Guyê (gûyê) mişkan di qulikên dîwaran de pir in.
٢٠٤٥. Gûyê qehpan li riyêd gidiyan: *(carina jinek di bin mêrê xwe de pîsiyê dike, û li gor fêl û xizamên Kurdan gerek e ew mêr wê jinkê bikujê, lê hin mêr*

hene, nakujin û wê cerisîyê bincil dîkin, û hin jî hene nakujin lê li ba xwe jî nahêlin, dişînin mala bavê wê, û hin bav jî hene wê didin kuştin, û hin jî hene wê cerisîyê bincil dîkin, îcar ew jinik li ser pîsiya kirî dibêjinê: (Qehpe) û ew mêtê ko wê jinkê li ba xwe bihêlê dibêjinê: (gidî), ango qehpe bi gidiya dimîne, ji bo wan herdiya pîs bikin û kesî din wenekê, dibêjin: Gûyê qehpa li rîyêd gidiya).

٢٠٤٦. Gûzê çit nebînê kevirî navê yê

٢٠٤٧. Gûzî kor bi dirêşê: *(gûzin hene kakil bi hesanî jê dernakevê, ew gûza kor e, anca tu bi şûjinê navka wê jê biderxê, mebest, mirovin jî hene tu nikane bi hêsanî sodekê jê wergirê).*

H

٢٠٤٨. Ha çoyê şivên ha qoçêd berên.

٢٠٤٩. Ha dê go ha mak go.

٢٠٥٠. Ha dêv got, ha qûnê got.

٢٠٥١. Ha dikim dê dimirê, ha dikim bav dimirê.

٢٠٥٢. Ha diranê kûçik, ha eyarê berêz.

٢٠٥٣. Ha ji dest ha ji zend.

٢٠٥٤. Ha kevir li cer ket, ha cer li kevir ket.

٢٠٥٥. Ha şoreka xwe kirî, ha tire ka xwe kirî.

٢٠٥٦. Ha te kir hûr, ha te kir tûr.

٢٠٥٧. Hahekirin heye ga kedî dikê, hahekirin heye ga tor dikê.

٢٠٥٨. Hasil giha mûsilê.

٢٠٥٩. Hat ê malê ye, çû qeda* salê ye.

٢٠٦٠. Hat ji derda tompiz di berda.

٢٠٦١. Hat ji newalê bû xwedî malê.

٢٠٦٢. Hat ji welêt, bû xudanê Ferêt .

*E qeda : bobelat . qeza . girdav . nervîn . rip .

٢٠٦٣. Hat ko poz paşkê çav kor kirin.
 ٢٠٦٤. Hate ciyê min, rabû li riwê min.
 ٢٠٦٥. Hate ser çoga min, dest avête riha min: *(Dibên wexta keça Fêrewn Mûsa ji çem derxist û anî mal, Fêrewn ew danî ser çoga xwe, Mûsa dest avêt riha Fêrewn).*
 ٢٠٦٦. Hate te enker û nekîr, li ber dîne nan û penîr, pê ne kir, lê bide gopalê fêqîr*.
 ٢٠٦٧. Hatîn ji çol û çolistana, bûn xwediyê dar û daristana.
 ٢٠٦٨. Hatîn nav me bûn xwediyê me.
 ٢٠٦٩. Haveynê* mîr bi rûmet e.
 ٢٠٧٠. Havîn çû kirasê fiqara da dû.
 ٢٠٧١. Havîn kirasê fiqara ye.
 ٢٠٧٢. Havîn kirasê xezanane .
 ٢٠٧٣. Havînê li ber siyê pal bidî, tê jî zivistanê zikê xwe mist bidî.
 ٢٠٧٤. Hebe miqlecî* ye, nebê parsekcî ye.
 ٢٠٧٥. Hebe şilik û milik, nebê keser û kulik.
 ٢٠٧٦. Hebe wezîr e*, nebê kizîr e*.
 ٢٠٧٧. Hebe, kurê seh be.
 ٢٠٧٨. Heblûr li yekî werin, li ber hêvê panzdeşevî bi sibirgê rêşke wê heblûr biweşin.
 ٢٠٧٩. Hebûn mera dike axa û xatûn.
 ٢٠٨٠. Hebûna Îsê min hebe, wê pir hinga (tona) bike.
 ٢٠٨١. Hebûnê xatûnê, tinebûnê teleqûnê ...

*K fêqîr feqîr : ji ezbetek ezdahîya ye
 *K haveyn : hêvan . ê ko şîr pê dimeye .
 *K miqlecî : qêxanexur . ê ko hêkerûna dixwe .
 *K wezîr : şalyar . şahyar .
 *K kizîr : dergevan .

٢٠٨٢. Hec° bi weseka° nabê.
 ٢٠٨٣. Hehecikê silava li hecêke.
 ٢٠٨٤. Heçî biçe masiyan dê qûna wî şil bibe.
 ٢٠٨٥. Heçî bixwazê mala xwe bê west xirabikê, mila du jina bînê.
 ٢٠٨٦. Hecî heciya dibînin li mekê, sofî sofîya dibînin li tekê, bênamûs bênamûsa dibînin li ekê.
 ٢٠٨٧. Heçî herê nêçîrê masiya, ê xwe bie nav kûntaziya.
 ٢٠٨٨. Heçî jê tê, lê tê.
 ٢٠٨٩. Heçî kirrî û firot dinya ji xwe ra dot.
 ٢٠٩٠. Heçî li ser sê singa bilîze, dê yek biçe têde.
 ٢٠٩١. Heçî ne li govendê xweşreqas e°.
 ٢٠٩٢. Heçî ne li şerr e, şêr e.
 ٢٠٩٣. Heçî neke xeberên mezinan, wê pêve bê du şaxên bizinan.
 ٢٠٩٤. Heçî° yî feqîra qelişi ye.
 ٢٠٩٥. Hêdî tif bikî, wê li rû yê te bikeve.
 ٢٠٩٦. Hêfa dijmin li dijmin nayê.
 ٢٠٩٧. Hefsarî mera bi des mera ye, kêl mizînê mera bi des xelkê da ye: *(Tu çî bikê bi des te ye û di des te da ye, tu çî bixwazê, tu kanê bikê, tu ku da herê, tu çî bêjê tu kanê, lê ji bîr meke tu di bin çavdêriya xelkê da ye, û ew xelka te bi kelmizînê xwe dipîvê û li gor dan û standinê te bi xelkê ra ûdê te tê girtin).*
 ٢٠٩٨. Hefsarî şora tine ye, te bi kude bada wê wirde herê.

°E hec : serdana mala xwedê . mebestgeh

°E wesek : qewîtî .

°E reqas : sergovendî . semavan .

°K heçî : çinxilê bi serî bena ve girêdayî .

٢٠٩٩. Heft avjenî kera hene dikevin avê her hefan jî ji bîrdikin.
٢١٠٠. Heft birçî heft dev vekirî.
٢١٠١. Heft çîvrokên hirçê hene, her heft jî li ser hermiyê ne.
٢١٠٢. Heft hevling ketin bin bêjîngikê û gotin: Hîn ciyî heft din jî heye.
٢١٠٣. Heft hevling li ser doşekikê rûniştin û gotin: Hîn ciyî heft din jî heye.
٢١٠٤. Heft kiras orispiya hene yekî li xwe dikin şeşa li hevala dikin.
٢١٠٥. Heft kirîf bi gopalekî, heft mal bi arvanekî.
٢١٠٦. Heft kirîf li barekî hatin hev ku barkin hîn gotin: Oy li me bêxwediya.
٢١٠٧. Heft kulam hurçê hene, hemî li ser hulyan e.
٢١٠٨. Heft lawê pûnê hebûn başê wan kûnda bû.
٢١٠٩. Heft lawê pûnê hebûn, başê wan çilek bû.
٢١١٠. Heft mêr kirin û jî derdî mêran re jî xeyaran dalêsê.
٢١١١. Heft pişt girêdayî ji yekî pişt vekirî ra kar dikin .
٢١١٢. Heft sala çû eskerê,* vejerî wekê berê
٢١١٣. Heft sala şivanî, heft sala gavanî, heqê* mirîşka reş nanî.
٢١١٤. Heft soberiyê kerê hene, dikeve avê ji bîr dike.
٢١١٥. Heft tişt pîs hene Xwedê her heft jî dane jinan.)
bêfedî ٢ gelacî ٣ karî nav nivîna ٤ avisî ٥
kinchatin ٦ paqijkirinê zaroka ji pîsiyê ٧ zandin.

*E eskerê : leşkeriyê .

*E heqê : bihayê .

٢١١٦. Heft û nivê xwe jê hilîna: (*mirovek aqilekî di rêya tirsê re yan di rêya zirarekê re ji kesekî hilînê, dibêjinê: Heft nivê xwe jê hilîna*).
٢١١٧. Heft xirxirk* nabin zengilik.
٢١١٨. heft zengil nabin girgehik*.
٢١١٩. Heftê û du derd ji sermê ne û derdek ji germê ye.
٢١٢٠. Heftê û du fêde* di xwarinê tiri da hene.
٢١٢١. Heftyarî li ber çavan diyarî.
٢١٢٢. Heger nanê ceh bit, bila xulqê te genim bit.
٢١٢٣. Heger nekewîne, ne xo ye.
٢١٢٤. Heger te girt bermede, ger te berda pê nekeve.
٢١٢٥. Heger virr bin mila pîrr bin.
٢١٢٦. Hêk bi tirra naqewirin.
٢١٢٧. Hêka kûsî ye, bi xwedê wesiye: (*Dibêjin: Kûsî hêkên xwe dikê û dixê bin axê û dispêrê Xwedê û dihêlê û derê, ew hêkîna ji ber xwe ve dibin çêlik*).
٢١٢٨. Heke mirov ji rezekî tiri xwaribe, nabe piştî xwe bidê yê.
٢١٢٩. Heke te bivî tu hebî tê nebî, heke te bivî tu nebî tê hebî.
٢١٣٠. Heke tu gul nebû, strî nebe.
٢١٣١. Hêkerûn nebû mila cilbir bê*.
٢١٣٢. Hekîm bi birîna xwe hekîmiyê hîn dibe.
٢١٣٣. Hele bila dar bikefê, ka berî ku da.
٢١٣٤. Heleb ne li vir e, gaz li vir e: (*Berê Heleb ji xelkê ve dûr bû her kes nikarî bû herêyê; îca, yekî gotî: Ez li*

*K xirxirk : zîlakî biçûke kulovere .dixin stoyî berxika .

*K girgeh : zengilekî mezine more, dixin stoyê miya û berana .

*E fêde : sode . hode .

*K cilbir : navê xwarina hêk û temetûsa ye .çizimiz.

Helebê xwe heft gazan çê dikim, ê din gotî: Heleb ne li vir e, gaz li vir e).

٢١٣٥. Helhela gavana siwariya kera ne.
 ٢١٣٦. Hemî ewr baranê nînin.
 ٢١٣٧. Hemî keran bi şivekê ne ajo.
 ٢١٣٨. Hemî qubên sipî ne ziyaretin*.
 ٢١٣٩. Hemî tişt li bendê demê ye, lê dem ne li bendê tiştiye.
 ٢١٤٠. Hemo kes goşt-xwerin, lê navê gur ecêb e*.
 ٢١٤١. Hemû hevrazan, deberjêrekî wan heye.
 ٢١٤٢. Hemû mêr nabin şêr.
 ٢١٤٣. Hemû teyr nêçîrê nakin.
 ٢١٤٤. Hên av dûre, xwe hilmemale.
 ٢١٤٥. Henek dibin genek.
 ٢١٤٦. Henekên wî henekê hirçê ne.
 ٢١٤٧. Heps ciyê mêran e.
 ٢١٤٨. Heqê dê weke heqê xwedê ye.
 ٢١٤٩. Heqî ji des neheqiyê zarezar e.
 ٢١٥٠. Her berek li ciyê xwe bi qedr e.
 ٢١٥١. Her biznek li karê xwe dîbanê.
 ٢١٥٢. Her canek di dilê xwe de siltanek e*.
 ٢١٥٣. Her carê kûçîkek birewê tu kevrekî bavê yê, kevir namîn in.
 ٢١٥٤. Her çavbelekek çavreşek li dû ye.
 ٢١٥٥. Her çûkek bi refî xwe ra difirê.
 ٢١٥٦. Her darek bi berî xwe tê naskirin.
 ٢١٥٧. Her dîk li ser lûsî xwe bandide.
 ٢١٥٨. Her dîkek li ser sergo yê xwe qî dikê.

*E ziyaret : mezel .

*E ecêb : sosret .

*E siltan : paşe . padişe . qeral .

٢١٥٩. Her dîkek şahê pînka xwe ye.
 ٢١٦٠. Her dînsizekî* îmansizek* gereke.
 ٢١٦١. Her etarek bi qulincê* xwe dêzi dipîvê.
 ٢١٦٢. Her gelîkî dengê jê tê, her gulekê bihnek jê tê.
 ٢١٦٣. Her giyak li ser koka xwe şîn dibe.
 ٢١٦٤. Her gulekê bênek xwe heye.
 ٢١٦٥. Her gulîsorek çavreşek li dûv heye.
 ٢١٦٦. Her gulîsorek simêlzerek li bendê ye.
 ٢١٦٧. Her kaşekî kûşekî xwe heye.
 ٢١٦٨. Her kehrek derê bin dêkê xwe.
 ٢١٦٩. Her kes a xwe dibê.
 ٢١٧٠. Her kes bi gazê xwe caw dipîvê.
 ٢١٧١. Her kes bi xwe qayîl e.
 ٢١٧٢. Her kes bi xwe û bi dilê xwe şaye.
 ٢١٧٣. Her kes çî dikê ji xwe ra dikê.
 ٢١٧٤. Her kes dibê ez lawê bavê xwe me.
 ٢١٧٥. Her kes dînên bê cil nasdike, esil ewe dîn bên naskirin bi cilan ve.
 ٢١٧٦. Her kes ji xwe razi ye, çî kizîr e çî qazi ye.
 ٢١٧٧. Her kes kurê bavê xwe ye
 ٢١٧٨. Her kes li mala xwe qeral e.
 ٢١٧٩. Her kes li ser miriyê xwe digrî.
 ٢١٨٠. Her kes orxanê ber xwe dikşînê.
 ٢١٨١. Her kes têvr berve xwe lédixe.
 ٢١٨٢. Her kes û riya pêşi ya xwe .
 ٢١٨٣. Her kes û şîrê xwe.
 ٢١٨٤. Her kes xazi ya wî di devê wî de şêrîne.
 ٢١٨٥. Her kes xwe li agirê germ digre.

*E T dînsiz : bê ol . xwedênenas .

*E T îmansiz : bê bawerî .

*K qulinc : dirêjî piya ji desta heya omizê .

٢١٨٦. Her kesî bi bêkekê* da mejo.
 ٢١٨٧. Her kevrek li ciyî xwe giran e.
 ٢١٨٨. Her kezîzerek simêlsorek li ber e.
 ٢١٨٩. Her kilîtek ji derîkî ra ye.
 ٢١٩٠. Her kûçikek li ber derî xwe no ye.
 ٢١٩١. Her kûçkek li ser sergo yê xwe xedare.
 ٢١٩٢. Her malek dînekî çêdikê.
 ٢١٩٣. Her malekê dînsizêkî xwe heye.
 ٢١٩٤. Her malekê sergoyekî xwe heye.
 ٢١٩٥. Her mangak tê dotin, lê her şorek nayê gotin.
 ٢١٩٦. Her nêr li mê sware, tenê gotina mê li ya nêr sware.
 ٢١٩٧. Her pêximberî berî dua li xwe kiriye.
 ٢١٩٨. Her qazî bi xwe razî.
 ٢١٩٩. Her qubakê ku sipî kir ne mizgeft e.
 ٢٢٠٠. Her rojekê padişakî xwe heye.
 ٢٢٠١. Her sebrekê xêrek vê re ye.
 ٢٢٠٢. Her seetek* hukmekî* wê heye.
 ٢٢٠٣. Her serîk aqileke.
 ٢٢٠٤. Her serîkî aqilek tê de ye.
 ٢٢٠٥. Her şevêk avisa roja xwe ye.
 ٢٢٠٦. Her te hê kir* bizin ba, dinya ê naha tiji pez biba.
 ٢٢٠٧. Her teyr* bi refê xwe re.
 ٢٢٠٨. Her teyrek bi baskên xwe difire.
 ٢٢٠٩. Her teyrek bi refê xwere difire.

*K bêk : wekheve .

*E seetekê : ketjimêrekê . demekê . bêhnekê .

*E hukum : dar . destelat . hêz . serdarî .

*K hêkir : bankir biznê .

*E teyr : tilûr . firinde .

٢٢١٠. Her tişt bi demê ra mezin dibê, tenê xêlibûn bi demê ra biçûk dibê.
٢٢١١. Her tişt bi ziravî dişkê, mirov bi stûrî.
٢٢١٢. Her tişt di destê hosta yê xwe de başe.
٢٢١٣. Her tişt di destê xwedê de ye, lê dewê malê di destê pîra de ye.
٢٢١٤. Her tişt di wextê xwe de xweşe.
٢٢١٥. Her tişt ji ziravî mirov ji stûrî diqete.
٢٢١٦. Her tişt li demê dinêre, dem li tiştêkî nanêre.
٢٢١٧. Her tişt nêr heye.
٢٢١٨. Her tişt xweş e di dema xwe de.
٢٢١٩. Her tiştî zani be, lê her tiştî meke.
٢٢٢٠. Her warek biharek.
٢٢٢١. Her yê ku biçê hecê, nabe hecî.
٢٢٢٢. Her zalimekê* zewalê* xwû yê heyî.
٢٢٢٣. Herçî jar e, li havînê jî sar e.
٢٢٢٤. Herçî li ser du singa bilîzê, rojekê singekê di kûnê ve herê.
٢٢٢٥. Herdu dizê qulekê ne.
٢٢٢٦. Herdu ling kirin solekê.
٢٢٢٧. Here ba wî kesî yê te bigrîne, nere ba wî yê te bikenîne.
٢٢٢٨. Here mêvaniya li nav neyaran, lê bê çek neçe.
٢٢٢٩. Herin şênahiya, pirsên ji zarokan.
٢٢٣٠. Herkes hesinkerê bextiyariya xwe ye.
٢٢٣١. Herkes mêrê roja xwe ye.
٢٢٣٢. Herkes mîmarê* dîwarê xwe ye (*xanî*).
٢٢٣٣. Herkes xwe li ronahiyê digre.

*E zalim : stemkar .

*E zewal : kembexbûn .

*E mîmar : avakar . hostê avakirinê .

٢٢٢٤. Hêrs tê çav reş dibin, hêrs diçe rû reş dibe.
 ٢٢٢٥. Hêrsê te li tersê te.
 ٢٢٢٦. Hesîl xiranabe, hingiv genî nabe.
 ٢٢٢٧. Hesin bi hesin bukute.
 ٢٢٢٨. Hesin bi hêsin tê kutan .
 ٢٢٢٩. Hesin hesin dibire.
 ٢٢٣٠. Hesin hîn germ e, bikut.
 ٢٢٣١. Hesin ji hesinkera nayê kirîn.
 ٢٢٣٢. Hesino xwe bi xwe dipesino.
 ٢٢٣٣. Heska dinê ye, di nav her pelûlê* da ye.
 ٢٢٣٤. Heskoyê got: Ez zêrîn im, darê got: Ne tu ji nava min î.
 ٢٢٣٥. Hesp bi hev dikevin, ker û golik di navda diçin.
 ٢٢٣٦. Hêsp bikire, paşê êfir bigire.
 ٢٢٣٧. Hesp dibezin siwar xwe dipesinin.
 ٢٢٣٨. Hesp heye meydana tuneye, meydana heye hesp tune ye.
 ٢٢٣٩. Hesp qevda şûr e , kî bi serket ma ji wî re.
 ٢٢٤٠. Hesp qevda* şûr e , kî bi ser ket ew î li jor e.
 ٢٢٤١. Hesp sîwarê xwe nas dike.
 ٢٢٤٢. Hesp û qantir li hev dixin, ker li ber lingên wan diçin.
 ٢٢٤٣. Hespan gem û hefsar, mêran bext û qerar.
 ٢٢٤٤. Hespê çê êmê xwe zêde* dike.
 ٢٢٤٥. Hespê her kesî li gorî bextê wî dimeşe.
 ٢٢٤٦. Hespê ku zîn qebûl* neke, mirina wî nêzîke.

*K pelûl : xwarineke ji ard û dimis (mit) û hinek rûn yan zêt çêdikin , û pelûl heye ji bo kûçka ew ji kepekê û hinek ard û avê çêdikin .

*E qevd : destik .

*E zêde : pirtir . bêtir .

*E qebûl : pejirandin . litêkirin .

٢٢٥٧. Hespê nêr ji simê xwe şerm nake.
٢٢٥٨. Hespêkî ji cîranê xwe re bixweze, da Xwedê kerekî bide te.
٢٢٥٩. Hespî çê ji siwêr e.
٢٢٦٠. Hespî çê xwedanê xwe li rêka nahêle.
٢٢٦١. Hespî çê zengiya naghînê xwe.
٢٢٦٢. Hespî kihêl zengiya nagînê xwe.
٢٢٦٣. Hespî xwe rind girêd û kumî xwe li yanxe.
٢٢٦٤. Heşt pê şimlek: (*Yekî çû ji bajêr nîvkêlek (godikek) kîrrî, hat mal. Kê dî, got: Xoce ev çî ye, rabû nîvkel kir çiwalekî û go: Ban gund kin, mila tev werin, gundî hatin mala xoce, xoce rabû nîvkêl ji çêwêl derxist û bilind kir, go: Hê, gundîno, we hev kodika dest min diye, gundiya bi hev re dibên: belê, xoce got: Heşt bi vê şimlek in*).
٢٢٦٥. Hestî ji kûçka nayên standin.
٢٢٦٦. Hêştir bi dûvgirêdanê gergîn nabin
٢٢٦٧. Hêştir bi hewêt* ve dixwe.
٢٢٦٨. Hêştir bimexelê, wê ciyî xwe bigrê.
٢٢٦٩. Hêştir birçî bû, ji hewatî xwe duxwê.
٢٢٧٠. Hêştir çîqa bi borborkê, ewqas bar lê giran dibê.
٢٢٧١. Hêştir çîqa ji hev dûr herin, guhên xwe li ser hevin
٢٢٧٢. Hêştir çîqas mezine zarokek sêri dikşînê.
٢٢٧٣. Hêştir çîqasî girse, gurê xwe yekî biçûke .
٢٢٧٤. Hêştir hat pûl,* pûl ne hat dîn: (*Yekî lawê xwe şand bazara hêştira go: Hele here, binêre ka hêştir bi çî ne, lawik çû û hat go: Bavo, hêştir bi pûlekî ne; bavê serê*

*K E nîvkêl : kodika ko pê zê dipîvin .

*K hewêt hewat : kurtanê hêştira .

*K pûl : pere ye lê bê nerxbû . erzanbû .

xwe hezand û deng nekîr, piştî demekê, dîsa gotin: Hêştir daxistine firotanê, wî mêrkî dîsa lawê xwe şand bazara hêştira, law çû û vejerî go: Bavo, hêştir derketine zêrekî, bavê pere dan lawê xwe, go: Here bikire).

٢٢٧٥. Hêştir ji hev dûr diçêrin lê guhên xwe li ser hevin.
٢٢٧٦. Hêştir radibin hev, hêştir û ker di bin lingê wan de diçin.
٢٢٧٧. Hêştirê xwe bi dûziyê xist.
٢٢٧٨. Hêştirek bi heft cencilûka nabê.
٢٢٧٩. Hestiyê bê minet, çêtire ji goştê bi minet.
٢٢٨٠. Hestiyê zimên nîn e.
٢٢٨١. Hestiyên me têre kûçkên me nakin.
٢٢٨٢. Hêstiyid çavid yekî bikevin, hestîk di şiketê dêv da heye wî hestî bi jor da têvedin, ê çê bibê.
٢٢٨٣. Heta aqilê paşî hat, ê pêşî çû.
٢٢٨٤. Heta barê qantirê giran nebe nizanê ker bavê wî ye.
٢٢٨٥. Heta cû rast nebe, av nayê berdan.
٢٢٨٦. Heta em bûn çavnas, dinya li me bû xelas.
٢٢٨٧. Heta genim firîk e, mele şirîk e.
٢٢٨٨. Heta hate ser hev, dawet çû ji ber hev.
٢٢٨٩. Heta jîr bûm pîr bûm.
٢٢٩٠. Heta kefa destî reş nebe, tama^{*} devî xweş nabe.
٢٢٩١. Heta ku tu aş î, ez qeraş im.
٢٢٩٢. Heta mar rast nebî naçe qulê .
٢٢٩٣. Heta mi xwe naskir, mal li xwe xelaskir.
٢٢٩٤. Heta min xwe naskir, min temenê xwe xelaskir^{*}.

*E tam : çêjt . çêj . çêşnî .

*E xelaskir : kutakir .

٢٢٩٥. Heta mirinê çav li kiinê.
 ٢٢٩٦. Heta mirinê ceht li kirinê.
 ٢٢٩٧. Heta nava destî ranebît, tama devî xûş nabît.
 ٢٢٩٨. Heta pexîl hebin, miflis namirin.
 ٢٢٩٩. Heta rûvî xwe îsbat bike, postê here çarşiyê.
 ٢٣٠٠. Heta serî sax dimîne, qûn ecêba dibîne.
 ٢٣٠١. Heta te dêrek ava kir, te mizgeftê xira kir.
 ٢٣٠٢. Heta tu ber piyê xwe nebînî gava xwe ne avêje.
 ٢٣٠٣. Heta tu li ser destan negerî, tu qedrê* lingan nizanî.
 ٢٣٠٤. Heta xera nebê, ava nabê.
 ٢٣٠٥. Hev hevîra wê pîr avê hilînê: (*Carina, li gunda di nav hin famîlan da cêwazîk giran yan jî sivik çê dibe; her weko em dizanin, li gunda hertim mirovêd mezin û hişmend hene, ew mirovana dûrnêzîka pêwendiya wan famîla bi hevdu ra dizanin, îca li gor dîtina xwe dibînin ku ev cêwazî zû bi zû çareser nabê, îca dibêjin: Ev hevîra wê pîr avê hilînê, ango pîr tiştên kevn û nuh wê ji binhev derkevin, û di warin di da jî ev gotin tê gotin*).
 ٢٣٠٦. Hev şivana ji vî pezî ra pîr e, hev gavana ji vî naxurê ra pirtir e.
 ٢٣٠٧. Heval hene yên rojên xweşin heval hene yên rojên reşin.
 ٢٣٠٨. Hevalê kesê çê be, rojekê li dinê be.
 ٢٣٠٩. Hevalê parî naçe arî.
 ٢٣١٠. Hevalê qirikê her nikilgû ye.
 ٢٣١١. Hevalê rê. birayê ji dê.
 ٢٣١٢. Hevalê roja xweş pirin, hevalê roja reş kêmin.
 ٢٣١٣. Hevaltî bi rastî.

*E qedir : nerx . ûd .

٢٢١٤. Hevîr tirsî nebû ye, tenûr dada ye.
 ٢٢١٥. Hêviya dera, xuliya li sera .
 ٢٢١٦. Hevraz bê berjêr nabin.
 ٢٢١٧. Hevrîşim bi biha yê xwe, hirî bi biha yê xwe.
 ٢٢١٨. Hewa hat û hewa çû.
 ٢٢١٩. Hewar ji paş ve tê ew li pêş dinêre.
 ٢٢٢٠. Heware, avê ez bi lêde birim, û ez ji tîna mirim.
 ٢٢٢١. Heya heyê şilik û milik, gava nema keder û kulik.
 ٢٢٢٢. Heya serî mera li darheda nekevê mera baqil nabê.
 ٢٢٢٣. Heya tu li karê xwe nepirsê, kes li te napirsê.
 ٢٢٢٤. Heya xwe karkir, dilê min sarkir.
 ٢٢٢٥. Heya xwedê li me pirsî, kefenê me rizî.
 ٢٢٢٦. Heye li derî bizire wekî kerî, ê bên digîne me xweş xeberî.
 ٢٢٢٧. Heye terk, nîne berk.
 ٢٢٢٨. Heyfa bizina kol ji ya bi qoç re namînê.
 ٢٢٢٩. Heyfa hêverûnê şevreş li dû ye, heyfa buharê havîn li dû ye, heyfa ciwaniyê pîrbûn li dû ye.
 ٢٢٣٠. Heyfa miya kol ji miya kel re namînê.
 ٢٢٣١. Heyfa ronahiyê tarî li pêye.
 ٢٢٣٢. Heyfa serê ko çû.
 ٢٢٣٣. Heyfa taveheyvê, tarî li pê ye.
 ٢٢٣٤. Heyî be, kurê kerî be.
 ٢٢٣٥. Hezar bavê çê, esil şîrê dê.
 ٢٢٣٦. Hezar bizin di sersiyî darekê de dimexelin.
 ٢٢٣٧. Hezar carî bipîve, carekê bibirre.
 ٢٢٣٨. Hezar dost hindikin, dujminek pire.
 ٢٢٣٩. Hezar dot, hezar firot, neghîşte xeta cot .
 ٢٢٤٠. Hezar salî li dinyê be, şevêkê mêvanê gorê be.

٢٢٤١. Hezar û yek çîrokê hirçê hene, hemû li ser hulmê ne.
٢٢٤٢. Hî çiqas bedew be jî dîsa qusûrek wê heye.
٢٢٤٣. Hildidê mildidê çava kil didê
٢٢٤٤. Hildidim mildidim çava kil didim.
٢٢٤٥. Hilpek dapek di cî da, di hewşa* apê hecî da.
٢٢٤٦. Him ji dêrê bû him ji mizgeftê.
٢٢٤٧. Him serê xwe dişkîne, him xercê xwe dide.
٢٢٤٨. Himhima şêx ji bo kevçîk rûne.
٢٢٤٩. Himî dize himî tompiz e*.
٢٢٥٠. Himî kêl e himî fodil e*.
٢٢٥١. Hin dîkin hin dixun.
٢٢٥٢. Hin ê bistrên, hin ê tewkin .
٢٢٥٣. Hîn gi dev li dêv hatiye, çêke.
٢٢٥٤. Hîn gi serî mirîşkê di pinkê da ye, bihêle dîk bikopisînê.
٢٢٥٥. Hîn hêlîn (hêk) bi poz va ye dixazê mêranîyê bikê.
٢٢٥٦. Hîn hesinî germ e, bikut.
٢٢٥٧. Hîn hesp nekiriye, êfir digrê.
٢٢٥٨. Hin hingiv dixwin, û mêş bi hina vedidin.
٢٢٥٩. Hîn marî biçûk e, sêri biceliqîne.
٢٢٦٠. Hîn mehîn nekiriye, êfir digre: *(Di nav Kurdan de, gelek çêrok li ser Kêlê - Kêlo - hene, dibên: Kêl di rêya xwe ra gihîşt ba cotarîkî, gote cotarî: here mal, şorbak nîskê ji min re bîne, ez ê vê mehînê û cehnîkê wê bidime te, hema cotarî bi lez çû mal û gote jina xwe : zû şorbak nîskê li kuç ke û were em afira ava kin, jinê*

*E hewş : xêl . hûz .

*K tompiz : kin û qaling û kulek .

*K fodil : tîtik . xemilandî .

pîrs kir, go: Çi heye ? Mêrik çêrok jê re got: Jin jî kêfxwaş bû û dest bi karê xwe kirin, piştî afir ava kirin, mêr gote jinê: hele ka were li ser afirê cehnîkê raweste û ez jî wek mehîne pêhnekê bavêm te, da ez zanibim ka pêhna mehîne wê bighê cehnîkê an na; jinik jî tu nabê bi du cana bû û pêhna mêrik li zikê jinikê ket û zarok ji ber çû, mêrik rahişt biroşa şorbê û dîna sr serê xwe û da rê, jinikê ji para gotê: Mêrko, te ez wilo kirim qe nebê tê cehnîkê bi min dê, mêrik ta qûrve werê qirşekê û bibê: Ez te dikim qurban vî qirşî şorbe bi ser da rijî, mêrik ta çû gihêşt nav erdê xwe, Kêlo ga dizî bûn).

٢٣٦١. Hîn nebûye kundir stoyî xwe xwardikê.
 ٢٣٦٢. Hîn nebûye kundir stoyî xwe xwarbûye.
 ٢٣٦٣. Hîn nebûye mişk, dixwazê arşûjina* qutkê.
 ٢٣٦٤. Hin nekin, hin naxwin .
 ٢٣٦٥. Hin nemirin, hin nazewicin*.
 ٢٣٦٦. Hîn nexwariye, xwedê spas kiriye.
 ٢٣٦٧. Hîn şivê te di tewikê da ye, haj xwe hebe.
 ٢٣٦٨. Hina tepir îçi tiji şekir, hina belan îçi tiji qitrana.
 ٢٣٦٩. Hînbûyî ji harbûyî xerabtir e.
 ٢٣٧٠. Hincî mêre esilînkê e*, çû fêde* kir ji xelkêre.
 ٢٣٧١. Hindik bixwe, hindik xeber bide, hindik raze.
 ٢٣٧٢. Hindik hindik derê gundik.
 ٢٣٧٣. Hîngî dev li dêv hatiye, çêke.
 ٢٣٧٤. Hîngî ez singekî dikutim, tu çelteyekê pêvedikî.
 ٢٣٧٥. Hîngî min got mû bi zimanê minve hat.

*K arşûjin : nexî bi devî çiwala ve girêdaî .

*E nazewicin : şûnakin .

*E esil înkêre : kok windakiriye .

*E fêde : sod . kar . hode . wec .

٢٢٧٦. Hingivê te nebê, mêş li te nacivin.
 ٢٢٧٧. Hirç belaş nareqisê.
 ٢٢٧٨. Hirç bi mezini honabê reqasê.
 ٢٢٧٩. Hirç diye, li dû şopê diçe.
 ٢٢٨٠. Hirç li ku govend li ku
 ٢٢٨١. Hirç reqisî ker fetisî.
 ٢٢٨٢. Hirç û bilûr, ereb û tenbûr.
 ٢٢٨٣. Hirç û govend kê ditiye.
 ٢٢٨٤. Hirç û govend.
 ٢٢٨٥. Hirç û qûn şuştin.
 ٢٢٨٦. Hirça birçî nareqisê.
 ٢٢٨٧. Hirçekê tûyek xwarî.
 ٢٢٨٨. Hirhirê hespî nêr li piş gayî mor e.
 ٢٢٨٩. Hirhirê hespî sipî li piş gayî reş e.
 ٢٢٩٠. Hirî li ser pišta miyê nayê firotin.
 ٢٢٩١. Hirmiyid tevî baş hirç dixwin.
 ٢٢٩٢. Hisqînkî keskî hilên, wer zani be hinek çêrrê wî dibin. Ji bo ew hisqînk jê herin, divê yek ji ên dor wî bêbextîkê li gor temenê wî ango mezin bê mezin biçûk bê bi çûk tê bide, hisqînkê biskinin.
 ٢٢٩٣. Hisqînkid kesekî hilên bila heft gulp av vexwê wê biskinin.
 ٢٢٩٤. Ho derê li ho dinê, mêş derê li gû dinê.
 ٢٢٩٥. Hohoke karê bavok e.
 ٢٢٩٦. Hopel* ta nîvşev ji des êşê zik nikarin razên, piştî nîvşev ji nêza ra nikan razên.
 ٢٢٩٧. Hortik* li kesî xê ji heft malan rûn komkin û mila ew bixwê ê çê bibê .
 ٢٢٩٨. Hotir*-lingê av êzingê.

*K hopel : kevokên çolê .

*K hortik : nexwaşiyek biharê ye li gewriyê dixê .

٢٣٩٩. Hov ji bo xwarinê, mirov ji bo avakirinê.
٢٤٠٠. Hukumdar bibe pir, di ser ra derbaz nebe.
٢٤٠١. Hundir bi qurban dervabê derva bi qurban hundirbê.
٢٤٠٢. Hûr bajo kûr bajo pir bajo ga mêşîn.
٢٤٠٣. Hurhut* bavê êr (ar) kuştî: *(berê, agirê kutik û êzinga di pixara da dadidan, û li ber rûdiniştin, carina yekê ji bêtengiya xwe radihişt maşê û agir dihurhutand û tev dida, yekê di ji maşê ji des digirt û digotê: Agir baş e, qey tu dixwazê vemirîne, ma ne hurhut bavê êr kuştî).*
٢٤٠٤. Hûrik hûrik dagirt tûrik.
- Î
٢٤٠٥. Î ço ya dixwê û î dijmêrê ne wek hev in.
٢٤٠٦. Î çova dixwe, ne wek î dijmêrê ye.
٢٤٠٧. Î dest bi gû bi î dest bi herî dikene .
٢٤٠٨. Î gur di zik da ye.
٢٤٠٩. Î ker ajotin ê ji tir fisa tehmlî* kê.
٢٤١٠. Î kin xwaş e.
٢٤١١. Î ko di govendê kefê wê xwe bihejinê.
٢٤١٢. Î ku bixwazê rûyek reş e, î ku nedê herdu rû reş in.
٢٤١٣. Î ku buxwazê hingivî kewarê buxwe, ê pêvedanê mêşa tehmlî kê.
٢٤١٤. Î ku dest û pê yid mera bikin, dê û bavid mera nakin.
٢٤١٥. Î ku di tewlê* xwe de nese kinê, wê pir îşa bibînê.

*K hotir lingê : jinek yan keçek ji êzinga pêve nizanê

*K hurhut : livandin . vekolan .

*E tehmlîkê : bipejirîne . gotirkê .

*K tewl : ciyê hespan .

٢٤١٦. Î ku dînek ji xwe ra zanê heft baqil jê re nizanin.
٢٤١٧. Î ku êniştakî* xwe hebê kerekî xwe heye.
٢٤١٨. Î ku fedî bikê, qiçkid xwe nabin.
٢٤١٩. Î ku herê navbera, ê hesabî serşikandinê xwe bike.
٢٤٢٠. Î ku herê nêçîrê masiya, ê xwe bidê nav qûntaziya.
٢٤٢١. Î ku hindikî nizanibê pirî ji nizanê.
٢٤٢٢. Î ku ho bû goştî beraza, nikanê dev jê berdê.
٢٤٢٣. Î ku ji malê xwe de ne têr be, li malê xelkê têr nabe.
٢٤٢٤. Î ku jinek kanê bikê, êlek nikanê bikê.
٢٤٢٥. Î ku li bendê şîvê cîrana bê, carina birçî xew dikê.
٢٤٢٦. Î ku nan bikê, şûr nakê
٢٤٢٧. Î me bi reng û penge î xelkê bê hus û denge.
٢٤٢٨. Î sorik biskînê, î glover î rehet e.
٢٤٢٩. Î were kuştin, natê şuştin.
٢٤٣٠. Î zanê, zanê, î nizanê, gurzek nîsk e: (*Emê dîsa vegerin ser Kêlê, dibên: Kêlê li paliya nîska şor avêtin jinekê, mêrê jînekê bihist, rabû xwe ajot Kêlê, hema Kêlê jî gurzek nîsk xist dest xwe û rabû revî; kesin din li wan dera paleyî dikirin, Kêlê xwe li nav wan girt û kir hewar, hewar û got: Ev mêrik dixwazê min ji bo gurzek nîsk bikujê, mêrka hatin pêva û mêrê jînekê lome kirin, mêrik di ber xwe da, got: Î zanê, zanê, î nizanê, gurzek nîsk e).*)
٢٤٣١. Î bi kevra bi kûccka ketî (îca gavê yek xizan bê dibên. Mêrik bi kevra bi kûçika ketiye ko xwarina devê kûçik jê bistînê ko buxwê) .

*T ênişte : zava .

٢٤٣٣. Îdî (cejn) biçûk berî îdî mezin e: (*Carina bext li birayê biçûk, yan li xûçka biçûk berî mezinên wan vedibê, û ew ji bi bextê xwe qayîl dibin, û dixwazin bidin dû bextê xwe, û her weko ew dizanin, ev ne gavek fêrweyî ye û usûliye, îca ji bo wê gavê pak û xawêne bikin, dibên: Îdê biçûk berî îdê mezin tê*).
٢٤٣٣. Îhîna hesp ji bin gunê ga ye.
٢٤٣٤. Înan nedikir bi destkevê ,bi desket û go: Bi pirç e.
٢٤٣٥. Îne, mela dîne.
٢٤٣٦. Însanê bê esas, ne dibe tevir ne dibe das.
٢٤٣٧. Îro bixe rizqî siba li siba ye.
٢٤٣٨. Îro derzîk dizî, siba wê deve bidizê.
٢٤٣٩. Îro heye, siba tineye.
٢٤٤٠. Îro li gir e, siba li vir e.
٢٤٤١. Îro nebû mila siba bê.
٢٤٤٢. Îş nabin xewn.
٢٤٤٣. Îş ne keşkirin e*, îş hişkkirin e: (*herkes kanê mêst xayê ke û têxê tûra, lê herkes nikanê di wextê da ji tûra derxê û pakpak hilînê û dînê û hişk bikê berî bêhn vêkevin, ya reng bê gihartin, mebest, ewe ne tu kara û îşa li serî xwe komkê û nikani bê ji ber hev derxê û zirarê bigîne xwe û xelkê*).
٢٤٤٤. Îsal jî rûnî gundî Bêkê ne gerek e: (*gundê Bêkê li ser dawîya girê biçûk ji alî bakur ava bûye, ev gund gundê axayên eşêreta Biya ne (Şêx simehla), ji berko ciyê gund bûye wek zozanekê bi dar û ber e, avên kaniya havîna pir sar dibin, ji xwe mast, ya rûnê gundê Bêkê di Çiyayê Kurmênc (Efrîn) de gotin li ser*

*K fêrwe : rasterê . usûl . rûye .

*E usûl : fêrwe . rasterê . rûye .

*K keşk : tiştê ko ji mêst hişk dikin wek çirtan . çortan ...

nabe, xuya ye kirîvekî li gundekî din gotinin li ser kesekî ji gundê Bêkê kiriye, wî jî ji kirîv re sûnd xwarî ko here gund wê lêxe, kirîv hersal rûnê wir dixwê, gava ev bihîstî hema gotî: isal jî rûnê gundê Bêkê ne gerek e).

٢٤٤٠. Îşî ber lingî xwe, mebe ser serî xwe.
 ٢٤٤٦. Îşî çû mekeve dû.
 ٢٤٤٧. Îşî îro mehêle sibê
 ٢٤٤٨. Îşî ko bi stûyî te de neketî xwe çemekê.
 ٢٤٤٩. Îşî ku bûye jê metirse, ji yê ku ne bûye bitirse.
 ٢٤٥٠. Îşî xwe têlê tenbûrê ye.
 ٢٤٥١. Îşî xwe tiriyê.
 ٢٤٥٢. Îxtiyare eyb* hezar e.

J

٢٤٥٣. Jana her pênc tilyan jî yek e.
 ٢٤٥٤. Jê ket bi pê ket.
 ٢٤٥٥. Jehr ji çêliyên mara qutnabe.
 ٢٤٥٦. Jehra marî ji marî naçe.
 ٢٤٥٧. Ji ava bê deng diherike bitirse.
 ٢٤٥٨. Ji ava bêdeng dikşê bitirse.
 ٢٤٥٩. Ji ava sekinî bitirse.
 ٢٤٦٠. Ji avê çelq metirse, ji ya meyî bitirse.
 ٢٤٦١. Ji başiyê re başî başe.
 ٢٤٦٢. Ji başiyê re başî karê mêrane.
 ٢٤٦٣. Ji ber baranê çû ber şurikê.
 ٢٤٦٤. Ji ber şurikê çû ber mirikê.*
 ٢٤٦٥. Ji bexê pir ma kavirê kurr .
 ٢٤٦٦. Ji biznekê du eyar çê nabin.
 ٢٤٦٧. Ji bo nefsê* ket hebsê.

*E eyb : şerm .

*K mirikê : ava bi gemar .

٢٤٦٨. Ji bo nêtê çû pêrtê.
 ٢٤٦٩. Ji bo xatira mera derê ser dînî gawira.
 ٢٤٧٠. Ji bo xatirî çavekî hezar çav tê xwedîkirin.
 ٢٤٧١. Ji bo xudana mera kêvir navê kûçika.
 ٢٤٧٢. Ji cifûta* Mirdoq nas dikê.
 ٢٤٧٣. Ji cîrana hînbibe îzana*.
 ٢٤٧٤. Ji cîrana mera hodibê îzana.
 ٢٤٧٥. Ji dehan nebû, bila ji nehan bê.
 ٢٤٧٦. Ji dêla tirrek çênabe seyê bezek.
 ٢٤٧٧. Ji delava ket çirava.
 ٢٤٧٨. Ji der ve mile ye, ji dil ve file ye.
 ٢٤٧٩. Ji derd û kula dengbêje.
 ٢٤٨٠. Ji derda rih berda.
 ٢٤٨١. Ji derdê xuhê dil ket birê .
 ٢٤٨٢. Ji dêrê ma, û ji mizgeftê ma.
 ٢٤٨٣. Ji des kul û derdan rih berdan.
 ٢٤٨٤. Ji des zana xwedê çû ezmana.
 ٢٤٨٥. Ji dijmin re zarê xweş pişta hişk e.
 ٢٤٨٦. Ji dijminî xwe yî dijmin metirse, ji dostî xwe yî
 dijmin bitirse.
 ٢٤٨٧. Ji dûr nagihê ber ûr.
 ٢٤٨٨. Ji eşqa re ling nagînin erdê.
 ٢٤٨٩. Ji eşqa re tirr bi dawê nakevê.
 ٢٤٩٠. Ji gur birçîtire, ji mêr tehzîtire.
 ٢٤٩١. Ji heft salan salek sala seyan e.
 ٢٤٩٢. Ji heft xêra xêrek nema.
 ٢٤٩٣. Ji hemo fermanan re serê xwe berjêr bikî, tê bibî
 kole.

*E nefis : nêt .

*K cifût : cihû . yahodî .

*K îzan : perwerde . sinçî . zanebûn .

٢٢٩٤. Ji her ewrî baran nayê.
٢٢٩٥. Ji heriyê derxist xist diriyê.
٢٢٩٦. Ji hesinê xirap şûrê baş çê nabe.
٢٢٩٧. Ji hêsp peya bû li kerê sîwar bû.
٢٢٩٨. Ji hêştir ketiye û ji hop-hopê xwe namînê.
٢٢٩٩. Ji hêştir pirs kirin tu çi karî dikê ? Go: Ez hêrîr (hevrişm) dirêsim Gotin: Di dest lepêd te re bêlî ye!
٢٣٠٠. Ji hêştir pirs kirin: Piştî te a xare Go: Ku dera min a doxri yei ?.
٢٣٠١. Ji hêştir re gotin: Çima tu namesê? hêştir got: Lêvê min a kul e.
٢٣٠٢. Ji hêştirekî guhekî dide.
٢٣٠٣. Ji hirçekî du eyar dernayên.
٢٣٠٤. Ji jêketiya metirse ji nûvêketiya bitirse .
٢٣٠٥. Ji kaniyê bibe kanî bi şîr e.
٢٣٠٦. Ji kar netirse mila kar ji te bitirse.
٢٣٠٧. Ji kê ditirsê, bi wî dipirsê.
٢٣٠٨. Ji kêfa re zît* bi dawê nakevin.
٢٣٠٩. Ji kelemê derxist xist diriyê.
٢٣١٠. Ji ker û mehînê hêştir dertê.
٢٣١١. Ji kera re kerbeş, ji hespa re ceyê reş.
٢٣١٢. Ji kera re tim li daholê de ker çi zanê dahol çiyê.
٢٣١٣. Ji kerê re gotin: Bilîze wê çirtik avêtin.
٢٣١٤. Ji kerê yi gi manker horiye.
٢٣١٥. Ji kesê diz ve, xelk giş diz e.
٢٣١٦. Ji kêw pirs kirin kuder bi te xwaşê got: Ciyê ko ez lê bûme çêlkew.
٢٣١٧. Ji kirinên şêx û melayan, dîsa rehmet li cahîlan.

*K zît : pihên .

٢٥١٨. Ji koran re bihayê mûma xem nake.
 ٢٥١٩. Ji kurê jinbiya, meke ti hêviya.
 ٢٥٢٠. Ji libek tirî kanê mehserekê* bigerinê.
 ٢٥٢١. Ji mala xwe têr nane, ji mêrê xwe têr gane.
 ٢٥٢٢. Ji maran tazîtir e û ji guran birçîtir e.
 ٢٥٢٣. Ji me ket, bi me ket.
 ٢٥٢٤. Ji mehan ji salan mirov carekê dibe mêvanê xalan.
 ٢٥٢٥. Ji melê bangdane.
 ٢٥٢٦. Ji mêra nav dimîne, ji gayan çerm dimîne.
 ٢٥٢٧. Ji milka aş, ji haceta simteraş, ji mêra mêrê dike hîsabê* pêş û paş.
 ٢٥٢٨. Ji milka* aş ji zeneta* simtaraş*.
 ٢٥٢٩. Ji minê, li minê çetintire .
 ٢٥٣٠. Ji mirinê wê da rê tineye, ji cehnimê wê da cî tine ye.
 ٢٥٣١. Ji mirtib û qereçiya, qeda* pêkevê herdu ciya.
 ٢٥٣٢. Ji mîx re gotin: Çima tu diherî dîwêr? Go: Tu wê ji çêkûç pîrskî.
 ٢٥٣٣. Ji neçari mera goştî dîka dixwe.
 ٢٥٣٤. Ji neçarî mera li cem xatûna xew dike.
 ٢٥٣٥. Ji nedîtî re kurek bû, anî kîrê wî jê kir.
 ٢٥٣٦. Ji nexwaşê nemirî re çare heye.
 ٢٥٣٧. Ji nêza zarzar derê û ji xwe nagerê.

*E mehsere : rezbank . ciyê ko dimis têde çêdikin .

*E hîsab : pîdav.

*K milk : mal . saman . xan û ber .

*E zenet : pîşe . destkarî .

*K simteraş : nalbendî .

*E cehnim : dojah .

*E qeda : bobelat . qeza . girdav . nervîn . rip .

٢٥٢٨. Ji nîskê dîke gîsk.
 ٢٥٢٩. Ji nu ve , guhar bi gu ve .
 ٢٥٣٠. Ji pîra pîr, jî hindîka hindîk.
 ٢٥٣١. Ji piş te dixwin, şîreta li te dîkin.
 ٢٥٣٢. Ji qantirê re gotin: Kî bavê te ye. got: Mehîn diya min e.
 ٢٥٣٣. Ji qehra gavana ra kûna xu da şivana.
 ٢٥٣٤. Ji qehra şivana nanê xwe dide gavana.
 ٢٥٣٥. Ji qelemî mêrik zêhêr dibarê.
 ٢٥٣٦. Ji qûna mera pîstir tune ye, jî mera nabe.
 ٢٥٣٧. Ji revê em naghên lêxistinê .
 ٢٥٣٨. Ji rînda ve xelk gî rinde û jî pîsa ve xelk gî pîse .
 ٢٥٣٩. Ji rîya kir bi simêla ve xist .
 ٢٥٤٠. Ji rîya kir di simêla da.
 ٢٥٤١. Ji rovî fenektir tine ye, jî eyarî wî pirtir tine ye.
 ٢٥٤٢. Ji roviyekî du post dernakevin.
 ٢٥٤٣. Ji ruvi pîrs kirin: Tu jî çire cot najoyî? Go: Ez dêmişî germê taştîya na bîm.
 ٢٥٤٤. Ji serê qijîkê qelî çênabe.
 ٢٥٤٥. Ji sipî rişka xelas bû, yan jî dibên xelas kir : (*ango çî pîrs girêkên wî hebûn jê re çare ser kirin*).
 ٢٥٤٦. Ji te ye ko meraş gund e.
 ٢٥٤٧. Ji tirekan re çî tirek çî du tir.
 ٢٥٤٨. Ji tîrsa gavana ra kûna xu da şivana.
 ٢٥٤٩. Ji tîrşîkê re xal û xwarzî, jî şeran re ap û birazî.
 ٢٥٥٠. Ji weliyan* dibin xwelî û jî xweliyan dibin welî.
 ٢٥٥١. Ji xelkê ra dengbêje, jî min re ker û gêj e.
 ٢٥٥٢. Ji xelkê ra rûmet e, jî min re robet e*.
 ٢٥٥٣. Ji xelkê re gul e, jî xwe ra kul e.

*E welî : pakzade , pîrozvan .

*K robet : bêteşe .

٢٥٦٤. Ji xelkê re hût e, ji xwe re kût e, hevalê ticarê rût e.
٢٥٦٥. Ji xelkê re masîgire, ji min re kûsîgire.
٢٥٦٦. Ji xelkê re mirîşk e, ji min re dîk e.
٢٥٦٧. Ji xelkê re pispore, ji xwe re kor e.
٢٥٦٨. Ji xezalê bezatir tine ye, ji rizqî* xwe bêtir naxwe.
٢٥٦٩. Ji xoce bangildane.
٢٥٧٠. Ji xudan esla bipirsîn, ji bêeslan bitirsîn.
٢٥٧١. Ji xuşxuşa gêj bûm, ji tîna lal bûm.
٢٥٧٢. Ji xwarinê re xal û xwarzî, ji şeran re ap û birazî.
٢٥٧٣. Ji xwe re masîgir e, ji xelkêre kûsîgire.
٢٥٧٤. Ji Xweda bitirsîn ne ji însana,* ji însana fedîkin ne ji heywana*, ji heywana dûr kevin ne ji dîwana, li dîwana rûnin wek mêran û mîrana.
٢٥٧٥. Ji ya qelsemêran ve laşê egîd û pehlewanan na êşe.
٢٥٧٦. Ji zarokê nebû yî re cila nederûn.
٢٥٧٧. Jin bi cemalê*, mêr bi kemalê*.
٢٥٧٨. Jin bi maçkirinîkê kûnde nabin.
٢٥٧٩. Jin bi porê xwe rind e.
٢٥٨٠. Jin bi qondira dirêj dibin, mêr bi kuma dirêj dibin.
٢٥٨١. Jin bi xeftana, mêr bi qapana.
٢٥٨٢. Jin bixwaze, mêrê xwe dike wezîr jî, dike rezîl jî.
٢٥٨٣. Jin çûn ba Xwedê gotin ê: Çima zarokêd me jî wek id ajalan tavalê nameşin*.Xwedê got: Hûn jî

*E rizq : rojîn . rozîn .

*E însan : mirov . ademî . keyomza .

*E heywan : ajal . teba . dehbe .

*E cemal : xoşîkî çelengî . sipehîtî .

*E kemal : têkozî . ûddarî . rêzdarî .

wek ajalan zarokên xwe balêsin wê taviê
bimeşin jina go: Em nikanin Xwedê gote: Wan
ger we nênkêd xwe birrîn destneşustî nanbuxin
dîsa zarokêd we wê bimeşin jina got: Em wê jî
nikanin .

٢٥٨٤. Jin di ser jina ra hene,
٢٥٨٥. Jin di ser jina ra hene, jin dikarê rûyê mêrê xwe
sipî bikê, û jin heye karê rû yê mêrê xwe reş bikê.
٢٥٨٦. Jin dibêjin: Îşê peyan tev medin .
٢٥٨٧. Jin dil bikê, wê dîwara qul bikê.
٢٥٨٨. Jin dîwarê hundir in, mêr dîwarê derva ne.
٢٥٨٩. Jin gî ne jin in û mêr gî ne mêr in.
٢٥٩٠. Jin giş ne jin in, destar jî qul in.
٢٥٩١. Jin gol e, mêr çem e.
٢٥٩٢. Jin gole mêr lêmişt e.
٢٥٩٣. Jin heye gula mêrê xwe ye û jin heye kula mêrê
xwe ye.
٢٥٩٤. Jin him gul in, û him kul in.
٢٥٩٥. Jin hin jin in hin janin.
٢٥٩٦. Jin jî hene, jan jî hene, melhema dilan jî hene.
٢٥٩٧. Jin jî hene, jinkok jî hene.
٢٥٩٨. Jin jin bê, bira li ber du dara bê.
٢٥٩٩. Jin kanin rû yê mêrê xwe sipî jî bikin û kanin reş
jî bikin.
٢٦٠٠. Jin kaniya jînê ye, mêr agirê tinê ye.
٢٦٠١. Jin kela mêran e, jin dayîka şêran e.
٢٦٠٢. Jin kela mêran e, û mêr hene karê wan rev û
bazdane.
٢٦٠٣. Jin kela ye, mêr girtiyê wê ye.

*E meş : rewî . kudandin .

٣٦٠٤. Jin keleh e mêr girti ye.
 ٣٦٠٥. Jin mêra hiltînin jî, datînin jî.
 ٣٦٠٦. Jin roniya malan e, mêr ston in.
 ٣٦٠٧. Jin roniya malane mêr stûnê malan e.
 ٣٦٠٨. Jin stûna malê ye.
 ٣٦٠٩. Jin tê dîtin, dê nayê dîtin.
 ٣٦١٠. Jin teşîris bê ê li dûvî kerê teşiyê birisê.
 ٣٦١١. Jin teşîris be ê li kîrî kerê teşiyê birisê.
 ٣٦١٢. Jin topaçê heriyê ne, tu li ku xî, wê bi wir ve bizemirin.
 ٣٦١٣. Jin û mêr tevr û bêr.
 ٣٦١٤. Jin ya bi axê disitirin, ya bi mêra.
 ٣٦١٥. Jin yek e, malê seke zebes ji çiwêl dibarin.
 ٣٦١٦. Jina baş şûrê pišta mêran e.
 ٣٦١٧. Jina baş, mêrê nebaş baş dike.
 ٣٦١٨. Jina bidin jinmiriya, kera bidin kermiriya.
 ٣٦١٩. Jina bira eyarê serê min gura, kir tûtik (pîk) heft sala têde stra.
 ٣٦٢٠. Jina çê hêjayê hemo dinê ye.
 ٣٦٢١. Jina çê hêjayî gundekî, mêrê pîs bi dûvî kundekî.
 ٣٦٢٢. Jina çê mirov dike wezîr, jina xirap mirov dike rezîl.
 ٣٦٢٣. Jina malê binyata xêni ye.
 ٣٦٢٤. Jina malê, binyata malê.
 ٣٦٢٥. Jina mêra be, li ber du dara be.
 ٣٦٢٦. Jina ne baş, mêrê baş xirab dike.
 ٣٦٢٧. Jina ne delal çavê mirov dêşîne, jina delal dilê mirov dêşîn e.
 ٣٦٢٨. Jina pîs kul û derd e.
 ٣٦٢٩. Jina pîs mêrê baş pîsdike, jina baş mêrê pîs başdike.

٣٦٣٠. Jina revandî, rûnê helandî.
 ٣٦٣١. Jina rind bi êlekê, jina pîs bi sêlekê.
 ٣٦٣٢. Jina rind buhara mêrê xwe ye .
 ٣٦٣٣. Jina rind, bela serê gund.
 ٣٦٣٤. Jina serhişk derê ber kuştinê û narê ber fereşuştinê.
 ٣٦٣٥. Jina zû razê, mêrê xwe zû pîr dike.
 ٣٦٣٦. Jinê bi namûs di nav komek leşker ra derbas bê jî, eniyê xwe hilmiştî ye.
 ٣٦٣٧. Jinê çê ji mêr e.
 ٣٦٣٨. Jinê dil kir, dîwar qul kir.
 ٣٦٣٩. Jinê hilnebijêre, esil[•] ew xêr e.
 ٣٦٤٠. Jinê rind taca serî mêrî xwe ye.
 ٣٦٤١. Jinê te rind bê, mere dewata; jinê te pîs bê, mere ser miriya.
 ٣٦٤٢. Jinê û mêr şer kir, nezana bawer kir.
 ٣٦٤٣. Jinebî li kur e şer li wir e.
 ٣٦٤٤. Jinekê heft mêr kirin û her heft jî mirin. Camêrekî çû xwast, jinkê gotê: Hevalo bibaxşîn, min heft mêr kirin û her heft jî mirin, ti di min nema ye, mêrik gotê: Ma di nav wan heftan de kesî mile hebû, jinkê gptê: Na, mêrik got: Nexwe hîn tu qîze.
 ٣٦٤٥. Jinên bira bi hevra nabin heval.
 ٣٦٤٦. Jinid pîs çavid mera dêşînin, jinid rind dilî mera dêşînin.
 ٣٦٤٧. Jinka bê xwedî ji kesî nakê fedî.
 ٣٦٤٨. Jinka têr ji xwediya nakê fedî.
 ٣٦٤٩. Jinkê rind seyd e[•], jinkê pîs qeyd e.[•]

[•]E esil : kok .binyat .

[•]E seyd : nêçîr . aw .

٣١٥٠. Jintî bi hev re başbin, bira wê ne şaşbin.
 ٣١٥١. Jiyana mezloma* ji ya zalima* dirêjtir e.
 ٣١٥٢. Jûjî destê xwe dide istiriyê xwe dibêje: Çi hevirmêje.
 ٣١٥٣. Jûjî ji çêlikên xwe re dibêje herîrî nav hêrîyo*.
 ٣١٥٤. Jûjî li têjikê xwe dinêre û dibêje: ez bi qurban pûrtika xwe ya hevrişim bim.

K

٣١٥٥. Ka kî berx e kî beran e.
 ٣١٥٦. Kadîn germ e, kulor[•] nerm e: (*Berê dizî mêranî bû; rojekê, mêrkekî gote jina xwe: dotmam, tu rabe baxçak kulor ji pismamê xwe re di hev ke, xuya ye îşev şeva mêra ye; gi ez herim birrek dewar û mêşin ji van zarokan re bînim, ma qey emê tim fiqare bin, hema jinkê jî rabû baxçak kulor jê re çêkir, û mêrik wek Kurd dibên qawîş da ser ebê, û xatir xwest û piştta xwe da felekê û berê xwe da oxirê, mêrik ji hundir derket. Gi çi derkevê, qizilqiyamet li derva ye, rêya çûnê tine ye, hema mêrik bi nermî xwe xist kadînê, di kadîna germ de kulorê nerm xwarin*).
 ٣١٥٧. Kako tê li Mako .
 ٣١٥٨. Kal ê reşiyê, can ê xweşiyê
 ٣١٥٩. Kal im ji derda re çal im.
 ٣١٦٠. Kalbûnî çekek e çerxûte ye.
 ٣١٦١. Kalê bi yar, havîna du bihar, pîra guh bi guhar.
 ٣١٦٢. Kalê Eceman li ber bostanan, kalê Kurdan li ber berxan in.

[•]E qeyd : sindî .

*E mezlom :sitembar.

*E zalim :sitemkar.

*E hêrî = herîr : hevrişim . kej . amûş .

*K kulor : êrd (ard) di dimis de distirên û di zêtê de sordikin .

٣٦٦٣. Kalê ji bênefsî, pîrê ji bêkesî, yek bi ê di pirsî.
 ٣٦٦٤. Kalê malê, rûmet li balê.
 ٣٦٦٥. Kalkî bavên xweşiya, xortkî bavên reşiya.
 ٣٦٦٦. Kanê cilê xwe ji avê derxê. (*jêhatiye.*)
 ٣٦٦٧. Kanê di kevçîk av da avjeniyê bikê.
 ٣٦٦٨. Kanê heft gunda bi barkirin bidê û li gundî heştê jî rûnê.
 ٣٦٦٩. Kanê heft roj heft şeva di aşekî xirabe da xewkê.
 ٣٦٧٠. Kanê heft rojan di aşekî xirabe de xewkê.
 ٣٦٧١. Kanê heft şîva di biroşekê da bikê û yek bi yekê de venedê.
 ٣٦٧٢. Kanê li ser heft kêndira bilîzê.
 ٣٦٧٣. Kanê li ser heft kêndira bireqisê*.
 ٣٦٧٤. Kanê xwe di qulê derziyê ra derbaz kê.
 ٣٦٧٥. Kanê xwe di ser heft dengiza* re çekê û dawê xwe şil nebê.
 ٣٦٧٦. Kanî ji serî ve şêlî dibe.
 ٣٦٧٧. Kaniya dila, civata cahila.
 ٣٦٧٨. Kaniya ku tu avê jê veduxwî keviran nevêjê.
 ٣٦٧٩. Kar bi kirinê, ker bi ajotinê.
 ٣٦٨٠. Kar di kîrrînê da ye.
 ٣٦٨١. Kar di paş zirarê* da ye.
 ٣٦٨٢. Kar ker e, te ajot ê here, te najot nare.
 ٣٦٨٣. Kar şêre, te dest avêtê dibe rovî.
 ٣٦٨٤. Kar û zirar bira ne.
 ٣٦٨٥. Kara bike lê tînê nede xwe.
 ٣٦٨٦. Kara necara, qoşilê (qaşil) dara.

*E bireqisê : semayê bikê . hildê lotika . keçekekê .

*T dengiz : derya . zerya . avşîn .

٢٧٧. Karê bi usûl hem li xwedê xweş tê û hem li Resûl*.
٢٧٨. Karê demekê, çêtire ji axiftina salekê.
٢٧٩. Karê Fate tîzê ye, Bi perakî pehlê diçinê, bi du pera quncirka ji xwe jê dike.
٢٨٠. Karê gavkî, xemên salkî.
٢٨١. Karê karkera, namûsa xatûna.
٢٨٢. Karê mal û sûkê li hev derneket.
٢٨٣. Karê Mehmûdê Kinê li bin konê ereba çî ye.
٢٨٤. Karê mêra tevr û bêr e, xemla jina zîv û zêr e.
٢٨٥. Karê ne ji mi re, ba yê wê di ser mi re.
٢٨٦. Karê rovî li derê teng çî ye.
٢٨٧. Karên xwe bikin bi esas*, bila dilê we neke tasewas.
٢٨٨. Karî (*kehr*) pîs te kir nêri, wê hilpekê diya xwe.
٢٨٩. Karikê sêwî nabe nêrî.
٢٩٠. Karker hezar in, serok yek e.
٢٩١. Karkeran kar kir, xeraba (*xerapa*) benîşt cût.
٢٩٢. Karkirê karî xwe be, şêrînê hevalî xwe be.
٢٩٣. Karkirin xweşî û dewlet e, nekirin xizani û zehmet e.
٢٩٤. Karzanîn, bazingê zêrîn.
٢٩٥. Kaşke, meqetîne.
٢٩٦. Kaya havînê bavêj kadinê.
٢٩٧. Kaya kadîna, golik radikin.
٢٩٨. Kê dinya xwar ? bêfediya,
٢٩٩. Kê dizî – Sêwiyê bê dê û bav.
٣٠٠. Kê go: Xal ez vêre heval.
٣٠١. Kê go: Gal ez vêre heval.

*E Resûl : pêximber ..

*E esas : bingeh .

٦٧١٢. Kê go: Hiş, tu dibê: Miş.
٦٧١٣. Kê golik berda, ewê girêdê.
٦٧١٤. Kê got: Şoş, tu dibê: Ezî boş.
٦٧١٥. Kê hebê dostek ji dil, kê m dibin êş û kul.
٦٧١٦. Kê ketî rakirin, xwediya.
٦٧١٧. Kê kire kê, jê re ma.
٦٧١٨. Kê tir kir, m êrkê xerîb* kir.
٦٧١٩. Kê tir kir, sêwiyê bê dê û bav.
٦٧٢٠. Kê tişt ji meriyê xwe xwast, bila di tûrî paçî de bixwazê: *(Tûrî paçî fere dibê û pir derêyê)*.
٦٧٢١. Kebanî êjdil li ber darî dergûşê xiya dikê.
٦٧٢٢. Kebanî, bi heyk meyka mala xwe zanî.
٦٧٢٣. Kebeniya zexel nanê wê xav e, û bêbextî takî zirav e.
٦٧٢٤. Keç. bi hefsar nabin.
٦٧٢٥. Keç û bextê xwe.
٦٧٢٦. Keça bê bav û dê, êvarê diçe sibê tê.
٦٧٢٧. Keça bê dê wek çiyayê bê rê.
٦٧٢٨. Keça bidin m êra ne zêra
٦٧٢٩. Keça çê rûsipîti ya bavê ye.
٦٧٣٠. Keça malê bi rûmet e, karê wê bi minet e.
٦٧٣١. Keça mîra, bi qelenê gavana nayê.
٦٧٣٢. Keça nexwende gulek vê bîn e.
٦٧٣٣. Keça qereçî nabe xatûn.
٦٧٣٤. Keçel dermana naskê, wê li xwe bikê.
٦٧٣٥. Keçel hekîm bûya wê dermanek ji serê xwe re bidîta.
٦٧٣٦. Keçel ji serkukirinê natirsin, ji şorafkê paşî ditirsin.

*E xerîb : biyanî . bêgane . avî (havî) .

٦٧٣٧. Keçel mir, gulî mor dibe .
 ٦٧٣٨. Keçelo navê min li te û hukmê min li serê te.
 ٦٧٣٩. Keçên jîr di çinîna tirî de xuya dikin.
 ٦٧٤٠. Keçikê, rû -nermikê, xorta dev xist qirikê .
 ٦٧٤١. Keçka bê bav, çiya yê bê av.
 ٦٧٤٢. Ked ji ewlada şêrîntir e.
 ٦٧٤٣. Keda helal dib mû lê naqete, keda heram bibe werîs jî diqete.
 ٦٧٤٤. Kefa dest reşnebe, tamê dev xwaşnabe.
 ٦٧٤٥. Kêfciya got: Emê şivê* berdîn dûvikciya got: Em nahêlin.
 ٦٧٤٦. Kehr di rêçê bizinê ra derê.
 ٦٧٤٧. Kêl bimirin, dibêjin poreşê min; kor bimirin, dibêjin çavreşê min.
 ٦٧٤٨. Kêl dimrin, temri sor dibin.
 ٦٧٤٩. Kel pel ûrî bel.
 ٦٧٥٠. Kela hêrsê kefa sabûnê ye.
 ٦٧٥١. Kêla kevirî, dûvê qutkirî
 ٦٧٥٢. Kêla min serî xwe şenakê ille bi şeyî mûşkin.
 ٦٧٥٣. Kelbeş divêt kera reş.
 ٦٧٥٤. Kêlê uziya tiji nabê.
 ٦٧٥٥. Kêlê* mihana tiji nabê.
 ٦٧٥٦. Kelex ket, kêr mise dibin ...
٦٧٥٧. Kêlik helawê dixwe, bi perê xwe dixwe: *(Berê qelancî (sipîker) di biharê de dihatin gunda ferefolikên tûncî qela dikirin, ji ber ku biharê şîr û mast derdiket; îcar, berî qelakirinê, yekê ji wan qûm dixist hundirê firaxa û du sing çikandi bûn diwarekî, bi wan singa digirt û bi lîngan diket hundir firaxê û kûna*

*K şivê : cixare . cigare .

*E kêl : kodik .

xwe dihjand vî alî, wî alî ta ew firaxa ji zingarê paqij biba, paşê sipîker qela dikir, ji wî mêrkî ra digotin kêlkê qelanciya; herweku ew kara kêma didîtin. Qey xwarina helawê li yaqî kêlik nedidîtin).

1708. Kêma bêje pir bike.
 1709. Ken ji dilê geş tê, baran ji ewrê reş tê.
 1710. Kenê zehf bê arî ye.
 1711. Kenê zehf girî tîne.
 1712. Kengê tu ketî destê min, tê bibînê rengê min.
 1713. Kepekê ber ervanî bavkî xwe bixwe ji qawirmê xelkê xweştir e.
 1714. Ker bê deng nazire.
 1715. Ker bi gem û hefsara, mêm bi soz û biryara.
 1716. Ker bi heft avjeniya zanin, ku ketin avê, tevan ji bîr dîkin
 1717. Ker bi kerîtiya xwe li ciyê bikevê, carek dî tê ra nare.
 1718. Ker bi kurtana, jin bi xeftana.
 1719. Ker bi naxirê re ye, pirsê ji şivên dikê.
 1720. Ker bikevê, diranê bişkên: (*Ango malik rût e, tişteke tê da nîne, ne çiwalek, ne arvan, ne nivînek, ku devî kerê lêkevê; çar neçar wê devî kerê li erdê kevê, û dev li erdê kevê helbet diranê bişkê*).
 1721. Ker bikevê, ji xwedana xurt tir nînin.
 1722. Ker çî dîzanê zahferan çî ye.
 1723. Ker di qulaqa* de nakulê.
 1724. Ker dîkin, hesp dixun.
 1725. Ker dimirê kêr namirê. merî dimirê dil namirê.
 1726. Ker dimre, kêr namre.
 1727. Kêr giha hestî.

*T qulaq : guh .

٢٧٧٨. Kêr gihişte hêstî, hên tevir î di darê da .
 ٢٧٧٩. Kêr heta tûj dibe, gelek çakûçan dixwe.
 ٢٧٨٠. Ker hinda kirî li kurtên digere.
 ٢٧٨١. Kêr ji birînê dertê, lê şopa wê dimîne.
 ٢٧٨٢. Ker ji lêxistinê re, hesp ji bezê re.
 ٢٧٨٣. Ker ket heriyê, ji xwedî pê ve kes ranehişt teriyê.
 ٢٧٨٤. Ker ket hîz dirî.
 ٢٧٨٥. Ker ket kurrê (herî), ji xudî mezintir nîne.
 ٢٧٨٦. Ker ku ji merîyan tune bin, her yek wê were hezarî.
 ٢٧٨٧. Ker li bavê xwe pix kir.
 ٢٧٨٨. Ker li kurtên nîşt kûr li kût nîşt.
 ٢٧٨٩. Ker li kurtên nîşt.
 ٢٧٩٠. Ker miriye li kortê, çiyê te li ortê.
 ٢٧٩١. Ker nabê qurban, lê perê kerê qurban pê tê kirîn.
 ٢٧٩٢. Ker sibirgêd mlan e: *(ji berko çî li ku rijî bê, derê dixwê)*.
 ٢٧٩٣. Kera li ba hev girêde, ji hev ho dibin tir-fisa.
 ٢٧٩٤. Kera me miriye, ew jî li av-dewşiyê heyiriye.
 ٢٧٩٥. Kera xwe bi ker da cilika xwe bi serda.
 ٢٧٩٦. Kerê bi perakî, kurriyê bi zaltakî* jê dibin .
 ٢٧٩٧. Kerê bi tûr de rî.
 ٢٧٩٨. Kerê bi wêrîs de rî.
 ٢٧٩٩. Kerê bin xwe najmêrê.
 ٢٨٠٠. Kerê çibkê bi bêhna gulê.
 ٢٨٠١. Kerê go zirt, min aqilê xwe girt.
 ٢٨٠٢. Kerê ku barê mera lê tune be, merî najo .
 ٢٨٠٣. Kerê mirî ji gur natirse.
 ٢٨٠٤. Kerê nemir bihar ê tê, pîrê nemir pincar î tê.

*K zalt . zolt : navê cûrak pere ye lê pir erzan e. kabciya navê wan zalta di lîztika kabê de bi kar danîn.

٢٨٠٥. Kerê reş dixwe tiştê xweş.
٢٨٠٦. Kerê te li ku biwestê, nikanim xanekê li wir ava kim.
٢٨٠٧. Kerê xwe bi singekî xurt ve girede, cîranê xwe meke diz.
٢٨٠٨. Kerê xwe ji merî şerûd dûr girêde: *(ji bo hûn bi hev têkil nebin)*.
٢٨٠٩. Kerê yekî tim dizirî mêrik got ê: Mila te xemê xayê malê tenê bixwara hele tu kê ço biziriya.
٢٨١٠. Kerên guh sist, tîrrên şidyayî dîkin.
٢٨١١. Kereng tên li kaşa, xwarina ker û cehşa çi dîke li mala paşa
٢٨١٢. Kêrguh jî dibê Xwedê, taji jî dibê Xwedê, kîjan bezatir bê ewê bi ser î din dê.
٢٨١٣. Kêrguh jî dibê Xwedê, taji jî dibê Xwedê.
٢٨١٤. Kêrguh rabû, çola (destav) taji hat .
٢٨١٥. Kêrhatiyan jî kêrnehatiyan biparêze.
٢٨١٦. Kerî nezirî gi bizirê çare lê nabê.
٢٨١٧. Kerî pir bizirê, sing û gem* dîkin.
٢٨١٨. Kerî xwe rind girêde paşê bi xwedê wesîne* .
٢٨١٩. Kero nemir heta qîvar şînbê.
٢٨٢٠. Keroşk ji çiya xeyidiye, haya çiya jê tune.
٢٨٢١. Kerra bi guh neke.
٢٨٢٢. Kerriyê ne bes, koriyê da ser .
٢٨٢٣. Kerro got: Pêjneke tê, koro got: Morantîk wa ye, tazî got: Wê cilê me ji me bikin, kûto got: Ka em birivin.
٢٨٢٤. Kerro mêvanê her ro.
٢٨٢٥. Kes aqilî xwe nadê bi aqilî kesî.

*K gem : liyan .

*K E di wesîne : bazgurî dîke . qewîtî dîke . dispêrê .

٢٨٢٦. Kes bê rehmet* namînê: (*Yek hebû karê wî kefen didizîn, xelkê digot: Kengê evê bimirê ko em jê xelas bin; pir neçû, mêrik mir, kurê wî mezin bû, gote diya xwe : bavê min çi kar dikir? Diya wî gotê: Kurê min, te çi ji karê bavê xwe ye, here wek vê xelkê karekê xwe bike. Ji diya xwe negerî, diya wî neçar bû ku jê ra bêjê, got ê: Bavê te kefen didizîn, ev kar ket serê lêwik, wî jî kefen dizîn û mirî rût dikir û darek dixist kûna mirî, xelkê got: Rehmetiyê bavê, erê, kefen dibirin, lê hema dar nedixistin kûna miriya).*)

٢٨٢٧. Kes bê sela nabe mela.

٢٨٢٨. Kes bi devî te şorbê venaxwê.

٢٨٢٩. Kes bi lingî xwe nare tîrbê.

٢٨٣٠. Kes bi sela nabe mela.

٢٨٣١. Kes bi temaşa nabe paşa.

٢٨٣٢. Kes bi xewnan dewlemend nabe.

٢٨٣٣. Kes delaliya kesî xweyî nake.

٢٨٣٤. Kes ji nêza re namirê.

٢٨٣٥. Kes li ber dara xweziyan rûneniştiye.

٢٨٣٦. Kes nabê li ku ye bavê te, tev dibên li ku ye diya te.

٢٨٣٧. Kes nabê te çi xwar, giş dibêjin te çi anî.

٢٨٣٨. Kes nabêjê dewî min tîrş e.

٢٨٣٩. Kes nakevê tîrbê kesî.

٢٨٤٠. Kes nekirî, kes nebirî, bi hev sitirî.

٢٨٤١. Kes newêrê bêjê yê biriyê te dudu ne

٢٨٤٢. Kes newêrê bêjê yê dûyî êgir tê te.

٢٨٤٣. Kes newêrê bêjê yê kêlê kêlmêşê.

٢٨٤٤. Kes nikanê bêjê yê kemûnê kem.

٢٨٤٥. Kes nikane qismetî kesî bibe.

*E rehmet . dilovanî . mêhrdarî . mehrevanî .

٢٨٤٦. Kes nizanê kî ji ber gunehê kê va çidibê.
 ٢٨٤٧. Kes ti tiştî bi xwe re nabê tirbê.
 ٢٨٤٨. Kes, bi revê li ber dijminî xwe xelas nabê.
 ٢٨٤٩. Kesê dîn, naçe ser zîn.
 ٢٨٥٠. Kesê hevalê deveciyan be, derbazê wî mezin dibe.
 ٢٨٥١. Kesê jinekê bîne, divê an tûrek perê wî an jî barek derewê wî hebe.
 ٢٨٥٢. Kesê kar bike birçî namîne.
 ٢٨٥٣. Kesê ko ji yekî fêm^{*} neke ji sedî jî fêm nake.
 ٢٨٥٤. Kesê ku têkeve dîlanê wê xwe bihejîne.
 ٢٨٥٥. Kesê min destê min.
 ٢٨٥٦. Kesê mirinê dibîne bi nexwaşiyê razî^{*} dibe .
 ٢٨٥٧. Kesê ne li malekê, nizanê bi halekê.^{*}
 ٢٨٥٨. Kesê sîra nexwê bîn jê nayê.
 ٢٨٥٩. Kesê xebitî ne xelitî.
 ٢٨٦٠. Kesê zû diçe zû jî diweste.
 ٢٨٦١. Kesek jê nemirî guliyid xwe dibirî.
 ٢٨٦٢. Kesek nabê kerî te bi çend pera ye.
 ٢٨٦٣. Kesera giran ji mala zengînan tê der.
 ٢٨٦٤. Kesî fuqare tune ye, ê fuqare li nav gora ne.
 ٢٨٦٥. Kesî ji weqiyê tune ye, giş ji lîtirê ne.
 ٢٨٦٦. Kesî li pê mirî ya mirî tune ye .
 ٢٨٦٧. Kesî qala gurî ne dikir rabû di devê kaniyê de gû kir .
 ٢٨٦٨. Keşîş fêrî kada^{*} bû ye.
 ٢٨٦٩. Ketî bi xebatê radibe.

^{*}E fêm = fehim : têgihêştin . hewisîn .

^{*}E razî : qayîl.

^{*}E hal : rewş .

^{*}K kad : navê cûrek nan e.

٢٨٧٠. Ketim otesiya dinê, neketim otesiya mêr û jinê.
 ٢٨٧١. Kevanî (*kebanî*) sisê, meşk ma li sêpê.
 ٢٨٧٢. Kevçî kodik li me hişk kirin.
 ٢٨٧٣. Kevçiyê mera tune be, mera bi kevçiyê xelkê têr
 naxwe.
 ٢٨٧٤. Kevçiyê mera tune be, mera bi kevçiyê xelkê têr
 naxwe.
 ٢٨٧٥. Kevilê bênamûsan fireh e.
 ٢٨٧٦. Kevir ji ciyê xwe tol be, wê bi hezar perçebe.
 ٢٨٧٧. Kevir li heriyê xist: (*her tiştê veşartî aşkere kir*).
 ٢٨٧٨. Keviravêjên sêva sor pir dibin.
 ٢٨٧٩. Kevirê kora li binê bîra .
 ٢٨٨٠. Kevirê mezin ne ê nîşanê ye.
 ٢٨٨١. Kevirê tol bê, ê li ciyî rast bisekinê.*
 ٢٨٨٢. Kevir-kuçik li hember zulmê* dipeqin.
 ٢٨٨٣. Kevn e pîr e, ji gotinan re bîr e.
 ٢٨٨٤. Kevra hilke şûnê bi dar ke.
 ٢٨٨٥. Kevra mîne bîrî diza.
 ٢٨٨٦. Kevrê aşê çiqas giranbe jî, aşvan bi fena xwe wî
 radike.
 ٢٨٨٧. Kevrê havîna bavêj pişt kulîna.
 ٢٨٨٨. Kevrê havînê çek bin qulînê.
 ٢٨٨٩. Kevrên mezin bi yên biçûk disekinîn.
 ٢٨٩٠. Kevrî giran li ciyî xwe dimînê.
 ٢٨٩١. Kevrî hewre çiknadê.
 ٢٨٩٢. Kew dijminê serê xwe ye .
 ٢٨٩٣. Kew li rûyê kêw dixwîne .
 ٢٨٩٤. Kew zimanê kewî dizane.
 ٢٨٩٥. Kewê ribat çavê mêkewa xwe ye.

*E zulm : stem . zor .

٢٨٩٦. Kezeb çiqra şêrîn be, şîret jê şêrintir e.
٢٨٩٧. Kezeb di ser her tiştî ra ye.
٢٨٩٨. Kezeb gurê har e.
٢٨٩٩. Kezeb ji bira şêrîntir e.
٢٩٠٠. Kezebê, bê edebê.*
٢٩٠١. Kezî rewşa qîzan e, simbêl rewşa lawan e.
٢٩٠٢. Kî bêjê hirt, tê bêjê zirt.
٢٩٠٣. Kî bêjê û bikê mêr e, kî nebêjê û bikê şêr e, kî bêjê û nekê kîrê kêr e.
٢٩٠٤. Kî bi lez here wê zû jî biweste.
٢٩٠٥. Kî bi rez û mal e, ew bi ap û xal e
٢٩٠٦. Kî bibê hevalê mirîşkê pozî xwe wê di pîsiyê da bê.
٢٩٠٧. kî bibe hevalê mirîşkê, nikilî xwe ji gû dernakvê.
٢٩٠٨. Kî bilind bifirê, wê nizim bikevê.
٢٩٠٩. Kî bûk bê mila bûk bê tu her berbûki.
٢٩١٠. Kî bûk e, ew berbûk e.
٢٩١١. Kî çêl şorî bikê wê bibehcê.
٢٩١٢. Kî dengkê, ewê golik berdê.
٢٩١٣. Kî di mehrişkê de heft lêlka bigrê û ji her yekê bi heft mala dê, bi çûnek hecê ye: *(Di ber devî biharê de qûtî gelek mala yê kevn namînê û yê nuh dernakevê, bi wan çend rojan re dibên (meherijk) belkî (reşmehe) û di wê demê bi xwe de jî kardî (kariye) şîn tê û helbet malin jî hene hîn qût li ba wan heye, îcar ji wî kardî û hinek dan di biroşek mezin da û şeş heft rojan xwe pêda mijûl dikin, ta ew lêlika çê bibê).*
٢٩١٤. Kî dibê ez xal im, ew dibê ez heval im.
٢٩١٥. Kî ditirse ew dipirse.
٢٩١٦. Kî diya min bibê, ew bavê min e.

*E edeb : tore .

٢٩١٧. Kî hesaba nekê, wê bê hesab here.
٢٩١٨. Kî ji avê bitirse, ho nabe avjeniyê.
٢٩١٩. Kî ji çivîka bitirse, nikare gêris biçîne.
٢٩٢٠. Kî ji guran bitirse, nikane pez xwedîke.
٢٩٢١. Kî ji kê bitirsê, wê bi wî bipirsê.
٢٩٢٢. Kî kê buxwê kî kê li xwexê.
٢٩٢٣. Kî li benda yarê bê, ê bê jin bimînê.
٢٩٢٤. Kî li karê ye, li harê ye.
٢٩٢٥. Kî li xêretê bê, wê li xesaretê bê.*
٢٩٢٦. Kî ne li şêrr e, şêr e.
٢٩٢٧. Kî şoşpan e ew poşman e.
٢٩٢٨. Kî te tînê sêrê çira.
٢٩٢٩. Kî teşiyê birisê, ewê bêçiyê balêsê.
٢٩٣٠. Kî xal e, tu heval e.
٢٩٣١. Kî zanê çi ji ber gunehê kê ve tê serî mera.
٢٩٣٢. Kî zanê kî ji ber gunehê kê ve çidibe.
٢٩٣٣. Kî zanê mala te li ku ye.
٢٩٣٤. Kiç dara mazî ne.
٢٩٣٥. Kiçik deriyê hecê ne.
٢٩٣٦. Kifir dom dike, lê zulim dom nake.
٢٩٣٧. Kihêl di bin mêrxasan de dibezin.
٢٩٣٨. Kijan kevra mezin e, serê xwe lêxe!
٢٩٣٩. Kijan kevrî hilîne, ew di bin da ye.
٢٩٤٠. Kijan kevrî rake î di bin da ye.
٢٩٤١. Kijan roja bê, tê wê xewnê bibînê.
٢٩٤٢. Kîn, kînê dikşînê.
٢٩٤٣. Kincid te biguviş devî mêt, wê mar pê bimirê.
٢٩٤٤. Kîngê baranê lêkir, hîngê zivistan e.
٢٩٤٥. Kîr bi paça mezin nabe.

*E xesaret : ziyan . zîrar .

٢٩٤٦. Kir etarê dimis: (*Emê dîsa vegerin ser Kêlê, dibêjin: Kêlo rastî etarekî hat, gotê: Ev çi ye. Etêr gotê: Dimis e. Kêlê gotê: Ka ez binêrim ger baş bê, ezê bikirim, devê hîzekî vekir û hinek jê vexwar û devê hîzê vekirî da des etêr û devê hîzê din jî vekir û têr dimis vexwer û devê wî hîzî jî kir destê etêr û tiştê xwastî bir û tiştê xwastî jî kir û etar wena hişt û çû*).
٢٩٤٧. Kir fis: (*Yek bi mêranî sozekê bi camêrekî dê û lê poşman bibe, helbet camêr xêlî dibe, kesek carina pirs dike, dibêjinê: Mêrik zoza xwe bi te ra anî cih, bi hêrs lê vedigerînê, dibê: Kir fis*).
٢٩٤٨. Kir gola reqbeqa: (*req û beq gavê dinêrin kes li dor golê tine ye, çiqas req û beq di golêda ne, giş dîkin wirqwirq; kesek jî li wan dera bê û kevrekî bavê wê golê ew dengina bi carekê qut dibin, mebest ew e carina li malina, li derina deng bilind dibin, ya camêrek qîrekê dide, ya mirovekî bi xatir carekê bi hundir dikevê; te dî ew deng bi carekê qut bû, wek gola req beqa*).
٢٩٤٩. Kir kirpinya gêzerê: (*gavê tu gêzerê dişkînê, dengê kir pîr kîn û kurt bê seda jê dertê, carina hinek li cîna pîr forta û lafa dîkin, û carek din jî bi ser gotinê de nayê, ya kesina gev-gurun lê dan newêrî li fortên xwe vegeriya, dibên : filanî kir kirpiniya gêzerê, ti deng jê nehat*).
٢٩٥٠. Kir pisiya tûr, rê li pêşê winda kir.
٢٩٥١. Kirasê meriya tê gihastin, lê xeyseta meriya nayê guhastin.
٢٩٥٢. Kirasê mirov diqete, lê eslê mirov naqete.
٢٩٥٣. Kirasî orispiya heft in, yekî li xwe dîkin, şeşa li hevala dîkin.
٢٩٥٤. Kîrê îro têxe qûna sibê.

٢٩٥٥. Kîrî wî xeyar e, ya buxwe ya di xwe xe.
 ٢٩٥٦. Kirîf birçî dibin, dewatid gumreh* tînin bîrê xwe.
 ٢٩٥٧. Kirîf û pez; Ereb û rez.
 ٢٩٥٨. Kirin kirar e, gotin zirar e.
 ٢٩٥٩. Kirin, ji gotinê çêtir e.
 ٢٩٦٠. Kirinek hêjayî hezar gotinan e.
 ٢٩٦١. Kirîv kal dibin, bi ber kara dikin; goçer kal dibin,
 bi ber ga û golka dikin.
 ٢٩٦٢. Kîso avruya masî naxeu.
 ٢٩٦٣. Kîştên bê fiştên nîn e.
 ٢٩٦٤. Kitêba mirov, piştî mirov tê xwandin.
 ٢٩٦٥. Kiyê bixwê, kiyê li xwexê.
 ٢٩٦٦. Konê bê stûn ne ti kon e.
 ٢٩٦٧. Konê mirov ji qesra xelkê çêtir e.
 ٢٩٦٨. Kopriya vira xerabe ye .
 ٢٩٦٩. Kor be, kerr be ji derda dûr be.
 ٢٩٧٠. Kor çilo li xwedê dinêre, xwedê jî werê lê dinêre.
 ٢٩٧١. Kor dimire, dibên çav reşê min, keçel dimire
 dibên por çîlê min.
 ٢٩٧٢. Kor ê bi çira çî bikin, kerrê bi şireta çî bikin.
 ٢٩٧٣. Kor herdu çavan dixwaze.
 ٢٩٧٤. kor korê xwedê ne, nîvkor bela dinê ne.
 ٢٩٧٥. Kor nehs in, keçel behs in.
 ٢٩٧٦. Koro li vir be, min ji te çêtir nedî, ezê li korê xwe
 vegerim.
 ٢٩٧٧. Kose jî li bîra riya ye.
 ٢٩٧٨. Koşkar heye çerm tune, çel heye mast tune.
 ٢٩٧٩. Kotek ji cinetê hatine.
 ٢٩٨٠. Koza berxa li ber qula gura,

*K gumreh : şên .

٢٩١١. Ku agir bi çiyê ket, ter û hişk tevde dişewitin.
 ٢٩١٢. Ku aqil tinebe, wê porê sipî çibke.
 ٢٩١٣. Ku bext reşbû, kûçkê malê diza venagerîne.
 ٢٩١٤. Ku dê razî be qîz razi ye.
 ٢٩١٥. Ku ders* be herfek* jî wê bes be.
 ٢٩١٦. Ku dev bi derde, kevrekî bi ser de.
 ٢٩١٧. Ku devê te tiji xwîn be, li pêş kesî tif meke.
 ٢٩١٨. Ku dilê şivan hebe, dikanê ji nêrî şîr bidoşe.
 ٢٩١٩. Ku diz bê şevê reş pirin.
 ٢٩٢٠. Ku hat hê meke, ku çû tê meke .
 ٢٩٢١. Ku kela şorbê çû buha yê heskê pera nake.
 ٢٩٢٢. Ku lawik ji êmlîkî nekeve nameşe.
 ٢٩٢٣. Ku mera negot: Eyb e ma fedî çi ye?.
 ٢٩٢٤. Ku piştî min heba zîkê min ne di êşîya.
 ٢٩٢٥. Ku te girt bernede, ku te berda bi dû nekeve.
 ٢٩٢٦. Ku tu bibî hesp wê swar pirbin.
 ٢٩٢٧. Ku tu bixwazî teedê li xezana kî, kirasê wan biqetîne.
 ٢٩٢٨. Ku tu li deriya nexê, derî li te venabin.
 ٢٩٢٩. Ku tu neke bi ya mezina wê quloçê te bibin wek yê bizina.
 ٣٠٠٠. Ku xwedê li hev anî, nûrê dikim kevanî (*kebanî*).
 ٣٠٠١. Kûçîk bê sêxur* ti pandiniyê nakin.
 ٣٠٠٢. Kûçîk binêwin, neçêyîk li dû ye.
 ٣٠٠٣. Kûçîk birçî dibin, kûnî hev bîndikin.
 ٣٠٠٤. Kûçîk birçî li ber malê nabe bekcî.
 ٣٠٠٥. Kûçîk çi dixwe wî dirî.
 ٣٠٠٦. Kûçîk goştî kûçka naxwen.

*E ders : fêrane .

*E herfek : tîpek .

*K sêxur : xwarina kûçka ye. Naneke ji kepekê û hinek ard çêdikin.

٣٠٠٧. Kûçik her birewin, tu kevrikî bavê yê, kevir namînin.
٣٠٠٨. Kûçik hestiya dixun hesabî* kûnê xwe dikin.
٣٠٠٩. Kûçik ji hestiya narevin.
٣٠١٠. Kûçik ji ku bitirse bi wî alî de direwe.
٣٠١١. Kûçik li ku dixwe li wir direwê.
٣٠١٢. Kûçik li pişt xudanî xwe î no ye.
٣٠١٣. Kûçik li ser sergoyê xwe no ye.
٣٠١٤. Kûçik pêl dûvî xwe nanin.
٣٠١٥. Kûçik pîsiyê dixwin ne ji xaşiyê.
٣٠١٦. Kûçik serî xwe bêşin, geyê dixun.
٣٠١٧. Kûçik sibehê xewdikin.
٣٠١٨. Kûçik xwediyê xwe nas dike.
٣٠١٩. Kûçika çiqas biqusîn*, nabin tajî.
٣٠٢٠. Kûçika mebin yayla*, ê har bibin û bi we bigrin.
٣٠٢١. Kûçikê me bû, bi lingê me girt.
٣٠٢٢. Kûçikekî har bi kesî bigirê, cilid wî di bin tehtekê kin û çêl rojî bihêlin wê kurmikid wek cêwrikan jê pêda bibin û wî çêl rojî di xanîkî kin û zêr û avê û camê lê nemînin ewê çê bibê.
٣٠٢٣. Kûçikî bêkêr li ciyekî dixwe, li ciyekî direwê
٣٠٢٤. Kûçikî bezî keviran jê netirse.
٣٠٢٥. Kûçikî bi du deriya xêr tê tineye.
٣٠٢٦. Kûçikî bi kar çêtir e ji şêrî bê kar.
٣٠٢٧. Kûçikî birçî, kî parîk nan pêdê ê li ber qapî wî birewê.
٣٠٢٨. Kûçikî ku tu bi zorê bişînê nêçirê, ti nêçirê ji te ra nînê.

*E hesab : jimar . bîrbirin .

*E biqusînê : kurrkê . bibirrê . hacekê .

*T yayla : zozan .

٣٠٣٩. Kûçikî nizanê birewê mêvana tîne xwe.
٣٠٣٠. Kûçikî tirrok derê kûnî kûçikî fisok bîn dikê.
٣٠٣١. Kûçikî xerîb dûvî di nav şeqa de ye.
٣٠٣٢. Kuçid* ara li hev dikevin, lê ji hev bi dûr nakevin. (*berê sêling tinebûn, îca li şûn sêling sê kevir gilover datanîn dor tifikê û nan û şîva xwe li ser dikirin, gavê kar pê nedima ji dor tifikê têvedidan quncikî pixarê, gavê gerek dibûn disa vedigerandin dor tifikê, di vê guhastinê de helbet li bin guhê hev diketin lê her tim jî li ba hevin, ya li dor tifikê ne ya jî di quncikî pixarê da ne*).
٣٠٣٣. Kuder te bêşê can di wir da ye.
٣٠٣٤. Kuder teniki mila di wir re qulbibê.
٣٠٣٥. Kuder zirav e bila di wir ra biqetê.
٣٠٣٦. Kûk (*bûk*) li çavid kesî werin, wê jinê ko pismamî xwe kirî wê kûkê bi biskê xwe yan jî bi zêrî stûyî xwe misdê ew kûk ê çê bibê.
٣٠٣٧. Kul ket şamê, ê eclê* xwe hatî mir.
٣٠٣٨. Kula aşvan arvane.
٣٠٣٩. Kula aşvan aş e.
٣٠٤٠. Kula aşvan ave.
٣٠٤١. Kula bûkê xasî ye.
٣٠٤٢. Kula dila di dil da ye.
٣٠٤٣. Kulbûn ji korbûnê çêtire.
٣٠٤٤. Kulek xwar e, dû rast e.
٣٠٤٥. Kulîka di çêm da hefkî çû bêhnda.
٣٠٤٦. Kulora* me ket zêtê.

*K kuçk : berê sêling tinebûn , sê kevir gulover li şûn sêling bi kar danîn , ew kuçkin .

*E ecl : merg .

*K kulor : êrd bi dimis distirên û bi zêtê sor dîkin .

٣٠٤٧. Kumê rasta tim qetyayî ye.
٣٠٤٨. Kumî elo didê serî welo.
٣٠٤٩. Kumî xwe berjor davê û bi gula berdidiyê: (*ango şerxwaz e*)
٣٠٥٠. kûn bi qujmirandinê teng nabin.
٣٠٥١. Kûn lê kir helaw, yan dibên kûn lê bû helaw: (*bi ser xwe ve anî*).
٣٠٥٢. Kunciyek ji destêd pexîla nakevê.
٣٠٥٣. Kund çilîka xwe dixwe, paşê bi ser de digrî.
٣٠٥٤. Kund li qûça vedihewê.
٣٠٥٥. Kund li ser malekê bixwîne, bê oxir e.
٣٠٥٦. Kund li ser malekê bixwînê, neçêyîk li pê ye.
٣٠٥٧. Kund li wêranan dixwînin.
٣٠٥٨. Kund zivistana xwe dixê paşiya qulê, û dibjê hevala xwe, ez bi dijmin im û havîna li ber devî qulê lûs dibê û hevala xwe dike paşiya qulê û dibêje: Hevala xwe tu namûsa min î.
٣٠٥٩. Kûnde bi cih dibin, xizan bi cih nabin.
٣٠٦٠. Kundir bi xewê mezin dibin.
٣٠٦١. Kundir di serî merî fiqare de dişkê.
٣٠٦٢. Kûnê mera çîqa pîse ji mera nabê.
٣٠٦٣. Kunî avê, li riyê avê didirê.
٣٠٦٤. Kûnî tirok bi nanî ceheyî mehne ye.
٣٠٦٥. Kûnid reş û sipî li ber delava xiya dibin.
٣٠٦٦. Kur darê li pişt bavê ye, qîz warê xeikê ye.
٣٠٦٧. Kur ji hinave, bira ji bave.
٣٠٦٨. kur li bava diçin, qîz li dayîka.
٣٠٦٩. Kurd dibên: Rizq sibeha beladibe.
٣٠٧٠. Kurd ji xelkê re wekî şûrin, û ji xwe re kûrin (korin) .
٣٠٧١. Kurê bi dewlet, ji ya bavê xwe der neket.

٢٠٧٦. Kurê mezin derdê malê, kurê biçûk delalê malê.
 ٢٠٧٧. Kurî li felan, xwarzî li xalan.
 ٢٠٧٨. Kurmanc î tere xwe jê re xêr e.
 ٢٠٧٩. Kurmanc ko têrdibe ya jinekê direvîne ya merîkî dikuje.
 ٢٠٨٠. Kurmanc refî tuhliya (*tîtî*) ye, hevdi nagrin.
 ٢٠٨١. Kurmê darê ne ji darê be, zewala darê nayê.
 ٢٠٨٢. Kurmê şîrî ta pîrî.
 ٢٠٨٣. Kurmî darê ji darê ye.
 ٢٠٨٤. Kurmî darê ne ji darê be dar kurmî nabe.
 ٢٠٨٥. Kurmî darê ne ji darê bê, dar nakevê.
 ٢٠٨٦. Kurrikî te hebê, tu li şûn wara namînê.
 ٢٠٨٧. Kurtik çoxe, nan tine buxwe.
 ٢٠٨٨. Kûsî jî dibê dest û lingê min hene.
 ٢٠٨٩. Kûsî rindba, xwedê ew ne dixst wî kirasî.
 ٢٠٩٠. Kûsî şandin tûq-tixim çû li helwa terpilî, got: Qeda bi karî bi lez kevê.
 ٢٠٩١. Kûsiyêd kendala bûn kebaniyêd mala.
 ٢٠٩٢. Kûsiyêd kendala xwe didin hember xezala.
 ٢٠٩٣. Kuştina kêw çî ye ? sêrî qut ke û têke xurcê.
 ٢٠٩٤. Kûtê germ mede kûçkan pê har dibin (kût ew nanê ko berî bibrêjê ji tenûrê dikeve nav êgir û bi hev de dibe topaç) .
 ٢٠٩٥. Kutkî mezin hilîne mertê.

L

٢٠٩٦. Lalîka şikestî çêtir e ji ya xwestî.
 ٢٠٩٧. Law darê bavê radike, qîz teşiya dê radike.
 ٢٠٩٨. Law jî serîk xelk e û qîz jî serîk xelk e .
 ٢٠٩٩. Law radibe darê bavê digre. keç radibe teşiya dê dirise.
 ٢١٠٠. Lawê derewîn, dixue carek firavîn.

٣٠٩٧. Lawê mencê çû qezencê.
٣٠٩٨. Lawêd me li cem xelkê gulin, û li mal jî bişkulin .
٣٠٩٩. Lawêd te hebin bi gidiya mekene, keçêd te hebin bi qehpa meken.
٣١٠٠. Lawkê min ji cot tê, tevirke wî çî lêtê, bê dayîk û ne bavo tê.
٣١٠١. Lawkê min pir delal e, mêrkar û xwedî mal e, wek şêr û şepal e.
٣١٠٢. Lawkekî di paş bûkê de li mehîne didin ji bo berwîlî xwe law bê.
٣١٠٣. Lê kaliyê lê koriyê, mirin çêtir e ji feqîri yê.
٣١٠٤. Lêhatin ji jêhatinê çêtir e.
٣١٠٥. Lêniştinê kera carekê şerm e, jêdahatin du cara şerm e.
٣١٠٦. Lêv ji diranan pêşdetir in.
٣١٠٧. Lêvek li erdê ye, lêvek li ezmên e.
٣١٠٨. Lêxistina pir kêr qelp dike .
٣١٠٩. Leyî her roj kutikan nayne.
٣١١٠. Li (ji) xwarinê re nan nabîne, kuma bazar dike.
٣١١١. Li aliyekî şîn e, li aliyekî dawet e.
٣١١٢. Li ba dînan tim îd û dewat e.
٣١١٣. Li ba gamêşa çêrê ciyekî şînkayî lê heye bibe bi şev da radibin derinê.
٣١١٤. Li bejnê nêrî bi zêra kirrî, laçik rakir kertkê gurrî.
٣١١٥. Li ber bûka beravêtî neketiye, bi mankera ku cêwî ani ye şa bû ye .
٣١١٦. Li ber bûka beravêtî neketiye, bi mankera ku cêwî ani ye şa bû ye.
٣١١٧. Li ber çavid mişk pisîk bi qas hêştiriki ya.
٣١١٨. Li ber defa bê deng direqise.
٣١١٩. Li ber dilopê çû ber şirikê.

٣١٢٠. Li ber fiskê morîka pêvedike.
 ٣١٢١. li çayî gewr ker bikevê, li vir qûşê bi stî minkevê.
 ٣١٢٢. Li cem kêmaqila her bihar e.
 ٣١٢٣. Li cem mêrên êrgan, lêxistinê jinan hêsan e.
 ٣١٢٤. Li ciyê nizim, qûç xwe çiya dihesbînin.
 ٣١٢٥. Li dayîkê binêre qîzê bixaze.
 ٣١٢٦. Li dê bimêze keçê bixwaze.
 ٣١٢٧. Li dê birêne dotê werêne
 ٣١٢٨. Li deriyê kesî nexê bi tilîka, bila kes li deriyê te
 nexê bi mîrkuta.
 ٣١٢٩. Li dînî xwe bipirse ta heft kes bi tera bibên ma tu
 dînî.
 ٣١٣٠. Li dinyayê mera gî bike, mera vira neke .
 ٣١٣١. Li gor salê tê fesalê.
 ٣١٣٢. Li gora makê golik pake.
 ٣١٣٣. Li gunda şerid mezin bibin, li mêra mexin, li jina
 xin.
 ٣١٣٤. Li heft gunda mêrkir kesî ew têr ne kir.
 ٣١٣٥. Li hemama tîr, li xeribiyê * virr.
 ٣١٣٦. Li hêştir nîştîye, diqelizê kêrgiyê.
 ٣١٣٧. Li kerê nîştî, li kurtên digêrê.
 ٣١٣٨. Li kerî ketî digêrê ku hefsêr jêke.
 ٣١٣٩. Li kerî mirî digere ku nala jêke.
 ٣١٤٠. li ku mefa ye, li wir bav û bira ye.
 ٣١٤١. Li kûçik biqewime* ji tajî bezotir e.
 ٣١٤٢. Li kuder av û dare, ew der war e.
 ٣١٤٣. Li kuderê dare, ew der war e.
 ٣١٤٤. Li malê nîne jaji xwe dike toltajî* ...

*E biqewimê: hêrs rabê.

*K toltajî : berê çemberin ji şivêd mêwê çê dikirin ji bo guvîştinê tîrî
 civilandi bi kar danîn .

٣١٤٥. Li malê tune nan û jajî, xwedî dike tûle û tajî...
٣١٤٦. Li malî kelepîr* digerê ko erzan bikirê.
٣١٤٧. Li meydanê mîr û mirtib yekin.
٣١٤٨. Li nav malê şêre, li nav êlê kitika bêkêre.
٣١٤٩. Li nav şûvêd reş xew meke, da xewnê xirap nebînî.
٣١٥٠. Li paşiyê tim başî hebû ya, wê li paşiya pêz ker tinebûya.
٣١٥١. Li pê bê li tirbê bê.
٣١٥٢. Li pêş zimên ne çiya hene ne gelî.
٣١٥٣. Li qîzê binêre qelen vebire.
٣١٥٤. Li quncî sifra rûmene.
٣١٥٥. Li rengê tûtînê û bextê avê nenhêre.
٣١٥٦. Li ser piştê te kabik nayê avêtin: *(kabik, cûze, ji lingid pêz derdixin, pê qumarê (kabê) dilîzin, berê li gunda (iskembîl, qeremaç, kaxet) tine bûn, bi kabka dilîstin, û hinek ji hebûn pere didan kabciya, bi wan re digotin (fêdecî). Ger kabciya kar bikirana, perê xwe û kara xwe dibirin, ger zîrar bikirana, tiştikî wî ji ber perê xwe ve dibirin; hinek fêdecî hebûn di nivê lîzkê de pere li ser kabciyê xwe qut dikirin, qey tiştî wî ko ji ber perid xwe ve bibira hindikbû. îcar li vir kabcî bi fêdeciyê xwe re digot: li ser piştê te kabik nayê avêtin; mebest, ango mera li te ewl enabê).*
٣١٥٧. Li ser rêya Helebê bi nalê dipirsê.
٣١٥٨. Li teştê û li piştê: *(Berê, xizanî pir bû, jin bi gelemperî bi fistanekî bûn, ew fistan tim li wan bû ango li piştê wan bû, rojê şûyê ji xwe dikirin û*

*K kelepîr : tiştî hatî dizîn ya li erdê hatî dîndin ya kevnare. Ez dibêm kelepîr û kelepûr yekin.

dixistin teştê ji bo bişûn, û ziwa bibê da li xwe kin, anga berşû bi dest her kesekê nediket).

٣١٥٩. Li warê bê av daneynin.
٣١٦٠. Li wê kastînê çû mêrsînê. (*kastîn. gavê tu likûçik dixê kastînî bi kûçik dikeve. Û radibe direve ciyekê dûr. Carina kesin di bin zorekê de yan xêlibûnekê de ji vir ji wir serî xwe radike û bi cîkê dûr de derê . ji bo wî bêtir bêşînin û rezil bikin . dibê filan kes li wê kastînê di filan ciyê re derket).*)
٣١٦١. Li welatê koran çavşaş qeral e.
٣١٦٢. Li xêrên xelkê be, xêr wê bi xwe werin pêşiya te .
٣١٦٣. Lihê mê ji Çayî Gewr radikê: (*ango zû dixeyidê, li mihana digere*).
٣١٦٤. Li malê tune dînar, navê keçikê hezar.
٣١٦٥. Ling li qeydê, çav li seydê.
٣١٦٦. Ling ling digere, kar kispikî xwe nakê.
٣١٦٧. Lingê gerê nayê bin berrê.
٣١٦٨. Lingê şimitî heval jêre tineye.
٣١٦٩. Lingekî li vir e, lingekî li wir e.
٣١٧٠. Lingî xwe bi tayî noka de: (*karekî bê omîd e; tevî wê jî, omîdê nebire û xwe ragire, dawî hindik mayî*).
٣١٧١. Lingid êşeka* narin ser doşeka.
٣١٧٢. Lingid kera naçin ser berra.
٣١٧٣. Lingid xwe li gor berrê xwe rade.
٣١٧٤. Lingid xwe li gor doşekê xwe dirêjke.
٣١٧٥. Lingid xwe li lingêd kê bûyî megir.
٣١٧٦. Lingid xwe mexe solên teng.
٣١٧٧. Lingid xwe qas orxanê xwe dirêjke.
٣١٧٨. Lîsk (*lîzk*) lîska berê, dûv dûvê kerê, yan dibên:

*T êşek : ker .

Lîsk lîska berê, quz quzê kerê: (*Li gunda lîskêd pîr tevayî ne; di lîskêd tevayî de jî du bend çê dibin, her bendek alîkî lîskê ye û her lîskekê jî yasayên wê hene; li gor wan yasa jî carina di nav herdu bendan de nakokiyin mezin ne li gor yasayê derdikevin, îca hîngê lîsk neçar dibê ku rawestê, ji bo li gor yasa lîskê wê nakokê çareser bikin, carina bi rêya yasayê çareser nabê, îca hîngê yekî bi xwe û bi gotina xwe bawer destê xwe bilind dikê û dibê: Hê, hevalino, lîsk lîska berê, quz quzê kerê; îcar, hîngê herdu bend radibin û lîska xwe dibin serî*).

٣١٧٩. Lîstin (lîztin) li gayê pîr nayê.

٣١٨٠. Lîtir li navî xwe tê .

٣١٨١. Lome dibin gom e.

٣١٨٢. Lûq gewriyê ziç sêrgo: (*lawik nesax e, nexaş e, li hundir dixwe, wê, tavilê, dere ser sêrgo derdixe*).

M

٣١٨٣. Ma a te namûs e . a xelkê filûs e * .

٣١٨٤. Ma bavê te sifra xwe li çatrê ya danî bû.?

٣١٨٥. Ma çûka zimanî te xwarîye.

٣١٨٦. Ma dermanê mûmkê ye.

٣١٨٧. Ma donî qirkê di xwe dayî: (*yek dereng bimirê, dibên: donî qirakê di xwe da yî*).

٣١٨٨. Ma emê tûya ji te bixwin: (*kesekî kara nekê ti fêdê nedê, dibên ma emkê tû ya ji vî bixwin*).

٣١٨٩. Ma emkê bi kîrî te sîra bikutun: (*xortek ji malekê carina kar-kispekî nakê tenê xwe dişû û dimalê û çî xwarina pak di mal de hebê, ew dixwê, girs dibê, qelew dibê û ne xema wî û ne dema wî; îcar, bav bi henekî qey newêre bi hêrs bêjê yê , dibê: Kurê min, tu xwe xurt dikê, ma em kê sîra bi kîrî te bikutin, ma xêr*

*K filûs e : pere ye .

i lle li vir sîr hatî holê, ji berko sîra di hewên (hewan) da dikutin û kîr jî wek destikê hewên e).

٣١٩٠. Ma emkê rezin şivsor bi hev re biçînin: (*rezid şivsor çarpênc sal gerek in ta bigîne û di mêxel kevê, mebest, ew e ko em pir bi hev re namînin*).
٣١٩١. Ma emkê te li devê gîsinkin: (*Gîsin, bi cotajotinê ko dibê, cotarî ew gîsna dibir ba hesinker, polat dixist ser devê gîsin; carina, di malan de yek qêmîşî xwe nedibû karekî bikê yan hina xwe ji karina vedigirt digotinê: Ma te xwe hilînayî ji bo em te li devê gîsin kin*).
٣١٩٢. Ma ew jî jine, agir berda mala mine.
٣١٩٣. Ma ez erebê bavê te me.
٣١٩٤. Ma ez li ser sifra bavê te mezin bûme.
٣١٩٥. Ma file hemo îşo ne.
٣١٩٦. Ma gi ez ne gihêştim te, ezê te jî negînim xwe.
٣١٩٧. Ma î te cane î xelkê bacan e.
٣١٩٨. Ma illem şerî çûka li nav garisî me bibê.
٣١٩٩. Ma ka ne a te bû, kadîn jî ne a te bû. (*gavê kesin çav birçî li deverina yan di boneyan de dikolijê ser xwarinekê û bi çavkurrî duxwe. Di dû re zik bêşê. Ji bo wî bêşînin û ji bo carek din we neke. Dibênê . ma ne ya tebû ma kadîn jîya tebû*).
٣٢٠٠. Ma kêrta hêsîni ye.
٣٢٠١. Ma kewê bi kostek e*.
٣٢٠٢. Ma kuliya zimani te xwarîye.
٣٢٠٣. Ma me tirp kirine êgir.
٣٢٠٤. Ma min bîna destê xwe kirî.
٣٢٠٥. Ma min kefa xwe bêhn kirî ye.

*K Kostek: xelxalek biçûk e, dixin lingê kewê gozel; ez gûman dikim ku kostek ji kostî hati bê. Kostî pişte e ji heftê û du nexan tê ûnan û Zaredeştî wê piştê didin navê zarokên heft salî ji bo li pey rewîştên Zaredeşt bi zanebûn herin.

٣٣٠٦. Ma mirov qawîn e ku yek kûnê bêhn kê: (*ji bo çi kûnê bêhn kê, ji berko qawîn ger bû bê, di bêhnkirinê kûnê re tê zanîn*).
٣٣٠٧. Ma morîkê diya te li vir qetîne.
٣٣٠٨. Ma pîka heft sazî ye.
٣٣٠٩. Ma qey dêka hirçê reqas bû ?.
٣٣١٠. Ma qeyne jin çiçekin mera ke di ber serê xwe re ke.
٣٣١١. Ma qeyne mêr gulin gi mera di ber serî xwe eakê
٣٣١٢. Ma serin kêl di bin kumada ne.
٣٣١٣. Ma te ava heyatê vxwariye.
٣٣١٤. Ma te def dirandiye: (*def karê kirîva ye, her kirîvek nikane defê bidirîne; gavê kirîvek defê bidirîne, li ba kirîva pilek pir bilind e; mebest gavê yek karekî bike û xwe bibîne, dibê: Ma te def dirandî*).
٣٣١٥. Ma te kezzebê kêrgiyê xwarî ye: (*ango pîrr tîrsok e*).
٣٣١٦. Ma te mêr guhart, tê bextî xwe jî biguherê.
٣٣١٧. Ma te namûsê xwe bi nên xwariye.
٣٣١٨. Ma te navka min birri ye.
٣٣١٩. Ma te nişadir di kûnî xwe dayî tu li cîkî natebitê.
٣٣٢٠. Ma te pîrçê min nerm diye: (*te di min re diye, te ez milayîm ditime*).
٣٣٢١. Ma te rum li kelê xistiye.
٣٣٢٢. Ma ti seriyê kêl di bin kuma de man (Ma tiştî veşartî ma, ma nerindin min û veşartî hene).
٣٣٢٣. Ma tim Şediya nanî rûnî xwariye: (*Berê, Rojê Erefatê nanî rûnî çê dikirin, dixwarin û jê bela dikirin. Ev nan jî jê ra rûn û dimis gerek e; qey li gundê Şediya dimis tine bûye, radibin peyakî dişînin gundekî ji bo hinek dimis binê, mêrik derê wî gundî dimis tînê, bi rê de diwestê, dibê: Ez bêhnekê rûnim, satila dimis dîdinê, satil dernexûn dibê û dimis dirijê*).

mêrik hêrs dibê û lingê xwe li satilê dixê, û dimisê tê de mayî jî dirijînê û dibê: Ma tîm Şediya nanî rûnî xwariye).

٢٢٢٤. Ma tu berxê misteşêr e.

٢٢٢٥. Ma tu bi tivngê nemir tê bi vî fisî (kuç) jî nemirê.

٢٢٢٦. Ma tu bi zenbîla hatiye xwar

٢٢٢٧. Ma tu hêştirê dewletê ye: (*Du çêrok hêştirê dewletê hene: ya yekê, dibêjin berê dewleta Al Osmên bi hêştira top dikşandin dibirin dera. Hêştirek kal bûye, nema kanê top bikşînê, radibin hêştir derdixin malnişînê (teqawîte) û feremanekî jê ra dinvîsin û bi stû dixin, ku ev hêştir ku da herê, çi bixwê, li ku xew kê, nabê kes dengî xwe vê ra bikê; îcar, li vir çêrok dibê du şax : a yekê, dibê rojekê hêştir li pêş firoşgeha (dûkan) yekê ye, sebse-şînkayiyê dixwe; mêrik çûye paş dûkana we vîlkên mizînê li hev dixê; cîranê wî hêdîka derbaz bû, gotê: Tu çi dikê, go: Ez va sehnkina li hev dixim belkî hêştir bitirsê ji ser sebzê herê, cîrên gotê: Bavo, bi hezaran top li ser piştê hêştir teqîne netirsiye, ê ji sehnkid te bitirsê; a dudiyê, ew çêroka bi xwe ye, dibên dûknadara û yên hêştir zererê dighê wan, li hev kom bûn û çûn ba walî ku çarakê ji xwe re bibînin; giştê da dû pêşengekî xwe û çûn, pêşeng ket dîwana walî li paş xwe nêrî gi kesek tine ye, walî gotê: Çi dixwazî kurê min, pêşeng go: Hezretê walî vî hêştirî gelek cefa bi dewletê re dîtiye û îro jî bi tenê maye, ez dibînim bêhna xwe gelekî teng dibê, ez hêvî dikim padişa hevalekê bi wî fermanî ji hêştir re bişînê).*

٢٢٢٨. Ma tu kê tîrbê min bi qube hilînê.

٢٢٢٩. Ma ûrê hêştir derbû ye.

٢٢٣٠. Ma virr jî bi kaviran e.

- ٣٣٣). **Ma we tif devê hev kirî: (ji hev hobûne).**
٣٣٣٤. **Ma xan bi kirî bû.**
٣٣٣٥. Ma xuyê dikeve pelûlê jî: *(Mirovekî xanedan jinek wî fedî nekir û pitpitokî hebû, rojekê mêvanekî xwe hat, piştî xoşbêş, çûn bi demekê mêrik xwast xwarinekê bide mêvên, lê zanê xayê li mal tine ye û zanê jinê bê fedî bidê rûya, mêrik ponişt ko şivekê bînê bîra xwe gi xayê nakevêyê, pelûla dimis hat bîrê, hema bi kêf û serbest gote jina xwe : qîzapê, ji kerema xwe rabe pelûlekê ji mera bike em ê bixwin, jinkê jî bi leztir got: Ma tu nizanê ku ji zû de xuyê li mal tine ye, mêrik gotê: Ma tu jî nizanê gi xuyê nakevê pelûlê).*
٣٣٣٦. **Makê pir ne alistiye: (hêwan (ajal) gavê dizên zayên xwe dalêsin, ger pak nelêse û pir pê ve nemîne qey kêmanin di wê zayê de dimînin, mebest ew e gavê tu kêmanina di yekî de dibîne, tu dibê, makê pir ne alistiye).**
٣٣٣٧. Mal bê ard dibin, bûk bê benîşt nabin.
٣٣٣٨. Mal bê mêvan, gund bê şivan nabin.
٣٣٣٩. Mal bi camêriyê xera na be.
٣٣٤٠. Mal bi jinê ava dibe.
٣٣٤١. Mal çîqa mezin dibin, derd û kul pir dibin.
٣٣٤٢. Mal jî ji cên e.
٣٣٤٣. Mal li ser malê nabe.
٣٣٤٤. Mal mala te ye lê bi alî firaxa de mere.
٣٣٤٥. Mal têr e kebanî wekî şêr e, mal birçiyê kebanî gazgêncî ye.
٣٣٤٦. Mal têr e, kebanî wek şêr e.
٣٣٤٧. Mal vedigere, can venagere.
٣٣٤٨. Mal, aş û bajarin.

٢٢٤٧. Mala aşîqa* bi rûniştinê xiradibê.
٢٢٤٨. Mala bavê min dûrbana, minê têr pesnê wan bidana.
٢٢٤٩. Mala bavê min ne li vire, têr bipesinim ji xwe re.
٢٢٥٠. Mala bê debar*, weke tirba sar e.
٢٢٥١. Mala bê jin xerabû ji bin.
٢٢٥٢. Mala bê mêvan derî lê venabe.
٢٢٥٣. Mala bê mezin, weke pezê bê şivan e.
٢٢٥٤. Mala bê pisîk, mişk tê de pehlewa ne.
٢٢٥٥. Mala bekê dudu dan bi yekê, ew yeka jî ne wek xelkê.
٢٢٥٦. Mala bi kew, dimînê bê dew: *(kew ji bo nêçîrê ye, xwediyê kêw nêçîrvan e, nêçîrvan bi xwe û nêçara xwe de dikeve, nikane pêz xwedî ke, û pez tine be, dew jî tine ye).*
٢٢٥٧. Mala bûkê def û zurne, mala zavê hay jê tine.
٢٢٥٨. Mala derewîn şewitî kesî jê bawer nekir.
٢٢٥٩. Mala fatê çû cem bazarê.
٢٢٦٠. Mala gur e, ne ard e ne bilxur e.
٢٢٦١. Mala li kerekê, hero li derekê.
٢٢٦٢. Mala me li ço yê me ye, ço yê me li ser mila me ye.
٢٢٦٣. Mala melê zave tirşeqîn ketî nave.
٢٢٦٤. Mala mêr tê de kaniya zêr tê de.
٢٢٦٥. Mala mêran çêtir e ji mala mîran.
٢٢٦٦. Mala mêran kaniya zêran.
٢٢٦٧. Mala meriv him cineta meriv e û him cehnima meriv e.

*E aşiq : evîndar . dilketî . dilbaz .

*E debar : çareserî . çaresazî .

٣٣٦٨. Mala mezin her ro min digezin, mala çûk her ro min dikin bûk.
٣٣٦٩. Mala nan dayî tinebûnê nabîne.
٣٣٧٠. Mala pir jin kembax bû ji bin.
٣٣٧١. Mala pir jin tê de xerabû ji bin de.
٣٣٧٢. Mala pîrê stara° pîrê.
٣٣٧٣. Mala pîrê, eyba pîrê.
٣٣٧٤. Mala têr jin xerabû ji bin.
٣٣٧٥. Mala xelkê nabe mala mirov, lawê xelkê nabe lawê mirov.
٣٣٧٦. Mala zarok tê de, ehremen naçe têde.
٣٣٧٧. Malê axa dengiz e, kî nexwê donxiz e°.
٣٣٧٨. Malê axê diçe canê xulêm dêşe.
٣٣٧٩. Malê bêxwedî, ya diz dibin ya gur dixun
٣٣٨٠. Malê camêrkî û xesîskî wek hev derê.
٣٣٨١. Malê dinê gemara desta ye.
٣٣٨٢. Malê dinê gemara destî camêra ye.
٣٣٨٣. Malê dinê li dinê dimîne.
٣٣٨٤. Malê dinê qirêja desta ye.
٣٣٨٥. Malê dinê qloçê mêran e.
٣٣٨٦. Malê dinê, li dinê ye.
٣٣٨٧. Malê dinyê gemara destî canik û camêra ye.
٣٣٨٨. Malê heram* dere û malê helal* jî bi xwe re dibe.
٣٣٨٩. Malê heram° di rê ya heramiyê re dere.
٣٣٩٠. Malê heram, malê helal bi xwe re dibe.
٣٣٩١. Malê kund lê xwend, ew mala xera dibe.

°E sitar : perde .

°T donxiz : beraz .

*E heram : bêrewa . guneh . arîş

*E helal : homoş .

°E heram : bêrewa . xiral . arîş .

٣٣٩٢. Malê malnexwaran behra zordara ye.
 ٣٣٩٣. Malê miriyan ê zindiya ye.
 ٣٣٩٤. Malê ne ji lawî çê ra bike, û ne ji lawî xirap re.
 ٣٣٩٥. Malê qûn divê, girarê rûn divê.
 ٣٣٩٦. Malê te hebe, her kes dostê te ye.
 ٣٣٩٧. Malê tenbela berî malê zalima xira dibê.
 ٣٣٩٨. Malê xsîs, diçe fetîs.
 ٣٣٩٩. Malê xwe bide, seriyê xwe meşkîne.
 ٣٣٠٠. Malê xwe wek mêşê li qapax e: *(mêşê li qapaq, ew kewarê mêşê hingiv ko hingiv jê dernexistine, îcar malek wek wê keware be, dibe ciyê pesnê).*
 ٣٣٠١. Malê zaf bê heram nabe, xeberdana zaf bê virr nabe.
 ٣٣٠٢. Malek ku yekdest bê, gundek pê nikanê, gundek yekdest bê, êlek pê nikanê.
 ٣٣٠٣. Malî camêra li meydanê ye.
 ٣٣٠٤. Malî dinê li dinê dimînê.
 ٣٣٠٥. Malî dinê serî xwe buxwê.
 ٣٣٠٦. Malî pexîla rizqê camêra ye.
 ٣٣٠٧. Malî pîs ê xwedana ye.
 ٣٣٠٨. Malî zengîna bela serê fuqarane .
 ٣٣٠٩. Malid pak di gedûka^{*} re xuya dikin.
 ٣٣١٠. Malid şêra bê hestî nabin.
 ٣٣١١. Malxirakirin careke .
 ٣٣١٢. Mamanê li xwe bi gûmanê.
 ٣٣١٣. Mamo ne li mal e, mala mamo gale gal e.
 ٣٣١٤. Manê tirekan ardê cehîn e.
 ٣٣١٥. Mange ne bi ga bê boxe bi dû nakevin.
 ٣٣١٦. Mar bê jehir nabe.
 ٣٣١٧. Mar biçûke, serî jêke.

*T gedûk : neqeb . bihur . derbazok .

٣٣١٨. Mar çêba dest û pê nediketin zik.
٣٣١٩. Mar çîqa hokan bide xwe, gereke rast here qula xwe.
٣٣٢٠. Mar dûvî xwe yî qut ji bîr nake, pîr nalnalê lawî xwe ji bîr nake.
٣٣٢١. Mar ji pûngê xêliye, li ber qulê şîn tê.
٣٣٢٢. Mar nakevin paşîla.
٣٣٢٣. Mar pêvedayî, ji wêrîs ditirsê.
٣٣٢٤. Mar qulê xwe nasdike.
٣٣٢٥. Mar û mişk bûne xweîşk.
٣٣٢٦. Marê bin testê ye, dûv li ser piştêye.
٣٣٢٧. Marê ku mar e, di ser avê de bi meriyan venade.
٣٣٢٨. Marek di hewşê kesî kevê, avinê avsin kin û bi hewşê reşînin wê mar ji hewşê bazdê.
٣٣٢٩. Margestî ji werîs ditirse.
٣٣٣٠. Marî kor avsinê nagrê.
٣٣٣١. Marî kor bi kê dadê, ji siyê naghê ber royê.
٣٣٣٢. Masî di avê de aza ye.
٣٣٣٣. Masî di golê de nayên bazarkirin.
٣٣٣٤. Masî di sêri da digemire.
٣٣٣٥. Masiyê çeman di behran de najî.
٣٣٣٦. Mast taştiya rast, dew taştiya derew.
٣٣٣٧. Mastê biharan bidin neyaran, mastê payîza bidin ezîza.
٣٣٣٨. Mastê kîs nabe rîs.
٣٣٣٩. Mastî kûçik biçelpînê jêre dimînê.
٣٣٤٠. Mastî rind bikeyê da nîvişk vêkevê.
٣٣٤١. Mazîvanî ne karê axan e.
٣٣٤٢. Me bi xwe rovî bir nav rezê xwe.
٣٣٤٣. Me çî got û tembûrê çî got.
٣٣٤٤. Me deve nedîtine, ma me pişkulê wan jî nedîtine.

٣٣٤٥. Me ew xwedî kirin di dawa xwe de, destên xwe avêtin rêyên me.
٣٣٤٦. Me girt tajî, derket tol tajî.
٣٣٤٧. Me hêştir nedîne li rêzê, qey me pişkul jî nedîne li pirêzê.
٣٣٤٨. Me jî rûvî re got: Rûvî jî dûvçilkê xwe re got .
٣٣٤٩. Me li pişt xwe li kerê kir, dest avêt e xurcê.
٣٣٥٠. Me roja pêşin devê pisîka xwe qelaşt: *(li gor gûmana min, mêrik roja bûk aniye, berî herê ba bûkê, li ber bûkê devê pisîkê qelaşt ji bo bûk her tim jê bitirsê).*
٣٣٥١. Me tu li jor jî dî, me tu li jêr jî dî.
٣٣٥٢. Mê ye û dixwazê mêraniye bikê.
٣٣٥٣. Mebe hevalê leng a, nabîsî deng a.
٣٣٥٤. Mede yan mera jîr dîkin, yan jî mera kor dîkin.
٣٣٥٥. Mefer* ders e*, herfek* jê bes e.
٣٣٥٦. Megere li newala, da nebînî xeyala.
٣٣٥٧. Meken bi deriya zû tê seriya.
٣٣٥٨. Mekene li jar û bendewaran bikene li ser bizêr û kofixwaran.
٣٣٥٩. Mekev, mekev, kesî ketiya tune .
٣٣٦٠. Melê bihna xwarinê kir, quran jî bîr kir.
٣٣٦١. Melevan, dixeniqin* .
٣٣٦٢. Meqes sed carî meqes.
٣٣٦٣. Mêr bê xwedî bin, jar dibin; jin bê xwedî bin har dibin.

*E mefer : rev . bazdan .

*E ders : fêrane .

*E herf : tîp .

*E dixeniqe : difetise . diniqomê .

٣٣٦٤. Mêr bi kuma dirêj dibin, jin bi qundira dirêj dibin.
٣٣٦٥. Mêr bi mûyê xwe, jin bi rûyê xwe.
٣٣٦٦. Mêr bi nanekê nabin nandar, û bi darekî nabin navdar.
٣٣٦٧. Mêr bi rihê xwe, jin bi rû yê xwe.
٣٣٦٨. Mêr bi te dada, şîr vexwe.
٣٣٦٩. Mêr çol e, jin gol e.
٣٣٧٠. Mêr dimire dil namire, ker dimre kîr namire.
٣٣٧١. Mêr dimirê jin hardibê, jin dimirê mêr jar dibê.
٣٣٧٢. Mêr gelî ne, jin gol in.
٣٣٧٣. Mêr giş ne mêr in, ker jî nêr in.
٣٣٧٤. Mêr gula malan e û jin derdê mêran e.
٣٣٧٥. Mêr hebin, şeveriş pir in.
٣٣٧٦. Mêr hene û mêrik hene, jin hene, û jinik hene.
٣٣٧٧. Mêr hene, mêrik hene.
٣٣٧٨. Mêr heye mêrê demdemi ye, mêr heye mêrê herdemi ye.
٣٣٧٩. Mêr jî hene mêrkok jî hene, jin jî hene jinkok jî hene.
٣٣٨٠. Mêr jî jinên zana nefret* dikin.
٣٣٨١. Mêr jî şerma xwe têne kuştin, jin jî bê şermi yê.
٣٣٨٢. Mêr jî şerma xwe têne kuştin.
٣٣٨٣. Mêr jina dikin jin jî û dikin darqûn jî.
٣٣٨٤. Mêr kaniye jin gole.
٣٣٨٥. Mêr kaniye, pîrek birk e*.
٣٣٨٦. Mêr ketin kewara, jin çûn hewara.
٣٣٨٧. Mêr lêmişt in, jin jî gol in.
٣٣٨٨. Mêr mêr bê şevîd reş pirin.

*E nefret : silbûn . bêzarî .

*E birk : gol . esêrk . avzêl . meher .

٣٣٨٩. Mêr mêr gotine, jin jin gotine.
٣٣٩٠. Mêr mêra nasdike, palzûn pûna kera rast dike...
٣٣٩١. Mêr mêran nas dikin, jin camêra şaş dikin.
٣٣٩٢. Mêr tev mêr be, jin tev jin be, kî mihtacê kê be.
٣٣٩٣. Mêr tevir e, jin bêr e.
٣٣٩٤. Mêr ya mêrxasbe ya bimire ji xwe xelasbe.
٣٣٩٥. nabe.
٣٣٩٦. Mera aşî wê de nebîne, aşî vir de bi mera şêrîn nabe.
٣٣٩٧. Mera bi lê da çû, merayê destî xwe çekê çî bûye.
٣٣٩٨. Mera carekê tê dunyê.
٣٣٩٩. Mera dişînê diziyê û li mera didê firîziyê.
٣٤٠٠. Mera dostî xwe di tengiya de nas dikê.
٣٤٠١. Mera guh nede mezinê xwe, mera timî poşmane.
٣٤٠٢. Mera ji bava de sêwî nabe, lê mera ji dêkan de sêwî dibe.
٣٤٠٣. Mera ji biroşê xwe têr nexwê, mera ji broşê xelkê têr nabe.
٣٤٠٤. Mera kanê nanî xelkê bi zorê bixuê, lê mera nikanê nanî xwe bi zorê bi xelkê dê.
٣٤٠٥. Mera kê rezîl bibê, mila malî mera rezîl bibê.
٣٤٠٦. Mera ku nemir, royên xweş mera yê bibîne.
٣٤٠٧. Mera li malê xwe sixêfa dikê pêdişê jî.
٣٤٠٨. Mêra mêr dikuştin, ceboriya hûr dişûştin.
٣٤٠٩. Mêra mêr kuşt, senemê hûrî şuşt.
٣٤١٠. Mera ne kanê li pêşê te herê ne li paşî te herê.
٣٤١١. Mera nikanê ji ber kerasî xwe ve sûnd bixwe.
٣٤١٢. Mera şorê tamam anca kera re hewaldê.
٣٤١٣. Mera xwe bi destî xwe nexurîne xurê mera naşke.

٣٤١٤. Mera zanibe mera kê kengî bimirê, mera yê tirbak
xwe pêşda bikolê.
٣٤١٥. Merakê çêrrê mêvana bibe, bibê jinê mila şîv
hazir be.
٣٤١٦. Mêranî ne bi badanê simbêla ye.
٣٤١٧. Mêranî salê carek, mêvanî mehê carek.
٣٤١٨. Merantî (merivantî) çiqasî tehle waqasî şêrîne.
٣٤١٩. Mêrê baş mîr e, û mêrê xirab esîr e.
٣٤٢٠. Mêrê baş nanêre ne li pêş û ne li paş.
٣٤٢١. Mêrê çê bi gundekî, merê xirab bi kundekî.
٣٤٢٢. Mêrê çê bi navê xwe tê .
٣٤٢٣. Mêrê çê di roja teng de fêm dibe.
٣٤٢٤. Mêrê çê li her derî zore .
٣٤٢٥. Mêrê ehmeq dibê: Ez.
٣٤٢٦. Mêrê fedok bi kundekî, jina fedok bi gundekî.
٣٤٢٧. Mêrê mîr li her dera mêre.
٣٤٢٨. Mêrê mîr, bê dost û dujmin nabê.
٣٤٢٩. Mêrê mîr, di bin mineta* xelkê de namîne.
٣٤٣٠. Mêrê mîr, serê ser de mêre.
٣٤٣١. Mêrê newêrek sînga gewr nabîne.
٣٤٣٢. Mêrê qels du caran şer dixwaze.
٣٤٣٣. Mêrê qenc tê ser gotîna xwe
٣٤٣٤. Mere rêk û pesarêd kaş, da nebînê xewnêd şaş.
٣٤٣٥. Mêrê xeberjin, berxê ber bizin, şûva bi kizin, ti
tişt jê dernayê.
٣٤٣٦. Mêrê xezan dijminên xwe ji malê ne.
٣٤٣٧. Merhemeta* ne li ci, merezê tîne.
٣٤٣٨. Merî bezî kevrî mezin ne yê şerra ye.
٣٤٣٩. Merî bi xwe bikevê nêşê.

*E minet : tikaye . hêvî . minêkarî .

*E merhemet : dilovanî . mehrevanî . mehrdarî .

٣٤٤٠. Merî çê bi xwarnê xerab qayil nabê.
 ٣٤٤١. Merî çiqas zane be, dîsa nezan e.
 ٣٤٤٢. Merî dîn tim zarok e, gayî dîn tim golik e, jinê dîn tim keçik e.
 ٣٤٤٣. Merî diz be, şevreş pir in.
 ٣٤٤٤. Merî durrû nabe ti gû.
 ٣٤٤٥. Merî goza (giwîz)xwe neçel nebêne, çelakê xwe navêjê yê.
 ٣٤٤٦. Merî goza (giwîz)xwe çit nebîne, kevrê xwe navêje yê.
 ٣٤٤٧. Merî har wê bi ser kêrê xu da bikevê.
 ٣٤٤٨. Merî hêştira xwedî kê, gerek e develikê* xwe hebê.
 ٣٤٤٩. Merî heye dewletî ye, merî jî heye dewlet diye.
 ٣٤٥٠. Merî ji guran bitirse, nikare pêz xwedî ke.
 ٣٤٥١. Merî ji kera pir in, sibek lê venehata, dûv û guh jî wê vêketana.
 ٣٤٥٢. Merî mêr bi ser şorê xwe de tê.
 ٣٤٥٣. Merî mêr carekê dixopê.
 ٣٤٥٤. Merî mêr di gêçûtîd* teng da bêli dibin.
 ٣٤٥٥. Merî qantirê qantirciya netirsîne, merî holika naxwe .
 ٣٤٥٦. Merî xayîn* temenî xwe kin e.
 ٣٤٥٧. Merî xerîb* î kor e.
 ٣٤٥٨. Merî xwe li dera vena ê xwe bi ber ziraradê.
 ٣٤٥٩. Mêrik gihîşt nav zeviyê xwe dît ko mêvên ga dizîne.

*K T develik : devegeh . hêştirxane .

*T gêçût : asteng . bihur . derbazok .

*E xayîn : xiniz .

*E xerîb : biyanî . bêgane avî (havî) .

٣٤٦٠. Mêrik rûniştiye, ne li neha ye, ne li deha ye.
٣٤٦١. Merîkî ket golê ji baranê natirsê.
٣٤٦٢. Mêristan li kesî were, rojê çarşemê kesî ko destê xwe bê, bira tuf ser mirêstên kê û bi derziyê lê belakê di çend çarşema da ê çê bibê.
٣٤٦٣. Meriv bi hev ra got baş e, xelk wê bêjê paş e.
٣٤٦٤. Meriv bi şorekê cinetî dibê, bi şorekê jî cehnimî dibê.
٣٤٦٥. Meriv li ber kaniya tî namînê.
٣٤٦٦. Meriv li mecbûrî* bi yarê jinê xwe ra nan dixwê.
٣٤٦٧. Meriv xwînê bi xwînê naşo, meriv xwînê bi avê dişo.
٣٤٦٨. Meriyê bê guman, bê ol û bê îman.
٣٤٦٩. Meriyê bê welat, teyrê bê perr û bask e.
٣٤٧٠. Meriyê bi ar, (bi avrû bi şeref) şorek jê re bar.
٣٤٧١. Meriyê dewletî siyar dibe xwedê bîr dike, peya dibe hespê bîr dike.
٣٤٧٢. Meriyê koçerî, jê dûr e rencberî.
٣٤٧٣. Meriyê ku nanê xwe erzan be, ewî buha be .
٣٤٧٤. Meriyê virrek para xwe serîn e .
٣٤٧٥. Meriyid mera zêrid veşartî ne.
٣٤٧٦. Mêrkê êzdî bi simbêla tê naskirin.
٣٤٧٧. Merlixî* ne bi pera ye.
٣٤٧٨. Merr emaret e, cot şoret e.
٣٤٧٩. Merre merrê, tu çûyê jî bi rûn û dimis herrê .
٣٤٨٠. Mêrxwasî şana wê dehin, yek jê zore neh jî fenin.
٣٤٨١. Mêş çiqasî biçûke mehdî mera li hev dixê.
٣٤٨٢. Mêş li demûşê datîne.
٣٤٨٣. Mêş û gamêş, xwedî tînin pêş ?.

*E mecbûr : neçarî .

*K T merlixî : mirovatî .

٣٤٨٤. Mêş zane ko wê ji kijan gulê hingiv hilîne.
 ٣٤٨٥. Mêşa gû li gû dinê.
 ٣٤٨٦. Mêşek li rûya binê wê bi hezar perçebe.
 ٣٤٨٧. Metê metê ser sepetê bi kerê da ketê ker reqisî*
 met fetisî*.
 ٣٤٨٨. Mêvan berxa malê ye.
 ٣٤٨٩. Mêvan berxê Mezûvan e .
 ٣٤٩٠. Mêvan bi nan û ava xwe tê.
 ٣٤٩١. Mêvan ger ji mêvên hezneke, xwediyê malê wê ji
 herdiya hezneke.
 ٣٤٩٢. Mêvan î têt e xew jê ra xêr e.
 ٣٤٩٣. Mêvan ji mêvên sil bû xwediyê malê ji herduwa
 sil bû.
 ٣٤٩٤. Mêvan mêvanê xwedê ne.
 ٣٤٩٥. Mêvan roviye têt xwar dibe şêr.
 ٣٤٩٦. Mêvanê bê wext bê, helbet wê kêr bext bê.
 ٣٤٩٧. Mêvanê bê wext, ji kîsî xwe dixwe.
 ٣٤٩٨. Mêvanê yekî, mêvanê gundekî.
 ٣٤٩٩. Mêxê xwar naçe dar.
 ٣٥٠٠. Meydan fetre ye tîr bê pere ye.
 ٣٥٠١. Mezbût bikole asas, ji bo dil neke wase was.
 ٣٥٠٢. Mezin avê dirijînin zarok pa dixuşînin.
 ٣٥٠٣. Mezin bibin ker jî. ger tu lê swarbû linga lê
 mekut.
 ٣٥٠٤. Mezin li mal tinebin, piştê bi kevrekîde.
 ٣٥٠٥. Mezin nefeqîne, lê îş bi sêri hatine.
 ٣٥٠٦. Mezin reqisî, biçûk hewisî.
 ٣٥٠٧. Mezinbûn û çûkbûnê gunda di teng û ferebûnê
 rêkê ra xuya dike.

*E reqisî : semakir . hilda lotka . keçekekir .

٢٥٠٨. Mî bi lingê xwe bizin bi lingê xwe her yek derê ber singê xwe.
٢٥٠٩. Mî bi lingê xwe, bizin bi lingê xwe.
٢٥١٠. Mî bi ser berxê xwe de dikale.
٢٥١١. Mî biha bê erzan bê, ne xema gur e.
٢٥١٢. Mî pêl berxê xwe nanê.
٢٥١٣. Mih bi nigê xwe û bizin bi nigê xwe.
٢٥١٤. Mih bi piyê xwe, bizin bi piyê xwe her yek mêvanê emelê* xwe.
٢٥١٥. Mih nedîtî kurrîn nabe.
٢٥١٦. Miha tenê qismeta* gur e.
٢٥١٧. Mij xwe li çiyayid bilind digre.
٢٥١٨. Mila barê xwedê bê, ne yê qûl bê.
٢٥١٩. Mila bîr bi av bê, mila kûr bê, mila rê bê mila dûr bê.
٢٥٢٠. Mila dil bi dil bê, mila tûrî gavaniyê li mil bê, doşek erd bê, orxan ezmanê bilind bê, balgi fişqul bê.
٢٥٢١. Mila dilî bi dil bê, mila doşek erd bê, orxan ezman bê, balgi kevir bê.
٢٥٢٢. Mila dilî bi dilbê tûrî parsê li mil bê.
٢٥٢٣. Mila eyarî te ferebê: (*mebest, mila bêhnê te fere bê*).
٢٥٢٤. Mila ji malê gurzê be, bira sîpa kerê be.
٢٥٢٥. Mila mal bê, ne can bê.
٢٥٢٦. Mila mêr bê li nav malê bê, bila komik hestî bê.
٢٥٢٧. Mila mirov mêr bê, mila rojekê li dinê bê.
٢٥٢٨. Mila rê ya rast be mila dûr be.
٢٥٢٩. Mila rindik bê mila çîlik bê mila qîza kûçik bê.

*E emel : kirin . xêr û guneh .

*E qismet : şans . par . pişk .

٢٥٢٠. Mila tim kum li serî te ferebê: (*mebest, mila tim her tiş tî te ji pêdivî te bêtir be*).
٢٥٢١. Mila zarok kûnê te bibînî, surê* te nebînin.
٢٥٢٢. Min bi çirî çava kom kir.te bi comerdî bela kir.
٢٥٢٣. Min bûk anî bi lez û bez, sivika malê dîsa mam ez.
٢٥٢٤. Min bûk anî ji hevîda serbinê xwe tev tê da, hîn nizanî kûfiya xwe girêda.
٢٥٢٥. Min bûkek anî bi lez û bez, min têda rez û pez, sivika malê dîsa mam ez.
٢٥٢٦. Min bûkek anî ji hezo, min tê da mal û pezo, sivika malê ma ezo.
٢٥٢٧. Min da hewş û pelaş, min anî bûkek tor û belaş.
٢٥٢٨. Min dey nekir, te fey nekir.
٢٥٢٩. Min dile, te dile, xelkê çi derd û kule.
٢٥٤٠. Min gîsnî bi herrî li ku hilgirt, ezê li wir nên buxum: (*mebest, ewe ko min li ku cot ajot ezê li wir nan buxum*).
٢٥٤١. Min guloka xwe jê zî: (*mebest, min pêwendiya xwe jê birrî*).
٢٥٤٢. Min heftnîvê xwe jê hîlanîn: (*heftnîv, heft û nîv e, bi wateya (peng) (îbret) gavê kesek ji kesekî bi hêvî qenciye ye û xirapiyê jê dibîne vê gotinê dibê û di warin dî de jî tê gotin*).
٢٥٤٣. Min keşka* te xwariye, ku tu siyê li min dikî: (*zivistana, rojina rok derdikevê û xelk jî di hundira de hosan bûye, û her gundekî ciyî li hev kombûnê heye,*

*E surr : raz .

*K Keşke: xwarina roja dawî ya dewatê ye, ji dan û goşt çêdikin, ger wê xwarinê li mal çêbikin navê wê kutayî ye. Û ermenî salê carekê wê kutayî ye li kenîse çêdikin û ermenî tèn dixwin, û kîjan kenîse kutayî ye pîrrê çêkê û werê xwarin ew kenîse dibe ciyê pesnê.

îcar gundî ji mala derdikevin, derin wir xwe didin ber rokê, carina yek bi henekî, ya jî bê hemdî xwe siyê li yekê dikê; ewê ko sî lê tê kirin ji ê dî re dibê: Ma min keşka te xwariye ku tu siyê li min dikê, mebest ew e, du tişt tèn bîrê mera: yek, ger keşke xwari bê di nav wan de nan û xayê çê bûye û li ba Kurda nan û xayê pir bi nerx û qêmet e; ger yek nerx û qêmetê nan û xayê negirê dibêjinê : nanxayê te li kabê ye. Yek jî xuya ye berê nan û xwarin kêmbû, loma jî bi qêmet bû; gavê camêrekî xwarinek bi kesekî da, wek qencîkê pê dikir; wextê dibê min keşkê te nexwarî ango nan û xayê di nav mede çê nebûye û te qencî jî bi min nekariye, çima siyê li min dikî).

٢٥٤٤. Min pîrr kes hînî govendê kirin li dawiyê kesî bi destê min negirt.
٢٥٤٥. Min rist teşî û dagirt tevn, ahîna min axîna min yarê min î kevin.
٢٥٤٦. Min şande behîva mir, ma ji vî va.
٢٥٤٧. Min û girê eradê, genim û ceh hatin ber seradê, heta dê dil nekevê zavê, dotê nadê.
٢٥٤٨. Min û te dile, xelkê çî dil ji me yî bi kul e.
٢٥٤٩. Min û te kir, ji der hat nav li xwe kir.
٢٥٥٠. Min û wê dile, wan çî kul e .
٢٥٥١. Min xelk hînî govendê kir, êdî kesî bi destê min negirt.
٢٥٥٢. Minê minê derê nav ciyê jinê.
٢٥٥٣. Minê-minê mirov naçe nivîna jinê.
٢٥٥٤. Mîr zalimin lê lazimin* .
٢٥٥٥. Mirazê bê dil, wek caniya bê hefsar û bê cil.
٢٥٥٦. Mirazê bê dil, wek kirasê bê mil.

*E lazimin : gereken.

٢٥٥٧. Mirazê min bi dil be, ber seriyê min kevir be
 ٢٥٥٨. Miri bi xêr bê, feqi bi xwe tê.
 ٢٥٥٩. Mirî dimire ji no ve şêrîn dibe.
 ٢٥٦٠. Mirî dimre qûnzêrî dibe.
 ٢٥٦١. Mirî ne modî be gor lê teng nabe .
 ٢٥٦٢. Mirî ne rûreş bê gor lê tengnabê.
 ٢٥٦٣. Mirî venagerê bi girî.
 ٢٥٦٤. Mirin çêtire ji feqîriyê.
 ٢٥٦٥. Mirin her kesî dike yek.
 ٢٥٦٦. Mirin hespa sor e, li ber derê hemo kesî ye.
 ٢٥٦٧. Mirin hespê boz e li ber derê hemo kesa ye.
 ٢٥٦٨. Mirin mirin e xirxirin çi xirrê min e.
 ٢٥٦٩. Mirin mirin e xirxirin çi ye.
 ٢٥٧٠. Mirin mirin e, ev çi xirxira min e.
 ٢٥٧١. Mirin yek e, lê mihane gelek in.
 ٢٥٧٢. Mirin yek i, sebeb pirin.
 ٢٥٧٣. Mirina dewlemendan ji bo melayan mizgîn e,
 mirina xizanan şîn e.
 ٢٥٧٤. Mirina hespê ji ceh be.
 ٢٥٧٥. Mirina pisikê tê, dere hîzê pîreka dixwe .
 ٢٥٧٦. Mirinê bi hev ra îd û dewat e.
 ٢٥٧٧. Mirinê bizinê werê, derê nanî şivên dixwê.
 ٢٥٧٨. Mirinê kûçka tê, bi dîwarî camiyê da dimîzin.
 ٢٥٧٩. Mirinê mara tê, xwe li ser rêka kulor dikin.
 ٢٥٨٠. Mirinê nebîne, bi tayê qayîl nabê.
 ٢٥٨١. Mirîşk avê vedixin, li hafê xwe dinirin.
 ٢٥٨٢. Mirîşk biqare, hêkê dike.
 ٢٥٨٣. Mirîşk birçî dibin, gêris di xewnê de dibînin.
 ٢٥٨٤. Mirîşk hene li ciyekî dikin qid-qid li ciyekî hêka
 dikin.
 ٢٥٨٥. Mirîşk reş e, hêk sipî ye.

٢٥٨٦. Mirîşk û kelmêş û mêş in, leşkerê bê teftêş in*,
hergî te go kiş dihatin pêşin.
٢٥٨٧. Mirîşk û rovî danaynin kirîvî.
٢٥٨٨. Mirîşka reş e, heroj nexwaş e.
٢٥٨٩. Mirîşka zer e, hêka bi zorê ji xwe dike dere.
٢٥٩٠. Mirîşka zer e, xwê û sabûa min li ser e.
٢٥٩١. Mirîşkê çav li betê kir, qûn li xwe dirrand.
٢٥٩٢. Mirîşkê hêk kirî, ji xwe re hevaleyê çê kirî.
٢٥٩٣. Mirîşkê kor di xewnê da dikefe embarê gênim.
٢٥٩٤. Mirîşkê kor di xewnêda dikeve nav komê gênim
û gêris.
٢٥٩٥. Mirîşkê nu hatin hêkê hesinî kirin.
٢٥٩٦. Mirîşkê pir gerî, ê gû bi lingî xwe re wîne.
٢٥٩٧. Mirîşkê te hêk di pînkê xelkê da kirin, wer
zanibe dolabê te î ters dizîvirê.
٢٥٩٨. Mirîşkî kor ji dikî kor ra ye.
٢٥٩٩. Miriya çiqas misde, ewqas ba bi ber dikevê.
٢٦٠٠. Miriya çiqas misde, weqas tîr fisa dikin.
٢٦٠١. Miriyo qedayo, saxo belayo.
٢٦٠٢. Mirov barê xwe hilnegire, kes jê re hilnegire.
٢٦٠٣. Mirov bi hevalid xwe tê nas kirin.
٢٦٠٤. Mirov bi nasan digî xasan: (*ango gavê dost û nasid
te ji dil hebin, wê alikarî te bikin, tê bi melaviya xwe
û alikariya dost û nasên xwe bighê xasan û daxwaz*).
٢٦٠٥. Mirov bi paşatîyê nabe mirov.
٢٦٠٦. Mirov bi zimanî xwe tê girêdan.
٢٦٠٧. Mirov carekê dîmirê.
٢٦٠٨. Mirov carekê tê dunyayê.
٢٦٠٩. Mirov çawa dizîvire bila bizîvire, her qûn li paş
dimîne.

*E teftêş : velo . pişkinîn . sorax . vejûtin .

٣٦١٠. Mirov çiqas zanabe, ewqas dilnizim dibe.
٣٦١١. Mirov çûka bê per e: (*Kirîv û jinka xwe ji hevdu xeyidî bûn, ketin nav nivîna, kûna xwe di hev yal kirin, lê netebitîn; piştî demekê kirin vitvit û beriyê xwe dane hev, mêrik got: Heyho, gava dinî em li ku bûn û a naha em li ku ne, jinê got: Ma tu nizanê mirov çûka bê per e).*)
٣٦١٢. Mirov di agirê dostan de naşewite.
٣٦١٣. Mirov di nav miletê xwe de şêx e.
٣٦١٤. Mirov dimire, lê deyn* namire.
٣٦١٥. Mirov diz be, şevê reş pir in.
٣٦١٦. Mirov gotina nîvcî ji kera re dibêje.
٣٦١٧. Mirov here goristanê, ko gora mirov tê de hebe.
٣٦١٨. Mirov hingî mûyekê ji beraz hilbike xêr e.
٣٦١٩. Mirov ji qehran, xwe davê behran.
٣٦٢٠. Mirov ji stûriyê diqete.
٣٦٢١. Mirov karwanê mêmîja diket belê karwanê befrê naket.
٣٦٢٢. Mirov ne xwediyê dilê xwe ye.
٣٦٢٣. Mirov nekeve avê sobehiyê hîn nabe.
٣٦٢٤. Mirov piçik piçik diçe ber kuçik.
٣٦٢٥. Mirov pîr dibe, lê dil pîr nabe.
٣٦٢٦. Mirovê bê xîret ne dunya ye û ne axret* .
٣٦٢٧. Mirovê bi hevotina jinê, li sira mirinê.
٣٦٢٨. Mirovê çê li paş ê xerab nasekine.
٣٦٢٩. Mirovê har wê bela xwe li ber lingê xwe bibînê
٣٦٣٠. Mirovê ko hindikî nizanibê, wê pirî jî nizanibê.
٣٦٣١. Mirovê lal, jê meke sewal* .

*E deyn : wam . qer .

*E axret : roja bangê . roja bandê .

*E sewal : pirs .

٣٦٣٢. Mirovê mirov, carekê dixope.
٣٦٣٣. Mirovê ne ti tişt, xwe pîrr began dike.
٣٦٣٤. Mirovê nezan dikê giliyêd erzan.
٣٦٣٥. Mirovê ser bi pirç e, çi kirî ê bikê.
٣٦٣٦. Mirovê sist tîrrê şîdya yî dîkin.
٣٦٣٧. Mirovê şît bi dilê pît.
٣٦٣٨. Mirovek di nav civatê da kenî yekî di nav civatê da bi dizîka jê pîrskîr got ê: Ezbenî tu bi çi kenî, go: Ez bi wa singî hay venayî kenîm ê dî got ê: Ma kes heye bi singa bikenê, mêrik got: Min heft ker ji wî singî dizîn û hîn jî kerek pê ve girêdayi ye û ez jî bê ker im ma ne ciyê kên e.
٣٦٣٩. Mirovek navî gundekî pîs dikê.
٣٦٤٠. Mirovekî bi piyekî hebû, her carê ew pî jê re gerk dibû xêli dibû, rojekê çû ser xanîkî bilind ku xwe bavêjê da bimirê, dît ku yekî herdu dest qutkirî li jêr direqîsê, hema ji ser xanî daket û çû ba mêrik, gotê: Ezbenî piyekî min qut e ez dixawzim xwe bikujim, tu bê piye û tu direqîsê, mêrik bi dilşewat gotê: Ezbenî bibaxşîn ez ne direqîsim, qûna min dixurê û ez nikanîm buxurînim li neçari ez van lotîkina didim xwe, belkî xur bişkê mêrik derdê xwe ji bîrakîr.
٣٦٤١. Mirovekî rovê xwe Kurdîkir mêşek hingiv hat li ser kîr nîşt, mêrik go: Te gulek xwe û rind dî.
٣٦٤٢. Mirovên baş bê dijmin nabin.
٣٦٤٣. Mirovên bê dost û bê dijmin, ne di rêza mirovan da ye.

٣٦٤٤. Mirovên kamil* , gulan des xula dikin, ewîl di ber yaqê xwe ra dikin, dîn di ber serî xwe ra dikin
٣٦٤٥. Mirtib kerr dibin, defê diqetînin.
٣٦٤٦. Misîbetek* ji hezar nesîhetî* çetir e.
٣٦٤٧. Mişk di quncke, dibe şêr.
٣٦٤٨. Mişk û mar nabin yar.
٣٦٤٩. Mişkek heft kûpa diherimîne.
٣٦٥٠. Mîvan î têt e xew jê ra xêr e.
٣٦٥١. Miya bi tenê qîsmeta gur e.
٣٦٥٢. Miya birçî şîr nade.
٣٦٥٣. Miya kol çetir ji miya kel*.
٣٦٥٤. Miya kol li histiriya geriya, ji guhê xwe bû.
٣٦٥٥. Miya xerîb* li rexa kerî mexel têt.
٣٦٥٦. Mîza hêştir e, her dere, bi şûn de dere.
٣٦٥٧. Mîza wî têt, jê werê kîrê wî rabû.
٣٦٥٨. Morîka qul li erdê namînê.
٣٦٥٩. Mû bi zimanê min ve hat, û pere ne kir: (*ango gelek pêde got û neket serî*).
٣٦٦٠. Mûkî di bin zimanî te da heye.
٣٦٦١. Mûkî di vî îşî de heye.
٣٦٦٢. Mûkî ji wêhş jêke kare.
٣٦٦٣. Mûyek mûyek, dibe tejek .
- N
٣٦٦٤. Nabêjin: Kê kir, dibêjin: Kê got.
٣٦٦٥. Nalbendan kihêl naldikirin, kêvjalî got, ev e ligên min jî.

*E kamil : gihîştî .

*E musîbet : bobelat . xişim . bêtar . girdav .

*E nesîhet : şîret . amoj .

*K miya kel : miya bi quloç .

*E xerîb : biyanî . bêgane . avî (havî) .

٣٦٦٦. Nalbendê çê moriyan nal dike.
 ٣٦٦٧. Namûs avêtin ber kûçkan, kûçka ranekir.
 ٣٦٦٨. Namûs ne bi peran e.
 ٣٦٦٩. Namûsê neke perde ya malê dinê.
 ٣٦٧٠. Nan bide nampêj, nanekê jî zêde bidê.
 ٣٦٧١. Nan buxwe parî parî, şorbê buxwe heta tu karî.
 ٣٦٧٢. Nan di ber te da ma, avê pêgîn; av di ber te da ma, kêfen* pêgîn.
 ٣٦٧٣. Nan dişkê dibê du kerî, werîs diqetê dibê çar serî.
 ٣٦٧٤. Nan ji deriyan, dew ji keriyên
 ٣٦٧٥. Nan ji êlê av ji golê.
 ٣٦٧٦. Nan ji hebana* tîr li ezmana.
 ٣٦٧٧. Nan ji hemiya ra, xeml ji hina ra.
 ٣٦٧٨. Nan li cem birçiya namîne.
 ٣٦٧٩. Nan li çogê ye çav li xelkê ye.
 ٣٦٨٠. Nan parî-parî, girar heya tu karî.
 ٣٦٨١. Nan serekê heft kitaba* ye: (*Min ev penda ji xocê Meydana, Muhemed kurê mile Nehsan pirs kir, xoce hana got: Gi merîk di odakê da bê û rêyê derketinê jî tê da tine bê, tenê hinek nan li ser refkek bilind bê û heft kitab evra li ba wî ne û ev meriya xwe bibînê ji nêza ew gihaye ber mirinê, hîngê kanê wan heft kitaba dînê ser hev û derkevê ser wan û wî nanî dînê û bixwê*).
 ٣٦٨٢. Nan tê quran hiltê.
 ٣٦٨٣. Nan û pîvaz hebe nexwaşî çavreşî ye.
 ٣٦٨٤. Nan û şîr xwarina mîr.

*E kêfen kefen : qerqer .

*K heban : tûrekî çêrmiye şêx tede êrd dicivînin .

*E kitab : bêrtûk .

٣٦٨٥. Nan û xa yê te li kabê ye.
 ٣٦٨٦. Nandayî birçî namîne.
 ٣٦٨٧. Nanê bê xwê dixwê, gotinên şor dikê.
 ٣٦٨٨. Nanê bi minet nayê xwarin.
 ٣٦٨٩. Nanê bibe kerî, hev nagire.
 ٣٦٩٠. Nanê îsa dixwe, selawatê* li ser Mûsa dide.
 ٣٦٩١. Nanê kêmaqila di zikê baqila da ye.
 ٣٦٩٢. Nanê mêran li ser mêran deyn e.
 ٣٦٩٣. Nanê min qesasê* serê min e.
 ٣٦٩٤. Nanê tîrê, xwaş hevîrê.
 ٣٦٩٥. Nanê xwe dixum bi avê, mineta* kesî min navê.
 ٣٦٩٦. Nanek û gak li ba yek e.
 ٣٦٩٧. Nanek û hespek li ba yek e.
 ٣٦٩٨. Nanek û zerkek dew ne ti tişt e lê ne karê her
 kesi ye.
 ٣٦٩٩. Nanek û zerkek dew ne tişt e, lê ji pençê
 herkesî dernakevê.
 ٣٧٠٠. Nanek, nanek, derê arvanek.
 ٣٧٠١. Nanekê zêde bide nanpêja, bila nanê te xweş
 bipêje.
 ٣٧٠٢. Nanî bê xê dixwê, tirrid şor dikê.
 ٣٧٠٣. Nanî camêra bi dêne*.
 ٣٧٠٤. Nanî genimî bi des mi ne ket, nanî ceyî kûnê min
 maçdike.
 ٣٧٠٥. Nanî genimî bi dest min ne ket, nanî cehî destî
 min maç dike.
 ٣٧٠٦. Nanî genimî di zikî her kesî de nasekinê.

*E selawat : dîleg . diroz

*E qesas : serbirr .

*E minet : tikaye . hêvî . minêkarî .

*E deyn : wam . qer .

٣٧٠٧. Nanî me î bê xo ye (*kî nanî me dixwe jê re nabe qencî*).
٣٧٠٨. Nanî mera hevalê mera ye.
٣٧٠٩. Nanî mêra li mêra ne bi minet.
٣٧١٠. Nanî mera yî tisî ji pelawê xelkê çêtire.
٣٧١١. Nanî xwe meke tûrî hevala û bi minet mexe.
٣٧١٢. Nanik xwe kê m bixwe, azepikî xwe ragire.
٣٧١٣. Nankoran bidiyê mediyê yek e.
٣٧١٤. Nav heye navok tune ye.
٣٧١٥. Nav î giran e, mezel î wêran e.
٣٧١٦. Nava du dînan de zincîr diqete, nava du jîran de mû naqete.
٣٧١٧. Navê gund namûsa gund e.
٣٧١٨. Navê gur derketiye, rovî dinyê xera dike.
٣٧١٩. Navê jinê Dînanok, mal de tune arvanok.
٣٧٢٠. Navê te ket kutkê Istenbûlê.
٣٧٢١. Navê wê edlan e, ji mêrê xwe re nezan e, ji xelkê re kevaniya bîst û heft salan e.
٣٧٢٢. Navê Xwedê hezar û yek e, Melekî Tawos serek e.
٣٧٢٣. Navê Xwedê sed û yek e, Melekî tawos serek e.
٣٧٢٤. Navekî şêr heye, lê rûvî dinê xera kiri ye.
٣٧٢٥. Navik mezin li gundek kavi.
٣٧٢٦. Navmalî salê carekê bigorîne, şivanê xwe bêhlîne.
٣٧٢٧. Naxir bermal bû, kebaniya xerab li mal betal bû.
٣٧٢٨. Ne bar ket, ne toz rabû.
٣٧٢٩. Ne ben bi linga ketî, ne bi sêrî ketî .
٣٧٣٠. Ne beran gêr bike, ne berxan kêr bike.
٣٧٣١. Ne bi çêyi ne bi xerapi sûnd mexe.
٣٧٣٢. Ne bi dînan de, ne jî jê bistîne.

٣٧٣٢. Ne bi golkinî têt giya xwar û ne bi gayîti têt kizin xwar.
٣٧٣٤. Ne bi lezê, ne bi bezê, kes nagihêjê tu mirazî.
٣٧٣٥. Ne bi weşş* be, ne jî di kelemê kefe : (*gavê kesek rik digire û ji ya xwe danayê, dibêjinê : Bû weşş û ket kelemê*).
٣٧٣٦. Ne biçûkê bira be, çêlkê ber devê gura be.
٣٧٣٧. Ne bide min û ne bide rûyê min.
٣٧٣٨. Ne bist bişewite û ne kebab.
٣٧٣٩. Ne cina bibîne, ne qulwela bixwîne.
٣٧٤٠. Ne çixara ber bê, ne kutana nav kayê.
٣٧٤١. Ne di dil diborê, ne di gurçikê diborê.
٣٧٤٢. Ne di dîna ne, ne jî qûna xwe bide dîna.
٣٧٤٣. Ne didim hevrazan*, ne dixum gêlaza*.
٣٧٤٤. Ne dikene ku em vê re bikenin, ne digrî ku em vê re bigrîn.
٣٧٤٥. Ne dîndinê êreb û ne xwarinê xurma û şîrî devê.
٣٧٤٦. Ne distirê ne tewdikê.
٣٧٤٧. Ne dîtinê êreb, û ne şîrî hêştir.
٣٧٤٨. Ne dîtinê gur û ne jî oxirê gur.
٣٧٤٩. Ne dixum sawarê, (*savarê*) ne diçim hewarê.
٣٧٥٠. Ne dixwe, ne dide hevala, genî dike û davê newala.
٣٧٥١. Ne dujminê xerapa bin, dujminê xerapi yê bin.
٣٧٥٢. Ne dûrî zana here, ne nêzîkî dîna here.
٣٧٥٣. Ne eferim ji ada* te ra, te xêretek ne kir ji miletê xwe ra.

*E weşş : hov . lawir .

*K hevraz : kaş .

*K kêlaz : kêraz .

*K ad : kok û binyat

٢٧٥٤. Ne êla bê serî, ne şivanê bê kerî, ne mala bê derî.
 ٢٧٥٥. Ne ew hêka bê, ne jî ew qidqida bê.
 ٢٧٥٦. Ne ewrê bi xurxurkê ne mêrê bi tirtirkê.
 ٢٧٥٧. Ne fene, ev çi dar û ben e: **(yekî xefkek li ber rovî vegirti bû, rovî di ber ra derbaz bû, lê nerî, go: Ew goşt e, lê gî ne fen e, ev çi ben e).**
 ٢٧٥٨. Ne feqîrê bi tîrr, ne zengînê diz.
 ٢٧٥٩. Ne firre bi malê dinê, bifirre bi feyza* dinê.
 ٢٧٦٠. Ne ga ye, ne za ye.
 ٢٧٦١. Ne gayê min li garanê ye, ne galgala nanê gavan dikim.
 ٢٧٦٢. Ne gundê bê rez, ne konê bê pez, ne mêrê bibêje, ez û ez.
 ٢٧٦٣. Ne hêja me tenak genim, û bi teva dikenim.
 ٢٧٦٤. Ne hêja ye tiştêkî, deng dike li ser her kesekî.
 ٢٧٦٥. Ne her tiştî tê baxşandin, tê ji bîrkin.
 ٢٧٦٦. Ne hesil kil û kildane hesil* dihêl* û badane.
 ٢٧٦٧. Ne hîz e bidirrê, ne kûz e bişkê.
 ٢٧٦٨. Ne ji defê re dibê, ne ji zurnê re dibê.
 ٢٧٦٩. Ne ji dil dibe, ne ji kezebê dibe .
 ٢٧٧٠. Ne ji dûv bûya ê li qulaqa keta .
 ٢٧٧١. Ne ji dûv bûya ê li qûnê keta .
 ٢٧٧٢. Ne ji gelaca ba wê gur û mî bi hera bigeryana.
 ٢٧٧٣. Ne ji gelacan bê, rovî wê li çarşiyên bigerê.
 ٢٧٧٤. Ne ji malekê ne, lê ji hewalekê ne.
 ٢٧٧٥. Ne ji tirsê bê, wê her kesek xwedêkî xwe ji heriyê çêkê.
 ٢٧٧٦. Ne jina bi bergera, û ne qiçkê bi berbejna* .

*K feyz : sod . hode . wec .

*E hesil . esil : ersim . dawa .

*E dihêl : daw .

٣٧٧. Ne jina bi devgirêdana, ne lawê ben û nivîsta.
 ٣٧٨. Ne jina bi pirç, ne mêrê kose.
 ٣٧٩. Ne jina gerok, ne mêrê tirsok.
 ٣٧٨٠. Ne jina parî rind, ne mêvanê mal li gund, ne xizanê pozbilind.
 ٣٧٨١. Ne jinê bi gotina ne kerî bi şûjina.
 ٣٧٨٢. Ne jinê bi hevotina ne kerê bi şûjina.
 ٣٧٨٣. Ne jinê kenok, ne mêrê gerok.
 ٣٧٨٤. Ne jinê kenok, ne mêrê tirsok.
 ٣٧٨٥. Ne karî jina, ne cotî çêla.
 ٣٧٨٦. Ne keça vê bav, ne çayê vê av.
 ٣٧٨٧. Ne ker ket, ne hîz* dirî.
 ٣٧٨٨. Ne ker tê ber bêr, ne bar derê ber kerê.
 ٣٧٨٩. Ne kerê zirzirî, ne ewrê girgirî, ne mêrê tirtirî.
 ٣٧٩٠. Ne kerr im ne kor im ne jî lal, kar dikim dixuim nanê helal*.
 ٣٧٩١. Ne kes bi dua dibît, ne kes bi nifrîna dimrît.
 ٣٧٩٢. Ne li mala min e nizanê bi halê min e.
 ٣٧٩٣. Ne li nav tirban xewke, ne jî xewnid kirêt bibîne.
 ٣٧٩٤. Ne li newalên kûr razê, ne xewnên xirap bibîne.
 ٣٧٩٥. Ne malê pîrr, ne gerdena stûr.
 ٣٧٩٦. Ne mêr heye bukujê, ne qiçik heye bimijê.
 ٣٧٩٧. Ne mêrê şermok ne jina kenok.
 ٣٧٩٨. Ne mêrê rût ne jina bi pirmût.
 ٣٧٩٩. Ne mist e, ne gurmist e.
 ٣٨٠٠. Ne nandar be, ne deyndar be.
 ٣٨٠١. Ne nanê ji deriya, ne dewê ji keriya.
 ٣٨٠٢. Ne nanê wan dixwim, ne defa wan lê dixwim.

*K berbejn : nivîstek bi dirêjîya bedenê ye .

*K hîz : eyarê rûn û dimis .

*E helal : rewa .

٣٨٠٣. Ne nê n pêde, ne mîkuta lêde.
٣٨٠٤. Ne nikilî kêw dibê kufte, ne jî pepil* : (*ger kesek bixwazê li yekîxê, gerek e mihanakê jê ra bibînê, îcar jê pirs dikê, dibêjê : Ma nikilî kêw dibe kufte lê pepil. Herdu jî nabin, hema mêrik bêje kîjan jî wê koteka bixwê*).
٣٨٠٥. Ne pêde, ne bi rû de.
٣٨٠٦. Ne sar li te tê ne germ li te tê.
٣٨٠٧. Ne şêrînbe ku xelk te buxwe, ne jî tehlbe ku xelk te bavêje.
٣٨٠٨. Ne şîş, ne kebab.
٣٨٠٩. Ne şorid ber ara, ne rindid ber çira.
٣٨١٠. Ne xebitiye, para herî mezin ji xwe re hiştiye.
٣٨١١. Ne xema min e, ne dema min e, qirçe- qirça benîştê min e.
٣٨١٢. Ne xema wê ye û ne dema wê ye, çirqe çirqa benîştê wê ye.
٣٨١٣. Ne xwar, ne da hevala, genî kir avêt newala.
٣٨١٤. Ne xwe ji dêrê dikê ne ji mizgevtê
٣٨١٥. Ne za di malê da, ne ka di kadînê da, ne xem di dil da.
٣٨١٦. Nebalixa benîştî xwe pûç nabin .
٣٨١٧. Nebe cilkê pê cercerê.
٣٨١٨. Nebe destikî kêra: (*mebest, nehêle ko kesek bi te yan di rêyê te re xirapiyê bikê*).
٣٨١٩. Nebe qal*, nabe mal.
٣٨٢٠. Nebêje, te got bike.
٣٨٢١. Nebînî zehmet, nabînî nîmet*.

*K pepil : lingid têr tivîra û firinda .

*K qal : çêrrê bûn .

*E nîmet : xêr bêr .

٢٨٢٢. Neçe cineta bi minet.
٢٨٢٣. Neçe şerê xal û xuharziyan, neke hewar û gaziyan.
٢٨٢٤. Nêçîrvan nêçîra xwe nasdike.
٢٨٢٥. Nedî..nedî..quzê ca xwe dî.
٢٨٢٦. Nefela çarpelî nîşana xêr û bêrê ye.
٢٨٢٧. Nefsa xwe birrî, zarokê xwe kirrî.
٢٨٢٨. Nefsê^{*} bilind meriyan nizim dike, nefsê nizim meriyan bilind dike.
٢٨٢٩. Negere li newala, nebîne xeyala^{*}.
٢٨٣٠. Nehan nedî dehan naxwî.
٢٨٣١. Neheqiyê^{*} erd û esman jî qebûl^{*} nakin.
٢٨٣٢. Neke bi kesan, wê bê serê te, ku neyê serê te, wê bê serê pisê pisan.
٢٨٣٣. Neke dengî dilê dujminî peqand.
٢٨٣٤. Nên bixwe bi qinyat, jina bixwaz ji derê bi kok û binyat.
٢٨٣٥. Nênûk tine xwe pê bixurîne.
٢٨٣٦. Nênûk û goşt ji hev naqetin.
٢٨٣٧. Nênûkid te bi ser goşt kevin debar^{*} li te nabê.
٢٨٣٨. Neqenciyan meke, ji te ra bimînê ji zarokên te ra namînê.
٢٨٣٩. Nerê aşî paşin, aşî pêşin pê şêrîn nabê.
٢٨٤٠. Nêrî nemînin dibêjin gîskan belo belo.
٢٨٤١. Nerindi ya meke, ji te ra ma ji qiçkid te re namînê.

^{*}E nefis : payebilind .

^{*}E xeyal : moranti . reşanti .

^{*}K E neheqi : bêbextî .

^{*}E qebûl : pejirandin . litêkirin .

^{*}E debar : çare .

٢٨٤٢. Nêrînek çavan, biharek dilan.
 ٢٨٤٣. Nêt* xêr aqûbet* xêr.
 ٢٨٤٤. Nêtê dil qeda sêri ye.
 ٢٨٤٥. Nexwaş e, parî şeş e.
 ٢٨٤٦. Nexwaş e, parî xweş e.
 ٢٨٤٧. Nexwaşa neşîne hinaran.
 ٢٨٤٨. Nexwaşê bi xêr hekîm bi xwe tê ser.
 ٢٨٤٩. Neyar bi rewşa neyar nizane.
 ٢٨٥٠. Neyîn ji kêvir hiştir e.
 ٢٨٥١. Neynik eyba mirov nîşan dide.
 ٢٨٥٢. Nêzamiryo, te cilmiriyê me nedî.
 ٢٨٥٣. Nezan e, rê ya malê nizane.
 ٢٨٥٤. Nezan î, mal bistîne bi cwan î.
 ٢٨٥٥. Nezanî, rehetiya canî.
 ٢٨٥٦. Nifir diçin asîmana, vedigerin xwedana.
 ٢٨٥٧. Nifir niçir bi heqanî*.
 ٢٨٥٨. Nifirid dê û bavê li ewlada nakevin.
 ٢٨٥٩. Nigê xwe li gor lihêfa* xwe rade.
 ٢٨٦٠. Nikare bi kerê dere kurtên.
 ٢٨٦١. Nikilî kêw sor ne kir, gule mavêjê.
 ٢٨٦٢. Nimêja kurmanca ne îbadet e*, adet e*.
 ٢٨٦٣. Nîr bi aliyê ga yê qelp ve xwar dibe.
 ٢٨٦٤. Nîrê pîşê kêrgiyê ye.
 ٢٨٦٥. Nîrek narê gepirê, bi alî karada jî narê.
 ٢٨٦٦. Nîrek narê gepirê.

*E nêt . niyet: alaz .

*E aqûbet : dawî . encam .

*E heqani : rastî .

*E lihêf : orxan . mitêl .

*E îbadet : perestîn .

*E adet : xû . aferîş . xwewah .

٢٨٦٧. Nîsan e, dew li ba hemi pîsan e.
٢٨٦٨. Nîsan e, dew li kîsan e.
٢٨٦٩. Nîşanê avzênka darêd biyê ne.
٢٨٧٠. Nîşanê çeman darêd biyê ne.
٢٨٧١. Nîsk e ne zik e, ne pişt e.
٢٨٧٢. Nîskê navên dewsa kizinê, berxê navên ber bizinê, malê nebin cem mala bavê jinê.
٢٨٧٣. Nîskê ne zik e, ne pişt e.
٢٨٧٤. Niştiman bi çekan tê vegirtin, û bi çekan tê standin.
٢٨٧٥. Nîvê mêranîyê reve .
٢٨٧٦. Nîvê serxwebûnê gurrîntîne (guriltî) .
٢٨٧٧. Nîvî mezela bi nezerê ye: (*Ger tu di ber mezelekê re derbaz bê, û tu bibê : nîvî vî mezeli bi nezerê ye, wek xandinî Fatêhê ye*).
٢٨٧٨. Nîvî, lê meke hêvî.
٢٨٧٩. Nivîştî bê tişt xwedi yê xwe kuşt.
٢٨٨٠. Nîvmeleyan dîn winda kir, nîvhekîman can winda kir.
٢٨٨١. Nîvxoce mera ji dîn dîkin, nîvtuxtir mera ji cên dîkin.
٢٨٨٢. Niyeta* dil qeda sêri ye.
٢٨٨٣. Nizanê bireqisê dibê erd xwar e.
٢٨٨٤. Nizanê daweta kê ye kevçiya kom dike.
٢٨٨٥. Nizanê hefteka kê ye, kefçiyên kom dikê..
٢٨٨٦. Nizanê kî mirî, gulyêd xwe dibirî.
٢٨٨٧. Nizanim vehesa canim .
٢٨٨٨. Niginên me helahela têra parronên me bikin.
٢٨٨٩. Nok heyê diran tine ye, diran he ye nok tine ye.

*E fatêhe : fêrkera yekemîn ji quranê (elhemd lîlah)

*E niyet : alaz .

٢٨٩٠. Nokê gotî: Min bi sîwarî di nav erdekî ra derbaz ke, ezê piştê li wî erdî bişkînim.

٢٨٩١. Nokê, giya rabû li ser kokê.

٢٨٩٢. Nokên genî çûn bajara bûn leblebî.

O

٢٨٩٣. Omîda dizan şevîd reşin.

٢٨٩٤. Oranê her tiştî heye.

٢٨٩٥. Ordekê ordekê hildave bendekê, da em herin nimêja kotekê.

٢٨٩٦. Ot otê xwe dibîne, ga cotê xwe dikşîne.

٢٨٩٧. Oyn^{*} oynê berê, quz quzê kerê: (*Ev di lîsk lîska berê, quz quzê kerê de hatî rave kirin*).

P

٢٨٩٨. Pale qels e, hicet^{*} das e.

٢٨٩٩. palê xerap das û tarê diguhêre.

٢٩٠٠. Para geroka, diçe ber balisoka.

٢٩٠١. para xeydoka, çû ber ecacoka.

٢٩٠٢. Pariyê ko naçe qirka te mexe devê xwe.

٢٩٠٣. Pariyê ko nikanibî daqirtîni meke devê xwe.

٢٩٠٤. Pariyê mezin gewriyê didirîne.

٢٩٠٥. Pariyê xwe ket rûn.

٢٩٠٦. Pariyê zêde gewriyê naqelêş e.

٢٩٠٧. Pariyekî xweş hêja ye gayekî reş.

٢٩٠٨. Pars di gişî de dibe, di hezkirinê de nabe.

٢٩٠٩. Pars ji parsekan nabe.

٢٩١٠. Pars ji parsekeran nabe[†].

٢٩١١. Parsek e û bi qetek e[‡].

٢٩١٢. Parsek nanê parseka naxwin.

*T oyn : lîsk . (lîzk)

†E hicet : mihane . abob .

‡K qetek : nexên rengîn ko ji paştî tevnê qutdikin .

٣٩١٢. Paş tengasiyan ferehî ye.
 ٣٩١٤. Paşî kirinê poşmanî ne lazim e*.
 ٣٩١٥. Paşiya her tariyekê ronahiyek e.
 ٣٩١٦. Paşiya tengasiyan firêqeti ye.
 ٣٩١٧. Paxir zer e, lê ne zêr e.
 ٣٩١٨. Pê ji bo rê, sîng ji bo sebrê.
 ٣٩١٩. Pêçiya neçe qulê, tişt pêve nabe.
 ٣٩٢٠. pêçiyid desta giştik ne yekin.
 ٣٩٢١. Pêl textî çirûk neke.
 ٣٩٢٢. Pelên mayî ji ên bihurtî çêtirin.
 ٣٩٢٣. Pelendarê feqîran li binê guhe...
 ٣٩٢٤. Pelgê sîran, didin pîran.
 ٣٩٢٥. Pel-pel dinêre û dengî xwe nake.
 ٣٩٢٦. Pênûs ji şûr bi hêztir e.
 ٣٩٢٧. Pera di kurtanî kerêke, ker jî wê bizire.
 ٣٩٢٨. Pere destî dê û qîzê ji hev dikê.
 ٣٩٢٩. Pere gemara destî camêran e.
 ٣٩٣٠. Pere gemarê destan e.
 ٣٩٣١. Pere meriyan dibin ciyid fere.
 ٣٩٣٢. Pere pera tînin.
 ٣٩٣٣. Perê pir dijminê mera ne.
 ٣٩٣٤. Pere pûştin bi meriyan re namînin.
 ٣٩٣٥. Perê te hebin bi kefil be, karî te tine bê bi şehde*
 be.
 ٣٩٣٦. Perê te hebin, kes nabê tu lawê kê ye.
 ٣٩٣٧. Pere tîn ser pera.
 ٣٩٣٨. Pere û dilî fere.
 ٣٩٣٩. Perên helal ji bo rojên tengin.

*E lazime : gereke . divê .

*E şehde : dîdar . gewah . gova .

٣٩٤٠. Perid te hebin, di çiqinê da bihêle; rûnî te hebê, di hîz* de bihêle.
٣٩٤١. Perspan li ser perspên nakeve.
٣٩٤٢. Perspanid reş û sipî li hev natên.
٣٩٤٣. Pêşî bifkire paşê bike.
٣٩٤٤. pesin daye, ji waran maye.
٣٩٤٥. Pêşiyê av paşê avahî.
٣٩٤٦. Pêşiyê diçe dibêjin pîj e, pey diçe dbêjin gêje.
٣٩٤٧. Pêşiyê hesp bikire, paşê afir çêke.
٣٩٤٨. Petîxa zer tim ji kosiya re ye.
٣٩٤٩. Pêwr û mizînê ji ser hev nakê der.
٣٩٥٠. Pêxember berê diya li xwe kiriye dû re li umtê*.
٣٩٥١. Pey tariyê ronahî ye.
٣٩٥٢. Pêyadanê heft sêmsora bi pêyadanê marekî ye.
٣٩٥٣. Peyê çê bi navê xwe tê .
٣٩٥٤. Peyê devrûtê sibê dereng derê êvarê zû tê.
٣٩٥٥. Pêyê xwe bi xêr e: (*carîna mirovek dere ciyekî; bi çûndinê wî ra qencik li wir çê dibê, dibêjinê: Pêya te bi xêr bû, ango hatina te bi xêr bû*).
٣٩٥٦. Pez dizê kehrekî û kêr cara dudi ya tîne û çiqasî tê serjêkirin, dîsa bi kerîya heye û kûçik dizê sê – çareka tîne û ne goşt tê xwarin û ne jî dikujin û kerî kûçka tînenî: (*Kurd dibên riziq sibê zû bela dibe; kûçik jî ji êvarê de direwin ta ber destî sibê û berî riziq bela bibê jî xew dikin, ji ber wilo jî risqî wan kêr e . Gavê risq kêr bê, her tişt kêr e, û ji wê pê ve jî nikanin tiştî bikin, ji berko wilo ji wan tê xwastin*).
٣٩٥٧. Pêz nespêre guran.
٣٩٥٨. Pez tîne rûn difroşê.

*K hîz : eyar . kunê rûn û dimis .

*E umet : millet .

٣٩٥٩. Pezê bê şivan gur dixwe.
 ٣٩٦٠. Pezê bi tenê guran xwariye.
 ٣٩٦١. Pezê goşt malê kêrê ye.
 ٣٩٦٢. Pezê kûvî ji kevirî nahête xarê, ille bi tivingê.
 ٣٩٦٣. Piç bi piç xwe gihand qunc.
 ٣٩٦٤. Pihên li zikê sêwî xistin go: Ax pišta min, pirs kirin çima dibêji pišta min, got: Pišta hebîya li zikê min ne dixistin.
 ٣٩٦٥. Pijik li pêçî te hatin der gustêlkek tûcî di pêçî xwe ke nema pijik derdikevin.
 ٣٩٦٦. Pino, navê xwe li mino.
 ٣٩٦٧. Pîr bi desmêj e, sal dirêj e.
 ٣٩٦٨. Pîr bike lê ji bîr neke.
 ٣٩٦٩. Pîr bû ji bîr bû.
 ٣٩٧٠. Pir gotin, ceger sotin.
 ٣٩٧١. Pir here hindik here ê wê xwenê bibîne.
 ٣٩٧٢. Pir herê, hindik herê, tê bimirê.
 ٣٩٧٣. Pir heywan goşt dixwin, lê navî gur derketî.
 ٣٩٧٤. Pîr im, ji xweşi yê dûr im.
 ٣٩٧٥. Pîr kaşanên devî hewşan e *.
 ٣٩٧٦. Pîr ku xêrker be, êvarên înan pir in.
 ٣٩٧٧. Piranî mêrani yê winda dike.
 ٣٩٧٨. Pirani yê mêranî danî.
 ٣٩٧٩. Piranî, betal* kir mêranî.
 ٣٩٨٠. Pirbûn ji hindikahi yê çê dibe.
 ٣٩٨١. Pirbûna mêra mêranti yê xera dike.
 ٣٩٨٢. Pirçê gunka ne dibe tevn ne dibe teşi.
 ٣٩٨٣. Pîrê bahwer ne kir mêr bike, mêr kir dawa next û hefteka kir.

*E hewş : xêl . hûz .

*E betalkir : zorbir .

٣٩٨٤. Pîrê bawer ne kir ku mêr bike, gava mêr kir dawa heftan, heyştan kir.
٣٩٨٥. Pîrê got: Sê fis min tên bilez, yek li ser gundê bê rez, yek li ser mala bê pez yek li ser kesî yê ko kes nebê yê tu û bibê ez.
٣٩٨٦. Pîrê nemir pincar tê, kero nemir qîvar tê.
٣٩٨٧. Pîrê têr bû, paşê ga hat bîrê.
٣٩٨٨. Pîrê tîrr kirî ye û pîr ne razî ye.
٣٩٨٩. Pîrêza me bi sap e, kera me bi xal û ap e.
٣٩٩٠. Pîrêze yî bi sape, Xidir î bi ape .
٣٩٩١. Pîrs bi pîrs mera dighê mala xudê.
٣٩٩٢. Pîrsa xwe bibêje, paşê birêje.
٣٩٩٣. Pîrsan bike ji xortên geryayî û ji kalên zemanan.
٣٩٩٤. Pîrskirin ne şerm e, li ser nezaniyê bimînê şerm e.
٣٩٩٥. Pîrskirin ne şerm e, nezani şerm e û ger nizani bê ku nezani.
٣٩٩٦. Pîrskirin ne şerm e, nezani şerm e.
٣٩٩٧. Pîs nebê, pak jî nabê.
٣٩٩٨. Pîsîk kal bûn bûne tirqiyê mişkan.
٣٩٩٩. Pîsîk ne li mal e, mişk bavê kal e.
٤٠٠٠. Pîsîk serê sibê avdaskê, wê rojê mêvanê wê malê wê bîn.
٤٠٠١. Pîsîka bi esil, mirarê xwe nîşan nade.
٤٠٠٢. Pîsîka heft ruhî* ye.
٤٠٠٣. Pîsing ne li mal be daweta mişkan e.
٤٠٠٤. Pîsmam bû ker, dotmam da der.
٤٠٠٥. Pîsmamo kero, sepeta kayê li bero, te ez dam dero.

*E ruh : giyan . can . rewan .

- Σ••٦. Pişrûka* mirov ji danê xelkê çêtire.
 Σ••٧. Pişta jinan kela ye.
 Σ••٨. Piştî baranê ser ga cil kir.
 Σ••٩. Piştî çax û wexta xwe guharek xistî guhê xwe.
 Σ•١٠. Piştî heft yara bû bûk.
 Σ•١١. Piştî hft zarokan çava kildidê.
 Σ•١٢. Piştî tengasi yê ferehi ye.
 Σ•١٣. Piştî tirr kir kûn qurmiçand.
 Σ•١٤. Piştî tirrê kezî kurrê.
 Σ•١٥. Piştî tirrê qurmiçandin fayde nake.
 Σ•١٦. Pîtavê* malê û sokê li hev dernakevê
 Σ•١٧. Pîvaz pîvaz e çi sor çi sipî.
 Σ•١٨. Pîvazê serê sibê tu buxe, nîvro bi dostî xwe de,
 îvarê bi dijminî xwe de.
 Σ•١٩. Pola ji pola nagre.
 Σ•٢٠. Polan hişk û sar, kadîn tar û mar.
 Σ•٢١. Porê xwe veke û li bextê xwe seke.
 Σ•٢٢. Porhinc kete qunc.
 Σ•٢٣. Porî min reş e fitîl* bîst û şeş e, şostina dayikê çi
 xweş e.
 Σ•٢٤. Poşmaniya paşin ber tiştî nagire.
 Σ•٢٥. Postê devê, barê gê ye.
 Σ•٢٦. Pozê jinekê dibirrîn, wê jî digot: Sûcê zimanê
 min e.
 Σ•٢٧. Pozî gîsnî cotajotinê vedibrûsê.
Q
 Σ•٢٨. Qadiyê* zaroka xwe bi darve kir.

*K pişrûk : navê xwarinikê ye

*K pîtav : jimartin . hesab.

*E fitîl : kezî . gîso .

*E qadî : dadwer .

- Σ•٢٩. Qam ji qama kermêşê, deng ji dengê gamêşê.
 Σ•٣٠. Qantir bi şev û roj didê serhev ku wê çawa xwedanî xwe bikujê.
 Σ•٣١. Qantir bizê dawiya dinê tê.
 Σ•٣٢. Qantir bizê, wê dunya* xera bibê.
 Σ•٣٣. Qantir nazê, xwê şîn nabê.
 Σ•٣٤. Qantirê bazirgancî metirsîne, tu ti zîrarê nabîne.
 Σ•٣٥. Qantirê çamûş pêş ve herê gez dike paş ve herê yê hildide zîta.
 Σ•٣٦. Qantirê çamûş pêş ve herê geza davê, paş ve herê yê pehna davê.
 Σ•٣٧. Qantirê qêdî metirsîne, tu zîrarê nabîne.
 Σ•٣٨. Qapî* cehnimê mixtarî* heft sala vedikê.
 Σ•٣٩. Qawiqa ji kesî re mehezîn. (*ango serî xwe bi xatira ji xariyê re mehezîn.*)
 Σ•٤٠. Qaz bi refa xwe re baz e.
 Σ•٤١. Qaz û ordekê bi hev ra li ber avê dijîn, qazê bar kir çû bi alî çê ve, piştî demekê rastî hev hatin, ordekê dît ku qaz gelekî jar bûye û dijûn ketiye û pepilên wê reş bûne. Ordekê got ê: Xakê, te xêr ji ber avê barkir, em bi kêfbûn, me her roj xwe dişuşt û dimişt, cûre cûre me goşt dixwar, nêçîrvana nikanî em bikuştana, Qazê got: Hêkêd min celq dibûn. Ordekê got ê: Ger kûnê te ew kûna bê, tu bi kuda herê, wê hêkid te celq bibin.
 Σ•٤٢. Qaz wekî dizane, ba wekî xwe.
 Σ•٤٣. Qaz zengilê devî deriya ne.
 Σ•٤٤. Qaza bi lingekî xeber da gundekî.

*E dunya : cihan . gerdon .

*T qapî : derî .

*E mixtar : keye .

- Σ•Σ٥. Qaza bi lingikî rojê li ser singikî.
 Σ•Σ٦. Qazik ji xwe re bi tewkê dikene .
 Σ•Σ٧. Qazik tenê zane çito bini dişewite.
 Σ•Σ٨. Qebhet* bibe taca zêrîn, ti kes nade serê xwe.
 Σ•Σ٩. Qedê were dana şîr ketiye guhana.
 Σ•٥٠. Qedrê gula çi zanit, kerbeş divêt kera reş,
 Σ•٥١. Qedrê mêvana qedrê xwedê.
 Σ•٥٢. Qedrê porsipiya zanibin.
 Σ•٥٣. Qedrê zêr zêrker zanê.
 Σ•٥٤. Qedrê* porê sipî zanibe.
 Σ•٥٥. Qehpik bi gidiya disekinin.
 Σ•٥٦. Qehra hêştir e, çira ji kerê paştire.
 Σ•٥٧. Qenca ez xwastim, pîsa ez birim.
 Σ•٥٨. Qencî carinan dibin gincî*.
 Σ•٥٩. Qencî ji te nayê, xirapiyê meke.
 Σ•٦٠. Qencî nayê ji bîrkirin.
 Σ•٦١. Qencî qenciyan tîne.
 Σ•٦٢. Qencî qencyê nas dike.
 Σ•٦٣. Qenciya ne di cihê xwe de, bela ye
 Σ•٦٤. Qenciya ne li cih, bela ye.
 Σ•٦٥. Qencyê ji cîranê xwe re bixwaze paşê ji xwe re
 bigaze.
 Σ•٦٦. Qereçiya welatê xwe, nadim bi xatûna welatê
 xelkê.
 Σ•٦٧. Qerqerê mirî cawê sipiye, lê xelasiya wî emelê
 wîye.
 Σ•٦٨. Qertel li berata* digerin.

*E qebhet : pîsî . kirêtî . erjengî .

*E qedr : ûd . nerx .

*K gincî : xirapî .

*K berate : laşê li çola li ber xwarina cinawira mayî .

- Σ•٦٩. Qertel sibê şiyar dibin stûyê wan bi kuda li yan ketibê bi wî piyî de difirin.
- Σ•٧٠. Qeşmer bi êlê dikenê, êl bi qêşmer dikenê.
- Σ•٧١. Qey hêlana Êreb e.
- Σ•٧٢. Qey mirov qawîn e, ku me ra kûnê bîn kê.
- Σ•٧٣. Qey te nmûsa xwe bi nê re xwariye.
- Σ•٧٤. Qiçik bifirin jî bawerke, bizirin jî bawerke.
- Σ•٧٥. Qiçik li ser tîrbê xwe dilîzin.
- Σ•٧٦. Qiçik mera dişînin qapî dujmina jî.
- Σ•٧٧. Qijak bi kevokê qayîl nabe.
- Σ•٧٨. Qijakê xwast meşa werdekê hînbe, meşa werdekê hîn nebû, cotkê xwe jî jî bîrkir.
- Σ•٧٩. Qini* bi virra ye, lê şûrî birra ye.
- Σ•٨٠. Qird belaş dîlanê nake.
- Σ•٨١. Qird di çavê dê de xezal e.
- Σ•٨٢. Qîretê cîrên a cîrên e .
- Σ•٨٣. Qirrka bavê xwe agemari nedîta, Xwedê zane, wê bigota ez lawê kê me?.
- Σ•٨٤. Qirrka bavê xwe yî gemari nedîta, Xwedê zane, wê bigota ez lawê kê me?.
- Σ•٨٥. Qisa mala bavêjin çala.*
- Σ•٨٦. Qîz çêtir in ji lawa, çê dikin mebrom* û cawa.
- Σ•٨٧. Qîz sor in, xort kor in.
- Σ•٨٨. Qîz warê xelkê ne.
- Σ•٨٩. Qîz, çira xelkê vêdixin.

*K qin : malkê şûr .

*E mebrom : bazingî zêrî û badayî

*K nîşan : ew xwîna ko ji keçîniya bûkê dirêje ser çarşefê ye .

٤٠٩٠. Qîza baş be, li pey kaş be.
 ٤٠٩١. Qîza cînar cînar dide mêr.
 ٤٠٩٢. Qîza daw dijmin e: (*Ev gotin ji girantirîn gotina ye. Daw aliyê kirasa yê jêr e; berê piştî bûk danîn û ew û zava diketin paş perdê, roja din serê sibê hinek jin ji mirovên zavê û ji dostan û carina jinek ji aliyê bûkê jî dihatin mala zavê ser nîşanê. Ger nîşan nedîtibana, gelekî dijwar bû; ew bûk bi riswakirin dişandin mala bavê wê û digotin: gûyê qehpa li riyê gidiya. Îca bavê wê li gor xwe çare jê re didî, ji kuştinê û jêr de. Îca çilo daw dijmin e, belkî rojekê keçik rûnê û dawa wê bi wê zara keçîniyê ve bizemire û keçik bê hemdê xwe wê dawê bi zerp bikşînê û ew zara keçîniyê bi wê kişandin re tiştêk pê werê û roja çûna ser nîşanê nîşan nemînê; ya din jî, ta keçik keçik e, çavê herkesî lê ye ta bighê kiras û dawa).*)
 ٤٠٩٣. Qîza mêr nekirî, derdê dê û bavê ye
 ٤٠٩٤. Qîzanî xweş e, bûkanî gula geş e, gava ku kete ber qehra malan roja reş e.
 ٤٠٩٥. Qîzek xwe anî pîr bû , Bûkek xwe anî jîr bû,
 hewîk xwe anî xedar bû .
 ٤٠٩٦. Qîzik xwe wîne pîr bibe, bûkik xwe wîne jîr bibe
 hewîke xwe wîne no bibe
 ٤٠٩٧. Qoçê kera çênabin, dibên qey em tim dehşin.
 ٤٠٩٨. Qûçid bilind qelawîza naxwazin.
 ٤٠٩٩. Qûl bê qusûr nabe
 ٤١٠٠. Qûl li ber yek xwe ye, Xwedê li ber yek xwe ye.
 ٤١٠١. Qûl tevdîra dikê, xwedê tevbîra dikê.
 ٤١٠٢. Qûlê ser bi pirçe, çi kirî ê bikê.
 ٤١٠٣. Qulpa bi hêka dixin.

٤١٠٤. Qumcî zêrî xwe nas dike.
 ٤١٠٥. Qumciyî rind ji ciyî xwe der nakevê.
 ٤١٠٦. Qûn bi qûnkaşkê ji kîr xelas nabe.
 ٤١٠٧. Qûn ji qentarekê gereke ku li ser weqiyek zêr
 rûne.
 ٤١٠٨. Qûna tazî, tembûrê dixwazî.
 ٤١٠٩. Quncikêd pixara germ in, şor tê de xweş û nerm
 in.
 ٤١١٠. Quriş tim çêl pere ye.
 ٤١١١. Qurnas digerin du cara, êvarî tèn li mala xwe
 dixun.
 ٤١١٢. Quruşekî di berîkê te da çêtir e ji zêrî di berîkê
 xelkê da.
 ٤١١٣. Quruşî xirap li xwedana vedigerê.
 ٤١١٤. Qusûr ji biçûka afkirin* ji mezina
 ٤١١٥. Qûtê kuwarê, heta biharê.
 ٤١١٦. Quwet* iletê* dibire.
 ٤١١٧. Quzê gewr di derpê re xwyanê ye.
 ٤١١٨. Quzê par rewisî, îsal bîhn dide.

R

٤١١٩. Rakirina zulmê ji zalimdara nexwazin.
 ٤١٢٠. Rast bifkire, rast bêje, rast pêkbîne. (zaredêşt)
 ٤١٢١. Rast fisê dîk ne tişt e, wekî dinê li xweşiyê
 mirîşkê tê.
 ٤١٢٢. Rast min dagirî, lê dengê min derket. (derneket)
 ٤١٢٣. Rastan zewal tune, waran kemal* tune.
 ٤١٢٤. Raste şêx e, lê di dilê xwe de rêx e.

*E afkirin : baxşandin

*E quwet : hêz .

*E ilet : nexwaşî .

*E kemal : têkôzî .

٤١٢٥. Rastî bibe dezî jî naqete.
 ٤١٢٦. Rastî carina serî dişkîne.
 ٤١٢٧. Rastî di şeravê (*araqî*) da ye.
 ٤١٢٨. Rastî serşikên e.
 ٤١٢٩. Rastî şûrê xwedê ye.
 ٤١٣٠. Rastî tehl e.
 ٤١٣١. Rastî tehle lê gereke tu bêjê.
 ٤١٣٢. Rastî xelasiye.
 ٤١٣٣. Rastî, bibe derzî jî naşke.
 ٤١٣٤. Rastiyê heft diram zêhêr têdane.
 ٤١٣٥. Rastiyê vemeşêr, û mebê: Ez im şêr.
 ٤١٣٦. Rasto bi rastî, xwaro bi stoyê şikestî.
 ٤١٣٧. Rasto bi rastî, xwaro darê şikestî.
 ٤١٣٨. Rasto duristo, xwearo şikesto.
 ٤١٣٩. Rê li dilan teng e.
 ٤١٤٠. Rê rêya mirinê jî be, tu her li pêşbe.
 ٤١٤١. Rebeno tim be te rûyê xwe reş kir, rabe li ser kab
 û nîvê.
 ٤١٤٢. Rêç rêça kera çûne, sûc sûcê bûkê nûn e.
 ٤١٤٣. Rêça rovî heta kunê ye.
 ٤١٤٤. Rehmek li rû, tirek li dû .
 ٤١٤٥. Rêncber û maldar, nabin hem war.
 ٤١٤٦. Rêncberê xwe be, axayê mala xelkê be.
 ٤١٤٧. Rêncberê zana be, ne axê nezan be.
 ٤١٤٨. Reng da der kesk û spî sor û zer, kesk aşî, sor
 hêza yezdan, sipî roj e, rûmet e zer.
 ٤١٤٩. Reng rengin, lê sor bi dengin.
 ٤١٥٠. Req ket devê tûtîkê: (*Berê, aşên pir bi avê digerîn;
 îcar, bendek li ber çem ava dikirin, ji bo coyek werê ser
 êş û lûleyek dixistin diwarê êş, ji bo av bi zerp li
 perikên çerxê dê ji bo aş bigerê; ew lûle bi xwe tûtîk e;*)

carina, ji çem req vediqetî û bi ber ava bendê diket û dihat diket devî wê tûtikê, vê ra aş disekînî, hema sûsanî (qerraş) ban dikir, digot: Req ket devê tûtikê, xwe pêgînin ango çi kar û barê kesekî kengê rawestê dibên req ket devê tûtikê).

٤١٥١. Reş bi reş kenî, beş çû li newala tewş kenî.
 ٤١٥٢. Reş da ber peşê. (*ango şîn kişand*)
 ٤١٥٣. Reş e wek qîrê, rast e wek tîrê.
 ٤١٥٤. Reşê dê û bavan, sipî nabe bi avan.
 ٤١٥٥. Reşê dê û bavê, sipî nabe, bi sabûnê û avê.
 ٤١٥٦. Reşê, bermalê, gewrê, berkendalê.
 ٤١٥٧. Reşo tu û destê xwe eger avê tu ne birî.
 ٤١٥٨. Reva pisîkê heya kadînê ye.
 ٤١٥٩. Revê pisîkan bin qulînê ye.
 ٤١٦٠. Rêwî diçe rê dimîne.
 ٤١٦١. Rêwîtiya rîyan ji rêberê rîyan kifş* e.
 ٤١٦٢. Rewşa kala mû yê sipî ne, rewşa xorta temberî ne, rewşa qîza bisk û kezî ne, rewşa pîra tevn û teşî ne.
 ٤١٦٣. Rewşa konan çît û perde ne.
 ٤١٦٤. Rewşa malê kebanîye.
 ٤١٦٥. Rewşa mirîşkan hêk in.
 ٤١٦٦. Rewşa qîza kezî ne.
 ٤١٦٧. Rewşa qîzan bisk û kezî yên wan e.
 ٤١٦٨. Rewşa zivistanê berf e.
 ٤١٦٩. Rêya dirêj ji gava biçûk dest pêdike.
 ٤١٧٠. Rêya malê malxwe zanê.
 ٤١٧١. Rêya seg di ber qesab deyî .
 ٤١٧٢. Rez kor dibin, simaq li şûnê şîn tîn.
 ٤١٧٣. Rez ne tu rez bû, teyrokê jî lê kir.

*E kifş : bêlî .

٤١٧٤. Rez û pez û zêr e, dara biçin hîn bi xêr e.
 ٤١٧٥. Rezîlî rabû dûvê qantirê: *(dibêjin dûvê qatirê, ji berko dûvî qatirê ji erdê ve ji dûvî hespa û kera dûrtir e û xuya ye asta reziliyê pir bilind bûye, gihaye asta dûvê qatirê).*
 ٤١٧٦. Rezîlî rabû kabê.
 ٤١٧٧. Rî dibe bost, lê dujmin nabe dost.
 ٤١٧٨. Rî-berdan a qolayî ye, rî-qutkirin a çetin e.
 ٤١٧٩. Rih kurkirin, paşê neynik dîna ber xwe.
 ٤١٨٠. Rim di tûr de nayê veşartin.
 ٤١٨١. Rim di tûr hilnayê.
 ٤١٨٢. Rind e, geroka nav gund e.
 ٤١٨٣. Rindek û gundek.
 ٤١٨٤. Rindid gunda, vê nav û notik nabin.
 ٤١٨٥. Rindid mera tine bin, id xelkê pera nakin.
 ٤١٨٦. Rindiyê bike, bi avê de berde.
 ٤١٨٧. Rindiyê ji bîr meke, li nerindiyê sêr meke.
 ٤١٨٨. Risqê haran li ser dînan e.
 ٤١٨٩. Riya asîman berwar e.
 ٤١٩٠. Riya azadiyê, bi xwîna şehîda rohnî dibe.
 ٤١٩١. Riya dirêj bi gava destpêkê dest pê dike.
 ٤١٩٢. Rizq sibê bela dibê.
 ٤١٩٣. Rizqê mêvanan fireh e.
 ٤١٩٤. Rizqî cixarê pir e.
 ٤١٩٥. Rizqî gur li şivanî bê xêr e.
 ٤١٩٦. Rizqî mêvana vê ra tê.
 ٤١٩٧. Rizqî sa li ser dîna ye.
 ٤١٩٨. Rizqî siba li siba ye.
 ٤١٩٩. Ro bi seradê natê girtin.
 ٤٢٠٠. Ro bi sêwî ya ket, mal heft cara ji dest barkirin.
 ٤٢٠١. Ro di pişt ça de namîne .

٤٢٠٢. Ro hilat mirna pêlî hat, roj çû ava palî bû zava.
 ٤٢٠٣. Ro li kî derê li te çû ava, li wê derê jî bisekine.
 ٤٢٠٤. Ro reş bû, xwe jî royê reştir bike.
 ٤٢٠٥. Roj bi rîkê nare ava: *(carina karkerin qelp hene; ji bo xwe li ber kar bidin yan, ya mîzkirinê, ya jî rîkîrînê dikin mihane; her bêhnekê, bi çolê de derin, loma dibên: ro bi rîkê narê ava).*
 ٤٢٠٦. Roj bi seradê nayê veşartin.
 ٤٢٠٧. Roj derin, qeza narin.
 ٤٢٠٨. Roj diçê bela naçe.
 ٤٢٠٩. Roj gazekekê bi banî ket, cotkarê min nûka bi rê ket.
 ٤٢١٠. Roj tê, yê dikene digrî, yê digrî dikene.
 ٤٢١١. Roja aş jî aş re ye.
 ٤٢١٢. Roja xweş jî sibehê ve xweş e.
 ٤٢١٣. Rojan nikanê dostekî bibînê, rojekê kanê deh dostan bixeydînê.
 ٤٢١٤. Rojê çê di sibê ra xuya ye.
 ٤٢١٥. Rojê heftê ji temenî zarok divê gundî werin ji êvar de ta roj hilata li ber serî zarok rûnin ji bo heftik* lê nexê.
 ٤٢١٦. Rojê sibê nedê mera, rojê berava vala ye.
 ٤٢١٧. Rojên xwedê ji garisê sorik pirtir in.
 ٤٢١٨. Ronî bi sêwiya ket, mala heft cara barkir.
 ٤٢١٩. Roniya çava deyaqa dila .
 ٤٢٢٠. Rovî ber derê kuna xwe şêre.
 ٤٢٢١. Rovî biweste dûv lê dibe kaşan.

*K Heftik: nexwaşiyek e dibêjin ger di roja heftê ji temenê zarok de bi zarok nekevê wê di heft mehiyê de pêkeve, ger di heft mehiyê de pê nekevê ,wê di heft saliyê de pêkevê, ger di heft saliyê de pê nekeve wê di heftê saliyê de pêkevê.

٤٢٢٢. **Rovî biweste dûv lê giran dibe.**
 ٤٢٢٣. **Rovî devê xwe ne gihêşt tirî got: Tirş e**
 ٤٢٢٤. **Rovî di şiketê kefin zarok ê bi dêri kefin.**
 ٤٢٢٥. **Rovî du cara nakeve xefkê.**
 ٤٢٢٦. **Rovî ger ji baranê bitirsiya, wê kurkek li xwe kira.**
 ٤٢٢٧. **Rovî ji teriya gur a rep aqil girt: (Dibêjin : şêrek û gurek û roviyek bûn dost ; rojekê, çûn nêçîrê, xezalek û berxek û dîkek ji xwe re girtin û hatin mal ; şêr gote gur : fermo, bira, nêçîra me li me parve ke, gur got: Ez pîr şa me ku te ev rûmeta mezin da min, destê xwe avêt xezalê û li ber şêr danî û gotê: Tu birayê me yî mezin î û serdarê hemû cinawira yî, goştê xezalan li yaqê te ye û rahişt dîk da ber rovî û gotê: Tu birayê me yî biçûk î û aqildarekî cinawira yî, û berx li ber xwe danî. Xuya ye ev parvekirin ne li gor dilê şêr bû, hema lepek li serê gur da û gur di cî de bi ser stoyê xwe de ket û dûv lê rep bû. Şêr gote rovî : fermo, bira, tu nêçîrê parve ke, rôvî rabû û bi temena ber şêr çû û got: Paşayê mezin, dîk taştîya te ye, berx firavîna te ye, xezal şîva te ye ; şêr gotê: Birayê rovî te ev aqilê ha yî mezin ji ku girtiye, rovî got: Ji dûvê gur î rep).**
 ٤٢٢٨. **Rovî li ber qapî xwe şêre.**
 ٤٢٢٩. **Rovî ne çû qulê, hejek bi teriya xwe vekir.**
 ٤٢٣٠. **Rovî ne diçû qulê, hejek bi serê dûvê xwe ve kir.**
 ٤٢٣١. **Rovî neçû qulê, hejek bi dûvê xwe da girêda.**
 ٤٢٣٢. **Rovî têr be, tirî tirş e.**
 ٤٢٣٣. **Rovî û sûk?**
 ٤٢٣٤. **Rovîkî berdayî, çêtire ji şêrekî giradayî.**
 ٤٢٣٥. **Rovîkî digere ji şêrekî xewkirî çêtir e.**
 ٤٢٣٦. **Rovîkî gerok çêtire, ji şêrekî mexelok.**

٤٣٣٧. Rovîkî kewek girt, kêw got ê: Apê rovî, piştî tu min bixwê û tu têr bibê tê çi bêjê: Rovî got ê: Ezê bêjim alhamdulillah. gava welê got: Devê rovî ji hev bû, kew ji dêv firî. Rovî got: Xwelî li wî kesî ku têr nexwê û bêje alhamdulillah.
٤٣٣٨. Roviye gerok ji şêrê raketî çetir e.
٤٣٣٩. Roviye zexel, bi herdu nigan dikve dafikê.
٤٣٤٠. Roviye ji çiyakî xeyidî ye
٤٣٤١. Royê çê ji sibêda xiya ye.
٤٣٤٢. Royê dere venagere .
٤٣٤٣. Rû ji rû fedî dike.
٤٣٤٤. Rû ji rûya şerm dikin .
٤٣٤٥. Rû xweşe lê dil reş e.
٤٣٤٦. Rû yê reş hewce^{*} nake tu teniyê lê bidî.
٤٣٤٧. Rum di çiwala da natên veşartin.
٤٣٤٨. Rûn hebê di hîz da bihêle, pere hebin di kîs da bihêle.
٤٣٤٩. Rûnê ereba pir dibe, di ber ûrî xwe didin.
٤٣٥٠. Rûnê ereba pir dibe, di xwe didin.
٤٣٥١. Rûnê ji Erdê berhev bûyî ye.
٤٣٥٢. Rûnê me bi hîzê me va.
٤٣٥٣. Rûnê me bi ser gêrmiya me de rijî.
٤٣٥٤. Rûnî te pîrbê di hîz da bihêle, perê te pîrbin di kîs da bihêle.
٤٣٥٥. Rûnişt li germa, rabû li serma..
٤٣٥٦. Rûreş dilreş in.
٤٣٥٧. Rûvî sed çêrokî dizane, nod û neh li ser mirîşkane .
٤٣٥٨. Rûviye ne çû qolekê, kaşanek bi xwe ve girêda.

*E hewce : gerekî , pêdivî . niyazî .

٤٢٥٩. Rûyê qayîm* ji berê cotê gayan çêtir e.
 ٤٢٦٠. Rûyê reş, wê bi teniyê çi bikê.
S
 ٤٢٦١. Sabûna min kef neda.
 ٤٢٦٢. Sal bi sal xwezî bi par.
 ٤٢٦٣. Sal wekî bawîşka tên û diçin.
 ٤٢٦٤. Salê carek mêranî, mehê carek mêvanî, rojê carek domanî.
 ٤٢٦٥. Salê du caran cejn dibin, di wan rojan de ji zikê sêwiyan dêşe.
 ٤٢٦٦. Salekê şivan e, deh salan heywan e.
 ٤٢٦٧. Saqo li yaqo .
 ٤٢٦٨. Sax dibe şûna xenceran, belê sax nabe şûna xeberan.
 ٤٢٦٩. Saxo bi xwedê re, çirûko bi dinê re.
 ٤٢٧٠. Se be, ji qewmê* xwe be.
 ٤٢٧١. Se çiqas ji tere nas be, dar ji destê xwe nevéje.
 ٤٢٧٢. Se direwît, karwan bi rêka xo diçit.
 ٤٢٧٣. Se direyin, hevdu dibînin.
 ٤٢٧٤. Sê henek bi rastiyekê ne.
 ٤٢٧٥. Sê malên feqîr mêvanekî têt nakin.
 ٤٢٧٦. Sê tişt hene bi dilêş: mirîşk û mêş û derwêş.
 ٤٢٧٧. Sê tişt hene xwaş in bi sarî, mehîr, ar û karî.
 ٤٢٧٨. Sê tiştan ji bîr mekin: şîrê diyan, westa bavan û şîretê mezinan.
 ٤٢٧٩. Sê wêne dost hene: nano gano cano.
 ٤٢٨٠. Se, seye hestiya dixwe hesabê paşeroja xwe dike.
 ٤٢٨١. Seba çilê, xwe nexê gilê.
 ٤٢٨٢. Sebir mîrê misirê ye.

*E qayîm : xurt . dugurdî .

*E qewm : millet .

٤٢٨٢. Sed gazê werîsî, esil heçik e .
 ٤٢٨٤. Sed gotin bi gotinekê disekinin.
 ٤٢٨٥. Sed mêr kerwanek, du jin bazirganek.
 ٤٢٨٦. Sed tîr û tîrrek li ba tîrreka yeke.
 ٤٢٨٧. Sed xeber bi xeberekê disekine.
 ٤٢٨٨. Seg çiyê û siya sêg çiyê.
 ٤٢٨٩. Seg rewa xwe zanê kerwan rê ya xwe zanê.
 ٤٢٩٠. Seh direye kerwan dibihore.
 ٤٢٩١. Sehna ku ji derve de were, bila bi rê de birjê.
 ٤٢٩٢. Sênika te ya şikestî çêtir e ji ya xwastî.
 ٤٢٩٣. Seqe°, li gor heq e°.
 ٤٢٩٤. Ser qube ye, bin tîrbe ye.
 ٤٢٩٥. Serdan, salê carekê bi siltanî, mehê carekê bi mêvanî, rojê carekê bi dilmanî.
 ٤٢٩٦. Serê bênamûsa cinetê nabîne.
 ٤٢٩٧. Serê berjêr nayê jêkirin.
 ٤٢٩٨. Serê du beranan di dîzekê de nayê kelandin.
 ٤٢٩٩. Serê gurrî di bin kum de baş e.
 ٤٣٠٠. Serê heft newalan newalek, serê heft pirsan pîrsek dibirre.
 ٤٣٠١. Serê keçel di bin kum de başe.
 ٤٣٠٢. Serê keçel di kum de baş e .
 ٤٣٠٣. Serê kesê rast, tim bilinde.
 ٤٣٠٤. Serê ko ne di nav seriyên de be hêja yî birrînê ye.
 ٤٣٠٥. Serê li ber minetan, bila biçê nav ziyaretan°.
 ٤٣٠٦. Serê mera li ber royê nekele, şîva mera li ser êgir nakele
 ٤٣٠٧. Serê min bi şar e, çibikim dilê min bi jar e.

°E seqe : seyîs . mehter .

°E heq : mafê rojanê .

°E ziyaret : mezel . goristan .

٤٣٠٨. Serê nav sera beranê li nav kera xarzayê gerden zera...
 ٤٣٠٩. Serê navçiyarên tê şikestin.
 ٤٣١٠. Serê ne êşe dismalê lê girêmede.
 ٤٣١١. Serê ne êşe girê nede.
 ٤٣١٢. Serê neêşî, destmalê nedê .
 ٤٣١٣. Serê qijikê nabe qelî*.
 ٤٣١٤. Serê sed mêrî mêreke.
 ٤٣١٥. Serê sed serî jê ne êşe, ew serî ji çî re ye.
 ٤٣١٦. Serê sing du çeq e, loma di axê de naçe.
 ٤٣١٧. Serê xwe bide bextê xwe mede.
 ٤٣١٨. Serên ne bi ser yek be, naçin dev yek ve.
 ٤٣١٩. Sergo nadin ser bana.
 ٤٣٢٠. Serî çawa çû, paşî jî dide dû.
 ٤٣٢١. Serî çiya yê bilind her mij û dûman e.
 ٤٣٢٢. Serî çov di bin ebê re li dijminî xwe mîne.
 ٤٣٢٣. Serî çox e binî pox e .
 ٤٣٢٤. Serî çû qûnê da dû.
 ٤٣٢٥. Serî du berana di biroşekê de nayê kelandin.
 ٤٣٢٦. Serî heft şora şorek .
 ٤٣٢٧. Serî heft şora şorek dibirê.
 ٤٣٢٨. Serî her mezin dibê, ecêba dibînê.
 ٤٣٢٩. Serî hezar galgalî galgalek.
 ٤٣٣٠. Serî hezar newalî newalek.
 ٤٣٣١. Serî ji êqil dêşe.
 ٤٣٣٢. Serî ku hebin, kum gelek in.
 ٤٣٣٣. Serî kûçka dêşê, derin çawîrê dixun.
 ٤٣٣٤. Serî kûçka ne êşê, narin çawîrê naxun.
 ٤٣٣٥. Serî mêr ne êşê, narê ser rêkan.
 ٤٣٣٦. Serî mêran çayê bi dûman e.

*E qelî : qawirme .

٤٣٣٧. Serî sax bêlgi naxwazê.
 ٤٣٣٨. Serî xwe di hefsarî boş re meke.
 ٤٣٣٩. Serî xwe mexe bin ebê xelkê.
 ٤٣٤٠. Serîk genim kefçîk şorbe ye.
 ٤٣٤١. Serîkê hêl û mêla xarzayê gerden kêla....
 ٤٣٤٢. Serîkî çortan e, birkî mêvan e.
 ٤٣٤٣. Serîkî heft serî jê nehesidin* ne ti serî ye.
 ٤٣٤٤. Seriyê ku hate birîn nayê kirîn.
 ٤٣٤٥. Seriyê ku ne êşê, kundirek ji çêtir e.
 ٤٣٤٦. Seriyê reşo te çi dî.
 ٤٣٤٧. Seriyê xwe qot kirî li şera digere.
 ٤٣٤٨. Seriyek çirtan, komek ewan.
 ٤٣٤٩. Seriyek ku deh serî jê nehesidin ne ti serî ye.
 ٤٣٥٠. Serpêhatî ji hekîmê luqman çêtir dizane.
 ٤٣٥١. Serpiyê Şamê ye, kî carekê bixwê, carek dî naxwê.
 ٤٣٥٢. Sêva çê para hurçê ye.
 ٤٣٥٣. Sêwî sitirîn, melek etirîn.
 ٤٣٥٤. Seyê bê tîmar qaha mala ye....
 ٤٣٥٥. Seyê birçî di xewna xwe de hestiyên dibîne.
 ٤٣٥٦. Seyê birçî hestiya di xewna xwe de dibîne.
 ٤٣٥٧. Seyê gurêx, di tuletîyê de jî gurêx e.
 ٤٣٥٨. Seyê har bela xwe dibîne.
 ٤٣٥٩. Seyê me termê miha me dixwe, li ber deriyê xelkê jî direye.
 ٤٣٦٠. Seyê me ye, li ber deriyê xelkê direyê.
 ٤٣٦١. Seyê pîs gur tîne pez.
 ٤٣٦٢. Seyê xwe baş xwedî nekî wê biçê ber deriyê malek din.

*K E nehesidin : nedexisin .

٤٣٦٣. Seyên birçî qûnên hev bîndikin.
 ٤٣٦٤. Sibat tiro viro, adar ma bîst û du ro.
 ٤٣٦٥. Sibatê* bankir adarê*, got: Sê rojan bide min bi deyn ezê gîskan ji tehtan bînim xwarê.
 ٤٣٦٦. Sibê parî, nîvro heta karî, êvarê dixwî naxwî tu dizanî.
 ٤٣٦٧. Sibe vetê, xêr vê ra.
 ٤٣٦٨. Sibe ye dengê dika qebe ye, rabin wexta karê me ye.
 ٤٣٦٩. Sîfilî kerasekî ji êgir e.
 ٤٣٧٠. Sifra merdan tim raxistî ye.
 ٤٣٧١. Sifrê comerdan tim li meydanê ye.
 ٤٣٧٢. Siha pelkê ye. ne li xwe ye û ne li xelkê ye.
 ٤٣٧٣. Silav li miya ye, ne li mûya ye: (*Kalekî rihsipî xwedî mî bû; xelk di berra derbaz dibûn, bi germî silav didanê; di bîra kalê de, xelk ji bo riha wî ya sipî silavê didinê; wî jî her diçû bêtir guh dida riha xwe û guhdana miya ji dest riha wî kêr dibû. Demek hat, miyên kalê neman; vêca, xelk di ber re derbaz dibin û wek berê silavê nadinê, hîngê kalê zanî ku silav li miya bû ne li riya bû*).
 ٤٣٧٤. Silav li pariyê hazir e*.
 ٤٣٧٥. Silav li sifra hazira.
 ٤٣٧٦. Silober bi gulê çikirî, gulê bi silober çikirî.
 ٤٣٧٧. Siltik hatin bûn siltan, pêlik danin çûn asîman.
 ٤٣٧٨. Silto bû kevanî, golika werîs hilanî.
 ٤٣٧٩. Simbêl bi pisîka ve jî hen e.
 ٤٣٨٠. Simbêl li pisîngê jî hene.

*K sebatê : meha şubatê. reşmeh

*K adarê : aydarê .

*E hazir : amede .

٤٣٨١. Simêl sorê mera hebin, kezî zerê xelkê pirin.
 ٤٣٨٢. **Simêl-sorê mera hebin, kezî-sorê xelkê pirin.**
 ٤٣٨٣. Sing ji ber mêkut diçe erdê.
 ٤٣٨٤. Sing tûj meke û mexe xwe.
 ٤٣٨٥. Singê du serî, di erdê re naçe.
 ٤٣٨٦. Singê sê çiq naçe erdê.
 ٤٣٨٧. Sîno sivik hîn gi li te neketiye şivik.
 ٤٣٨٨. Sîpe yî biçûk e, barî giran e.
 ٤٣٨٩. **Sipi ya binî êş e.**
 ٤٣٩٠. **Sipiyek kulek şevê li nav heft ciyan digêrê.**
 ٤٣٩١. **Sîran nexwe, bîn ji te nayê.**
 ٤٣٩٢. **Sîrek bû, pîrek bû.**
 ٤٣٩٣. **Sîrekê didê, bi pîvazekê jê xelas nabe.**
 ٤٣٩٤. **Sîrkut hilat, mîrkut dahat.**
 ٤٣٩٥. Sirt bê ba nabin, geliyên kûr bê av nabin, û dildar bê yar nabin.
 ٤٣٩٦. **Sîsalk dimînin dawiya pizana û sûc dikin stûyê şivana.**
 ٤٣٩٧. **Siwar hat peya çû.**
 ٤٣٩٨. Siwara dibe û peya dihêle (id rind dibe, ê xerab dihêle).
 ٤٣٩٩. **Sîwarbûna kerê carekê eybeke peyabûn du eyb in.**
 ٤٤٠٠. **Sîwarê hespê xelkê, her peya ye.**
 ٤٤٠١. **Sîwarek di ser kaniyekê ra derbaz bû, dît ku jinek û qîza xwe gênim dişon, rojbixêrek da wan û got: Hûn kanin ji kerma xwe zerkek av bi min din, dayîkê got: Ser çava kurê min çima nikanin, qîzê çû zerik bi kaniyê xist û jê re bir, mêrik av ji des girt û li avê nêrî û li qîzî nêrî û li koma gênim nêrî, qîzkê gotê: Ezbenî ger tu li avê dinêre, li kaniyê binêre, ger tu li min dinêre, li**

diya min binêre, ger tu li gênim dinere, li êrd binêre.

٤٤٠٦. Sîwarî hespî xelkê, kengî be peya ye.
 ٤٤٠٧. Soldîrû pêxwasin, cildirû bê kirasin.
 ٤٤٠٨. Solên koşkara tim çîrîne.
 ٤٤٠٩. Solker pêxwasin cûmker bê kirasin.
 ٤٤١٠. Solkerê xwe be, xoştiviyê xelkê be.
 ٤٤١١. Soz ji devê mêran derdikeve.
 ٤٤١٢. Sûc topaçê berfê ye, kes nakê paşilê xwe.
 ٤٤١٣. Sûcliya zimanî xwe kin e.
 ٤٤١٤. Sûnd şûrê du dev e.
 ٤٤١٥. Sûndî kabciya netê ye.
 ٤٤١٦. Swarê kera ne ti swar e, jina bi mêr ne ti yar e.

Ş

٤٤١٧. Şabûn ji mirtiba nayê.
 ٤٤١٨. Şahî û şînî bira ne
 ٤٤١٩. Şahidê rûvî terrî ya wî ye .
 ٤٤٢٠. Şahidê rûvî terrî ya wî ye .
 ٤٤٢١. Şahidê* ereban tim kesên mirî ne.
 ٤٤٢٢. Şahidê* rovî dûvê roviy e.
 ٤٤٢٣. Şala çivîtkirî pirepir e, zik ji nêza re qurequr e.
 ٤٤٢٤. Şam dûr e ma mişar jî dûr e.
 ٤٤٢٥. Şam şekir e, welat şêrîntir e.
 ٤٤٢٦. Şand diziyê, lê da firiziyê (*ton fitkirinek e*).
 ٤٤٢٧. Şansê te hebe, sêlê dernexûn dîne, nên bikê, wê bîn: Çi kebanî ye!
 ٤٤٢٨. Şansê te pîs bê, diranî te wê di kolkê da bişkê.

*E şahid : gewah . gova . dîdevan .

*E şahid : gewah . gova . dîdevan .

٤٤٢٥. Şansê xwe di kûnê gur da ye: (*kesek xwedî bext ba digptinê: Ma te kûnê gur bi kumî xwe de durûtî ye*).
٤٤٢٦. Şeb û şekir çûn diyarbekir, şekir rûnişt dengnekir, şeb rabû pesnê xwe kir.
٤٤٢٧. Şeb û şekir ji şivên re yek in.
٤٤٢٨. Şeb û şekir, ji hev nasnekir.
٤٤٢٩. Şekala xwe ramede nav qonderê xelkê .
٤٤٣٠. Şekir ne xurdê gavana ye.
٤٤٣١. Şeko navê xwe li hevalê xweko.
٤٤٣٢. Şelpê (derbê) mêra sisê ne .
٤٤٣٣. Şepilê kora li nav hijîra.
٤٤٣٤. Şêr bi fena tê girtin.
٤٤٣٥. Şêr bi lepê xwe mêr bi destê xwe.
٤٤٣٦. Şêr di xew da be, berx qeral e.
٤٤٣٧. Şêr ji daristanan qut nabin.
٤٤٣٨. Şêr ji pisîkê re got: Ez li te dinêrim, tu ji neslê me ye, çima tu hûrikî. Go: Xwedê kesî neke bin destê benê Adem. (Bin destê benî Adem) ne bi şora ye .
٤٤٣٩. Şêr kal bû, gur har bû.
٤٤٤٠. Şêr kal dibin rovî bi gunkid wan dilîzin.
٤٤٤١. Şêr ko pîr dibin, dibin qeşmerê roviyan.
٤٤٤٢. Şêr şêr e, çi mê ye çi nêr e.
٤٤٤٣. Şêr şêre çi jine çi mêr e.
٤٤٤٤. Şer xweş e li nav şovê, ne li nav bênderê.
٤٤٤٥. Şerav (*araqî*) dan bizinê, çû çêy li gur gerî.
٤٤٤٦. Şerav (*araqî*) eslê^{*} mirovan derdixe.
٤٤٤٧. Şerbik^{*} nû ye, av şêrîn e.
٤٤٤٨. Şerdê mirinê rîk e.

*E şerbik : qulpîka avê . kûpkê avê

٤٤٤٩. Şerê ku hate ber dêrî, li ser sêrî.
 ٤٤٥٠. Şerê no çov gerek e .
 ٤٤٥١. Şerê sibehê ji xêra êvarê çêtir e.
 ٤٤٥٢. Şeref ji jîyanê mezintir e.
 ٤٤٥٣. Şêrekî bibirîn û kûsiyekî rast hev hatin, kûsî got:
 Birê şêr kuda?. Şêr got ê: Zarokên me bi vî piyî
 da çûne nêçîrê hema min jî kûtkût dayî dû wan,
 kûsî got: Zarokên me jî bi wî qulpî da çûne
 Xwedê bikim rastî hev neyên û ti şer û dogiş çê
 nebin, şêr got ê: Ez bi vê birînê namirim lê ezê bi
 vê gotinê te bimirim.
 ٤٤٥٤. Şêrekî birîndar bi ber kûsikî ve diçû, kûsî got ê:
 Ev rêya me teva ye, şêr go: Ez namirim bi vê
 derbê ezê bimirim bi vê kerbê.
 ٤٤٥٥. Şerî çûkan li nav garisî me ye.
 ٤٤٥٦. Şerî kûçka li ser sergoyî me ye.
 ٤٤٥٧. Şerî no rev gerek.
 ٤٤٥٨. Şerî xwe di kevra dide.
 ٤٤٥٩. Şerî wehşan di nav garisî me de dibe.
 ٤٤٦٠. Şêrîn şêrîn here malên dostan.
 ٤٤٦١. Şerm bike ji şermnekeran, bitirse ji bêtirsan.
 ٤٤٦٢. Şêro, bi lepê xwe.
 ٤٤٦٣. Şerr bi tivingê vala nabê.
 ٤٤٦٤. Şerr û nivşerr yekin.
 ٤٤٦٥. Şerrê kûçkan li ser dêlan e.
 ٤٤٦٦. Şev çiqasî tarî be, lê ronayî li paşî yê ye.
 ٤٤٦٧. Şev hemû avisin.
 ٤٤٦٨. Şev kal bû rovî har bû.
 ٤٤٦٩. Şev kal dibe, rovî no dibe.
 ٤٤٧٠. Şev kaldibê dik laldibê.

٤٤٧١. Şev reş, şûv reş, mî qemer berxa reş li ber gur li ser hev dikê der.
 ٤٤٧٢. Şev yek e, diz hezar in.
 ٤٤٧٣. Şevê reş ji êvarê de reş e.
 ٤٤٧٤. Şevîd reş, şevêd mêran e.
 ٤٤٧٥. Şewat şewatê tînê.
 ٤٤٧٦. Şêwr heye, sinet e.
 ٤٤٧٧. Şêwra jinan, bêriya bizinan.
 ٤٤٧٨. Şêwrê çûka li ser garisî me ye.
 ٤٤٧٩. Şêx ne batin e*, lê bi sêri hatine.
 ٤٤٨٠. Şêx û feqî bi miriya dipirsin, kirîv bi şahiya dipirsin.
 ٤٤٨١. Şêx zanê çî xistî hebanê.
 ٤٤٨٢. Şikefta sed bizin herê yê, sed û yek jî ê herê yê.
 ٤٤٨٣. Şilî şahî ye.
 ٤٤٨٤. Şîn jî ya meye, şahî jî ya meye.
 ٤٤٨٥. Şîn şînê tîne, şahî şahiyê tîne.
 ٤٤٨٦. Şîn û şahî bira ne.
 ٤٤٨٧. Şîna tev hevalan şahî ye.
 ٤٤٨٨. Şînê negotiye singê konê bikute.
 ٤٤٨٩. Şîr bi şekir xweş e.
 ٤٤٩٠. Şîr da û lingê xwe li biroşê xist.
 ٤٤٩١. Şîr dot seradê, bêjing da binî.
 ٤٤٩٢. Şîrê kerê anca sîpê mezin dike.
 ٤٤٩٣. Şîrê kerê ji cehşa kerê re ye.
 ٤٤٩٤. Şîre li malê te hebê, mêş ê werin ji Bexdadê.
 ٤٤٩٥. Şîreta bûk û xeswê ye.
 ٤٤٩٦. Şîrî kerê ne besê kuri yê ye.
 ٤٤٩٧. Şîrra tehl, qawînên şêrîn jê nabin.

*E batin : remildar . nawend . nihan . penhan .

٤٤٩٨. Şîrrê (tamar . lem) tal ecûrî şêrîn nakevê yê.
 ٤٤٩٩. Şîva ku ji derve de were, bila bi rê de birjê.
 ٤٥٠٠. Şîva şevê sîwarê revê.
 ٤٥٠١. Şivan dilbike, di sola xwe de şîr didoşe.
 ٤٥٠٢. Şivanî xirap zanê pez li ku dayî gur.
 ٤٥٠٣. Şîvê bikel ta êvarê, mêvano, rûne ta biharê:
*(Mêvanekî malekê hat û rûnişt û neçû. Jinikê dît
 mêvan gelekî xwîngiran e, bi rojekê-dudiwa nare.
 Jinikê şîv da ser êgir û got: Şîvê bikel ta îvarê; mêvên
 got: Mêvano, rûne ta biharê).*
 ٤٥٠٤. Şîvê me nîsk û bulxur e tev li hev e, taştî me jî
 nanî tisî carna vê ra dew e.
 ٤٥٠٥. Şivkê ter zû rast dibe.
 ٤٥٠٦. Şor bûn, şîv nebû .
 ٤٥٠٧. Şor bûn, şorbe ne bû.
 ٤٥٠٨. Şor heye mû dibirê.
 ٤٥٠٩. Şor ji derê germ tên der : *(carina, hin kes şorid
 mezin dikin û ji id dor xwe ra jî dibê : gerek e hûn
 hana bikin hana bikin. Yek ji wanid dorê dibê : erê, şor
 ji derê germ tên der ; mebest, ango bi şora her tişt qola
 ye (hêsan e).*
 ٤٥١٠. Şor ji devî mêra derdikeve : *(ango te sozek da
 gereke tu jê venegere).*
 ٤٥١١. Şor jî hene, şorik jî hene.
 ٤٥١٢. Şor jî kufta xwaştir in.
 ٤٥١٣. Şor şor, gakî emel*, yekî tor: *(mebest, gavê şor di
 civata de dibin helbet şorin ne wek hev jî derdikevin).*
 ٤٥١٤. Şor şora tînin der.
 ٤٥١٥. Şora hêvarê ne ya me ra ye.
 ٤٥١٦. Şora rast dendikek zihêr pê re ye.

*E emel : kêrhatî . nuzîn . zînkirî .

٤٠١٧. Şorbe zik dike torbe (tûr) .
 ٤٠١٨. Şorê ji xwe mestir meke.
 ٤٠١٩. Şorê mê dide ser ê nêr.
 ٤٠٢٠. Şorê mê dine kûnê şorê nêr.
 ٤٠٢١. Şorê rast sê diram zêhêr tê dane.
 ٤٠٢٢. Şorêd ber ara, dikevin qulên dîwara.
 ٤٠٢٣. Şorêd mezina li erdê namînin.
 ٤٠٢٤. Şorêd pir bayê kur.
 ٤٠٢٥. Şorêd pîs ji mirdara, sîpi ji qerpala*.
 ٤٠٢٦. Şorêd tamam* anca mera ji keran re hewaldê.
 ٤٠٢٧. Şorek rast pîşê sed şorî dibirê.
 ٤٠٢٨. Şorek xweş biharek dila ye.
 ٤٠٢٩. Şorên çiya û pesara mînin ber ara.
 ٤٠٣٠. Şorên mêra dike û li şûna jinan rûdine : *(li vir dide xuya kîrin ko jinek ji gotinê xwe vegeê, ne pir şerm e bi qas ko ji mêran re şerm e. Qey mêranî û şormertî ji mêran re ye, pirtir ko ji jinan re be).*
 ٤٠٣١. Şorên pîs ên xwedana ne.
 ٤٠٣٢. Şoreta kerê palasa wî ye.
 ٤٠٣٣. Şorid êvara, nayên sira.
 ٤٠٣٤. Sorik biskinê, gulover î rehet e.
 ٤٠٣٥. Şorkara ker firotime gura .
 ٤٠٣٦. Şorpira ker dan gura.
 ٤٠٣٧. Şuji* li malê te hebê, mêşê werinê.
 ٤٠٣٨. Şûjin bi fen tê qulkirin.
 ٤٠٣٩. Şûjina di çavê xwe de nabîne derzya di çavê xelkê de dibîne.
 ٤٠٤٠. Şûjina xwe nabînê, derziya xelkê dibînê.

*K qerpala : kincid kevn û perspankirî û gemarî .

*E tamam : tikoş . rebeq . sîp . gizûr .

*K şuji : avê mêst yan penêr.

٤٠٤١. **Şûjinê di ber serî xwe ra nabinê derziyê di ber serî xelkê ra dibînê.**
 ٤٠٤٢. Şulkerê xwe be, xoştiviyê xelkê be.
 ٤٠٤٣. **Şûna ku dêya mera bigrî, bera diya xelkê bigrî.**
 ٤٠٤٤. Şûna şêra kund dixwîne.
 ٤٠٤٥. Şûna şêra kundek kor.
 ٤٠٤٦. Şûna şêra, mane roviyê şikêra.
 ٤٠٤٧. Şûna şêra, rovî dikin gêra.
 ٤٠٤٨. Şûna şûr û tîran xweş dibe, lê ya qise yên nexweş xweş nabe.
 ٤٠٤٩. Şûnê birînê qurşînê çê dibê, şûnê şorê xerab çê nabê.
 ٤٠٥٠. Şûnê dêkê min digrî, bila dêkê xelkê bigrî.
 ٤٠٥١. Şûr dere derb* dimîne.
 ٤٠٥٢. Şûr di des te de be, bila rehma xwedê di dilê te de be.
 ٤٠٥٣. Şûr mêrekî dikuje, ziman hezaran.
 ٤٠٥٤. Şûr qinî xwe nabirê.
 ٤٠٥٥. Şûr û hesp û jinin ezbeteke dijmin in, ti cara lê ne amin in ; şûr kalandar e, hesp bê ixtibar e, jin di parsiyan de xar e.
 ٤٠٥٦. Şûr û mertalê jinan ziman e.
 ٤٠٥٧. Şûrê kê tûj be, bila li çaqa min bikeve.
 ٤٠٥٨. Şûrê kê tûj be, ew dinê dixwe.
 ٤٠٥٩. Şûrê tazî xwîn dixwazî.
 ٤٠٦٠. Şûrî kê stûr e, ardî wan î hûr e.
 ٤٠٦١. Şûrkêşo qeda li pêşo.
 ٤٠٦٢. Şûşa dil ku şikest nacebire.
 ٤٠٦٣. Şuşt bi heri yê, rêxist bi diri yê.
 ٤٠٦٤. Şuştin reng û rû ye, xwarin gend û gû ye.

*K derb : birîn .

T

٤٥٦٥. Ta bi ta dibe rih.
٤٥٦٦. Ta dik mîr e û tajî kizîrê mîr e, mîr mêvana li ber deriyê xwe nabîne: (*Roviyek di ber mala dikekê re derbaz bû, dit ko dik bi tena xwe ye; pate (selam) dayê, dik gotê: apê rovî, fermo, were malan, rovî berê xwe da malê, kûçkê malê hêriş kirê û rovî baz da, bi hekhaka ji nav lepên kûçik xwe xelas kir. Piştî çend rojan, dîsa rovî di ber dik re bihorî, dik gotê: Fermo, apê rovî, were mala, rovî gotê: Ta dik mîr e û kûçik kizîr e, mîr mêvana li ber deriyê xwe nabînê*).
٤٥٦٧. Ta em hev nas bikin, emê umir xelas bikin.
٤٥٦٨. Ta ev aş bê û ev qeraş bê, ardê me wê şewitî be.
٤٥٦٩. Ta hîn bûm, pîr bûm.
٤٥٧٠. Ta hirç rabûn semakirin heft merî bi birînkirin.
٤٥٧١. Ta ji mirinê çêtir e.
٤٥٧٢. Ta jîr bûm pîr bûm.
٤٥٧٣. Ta ko min xwe naskir, min temê xwe xelakir.
٤٥٧٤. Ta ku bûk xemilî, govend betilî*.
٤٥٧٥. Ta ku genim firîk e, xoce şirîk e*.
٤٥٧٦. Ta mirinê cehd li kirinê.
٤٥٧٧. Ta mirov dêndar nebî zengîn nabî.
٤٥٧٨. Tajî bi zorê naçe nêçîrê.
٤٥٧٩. Tajî bi zorê narê awê.
٤٥٨٠. Talana bi xelkê re dawet e.
٤٥٨١. Talana mêro yê liba cehî ye.
٤٥٨٢. Talda şêra ji sitara roviya çêtir e.
٤٥٨٣. Tamareka tehl û şêrîn di zimên de hene Te tehl kir tehl dibe, û te şêrîn kir şêrîn dibe .

*E betilî : kuta bû . ewre bû

*E şirîk: hevbeş.

٤٠٨٤. Tandir bi tir-fisa germ nabin.
 ٤٠٨٥. Tas hat û çengirî çî tije û çî vala.
 ٤٠٨٦. Tasa li derve bimîne, seg dalêse.
 ٤٠٨٧. Tasûmê ne çepê xwe hey e, ne rastayê xwe heye.
 ٤٠٨٨. Tat li kerê girêdayî dixin, dibên ev bifiltê ji wayî girêdayî xerabtir e.
 ٤٠٨٩. Tat xêli dibin, guhên wan sor dibin.
 ٤٠٩٠. Tava biharan, li serê neyaran, tava pahîzan li serê ezîzan*.
 ٤٠٩١. Tava sibehan pere neke, tava êvaran hîç pere nake.
 ٤٠٩٢. Tayê gotî: Ez bi yekî kevim, piştî salekê rastî min werê ezê nas kim, lê eger goştî kewa buxwê, piştî rojekê rastî min bê ez nas nakim.
 ٤٠٩٣. Tayîna kund e ne kê m dibe ne zêde* dibe: *(rojê sê çûkîn . ev di pengê nimre ٤٨٤٣(wek pêçemkê) de hatî şîrove kitin).*
 ٤٠٩٤. Tazî ye û ji xwe razî ye.
 ٤٠٩٥. Tê bazara xwe bikê ta xû di eniya te re çekê.
 ٤٠٩٦. Te bi destê xwe kir, tê bi stûyê xwe jî bikşînê.
 ٤٠٩٧. Te bi ereba ra got merheba wê tev sola werin ser kurk û eba.
 ٤٠٩٨. Te bi findiqiyê li deriyê xelkê xist, xelk wê bi gurmistê li deriyê te xin.
 ٤٠٩٩. Te bi tiştikî nizanî, te mala xwe xera kir û mala me li ser danî.
 ٤١٠٠. Te bi yekî ra got ezê qîzê xwe bi te dim, wê bêje pîs e.

*E zêde : bêtir . pirtir .

٤٦٠١. Te bi zorê kesek şand maziya, ê ji te ra gulêra* wînê.
 ٤٦٠٢. Tê bikirî, malî mêrasmayî* bikire.
 ٤٦٠٣. Te çêlkê xwe bi firê xistin.
 ٤٦٠٤. Te çî çand, tê wî biçinê.
 ٤٦٠٥. Te çî di tewkê da hişt: (*mebest, çî tiştê li ba te bû, te kir û te got*).
 ٤٦٠٦. Te çî kir bi deriya, wê were bi seriya.
 ٤٦٠٧. Te çî kir ji te ra ma, tê her tiştî bikê.
 ٤٦٠٨. Te çî xist biroşê, tê li gor wî şivê derînê.
 ٤٦٠٩. Te çî xist biroşê, tê wî derînî.
 ٤٦١٠. Te çî xist kewarê, ew tê xwarê.
 ٤٦١١. Te cin* kom kirin, divê tu zanibê belakê jî.
 ٤٦١٢. Tê çirkê, çir qîntê* ke: (*tê çî bikê, bi navendê re bike*).
 ٤٦١٣. Te ecele gûkir, tê du cara gûkê.
 ٤٦١٤. Te fedî ne kir, çî dikî bike.
 ٤٦١٥. Tê gênim bikirê, li êrd binêr; tê qîzê bixwazê, li dê binêr, tê avê vexwê li kaniyê binêre.
 ٤٦١٦. Tê gênim bikirê, li êrd binêr; tê qîzê bixwazê, li dê binêr.
 ٤٦١٧. Te girt bermede, te berda bi dû mekef.
 ٤٦١٨. Te got neyse pir dibirê.
 ٤٦١٩. Te got tu zanê, xircir di aşa de nabê.
 ٤٦٢٠. Te guçilî melefê dî, mebê kefene .
 ٤٦٢١. Te gura gura dûv hêşt.
 ٤٦٢٢. Te hêştirê xwe bi dûziyê xist.

*K gulêr : sê berik dikevin darê maziye, palût . mazi . gulêr sore û gilovere .

*E K mêrasmayî : şûnêmayî .

*E cin : meçêtir . id gonê . id neçê .

*K qînt : kevrike dibe navenda lîztikê .

٤٦٣٣. Te hîn kir bîr neke, te bîr kir hîn meke.
 ٤٦٣٤. Te îşek kir bira du camer bêjin pêh*, ne bêjin pû*.
 ٤٦٣٥. Te karek bi yekî ra kir, divê hûn çelka bi hev re derxin.
 ٤٦٣٦. Tê karên xwe bi xelkê bikê, du karan bike: karek jê kesaxî: Ger şiv pir qut kirin, mêw ê xurt bibe, ger şiv hindik qut kirin tirî wê pir bibê. û karek jî kehran bi xelkê bimijîne, ger şîr giş dan kehran, wê kehr xurt bibin, ger şîr giş nedan kehran, tê ji xwe ra bidoşê.
 ٤٦٣٧. Te ker ajotin tê li tîrr fisa tehmilkê.
 ٤٦٣٨. Te kûçkî xwe têr nekir, ê herê ber qapî xelkê.
 ٤٦٣٩. Te lêxist, pehnê kurtanciya lêxe.
 ٤٦٣٠. Te li ku xwar, ew der ji te ra dibe war.
 ٤٦٣١. Te miriyêd xwe birin nav miriyêd Metîna*.
 ٤٦٣٢. Te nanê kê xwar, tu wê defa wî lêxê.
 ٤٦٣٣. Te qencyek kir, bibe serî.
 ٤٦٣٤. Te qurbanek kir gereke tu jê bi heft malan dê.
 ٤٦٣٥. Te rindî kir ji te ra ye, te xirapî kir ji te ra ye.
 ٤٦٣٦. Te rindî xwast tê rindiyê bibînê tê xirapî xwast tê xirapiyê bibînê.
 ٤٦٣٧. Tê rokê rast gunik reşekî werê.
 ٤٦٣٨. Te rû da sêwiya, mewîja dixwazin.
 ٤٦٣٩. Te tim zînî li kêrgiyê kirî: (*ango tu tim bi lez e*).
 ٤٦٤٠. Te xêrek kir, bi serî bike.
 ٤٦٤١. Te xwe da nav avê, çi li kabê çi li navê.
 ٤٦٤٢. Tebax e, tirî raxe.
 ٤٦٤٣. Tehtë te lê rîne, hîn baranê neşuştine.

*K pêh : aferîn . biravo .

*K pû : tîfkirine .

*K Metîna : gundekî Efrînê ye .

٤٦٤٤. Tehtên wî lê rîne heft sala baran naşû.
 ٤٦٤٥. Temaşê ji mewîja xweştire.
 ٤٦٤٦. Temayî* malê dike, pir temayî malê bilav dike.
 ٤٦٤٧. Temenê leqleqê, çû bi teqreqê.
 ٤٦٤٨. Temîz e kakil ket kûz e.
 ٤٦٤٩. Temûz dibêje, tebax dirêj e.
 ٤٦٥٠. Tendûr bi tîrr û fîsa germ nabe.
 ٤٦٥١. Tendûr nesicire, nan napêje.
 ٤٦٥٢. Tene bû firîg, mele bû şîrîg.
 ٤٦٥٣. Tene ji kaya kevn dernakevê.
 ٤٦٥٤. Tenûr bi tîrra germ nabe.
 ٤٦٥٥. Tenya binê beroşê ye.
 ٤٦٥٦. Teq teq stûnê, yek çû yek ket şûnê.
 ٤٦٥٧. Têr (teyr) hene tê goşt pêdê têr hene tê goşt
 buxwê.
 ٤٦٥٨. Têr bi halê birçî, sax bi halê nexwaş nizane.
 ٤٦٥٩. Têr nedixwar nan û jaji radikirin tole û taji.
 ٤٦٦٠. Têr tev dujminê kêwin, kew jî dujminê mîletî
 xwe ye.
 ٤٦٦١. Ter û hişk bi hev de dişewitin.
 ٤٦٦٢. Têr, bi halê birçiya nizanin.
 ٤٦٦٣. Têrek hebû apê Os tenê zanî bigirta, gundiyan ji
 çend xortan re got: Herin ba apê Os berî bimire,
 bila we hobike girtinê vî têrî, çendek çûn ba apê
 Os û ew hokirin. piştî hobûn bê apê Os diçin
 nêçîra têr, gundiyan pîrskir, çima hûn apê Os bi
 xwe ra nabin? Gotin: Têr ji kulehî apî Os ditirse,
 gundiyan got: Ne sûcê we ye, sûcê me ye.
 ٤٦٦٤. Têrebû li destê te nîşt lê te pê nizanî.

*E temayî : pexîlî . çikosî .

٤٦٦٥. Teriya kûçkan qalib* nagire.
 ٤٦٦٦. Teriya xwe bi caniya ra diqusînê*.
 ٤٦٦٧. Terpiyê (*derpî*) min li xwe nek, têde tir û fisa nek.
 ٤٦٦٨. Têrxwarin tune. danîn edet e.
 ٤٦٦٩. Teşîris teşî-ris bê, ê teşiyê li dûvî kerê birisê.
 ٤٦٧٠. Teşîris teşîris bê, ê teşiyê li kîrî kerê birisê
 ٤٦٧١. Teşiya mûşê çiqasî birêsî ji hev dikşê.
 ٤٦٧٢. Teştê kincşuştinê qereçî ye: (*berê, kinc di teştê da dişuştin; gavê teşt dihate meydanê, te di ji vir ve wê ve kinc li dor teştê civîn, malikê bi xwe nizanî ko ewqas kincê şuştinê hene, lê teştê wek qereçiya ew cil kom kirin*).
 ٤٦٧٣. Têt (tat) têr xwar ê hiltirînê xewê.
 ٤٦٧٤. Tev bikin, tev bixwin.
 ٤٦٧٥. Tev kûnê ket cacirûnê*.
 ٤٦٧٦. Tevdan ji helîsê re başe.
 ٤٦٧٧. Tevir doxê xwe (destikîxwe) qot nake .
 ٤٦٧٨. Tevnê bike, xeca min; buha bibe, keça min.
 ٤٦٧٩. Texmîn rêbir e, aqil hakim e.
 ٤٦٨٠. Têxt ji mîx re Got: Tu çi xwe difltînê min Go:
 Çakûç zanê.
 ٤٦٨١. Textikî ser avê ye.
 ٤٦٨٢. Teyr bi baskên xwe difire.
 ٤٦٨٣. Teyr bi çengan difirin, mêr bi mêran dixwirin.
 ٤٦٨٤. Teyr bifire erş, wê her dakeve axa reş.
 ٤٦٨٥. Têyr dijminê hemo kewa ye, kew bi xwe dujminê serê xwe ye.
 ٤٦٨٦. Teyr laşe xwarbê, wê nikil xwarbê.

*E qalib : ferş .

*E diqusîne : Kurdike . dibirre .

*K cacirûn : xwarineke ji rûn û nanê hûrkişî ye .

٤٦٨٧. Teyr li berata digere.
 ٤٦٨٨. Teyr rinde bi refî xwe re.
 ٤٦٨٩. Ti çiya ko rê vê nekevin nînin.
 ٤٦٩٠. Ti dar ku das lê neketine tinene.
 ٤٦٩١. Ti dar serî xwe gêştine ezmana tineni.
 ٤٦٩٢. Ti dar tineye ko ba lê nekeve.
 ٤٦٩٣. Ti dîwar çê bi ser meda nahedimin*.
 ٤٦٩٤. Ti gul bê strî tinene.
 ٤٦٩٥. Ti kes vê qisûr tine ye.
 ٤٦٩٦. Ti kesî ji kokê darê tine ye.
 ٤٦٩٧. Ti nema ye ku pêşyan negotî.
 ٤٦٩٨. Ti serî vê derd tinene.
 ٤٦٩٩. Ticarê kovî ne karê dike ne zîrarê dike.
 ٤٧٠٠. Tifaqa* meriyan, çiyân werdigerîne.
 ٤٧٠١. Tifaqa* mûriyan çiya dixesibîne.
 ٤٧٠٢. Tifaqi* çiya werdiliqîtîne*.
 ٤٧٠٣. Tifka sayî, şerm bike ji xweyî.
 ٤٧٠٤. Tilî hene tilî ne, tilî hene zêrî ne.
 ٤٧٠٥. Tilyên destan nabin yek.
 ٤٧٠٦. Tim dêkê mera lawa nînê.
 ٤٧٠٧. Tim girî ne ji hiznê (şewatê) ye, ken ne ji kêfê ye.
 ٤٧٠٨. Tim kirasê hesûdan kin e.
 ٤٧٠٩. Tim kufte di gêlî re tolnabin .
 ٤٧١٠. Tim lêmişt na yê û qil û qirşa nîne.
 ٤٧١١. Tim lêmişt nayê û pûş nayne.
 ٤٧١٢. Tim lêmişt nayê û pûş û pelaş pîrnabê.

*E nahedimin : narimin .

*E tifaqi : lihevkin . yekdilî . palane .

*E tifaq : lihevkin . yekdilî . palan .

*E tifaq : lihevkin . yekdilî . palan .

*K werdiliqîtîne : dernexûn dike . serbinhevî dike .

٤٧١٣. Tim lêmişt nayê û pûş û pelêş naynê.
 ٤٧١٤. Timahî tim kêmahiye.
 ٤٧١٥. Timayî* birakuj e.
 ٤٧١٦. Timayî* emayî*.
 ٤٧١٧. Tînê ji deriya didê sedeqa* seriya.
 ٤٧١٨. Tînê ji deriya, didê xêra miriya.
 ٤٧١٩. Tinebê, camêrî hesan e.
 ٤٧٢٠. Tinebûn kerasekî çetin e .
 ٤٧٢١. Tinedîtîyan ti nedîtî, dema dîtî, bi xwe de rîtin.
 ٤٧٢٢. Tîntorê* xwe ne tamam e* .
 ٤٧٢٣. Tîntore, e bi ccarox tu bi gore.
 ٤٧٢٤. Tirba siwaran her kola ye.
 ٤٧٢٥. Tirbê nêzmiriya tinene.
 ٤٧٢٦. Tirbê xerîba tîm li ûc e. *
 ٤٧٢٧. Tîrê ciyê xwe dî.
 ٤٧٢٨. Tîrê davê kevên vedişêrê.
 ٤٧٢٩. Tirî bavê êlê ye, zêtûn diya feqîra* ye.
 ٤٧٣٠. Tirî li tirî dinêre reş dibe.
 ٤٧٣١. Tirk comerd yoq,* ereb pexîl yoq, Kurd zelil* yoq.
 ٤٧٣٢. Tîrr bi dîna dewat in.

*E timayî : pexîlî . çikûsî .

*E timayî : pexîlî . çikosî .

*E emayî : korbûn .

*E sedeqe : xêr .

*K tîntore : mêtî .

*E tamam : rebeq . sîp . gizûr .

*K ûc : alî . veder .

*E feqîr : xizan

*T yoq : nîne . tine

*K rezîl : riswa . bê avrû .

٤٧٣٣. Tirr li hemama derew li xerîbiyê.
 ٤٧٣٤. Tirr li ku û das li ku.
 ٤٧٣٥. Tirr têde bûne fis.
 ٤٧٣٦. Tirra meke, te kir jî mila du camêr bibên, li serî vî.
 ٤٧٣٧. Tirrê kûnê xwe meke kûnê hevala.
 ٤٧٣٨. Tirrek û du tirr li cem* tirreka wek hevin.
 ٤٧٣٩. Tirs berê mirinê nagirê.
 ٤٧٤٠. Tirs dijminê aqil e.
 ٤٧٤١. Tirs hebe erd giran dibe.
 ٤٧٤٢. Tirs mergê rovî ye.
 ٤٧٤٣. Tirs a gur ji baranê hebûya, wê ji xwe re kulavek çêkira.
 ٤٧٤٤. Tirs a mirinê. her kesî dide diya* kirinê.
 ٤٧٤٥. Tirsonek tim li paşin, tenê di revê de li pêşin.
 ٤٧٤٦. Tiştê destan kir kesan nekir.
 ٤٧٤٧. Tiştê dila, nayê mila.
 ٤٧٤٨. Tiştê kevnê wî tunebe, teze yê wî jî tune ye.
 ٤٧٤٩. Tiştê ko te dît, ji bîr meke.
 ٤٧٥٠. Tiştê ne çê, para keçê .
 ٤٧٥١. Tiştêkî te wînda bû heft caran malê xwe seke paşê cînara pirske..
 ٤٧٥٢. Tiştî bi qelem bê nivîsandin, bi bivir nayê şikandin.
 ٤٧٥٣. Tiştî çû mekefe dû.
 ٤٧٥٤. Tiştî giranbiha î erzan e.
 ٤٧٥٥. Tiştî ji malê te ra gerek nabê xêr û sedeqe*.

*K cem : ba . rex . cem .

*E diya : dîleg . diroz

*E sedeqe : xêr .

٤٧٥٦. Tiştî tu dixwazê bi des te neket, tiştî bi des te ket bernede.
٤٧٥٧. Tixobê xortan tune ye.
٤٧٥٨. Tizbî bê serkêş nabe.
٤٧٥٩. Tolka bi mast e : *(berê, xizani û feqîrtî bû , xwarina tolkê û mêst ji wan xwarinên baş bû ; gavê kesek diket nav xêrbêrekê, digotin:Tolka bi mast e).*
٤٧٦٠. Tor tor digerê, karikî xwe nakê.
٤٧٦١. Toraqa îro ji rûnê sibê çêtir e.
٤٧٦٢. Tosino, xwe bi xwe dipesino.
٤٧٦٣. Tovê ku dijmin bireşînin, dê stiriyan şîn bike.
٤٧٦٤. Tovê xwê ye, pisê hêstirê ye.
٤٧٦٥. Tu bê ez, ez bê ez, gurê têkevê nav pez.
٤٧٦٦. Tu bi çi bifkirê, ewê werê serî te.
٤٧٦٧. Tu bi hirî ba, tê li nav kerî ba.
٤٧٦٨. Tu bi pêçiyê kulda namîzê: *(Berê li çol-mola derek kesî bi birîn biba, hema bi lez bi wê birînê da mîz dikirin, qey ji ber ku xayê di mîzê da heye, xuya ye mêrik ewqas çurûk û pexîl e, mîza xwe dirjînê û bi birînê da namîzê).*
٤٧٦٩. Tu bi rêkekê de çû bila çik ji ber lingid te bifirin.
٤٧٧٠. Tu bi tivingê ne mir, tê bi vî hîmî jî nemirî.
٤٧٧١. Tu bi yekî ra bi rêyekê de çû, bi xwe di rê ra meşî û tu jî da aliyê rê, carek din vê re med-mestîn.
٤٧٧٢. Tu bi yekî re bû heval gereke hûn çelka bi hev re derxin.
٤٧٧٣. Tu bidî zîtika nedî zîtika, tuyê bidî heqê dîzika.
٤٧٧٤. Tu bixazê kerek te hebê bixwaz du ker cîrana hebin.

٤٧٠. Tu bixwazî mêrekî riswa bikî, jinekê berde ber rûya; û tu bixwazî jinekê riswa bikî, zarokekî berde ber rûya.
٤٧١. Tu bû hêva îdê: *(xelk dixwaze meha rojîyê zû derbas be, loma tim bi heyva dawîya mehê diramin (dîfîrin) ; lewre, meha rojîyê bi xelkê ve dirêj dibe û heyv bi dûr dikeve, mebest ew e wextê dostek dereng tê ba dostî xwe, dibêjê :tu bû hêva îdê).*
٤٧٢. Tu bû heval yekî û hûn ji hevdu xeyidîn mila sûcê wî bê.
٤٧٣. Tu bû hevalê kesî, bila ji te çêtir bê.
٤٧٤. Tu bû mîr, xwedê meke bîr.
٤٧٥. Tu bû roviyê me ji mirîşkên xura tîmarkirî.
٤٧٦. Tu cehnimê (dojah) nebînê cinet (bihuşt) bi te xwaş nabê.
٤٧٧. Tu çi biçînî, tê wî hilînî.
٤٧٨. Tu çi bikî ji xwe re dikî.
٤٧٩. Tu çi bixî kewarê, wê ew were xwarê.
٤٨٠. Tu çi di biroşêxê, tê wî jê derxê.
٤٨١. Tu çi di kewarêxê tê wî derxê.
٤٨٢. Tu çi ji bîrbikê, şîrê diya xwe ji bîrmeke.
٤٨٣. Tu çi têxî biroşê, tê wê bixwî.
٤٨٤. Tu çi têxî teyfikê* wê ew bê kevçiyê te.
٤٨٥. Tu çiqas bilind bifirî, tê weqas nizim bikevî.
٤٨٦. Tu çû bajara, perê te hebin, tu çû gunda, dostê te hebin.
٤٨٧. Tu çû ku tê şûrî wir biikşînê.
٤٨٨. Tu çû malên dosta, bi ber taqan mekeve ; dostid te hebin, bi ber berîkan mekeve.

*K teyfik : biroş .

٤٧٩٤. Tu çûyî bajarê yekçava, divê tu jî çavek xwe bigrî.
٤٧٩٥. Tu derê derê li paşî gamê* dinê. (gam cercerek kevne. Textekî dirêj î pehnû alîkî têxt çî hesin hebana û kevrên çeqmaqî diçikandinê ji bo sap pê hûr bibe. Ali yê qulp pê ve bi nîrê ser sto yê du dewara yan du gayan ve girêdidan. Bi vî awayî pêşiya gamê li jor dima . dawiya gamê li ser sêp (sap) dima. Bi vî awî ew tiştê çikandine bin gamê nedigihîşt ser sêp. Hîngê gerekbû ko kesek li pêşiya gamê swarbê ji bo gam dakevê ser sêp. Nexwe swarbûnê paşiyê gamê bê sodebû îcar gavê kesek karekî bê sode yan gotinin vala bikê dibêjin : tu derê li paşiyê gamê swar dibe.
٤٧٩٦. Tu derê ji xelkê ra goşt dibrêjê û tu tê ji min re wê çêrokê dibêjê.
٤٧٩٧. Tu dibê qey erd veqelişî û daqirtand.
٤٧٩٨. Tu dibê qey heft kirine qulekê.
٤٧٩٩. Tu dibê qey ji gundê bêlê hatiye meşkekê.
٤٨٠٠. Tu dibê qey min nan xwariye, û wî perçe xwariye.
٤٨٠١. Tu dibê qey şîrî kera mêtî
٤٨٠٢. Tu dibê qey xwîn ji bin kerkê berdane (sist û gêj e).
٤٨٠٣. Tu dibê hevalê merivekî, bila ew merî di ser te re be.
٤٨٠٤. Tu dibê nankir, genim bikire, perçe dikirî, çox bistîne.

*K gam : cercerek kevne .

٤٨٠٥. Tu dikê dîna bi dengkirin bidê, dîndoq bi des de.
 ٤٨٠٦. Tu dikê golkî xwedê biçêrînê.
 ٤٨٠٧. Tu dikê keça xwe nedê yekî, qelen biha bike.
 ٤٨٠٨. Tu dikê tirî bixwî, yan bêgci* kotek kî.
 ٤٨٠٩. Tu dixwazî li serî min ho bibî berberiyê.
 ٤٨١٠. Tu diya* li min bike, ko xwedê bi min de da ez bidim te.
 ٤٨١١. Tu dizbe şevê reş pirin.
 ٤٨١٢. Tu dojhê nebînî, behîşt bi te xweş nabe.
 ٤٨١٣. Tu ê ko mera te ji nexwaşa ra bişînê zebeşa ye.
 ٤٨١٤. Tu fedî nekî, çi hebe tê bikî.
 ٤٨١٥. Tu girêka xwe bi destê xwe venekî, kes ji te re venakî.
 ٤٨١٦. Tu gul bî gula cûrî, bibişkuvê lîlka jorî ta vebê temenê min bihûrî.
 ٤٨١٧. Tu gul bî, ez te di ber yaqê re nakim.
 ٤٨١٨. Tu heft mehe havîn dikê qereqîş.*
 ٤٨١٩. Tu her çi bêjî, li bejna heyran tê.
 ٤٨٢٠. Tu herî ber dengizê, wê hişk bibê.
 ٤٨٢١. Tu hijda bazdî tê zû biweste.
 ٤٨٢٢. Tu hildî çîza, hilnedî çîza, tê bidî heqê* gwîza.
 ٤٨٢٣. Tu ji çi bitirsê, ewê werê der rê yê te.
 ٤٨٢٤. Tu ji çi bitirsî, wê werê serî te.
 ٤٨٢٥. Tu ji êş werê serî te jî bi ard bê, kes ji te bawer nakê.
 ٤٨٢٦. Tu ji hêştir guhekî didê mera.
 ٤٨٢٧. Tu ji kê hez dikî, tê loma lê bikî.

*T bêgci = begci : pandî .

*E diya : dîleg , diroz .

*T qereqîş : deh rojên dawîya payîzê .

*E heqê gwîza : bihayê gwîza .

٤٧٧٨. Tu ji meriyê pir sofî (olperest) bitirse.
 ٤٧٧٩. Tu jî weqî^{*}ya xwe dîne ser wê litirê (her litirek
)^{*} weqî ne: *(carina, kesin gefgurra li hev didin, yekî
 din jî piştgîriya xwe ji yekî jî wan re nîşan dide, ê dî
 dibêje wî : tu jî weqîya xwe dîne ser wê litirê. Mebest
 ew e ko ew bi xwe tev da litireke û tu jî weqiyek e, hûn
 herdu bi hevra li ber min nabin tiştêk).*
 ٤٧٨٠. Tu kê cêw bikirî, tê li kenarê binêrê.
 ٤٧٨١. Tu kê derewekê bikê, tê şehdê^{*} xwe hazirkê
 ٤٧٨٢. Tu kê tiştêkî buxê, û bi des te de bipekê çavê
 hina têda ye.
 ٤٧٨٣. Tu kerî nêr di hêlika ra nas dikî.
 ٤٧٨٤. Tu kesî ji koka darê tune ye.
 ٤٧٨٥. Tu kevîr bavêjê çiravê, wê peşk bêne te.
 ٤٧٨٦. Tu kûçik bî jî, bi qewmê xwe re be.
 ٤٧٨٧. Tu li derî nedê, derî li te venabê
 ٤٧٨٨. Tu li tirî digêrî, yan li kuştina nehtor^{*}.
 ٤٧٨٩. Tu mê bî jî tu kê bizê, tu nêr bî jî tu kê bizê.
 ٤٧٩٠. Tu mêrxas bî, babax nebe.
 ٤٧٩١. Tu nanê kê bixwî tê şûrê wî hilînî.
 ٤٧٩٢. Tu nanê kê bixwî, tê şûrê wî bikşînî.
 ٤٧٩٣. Tu ne bi tizbî û ukaz^{*}î ko xelk bi te bipirsî, û tu
 ne bi şûr û gurzî ko xelk ji te bitirsî û ne jî dimrî
 ko xelk ji te vehesî.
 ٤٧٩٤. Tu ne miste, û ne jî gurmiste.
 ٤٧٩٥. Tu newêrî bêjiyê, dûyî êgir tê te.
 ٤٧٩٦. Tu pêri (parî) necûne narê xwar.

^{*}K weqî : sed girami .

^{*}E şehde : gewah. gova. dîdevan .

^{*}E nehtor : pandî .

^{*}E ukaz : gopalê pîran .

٤٨٤٧. Tu rovî yî ez serê dûv im.
 ٤٨٤٨. Tu sêfil ket, cêhê biçîne û mirîşka xwedîke.
 ٤٨٤٩. Tu şêx bî, rojid îne pîr in.
 ٤٨٥٠. Tu sibê radibî, bêje, xwedê, pêşiyê bide cîranê min.
 ٤٨٥١. Tu şîrî şêr di eyarî çêlkê şêr da bixwazê ezê ji tera wînim.
 ٤٨٥٢. Tu teneke di nav ava zêr de jî bikî dîsa tneke ye.
 ٤٨٥٣. Tu textikî ser avê ye, kes nizanê rêyê te di kura ye.
 ٤٨٥٤. Tu tim li kerî ketî digêrê.
 ٤٨٥٥. Tu were dewê min bikêle, ez jî herim dewê lawê mîr bikêlim.
 ٤٨٥٦. Tu werê kuştin û tu netê şuştin.
 ٤٨٥٧. Tu xwe bi kuda biftilîne, Kûnê te li paş te dimîne.
 ٤٨٥٨. Tu zanê xaço mirî, lê tu nizanê sêrojka wî li ku didin.
 ٤٨٥٩. Tûrê parsekan ti carî tiji nabe.
 ٤٨٦٠. Tûrî virekan tim bi qul e.
 ٤٨٦١. Tûrkî derewîna tim qule.
 ٤٨٦٢. Tûrkî xwe li ba kê bû ye dawmeşîn.
U Û

٤٨٦٣. Ûcaqî kor ne di tinebûnê ewlada tenê da kor e, di hebûnê ewladî tenbel da jî kor e.
 ٤٨٦٤. Umrî kûçkî har çêl ro ye.
 ٤٨٦٥. Ûr pizûr para xezûr
 ٤٨٦٦. Ûrê bengîna tere jî nanê zengîna.
V

٤٨٦٧. Va şar û va minşar*.

*E minşar : birrek .

- ΣΛ٦٨. Vê xemê bihêle wê demê.
 ΣΛ٦٩. Vê zivistanê gur ji qulê xwe dernakevê.
 ΣΛ٧٠. Vexwe dew, têkev xew.
 ΣΛ٧١. Vî duxum têr nabim, wî duxum qût nakim.
 ΣΛ٧٢. Vir di dûyî miriyan ra dibin.
 ΣΛ٧٣. Vir mirdar in.
 ΣΛ٧٤. Virrek carekê taştîyê dixun.
 ΣΛ٧٥. Vitek bi ciwanî, vitek bi pîrî.
 ΣΛ٧٦. Viyana dilan bi dayîna destan diyar e.

W

- ΣΛ٧٧. War ew war e, lê bihar ne ew bihar e.
 ΣΛ٧٨. War, warê hêşîn, bext, bextê pêşîn.
 ΣΛ٧٩. Warê xelkê ji mirov re nabe war.
 ΣΛ٨٠. Warê xwe genî meke, navê xwe ji bîrmeke.
 ΣΛ٨١. Wêde têm heytehol e, şara piştê dor bi gol e, dê xatûn e qîz tol e.
 ΣΛ٨٢. Wek ba tê bêderê li bake.
 ΣΛ٨٣. Wek mirîşkê hêk vê re li ciyekî nasekinê.
 ΣΛ٨٤. Wek nanê ser sêlê ye.
 ΣΛ٨٥. Wek pêçemkê xwe pêşde meruquçîne: (*Dibên Siltan Silêman bi dîlî ajala û tilûra jî zanî; jinê nivînî ji perê têr-tilûra jê xwastî, siltan radibê, dişînê dû têr-tivîra, û têr û çûk û çivîk kom dibin., Siltan mebesta vê komkirinê ji wan re dibêjê: Hema pêçemok xwe diruquçînê û dibêje: Çêlikê min li mal bi tenê ne û derê; Siltan dinêre ko kund nehatî, şandîkî duduya li pê dişînê, kund nayê; radibê kûçik rê dikê pê, kund bi kûçik ra tê; Siltan jê pirs dikê, dibêjê: Xêr e, tu bi hevalên xwe têran ra nehat û tu bi kûçik ra hat, kund gotê: Kûçik dilsoztir e, Siltên gotê: Serî te xêri mezin e, kund gotê: Tev aqil e. Siltên gotê: Çavêd te xêre zer in, kund gotê: tev hindêv in. Siltên*)

gotê: Ez ê pîrsekê ji te bikim, eger tu nizani be, ezê te tewanbar bikim, kund gotê: Fermo, Siltanê mezin, Siltên gotê: Rojê, çend kes dimirin û çend zarok dibin, kund gotê: Rojê, hezar kes dimire û hezar û yek zarok dibin, siltên got: Çima zarokek fazle ye, kund gotê: Ew ji yekî wek te ye, ku gul jinê xwe dikê û wê per û pinciqê evqas têr û tivîr û çûk û çivîk biruquçînê. Siltên dît ku kund pirî baqil û hişmend e, gote kund: tu çiqas temen dixwazî, kund got: Salek ji ber ku herçar demê dunyayê: havîn, payîz, zivistan, bihar, di salekê da ne; Siltên gotê: Mila tayîn û xwarinê te çi bê, kund got: Rojê, sê çûk; siltên evqas têr û tivîr baxişandin xatirê kund û herkes firî çû mala xwe, û pêçemok ket xema perên xwe, û kund ma li ser temen û tayîna xwe).

- ΣΛΛ٦. Wek sêwyê eba bavê xwe li xwekirî.
- ΣΛΛ٧. Wekî du dil bibin tevayî, wê vî çiyayî hildin bibin ser wî çiyayî.
- ΣΛΛ٨. Wekî ku ez ciwan bûm, bi tîr û kevan bûm, gava ku ez pîr bûm notirvanê şikeva hevîr bûm.
- ΣΛΛ٩. Welat ji dê şêrîntir e.
- ΣΛ٩٠. Welat xweşe, bi welatiyan.
- ΣΛ٩١. Werin dê û bava, berî li zaroya ye, zaro berî li çiya ye.
- ΣΛ٩٢. Werîsê derewan kine.
- ΣΛ٩٣. Wetaq bi obê ma, kevçê bi kodê ma.
- ΣΛ٩٤. Wexta giya bû, kes ne xiya bû, bû firîk, hemo û heso bûn şirîk.
- ΣΛ٩٥. Wexta heye mêvanî, wexta tine golikvanî.
- ΣΛ٩٦. Wexta kar rû dizivirîn e, wexta şivê kevçî tîne.
- ΣΛ٩٧. Wexta nêçîra min tê, gûyê tajiye min tê.

٤١٩٨. Wextê bîrecik derbaz bû, qufirê di kokê kîrî xwe bide: *(Di nav qalixî kokê mêmê tiri da, kurmikekî pir biçûk heye, dibêjinê: bîrecik. Ew kurmika di destpêkê germê biharê da derdikeve ser şivê mêmê û di hindur gupkê da çiçekê tirî dixwê; îcar, berî ku ew kurmik derkevê ser şivê, kokê şiva qufir dikin; her weko qufir jî zemirokî ye. bîrecik hew kanê derkevê ser şivê. û gi tu dereng ma û bîrecik derket ser şivê, qufirkirin pera nake, loma dibên: Wextê bîrecik derbas bû, qufirê di kokê kîrî xwe bide; îca, gotine kîr ji berko kîr jî wek şivê mêmê ye).*

٤١٩٩. Wî tûrê xweş e li serê wî kerî.

X

٤٢٠٠. Xal xelk e, ap milk e.

٤٢٠١. Xalan xwarzî rakirin, apan birazî winda kirin.

٤٢٠٢. Xaltiya Donê. ji ser ve pakê ji bin ve çonê.

٤٢٠٣. Xan nabe bê mêvan.

٤٢٠٤. xana bê mêvan ehremen lê civan.

٤٢٠٥. Xaniyê xwe xirab neke heta tu yekî din çenekî.

٤٢٠٦. Xar rûne doxri denke.

٤٢٠٧. Xarzî li xalan tên .

٤٢٠٨. Xasî dibêje qîza min ez ji te re dibêjê Bûkê, tu bibhîse.

٤٢٠٩. Xasoyê got: Bûka xwe va rojî hat tu rojîyê nagirî, bûkê gotê: Binî min ne şil e: *(ango min pîsîtî nekîriye).*

٤٢١٠. Xatûn, me tu li ser (jor) dîtî, û li bin (jêr) jî dîtî.

٤٢١١. Xebat ker e, bajo wê here.

٤٢١٢. Xebat şêr e, dest bavêjî dibe rovî.

٤٢١٣. Xeber çeka jina ye.

٤٢١٤. Xeber ji nepaza, sipî ji palaza.

٤٢١٥. Xeber ker e, bajo here.

٤٩١٦. Xeber ket nav sî û sê (**du**) diranan, wê bikeve nava sî û sê bajaran.
 ٤٩١٧. Xeber ne karê mêra ne.
 ٤٩١٨. Xebera xweş bide dujminê xwe, pariyê xweş bide hevalê xwe.
 ٤٩١٩. Xebera xweş bihara dilan e.
 ٤٩٢٠. Xebera xweş mar ji qulê dertînê.
 ٤٩٢١. Xeberê mirinê, zû beladibê lidinê.
 ٤٩٢٢. Xeberikê bi Xwedê re bixelitê, sed salî jê ra bixebitê, roja qiyametê* bûstek ci nabînê ko tê da bitebitê.
 ٤٩٢٣. Xelk derê kêfa xwe dikê tu derê avê li xwedikê.
 ٤٩٢٤. Xelk derê kêfa xwe dikê tu tê mal avê li xwedikê.
 ٤٩٢٥. Xelk dihere tiştan tîne, Kor-elî dihere mişkan tîne.
 ٤٩٢٦. Xelk hejîra dixwen, em kerka dicûn in.
 ٤٩٢٧. Xelk li baniya wek hev in.
 ٤٩٢٨. Xelk li dûberana rast tîn, em li fisgura rast tîn.
 ٤٩٢٩. Xelk mal û dewletê çêdike, ez û andro kolozê xwe tûj dikin.
 ٤٩٣٠. Xelk mera bi serê xwe nahêle.
 ٤٩٣١. Xelk qulpa bi hêka dixin.
 ٤٩٣٢. Xelkî bi merî ye, mişkî bi serî ye.
 ٤٩٣٣. Xema gure ? deve biha ye.
 ٤٩٣٤. Xema me ye dema me ye.
 ٤٩٣٥. Xema mexe xem xirap in, gula biçin sûsin ê rabin.
 ٤٩٣٦. Xemgîn e, xew nîne.
 ٤٩٣٧. Xemla malan stêr û qulîn in.

*E qiyamet : peslan . qars .

٤٩٣٨. Xemla mala kejî û gulîn e.
 ٤٩٣٩. Xemla mixtiya^{*}, betîx û zebeş in.
 ٤٩٤٠. Xêr bêr li te barîn kevir kuçik li min barîn.
 ٤٩٤١. Xêr carina li mera dibin xeyar,[°] û derin mera.
 ٤٩٤٢. Xêr û gunehên te li stoyê te ye.
 ٤٩٤٣. Xêr û neheq xwe li ber baranê şil meke.
 ٤٩٤٤. Xêra bike û bi avê de berde.
 ٤٩٤٥. Xêra kîrê me, bû mîrê me.
 ٤٩٤٦. Xera nebê çênabê.
 ٤٩٤٧. Xerapa çav li hevin.
 ٤٩٤٨. Xêret ji baweriyê ye.
 ٤٩٤٩. Xeta xwar ji gayê pîr e.
 ٤٩٥٠. Xetê xwar di gayî pîr da ye.
 ٤٩٥١. Xew nema li biçûkan, fedî nema li bûkan.
 ٤٩٥٢. Xew û kew herdu bi hevra nabin.
 ٤٩٥٣. Xew û mirin yek in.
 ٤٩٥٤. Xewa bav kuştiyan tê, xewa zikbirçiya nê.
 ٤٩٥٥. Xewa kuştiya tê, xewa birçiya nayê.
 ٤٩٥٦. Xewa sibê zirar e.
 ٤٩٥٧. Xewa sibehê xewa kûçika ye .
 ٤٩٥٨. Xewna ga li ser kêrê ye.
 ٤٩٥٩. Xeysetê ga xwedî dizane.
 ٤٩٦٠. Xezal çiqas bezaye, ji bilî rizqê xwe naxwe.
 ٤٩٦١. Xezal çiqasî a beza ye, bêtirî rizqî xwe ranake.
 ٤٩٦٢. Xidiro hero diro li viro.
 ٤٩٦٣. Xirapiyê her kes dikarê bike, qencî dijwar e.
 ٤٩٦٤. Xîret zêr e, ji bilî namûsa vêre.
 ٤٩٦٥. Xizanî kirasekî ji êgir e.
 ٤٩٦٦. Xizanî ne gunehkarî ye.

*K mixtî : werzê cebeş û qawîna ye

°E[°] xeyar : aro .

٤٩٦٧. Xizanî zenga mêran e.
٤٩٦٨. Xizanî, qedrê peran tînî.
٤٩٦٩. Xocak û hevalên xwe bi rê de diçûn gihîştin ber çem, xoce xwe avêt ê û bi lê da çû hevalê wî tim di ber çem ra bezî û got: Xoce ka destî xwe û xoce destê xwe nedida yê hevalê din dît ko xoce bi lêda derê û destî xwe nadê yê, hema bezî pêşiya xoce û got ê: xoce ha ji te ra destê min hema xoce bi lez bi desta girt û ji avê derket, gotin ê: Xoce te xêri berî me xwe avêt çem û tu bi avjeniyê nizanê, xoce go: Belkî masî tê de hebin ezê berî we bigrim.
٤٩٧٠. Xoce dibêjin, me çî kir, mekin lê me çî got, bigrin.
٤٩٧١. Xoce ê birinê ne, ne yê danê ne.
٤٩٧٢. Xoce go: Ezê herim bajêr gundiya her yekî tiştê jê xwast, yekî pere danê go: Tê pîkekê ji min re bînê, xoce got ê: Tê pif pîkekê.
٤٩٧٣. Xoce hertim digot: Ger du tiştê we hebin, yekî sedeqe* bidin, herweko wî dizanî sedeqe ji wî re tîn, rojekê hat mal dît ku jina wî nivê malê dayî xelkê, xoce got: Jinê, ka alavên malê, jinê got: Min sedeqe dan, ma ne tu dibêjê, xoce bi hêrs gote: Jina xwe, hey keçê nezanê, ez vêya dibêjim: Ji bo xelk bide me, ne em bidin xelkê.
٤٩٧٤. Xoce jî ji Quranê şaş dibê.
٤٩٧٥. Xort xortaniya xwe dike, qels doza çî dike.
٤٩٧٦. Xu (xwêdan) di bin cên de yî, Xû di bin eyêr de yî.
٤٩٧٧. Xû di bin çêrm da ye.

*E sedeqe : xêr .

٤٩٧٨. Xû ya şîrî çû pîrî.
 ٤٩٧٩. Xudanê lezê her poşman e.
 ٤٩٨٠. Xudê nanî şil nexê zikî her kesekî.
 ٤٩٨١. Xudê yê gotî dê te keme mîr belê min neke ji bîr,
 eger bike ji bîr dê te keme êxsîr.
 ٤٩٨٢. Xudiyê fisê bi xwe dihesê.
 ٤٩٨٣. Xulî li serî î mirî ye.
 ٤٩٨٤. Xulî li wî serî, ku sed serî jê nehesidin*.
 ٤٩٨٥. Xuliya min li seriyê wî omeriyê bê rez û
 berîvaniyê bê pez û yê ku xelk nabêjê yê tu û ew
 dibê ez.
 ٤٩٨٦. Xult axê dikolê bi nav çavid xwe dikê.
 ٤٩٨٧. Xult ji li bîrî çava ye: *(Xult dibê ezê heft komik ax li
 dûrêzî hev hildim ji bo çavid min vebin).*
 ٤٩٨٨. Xumxuma piyê hespê nêr, ji bin milê ga yê cot tê.
 ٤٩٨٩. Xûn bi xûnê nayê şuştin.
 ٤٩٩٠. Xûn xûnê meriya ye laşe laşê kûçka ye.
 ٤٩٩١. Xûnê min ji xûnê te ne sortir e.
 ٤٩٩٢. Xûnê te ji xûnê min ne sotir e.
 ٤٩٩٣. Xursîne ne dixwin ne didin kesîne xwediyê
 xiyarê çelmsîne.
 ٤٩٩٤. Xur-xurê ewran nîşana baranê ye.
 ٤٩٩٥. Xuya malê jê nayê xwestin.
 ٤٩٩٦. Xwandin çala bi derziyê ye.
 ٤٩٩٧. Xwar rûne lê rast biaxef.
 ٤٩٩٨. Xwarbûn xerabûn e.
 ٤٩٩٩. Xwarina bi heval xweş tê xwarin.
 ٥٠٠٠. Xwarina xwe bi gura ra ye, meşa xwe bi şivana
 ra ye.

*E nehesidin : nedexisin .

٥٠٠١. Xwastina keçan jî ne şerm e, nedan jî ne şerm e.
 ٥٠٠٢. Xwastinê qîza jî ne eybe û nedan jî ne eybe.
 ٥٠٠٣. Xwe hêvşand (xwe ragirt), xwe hêvşand, hêvarî
 Henê xwe kişand.
 ٥٠٠٤. Xwe ji strî xeyara diparêzê.
 ٥٠٠٥. Xwe kirî gêrmiya nexwaşa.
 ٥٠٠٦. Xwe kiriye şorba nexwaşaa.
 ٥٠٠٧. Xwe li ber êgir germ dikin û xaliya xwe jî davêne
 ser rêyê me.
 ٥٠٠٨. Xwe li heft avaxê qolanê piştê şil nabê.
 ٥٠٠٩. Xwe li tîrî kêr dîmene.
 ٥٠١٠. Xwe meke benîşt, û mekefe devî xelkê.
 ٥٠١١. Xwe meke taldê dîwarê derizî .
 ٥٠١٢. Xwe ne ji dêrê dikê ne ji mizgeftê.
 ٥٠١٣. Xwe nede ser berê bê bin, û xwe nede pêşiya
 mêrê dem demî.
 ٥٠١٤. Xwed yê sebrê bû melêkê* Misrê.
 ٥٠١٥. xwed yê sebrê* bû mîrê Misirê.
 ٥٠١٦. Xwedan esla safîn e,* nabê jê berî wergerî, helbet
 dewlet ê bête serî.
 ٥٠١٧. Xwedan esla* bibin gorî, bê esla jê wergerînin
 berî.
 ٥٠١٨. Xwedanê çêlekê ji xwedanê kerê şîr dixwazê.
 ٥٠١٩. Xwedanî namûsê kerr e û kor e.
 ٥٠٢٠. Xwedê baxazê* qul dayî, rizq* jî vê ra dayî.

*E melêk : padişe . paşe .

*E sebrê . sebir : aram .

*E safî : zelal .

*E esl : kok û binyat .

*K baxaz : gewrî . qirk . qirtik .

*E rizq : rojîn . rozîn .

٥٠٢١. Xwedê bi tedê nabê tu lawê kê ye.
 ٥٠٢٢. Xwedê bidê jî qûlî ne rind nahêle.
 ٥٠٢٣. Xwedê carina dikê mû, lê naqetînê zû.
 ٥٠٢٤. Xwedê carina li xet û nivê dide meriyan.
 ٥٠٢٥. Xwedê derd dane derman jî dane.
 ٥٠٢٦. Xwedê fersendê enbarê cihê nekê keran.
 ٥٠٢٧. Xwedê fersendê kuspê nekê tata.
 ٥٠٢٨. Xwedê fersendê mêrê çê nede dest mêrê xerab.
 ٥٠٢٩. Xwedê fersendê şêran neke roviyan.
 ٥٠٣٠. Xwedê gotî ,ez jî qûlê xwe razî me jî ber her kes
 bi xwe razîye.
 ٥٠٣١. Xwedê gotî, rabe ez bi te ra.
 ٥٠٣٢. Xwedê gotî, ya ez ba me, ya jî ez di bê de me.
 ٥٠٣٣. Xwedê gotiye, jî te hereket* .ji min bereket.
 ٥٠٣٤. Xwedê jî meriv bistîne, diranê meriv di pişrûkê*
 de dişkê.
 ٥٠٣٥. Xwedê kesî hoyî pariyid şil nekê.
 ٥٠٣٦. Xwedê kesî nexer ber şîretan.
 ٥٠٣٧. Xwedê kevrekî li mera dixê, û yekî di ser mera ra
 digre.
 ٥٠٣٨. Xwedê kevrekî li mera dixîne û heftan jî di ser
 mera re digre.
 ٥٠٣٩. Xwedê korê xwe nas dike.
 ٥٠٤٠. Xwedê kûsî dibînê û di wî qaliqîda datînê.
 ٥٠٤١. Xwedê li çê dinêre, û berfê lê dibarînê.
 ٥٠٤٢. Xwedê li wê dinê wê heqê bizna kol jî ya bi qoç
 bistîne.
 ٥٠٤٣. Xwedê noka dide kalên vê diran.
 ٥٠٤٤. Xwedê padişakî mezin e.

*E hereket : liv . kar . kirin .

*K pişrûk : navê xwarinekê ye

٥٠٤٥. Xwedê qapîkî* digrê, deh qapiya vedikê.
 ٥٠٤٦. Xwedê qûlî xwe naskiriye, kum li sêrê rast kiri ye
 ٥٠٤٧. Xwedê rû dibîne û sîlê lê dixîne.
 ٥٠٤٨. Xwedê şaşkê dide wî, nizane girêde.
 ٥٠٤٩. Xwedê serî dibîne, kum lê datîne.
 ٥٠٥٠. Xwedê songê* mera xêr wînê.
 ٥٠٥١. Xwedê umrî li daha dayî li naha nabê.
 ٥٠٥٢. Xwedê xerîba nexer nav xwemalan.
 ٥٠٥٣. Xwedê Xwedê ye, ne mêrê Medê ye, bavê mera
 dikuje, dêya mera jî dide xelkê.
 ٥٠٥٤. Xwedê yekê bi serî mera dike û hefta jî di ser
 mera re digre .
 ٥٠٥٥. Xwedî mal bi malekê ye, bêmal bi hezar mali ye.
 ٥٠٥٦. Xwedi yê heq siltan e
 ٥٠٥٧. Xwedi yê mal heye, malê bê xwedî tune ye.
 ٥٠٥٨. Xwedi yê malê, maleke wî,yê bê mal hezar malên
 wî hene.
 ٥٠٥٩. Xwedi yê pendê dikeve kendê.
 ٥٠٦٠. Xwedi yê xêra rebenê dêra.
 ٥٠٦١. Xwedî yên miri yan korin.
 ٥٠٦٢. Xwediyê xêran dibe rebenê li ber dêran.
 ٥٠٦٣. Xwelî li wî be, ew ê mirovên xwe bide bi xelkê.
 ٥٠٦٤. Xwelî li wî serî ewê ga da bi kerî.
 ٥٠٦٥. Xwelî li wî serî ku hefit serî jê ne êşin.
 ٥٠٦٦. Xweliya mêr û jinê jî hev e.
 ٥٠٦٧. Xweş xeber e,* lê min ne bawer e.
 ٥٠٦٨. Xweşî bê tehlî nîne, Qonax bê hostan ava nabî.
 ٥٠٦٩. Xwîn nabe av.

*T qapî : derî .

*T song : dawî . encam .

*E xeber : salox .

٥٠٧٠. Xwîn winda nabe: (*Rojekê, yekî cîranê xwe bir çêyê ku wî bikujê; mêrik li ber gerî, li ser gerî, pere an fêde nekir, gotê: Birako, min nekuje, xwîn hinda nabe, ê dî gotê: Kesî em nedîtine û kesî jî nedî em hatine vir, keremperek (istirî kerengê yî hişk bûye û ji kokê xwe jê bûye) bi ber bê ket bû, mêrik gotê: Te ew keremper diye?. Wê ew hewalde, ewî guh neda gotina mêrik û mêrik kuşt û hat mala xwe. Xelkê bihîst ku filan kes li çêyê hatiye kuştin; çûn laşê xwe anîn û ew bingor kirin û pirs kirin û çiqas hılanîn, danîn, nikanîn bi cih bikirana û wena ma. Rojekê, ê ku mêrik kuştî û jina xwe rûniştine dîtine hema istirîkê kerengê (keremperek) bi ber bê ketî û di ser hev wer dibê; istiriyê kevn hat bîrê û kenî, jinê gotê: Tu bi çi kenî, ewî nexast bêjê: Jinik jê negrî û xwe xêli kir û bêhteng kir û got: Tu bi min dikenê. Li dawiyê, nebû, încamê çêrok jê re got: Pir çû hindik çû, mêrik û jinkê ji hevdu xeyidîn, mêrik zirtê xwe kirin, hema jinkê kir qîr qîr û got: Gundo, mêrê min çiko kuştî û dixwazê min jî bikujê).*
٥٠٧١. Xwîn xwînê meriya, laşê laşê kûçka.
٥٠٧٢. Xwînê min ji xwînê te ne sortir e.
- Y
٥٠٧٣. Ya dil. mila di dil de bê.
٥٠٧٤. Ya li te tê, ya li min tê: (*gi du mirov bi hev re dijberiyê bikin, yek ji yê dî re dibêje: Bike, ya li te tê, ya li min tê, ango ya ez mêr im, ya jî tu*).
٥٠٧٥. Ya mêra, lêhatin e.
٥٠٧٦. Ya mêrekî baş be, ya bivir û das be, ya jî bimir ji xwe xelas be.

*E cîran : hevsî . cînar . hemsî .

٥٠٧٧. Ya narim êş, ya ezê aşvanî bikujim.
 ٥٠٧٨. Ya xwe di zikî gur da nahêle.
 ٥٠٧٩. Ya ziman dibirre şûr jî nabirre.
 ٥٠٨٠. Yahûdî sêfil dibe defterê kevin vedike.
 ٥٠٨١. Yan arvanê xwe li êşke, yan jî ji êş barke.
 ٥٠٨٢. Yan bi cîran be, yan bi heval be .
 ٥٠٨٣. Yanbasi li gayî cot nabê, lê qûl dikê.
 ٥٠٨٤. Yarê di ya mi yek ba minê bi dendikê bihîva
 xwedîkîra.
 ٥٠٨٥. Yê baştir behdîne, ew jî hîz e û diz e û derewîn e.
 ٥٠٨٦. Yê bilind bifire, wê nizim dayne.
 ٥٠٨٧. Yê direve jî gazî Xwedê dike, yê dide pey jî gazî
 Xewdê dike.
 ٥٠٨٨. Yê ku bi jina xwe nikare, ne ti mêr e.
 ٥٠٨٩. Yê ku li du riyan dinêre şaş dibe.
 ٥٠٩٠. Yê ne jî hinava, nayê pêş çava.
 ٥٠٩١. Yê nû hat, mirov li yê çûyî digere.
 ٥٠٩٢. Yê nû tim yê baştir nin e.
 ٥٠٩٣. Yê pisyarkerbe dawê zanabî.
 ٥٠٩٤. Yê tiştêkî nizanibe tiştêkî ji bîr nake.
 ٥٠٩٥. Yê xêrê naçin dêrê.
 ٥٠٩٦. Yek bi şev rabû dirûmek eprex li hev pêça û çû
 nav dewêr, gezek lêda eprexek ji dirûm ket destê
 xwe peland qey beqek li wirbû ket nav destan
 hema rakir û xist dirûm û gez lêxist beqê kir
 çîzçîz mêrik got: Ez çîzmîz nizanim ez eprex
 duxum.
 ٥٠٩٧. Yek çû malekê kebanîya malê şîv bi germî danî
 ber, qey mêrik birçî bû hema kefçî tê danî û xist
 devê xwe û dev şewitî, ji bo gûmanê nebinê devê

- xwe berjor kir û got: Xakê xanî we li ser çend dîraka ye. Jinkê gotê: Li ser sebrekê* û du pifa ye.
٥٠٩٨. Yek debazî bibê zendê desta daxdin yan xûnê jê berdin yan jî berî roj hilê avê sar lê kin wê çê bibê.
٥٠٩٩. Yek heye bi sedî, sed heye ne bi yekî.
٥١٠٠. Yek îdare nake (têrê nake) didu li hev nakin.
٥١٠١. Yek ji malê xwe, yek ji canê xwe.
٥١٠٢. Yek li hafa gundekî li ser zinarekê rûnişti bû, dît mirovek ji jêr va hat û ket nav gund û bi nav mala ket û zaroka kûçik hişê kirinê û kevir kirin. piştî ket du-sê mala û zaroka têra xwe ew kevir kirin û bi sed belayî ew ji nav gund derket û devê xwe da wê zinarê û li bin zinarê rûnişt û bizilme û pîvaza li nav gund civandî xist nav hev û pelixand û xwê û pîrmût-mirmûtê berîka xwe bi nav wer kir û xwar. piştî têr xwar û çend xirpînkê xwe hilhatin û dev û simêlê xwe paqij kirin û got: Elhamdûlillah. Mêrkê ser zinêr qîrek lê da û got ê: Kuro te çi xwarî tu dibêjê: Elhamdûlillah, ma ne id wek te serî li Xwedê mezin kirine, em nikarin tiştêkî jê bixwazin, dibêjê: Li jêrî xwe binêrin, em li jêrî xwe dinêrin ên wek te bi pîvazê qayil bûne dibînin.
٥١٠٣. Yek mir, yek mirdos, yek filitî nate des.
٥١٠٤. Yek mir, yekî got: Hîn can bû çi zû mir. Yekî kirîv got: Wey law can çi ye min dîtî cara zarokî sêrokî mirî.
٥١٠٥. Yek ne di govendê da bê, sema pê hêsan e.

*E sebrekê : aramekê .

٥١٠٦. Yek niç (na), du niç, ê dinê serî li kuç .
٥١٠٧. Yek ta nabe, du ta tê re nabe.
٥١٠٨. Yek tiştekî bixwê û hinek li ber dêv binêrin û ji wê xwarinê nedê wan, bi şev di xwenê de marid wan ê werinê.
٥١٠٩. Yek û kurê xwe çûn mêvandari ya yekî, jinikê şîv bi germî danî ber wan, kurik kefçî tê danî û xist devê xwe her weko şîv germbû hêstir bi çava ketin. Bavê jê pirs kir, çima tu digrî?. Kurik got ê: Birayê minî mirî hate bîra min. Bavê jî kefçî tê danî û xist devê xwe hêstir bi çavê wî jî ketin. Vê carê lêwik jê pirs kir, got: Bavo, tu xêre digrî. Bavê got ê: Ez digrîm ko çima tu berî bira yê xwe nemir.
٥١١٠. Yek yeke dudu kulfet e, (*kulfet e*).
٥١١١. Yekî areqî vedixwer û diya wî jî li rex wî, ardê xwe bi ser teştê de dibêt. Dît ku kurrê wê tiştekî vedixwe, got : kurrê min, tu çi vedixwî, kurr got : şerbeta tirî vedixwim. Kurrik jî nedixwest ku diya wî bizane ku areqiyê vedixwe. Dayîkê gotê : kurrê min, kasakê bide min jî, dev û lêvên min di ber vê bêtinê re ziwa bûne. Kurrik kasak dagirt, da dest diya xwe û got : bike qurtek ; da ku bi çêşt û bêna areqiyê nehese. Hema dayîkê jî kase ji dest girt û bi ser xwe da kir. PIRR neçû, tajanên serxosiyê xwe gîhandin dayîkê, û rabû, êleka wê bi dest wê da, li hindur çû û hat, çiv didane xwe û ardê xwe jî çep û rast dibêt. Lawik gotê : yadê, êrd bi ser teştê de bibêje, dayîkê got : kurrê, ji min bigerre, xanî tev de li min bûye teşt.

٥١١٢. Yekî berazî û yekî karazî ji hev ra bûn xal û xarzî.
٥١١٣. Yekî bi çavekî li te nihêrî, tu bi herdu çavan lê binêre.
٥١١٤. Yekî bi te re got: Merheba, bibêje: Du merheba.
٥١١٥. Yekî bi yekî ra got: îro, dêka min dêka te li binê kelê dî. Ê din vê ra got: gi dêkê te rind e, li binê kelê li çi digerî.
٥١١٦. Yekî bi yekî re got: Qurşînek* seybê* li te kevê, ê dî got: Ger ez li ber êgir derketim mila didu li min kevin.
٥١١٧. Yekî birçî çû malikê hema rûnişt rûnenişt xoce banda xwediyê malê got ê: Rabe dest nimêjke mêvên got: Ma min çi xwarî ta ez rabim destnimêjkin.
٥١١٨. Yekî bûkek ji lawê xwe ra anî, piştî çend rojan bûkê taştiya xezorê xwe bir çolê. Xezor rûnişt û taştiya xwe duxwê, bûkê ji fedîna tirrek jê derket, xezor dengê xwe ne kir, piştî têr xwar, rabû û lîland. Bûkê got ê: Rûyê min reş, bo çi tu dilîlînê? Apê got ê: keça min ger bûka nuh li ba xezorê xwe tirrekê bikê, berwîlê wê bûkê law e. Bûkê got: Apo, ez tirrek din bikim Xezor got ê: Keça min, hele tu bi xêr û selamet yekî ji şîr veke.
٥١١٩. Yekî darekî hevcarî di kelmekê de dî, lê hinekî zirave, gereke salekê biminê paşê bê qutkirin, mêrik tirsî ko bihêlê hinek din lê rastbên û qutkin, mêrik çû mal hinek paç- maç anîn û di kelemê girêdan kir wek ziyaretekê ji bo kes wî

*T qurşîn : gulê tivingê . fişek

*E seybê : tewşankî . berdayî . bê nîşankirin .

darî qutnekê, mêrik piştî salekê bireka xwe anî ko dêr qutkê, giha ber kelemê gi rast bûye ziyret ciyê tu paçekî pê ve girêdê tê nemaye, mêrik newêrî dar qutkira, dar hişt û çû.

٥١٢٠. Yekî du ga hebûn, yek nedîçû axirê, yek ji axirê dervediket.
٥١٢١. Yekî êlidînî sola xwe li mizgeftê hindakir, rabû kir stoyê yekî kêtkî li vir li wir gotin: Emê herin ba xoceyê camiyê û hevdu kişkişandin û çûn ba xoce û çêroka xwe jê re gotin: Ê kêtkî got: Xoceyê min ev heft sal in te ez li ber qapî mizgeftê dîtîme, xoce got: Na, ê kêtikî got: Ê neyê mizgeftê, nikanê sola ji bidizê.
٥١٢٢. Yekî fiqare* keça axê xwast, axê zanîbû keça wî jê hezdikê axê gote: Fiqêre tê îşev ta sibê tazî li ser xênî rawestê, ezê keça xwe bidme te fiqêre got: Bila, hema çû ser xênî û xwe tazîkir û ta serê sibê ma êxe peyak şand ko termê wî bînê peya hat ko feqîr wek gujgutekî li dû tê û rojbaşek da axê, axê got ê: Kuro tu sar nebû, got: Na. ma ne li pozê wî çiyayê ha agirek vêketibû min xwe li ber germ dikir, êxe got: Ez keça xwe nadim, te xwe li ber êgir germ kiriye ev ne li gor mercê me ye û berda mêrik piştî demekê mêvanê axê hatin, axê gote: Keça xwe, rabe şîvekê bike keçê çû agir di tifikê da vexist û biroş danî ser devê pixarê bavê dît şîv dereng ma hat ba keça xwe got ê: Ka şîv? Keçê got ê: Biroş li ser devê pixarê ye, bav xêli bû û bi hêrs got ê: Çilo şîvê bikelê û ji êgir dûre keçê

*E fiqare . xizan .

got ê: Bavo ger şîv li ser devê pixarê nakelê çilo mirov li ber agirê wî çiyayê ha germ dibê.

٥١٣٣. Yekî got: Ez li Helebê xwe heft gazan çeng dikim, ê din got: Baş e, Heleb dût e lê gaz li vir e, ka emê gazê bînin û bipîvin û xwe çengke.
٥١٣٤. Yekî got: Kerê min kevrîn e Ê dî got: Eve kevir e, eve ker.
٥١٣٥. Yekî got: Mala min mala te ye, ma gereke tu arkê.
٥١٣٦. Yekî got: Yekî, bavê te ji nêza re mir, ê dî got ê: Ma nan hebû û bavê min nexwar.
٥١٣٧. Yekî ji sergînekî hezkir heft sala bi xwe re gerand li dawiyê av kir ser û vexwar.
٥١٣٨. Yekî ji yekî ra got: Jina te pir digere, ê din got: Ne rast e, ger pir bigeriya, ê rojekê bihata mala mi jî.
٥١٣٩. Yekî jinê xwe ji dest dêna difroşe, yek hat, go: Tu jinê xwe bi dên nadî
٥١٤٠. Yekî jinê xwe ji dest dêna difroşe, yek hat, go: Tu jinê xwe bi dên nadî.
٥١٤١. Yekî ko nerindiyek bi te kir, tu rindiyan pê bike.
٥١٤٢. Yekî li bin darek gwîzê xewkiribû, marek hat gi pêyadê, dara gwîzê bi mêr re got: Jê bigere min berê pêyada yî.
٥١٤٣. Yekî li jina xwe xist, go: Çima te ciyê min li bin pêwrmizînê kirî belkî litir bi ser min de bikevê.
٥١٤٤. Yekî li jina xwe xist, go: Çima tu hevîr distirê û kûnê xwe vêra dihezînê.
٥١٤٥. Yekî li lawê xwe xist, law revî çû ket mizgeftê, bavê got ê: Kurê min, ji mizgeftê derkeve, mêle

ko ez bi riha xwe ya sipî di mizgeftê kevim. (*ango ti carî neketî hundirê mizgevtê*)

0136. Yekî li seriyê zarozekî sermezî nêrî gotê: Anê heye. (*li gor bîr û baweriya wî gerek e diya zarok bi wî serî mirî bê*).
0137. Yekî mêr pêveda, ji gera werîsa dîtisiya.
0138. Yekî nalek dî got: Îşê min ma li sê nala û hespekî.
0139. Yekî navê wî tinebû, çû serê kaniyê pîs kir.
0140. Yekî ne go: Kerî te bi çend pera ye.
0141. Yekî ne go: Mendo kerê te bi çendo.
0142. Yekî rindîk bi te kir, bi tobekirin* mede.
0143. Yekî şîvek kundirî germ xwar dev şewitî. Rojekê ew û hevlekî xwe di çem de avjeniyê dikin dît ko kundirek bi ser avê ketî û bervê tê mêrik rabû pif kundir kir. Hevêl got ê: Çima pif kundir dikî? Mêrik got ê: Kundir germ e wê me bişewitîne.

Z

0144. Zanibê çi bêjê.
0145. Zanîna bi çûkî kolîna li berî ye .
0146. Zarê xweş bihara dilan e.
0147. Zarî koşkara tim a pêxasin.
0148. Zaro bi listikê gir dibin.
0149. Zaro li zorê ke, bûkê li kerê ke.
0150. Zarok bi girî mezin dibin.
0151. Zarok bi lîzkê mezin dibin.
0152. Zarok di lorik da, bûkê di sorik da.
0153. Zarok duxin ta çav dibînin, kûçik duxin ta dûv dilivînin.
0154. Zarok fêkiyê* malan in.

*E K tobekirin: paşkêşekirin . jêvanîkîrin .

٥١٥٥. Zarok gul in jî kul in jî.
 ٥١٥٦. Zarok guleyên zêrî ne.
 ٥١٥٧. Zarok kezeba dê û bava ne.
 ٥١٥٨. Zarok kulîlkên malan e.
 ٥١٥٩. Zarok li ser mila dê mezin dibin.
 ٥١٦٠. Zarok mera dişînin qapî* dujmina. (*ger tiştêk ji zarok re gerek bibê, ew tişt xema wî ye; tu ji ba dosta wîne ji ba dujmina wîne, ne xema wî ye, û çeka wî jî giri ye*).
 ٥١٦١. Zarok negrî, dê namijîne.
 ٥١٦٢. Zarok perdên sipî ne, nexşên xweş lê dîne.
 ٥١٦٣. Zarok ta çav dibînin, kûçik ta dûv dilivînin.
 ٥١٦٤. Zarok ya gul in ya jî kul in.
 ٥١٦٥. Zarok zarok e, çi feqîr e, çi milok e*.
 ٥١٦٦. Zarok zaroke, ha firiye ha ziriye.
 ٥١٦٧. Zarokê bê dê wek gundê bê rê.
 ٥١٦٨. Zarokê çê bi dê û bavên xwe naşêwire.
 ٥١٦٩. Zarokek seriyê wî şiloke bibê divê yekî ji heft salan bêtir şivanî kiribê di gavê stêrk ketibin ezmên de heft caran hêste li ser serî wî zarokî bijenê wê ew şiloke jê herê.
 ٥١٧٠. Zarokî baş dibê kî hevalê min e, nabê ez hevalê kê me.
 ٥١٧١. Zaroyê bê dê şîva bê xwê.
 ٥١٧٢. Zava kerê xezûran in.
 ٥١٧٣. Zava yê ber derî yê xezûra, segê ber tenûra.
 ٥١٧٤. Zava yê malê kerê malê ye.
 ٥١٧٥. Zave tim kûçkên xezûrane .

*E fêkî : êmiş . fêqî . mêwe

*T qapî : derî .

*E milok : paşe . zengîn .

٥١٧٦. Zebeş ji teyîkî xwe direvê.
 ٥١٧٧. Zebeşa pir bixwe tamê* kundira jê tê.
 ٥١٧٨. Zengîne heft perspana ye.
 ٥١٧٩. Zengîno bimbarek, fiqaro te ji ku anî ye? .
 ٥١٨٠. Zengîno, te bi çi kirî; xizano, te ji ku anî.
 ٥١٨١. Zêr biçûk e, biha giran e.
 ٥١٨٢. Zêr bide zêrkeran.
 ٥١٨٣. Zêr çiqasî biha bê, motacî* kepekê ye.
 ٥١٨٤. Zêr çiqasî çûçik e weqasî biha ye .
 ٥١٨٥. Zêr di bin axê de zingar nagire.
 ٥١٨٦. Zêr di kuçan de winda nabe.
 ٥١٨٧. Zêr qilêra destî mêra ye .
 ٥١٨٨. Zêr zanê, zor zanê, devî tivingê mor zanê.
 ٥١٨٩. Zerik çingiya, çi rast çi derew.
 ٥١٩٠. Zerik ket, neşkî lê deng da.
 ٥١٩١. Zerka vala çingîni jê tê.
 ٥١٩٢. Zerka xwe ya dagirtî, li zerka xelkê ya vala nexe.
 ٥١٩٣. Zêrker bi qedrê* zêran zanê.
 ٥١٩٤. Zêt ta heft salan dinê.
 ٥١٩٥. Zêtê nekî çirê, çira vênakevê.
 ٥١٩٦. Zeviya ji zeviya zêde, heft cara gîsnê xwe lêde,
 paşê tovê xwe têde.
 ٥١٩٧. Zewac* girakê gû ye, ne bi desta ve dibe, ne bi
 deva.
 ٥١٩٨. Zewac* girêkeke kiftî ye, ne bi desta vedibê û ne
 jî bi deva.

*E tam : çêj . çêjt . çeşnî .

*E motac : pêdivî . gerekî . atac . niyaz .

*E qedr . nerx . biha .

*E zewac : şûbûn . şûkirin . jinhênan .

*E zewac : şûkirin . şûbûn . jinhênan .

٥١٩٩. Zik baxçe ye, her tişt tê heye.
 ٥٢٠٠. Zik bîstane .
 ٥٢٠١. Zik mirov dike tizik.
 ٥٢٠٢. Zik ne êşe, dev nabêje.
 ٥٢٠٣. Zik tê e, mil şêr e.
 ٥٢٠٤. Zikbirçî têr dibin, belê çavbirçî têr nabin.
 ٥٢٠٥. Zik-birsî têr dibî, malbirsî têr nabî.
 ٥٢٠٦. Zikê bixwe savarê, divê here hewarê.
 ٥٢٠٧. Zikê têr ne xema î birçî ye .
 ٥٢٠٨. Zikê xwe ho meke hemo dana, heye ko bi des te
 nekevê carina.
 ٥٢٠٩. Zikî mera ne sifre ye, ko mera ji her kesî ra raxê.
 ٥٢١٠. Zikî têr e, çavî birçî ye.
 ٥٢١١. Zikî têr haj zikî birçî tune ye.
 ٥٢١٢. Zikî têr qurqur jê nayê.
 ٥٢١٣. Zilam darê şikestiye .
 ٥٢١٤. Zilam serkar e, jin binkar e.
 ٥٢١٥. Zilamên pîs timî fena li yê baş dikin.
 ٥٢١٦. Zilikên biharê debara malê ye.
 ٥٢١٧. Ziman bê hesti ye, digere.
 ٥٢١٨. Ziman bê hesti ye, hefsar di des xwedîya ye.
 ٥٢١٩. Ziman go: Leq, serî go: Teq.
 ٥٢٢٠. Ziman him dost e, him dujmin e.
 ٥٢٢١. Ziman him yar e, him neyar e.
 ٥٢٢٢. Ziman kilitê dilan e.
 ٥٢٢٣. Ziman li zimên namînê.
 ٥٢٢٤. Zimanê dirêj darkutê serê xwediyê xwe ye.
 ٥٢٢٥. Zimanê dirêj edû* yê serî ye.
 ٥٢٢٦. Zimanê dirêj, bela sêrî ye.

*E edû : dujmin .

٥٢٢٧. Zimanê te rihet be, serê te vehesi ye.
 ٥٢٢٨. Zimanê te toqmaqê te ye.
 ٥٢٢٩. Zimanî sorik biskinê*, ciyî bilind ê mera ye.
 ٥٢٣٠. Zimanî xwe bibirr, ciyî xwe bikirr.
 ٥٢٣١. Zimano riheto, seriyo firqeto .
 ٥٢٣٢. Zîniqê navê xwe derneket, çû bi serê kaniyê da mîst.
 ٥٢٣٣. Zirar ji cerisiyê çêtir e.
 ٥٢٣٤. Zirara Elkê, kara xelkê.
 ٥٢٣٥. Zîrê dûvmeqeskê, ji Yemenê pirske.
 ٥٢٣٦. Zîrê megîne kesa ji bo negihê pisa.
 ٥٢٣٧. Zivistan hat kerasê sêfila dirrî.
 ٥٢٣٨. Zivistan tê birka* feqîr* diteqe.
 ٥٢٣٩. Zîwana gundî mera ji genimê xelkê çêtire.
 ٥٢٤٠. Ziyareta* bê keramet*, qurbanê heq* nake.
 ٥٢٤١. Zor di derî re bikeve hundir, qanûn di kulekê re derdikeve.
 ٥٢٤٢. Zor gêzera hildikê.
 ٥٢٤٣. Zor ji zêr xurtir e.
 ٥٢٤٤. Zor tê, se ji tajî bezatir dibe.
 ٥٢٤٥. Zor zora zorê dibe.
 ٥٢٤٦. Zulm li erdê namîne.
 ٥٢٤٧. Zulmê* meke, ku li te bû, qebûl* meke.

*E bisekinê : rawestê .

*E birk : esêrk . gol . avzêl .meher .

*E feqîr : xizan .

*E ziyaret : mezel . goristan . tirbistan .

*E keramet : evra . ûddarî . rêzdarî .

*K E qurbanê heqnake : qurban lê nakeve .

*E zulm : stem . zor .

*E K qebûl meke : nepejirîne . litê meke .



**Nevîkî minî tikî bi tenê hebû bi navê jîyan .
bi xawêne yî di yeksali ya xwe re hildikşî.**

**Min nevi yê xwe û welatê xwe hêşt û hatim welatekî ne
..û ne**